**"Pirtûkeke bihêz, ya ku hemayên pêxembertiyê di xwe di hewîne û îlhamê dide."**
— Christine Caine, avakarê xizmetên A21 û Propel Women'ê

Di serdema alozî û danberheviyê de li nasnsme û armanca xwe xwedî derkevin



# BÊREQÎB

Lisa
Bevere

Nivîskara pirtûkên
*Lioness Arising û Girls with Swords* yên ku herî pir tên firotin

Hevala delal û hêja,

Tu weke jineke bi hêz ku ji bo armanceke dijî, ji aliyê Xweda ve bi awayekî bêhempa hatiye afirandin! Lê mixabin, gelekan ji me di nava tevlihevî û bêewlebûnê de gelek dema xwe derbas kir. Ji ber ku me her dem bi hinekên din re xwe da ber hev, xweşî û kêfxweşiya me ji me hat dizîn.

Dema ku em rabin ser xwe û di xweşikbûn, hêz, dilpakî û têgihiştinê de jiyaneke bêreqîb derbas bikin, hatiye. Di Mesîh de bi ser nasnameya xwe vebin; bi hêviyeke rewnaq, bi xizmeteke sadiq û çi tiştên we kirin bi hezkirinê bijîn.

Hevala min ya delal û xwuşka min, ev peyam di çi temenedî be ferq nake ji bo her jinê ye û ji bo we bi vê pirtûkê bi bereket bikim, ji bo min rûmeteke mezin e. Vê çavkaniyê bi her kesê hûn wan nas dikin re parve bikin û jê netirsin. Ev pirtûk xelata min e ji bo we!

Jiyana xwe bi hezkirin, bi wêrektî û bi azweriyê bijîn!

Bi hêviyên herî xweş…



Lisa Bevere
LisaBevere@ymail.com

MessengerX

Messenger
INTERNATIONAL

**"Pirtûkeke bihêz, ya ku hemayên pêxembertiyê di xwe di hewîne û îlhamê dide."**
— Christine Caine, avakarê xizmetên A21 û Propel Women'ê

Di serdema alozî û danberheviyê de li nasnsme û armanca xwe xwedî derkevin

# BÊREQÎB

Lisa
Bevere

Nivîskara pirtûkên
*Lioness Arising û Girls with Swords* yên ku herî pir tên firotin

**Without Rival** by Lisa Bevere, Kurdish Latin
© 2024 Messenger International
MessengerInternational.org
Originally published in English as Without Rival
Additional resources in Kurdish Latin by John and Lisa Bevere
are available for free download and video streaming at
**MessengerX.com** and on the **MessengerX** App
To contact the Author: LisaBevere@ymail.com

This book is a gift from Messenger International and is
NOT FOR SALE

**Bêreqîb**, Lisa Bevere, Kurdî Latinî
© 2024 Messenger International
MessengerInternational.org
Orîjînala pirtûkê ya Îngîlîzî bi navê Without Rival hatiye çapkirin.
Xebatên John û Lisa Bevere yên di nava Kurdî Latinî de çap bûne hûn dikarin
ji malperên **MessengerX.com** û **MessengerX** bi awayekî bêpere daxînin û
online li wan temaşe bikin.
Ji bo têkiliya bi nivîskar re: LisaBevere@ymail.com

Ev pirtûk xelateke xizmeta Navneteweyî ya Messenger'ê ye
û bi pereyan nayê firotin.

Daxîne ji ser App Store

Werbigire ji ser Google Play

App Store, marqeyeke tîcarî ya şîrketa Apple Inc.ê ye ku li Amerîka û welatên din qeydkiriye.
Google Play û Google Play logo jî marqeyên tîcarî yên şîrketa Google LLC'yê ne.

*Xwuşka Delal û Hêja,*

*Tu ew keçik e ku Bav'ê te bêreqîb e û Bav'ê te, ji te pir hez dike. Û di paşerojê de û di demeke ku mînaka wê tuneye de, peyamek û sozek emanetî te kiriye. Tu ji bo vê kêlîka ku di heman demê de hem bêhempa ye û hem jî tirsnak e hatiye hilbijartin. Ha tam jî ji ber vê divê mirov bê tirs hez bike… bê pîvan bawer bike… û bê sînor hêvî bike.*

# NAVEROK


1. Nasnameyeke Bêreqîb . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 1
2. Xwedayê Me yê Bêreqîb . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 17
3. Sozeke Bêreqîb. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .37
4. Ceger Neke ji bo Danberhevdinê! . . . . . . . . . . . . . . . .59
5. Gava Reqîb Hat Dîtin. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .77
6. Zayenda Bêreqîb. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .97
7. Reqabeta Tirs û Hezkirinê . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 125
8. Bîrên Kûr û Bîrên Xwestekan . . . . . . . . . . . . . . . . . . 143
9. Keçikeke Xweda ya Bêreqîb . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 165
10. Jiyaneke Bêreqîb . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 187

# 1

## Nasnameyeke Bêreqîb

> Kesê li ser serê me, ew kes e ku ji bo em bibin tiştê em pê dizanin ku em bibin ew tişt, îlhamê dide me.
>
> RALPH WALDO EMERSON

Qet reqîbekî we çêbû?

Ez ne behsa reqabeta bi dostanî ya biranşên werzîşê dikim. Ez ne behsa zarokên biçûk jî dikim, yên bi hev re reqabetê dikin ji bo bala dê û bavên xwe bikişînin û xwe li ber çavên wan xweş bikin.

Ez bêtir behsa kesekî ku her dem li hemberî we dixebite, dikim. Reqîbek tu carî xwe weke heval an jî kesekî ji malbatê, nade hîskirin. Gava ku reqabet dikeve nav lîstikê, armanc dibe ne serkeftina lîstikê, armanc dibe ew ku we ji sehayê bavêje.

Lêbelê eger we her dem kifş bikira ku hûn bibin ew jiyana ku hûn dixwazin li derveyî wê dinyaya reqabetê bimana, wê çi bibûya? An ji bo hûn ji lîstikê vekişin, hûn hîn bibûna ku hûn ne mecbûr in têk herin? An hûn hîn bibûna ku hûn ê têk neçûna? An ne tenê hûn ê bifikiriyana ku hûn ê li derveyî qutiyê bimana û we yê ev yek hilbijartaya?

Berî bi dehan salan, min pirtûkeke diyar dikir ku wê dawiya vê dinyaya em pê dizanin (ne ji ber fezayiyan) wê ne ji ber biyaniyê pêk were, xwendibû. Li gorî teoriya wê, wê dinya bibûya di aliyên li hemberî hev an jî bibûya du fikrên li hemberî hev û wê dawiya wê bihata. Gava ku ev atmosfera berbelav ya perçebûyî ava bibûya, ji bo heta qiyametek çê bibe wê karekî pir rehet bûya ku van her du koman li hemberî hev sor bikin.

Perçebûneke sîstematîk ya evqasî fireh, wê di çerçoveyeke hîn samîmî de dest pê bikira. Dibe ku ji hundurê malên mirovên birîndar ku dilên wan perçe bûye, dest pê bike. Bi hêviya ku hûn pişta xwe bidin xwe û pişt re bidin kesên din, hêzên rast yên ku derewan li ber guhên we dipispisînin û êrîşî hiş, îrade û hestên we dikin, hene.

Pir zor e ku em ji peyam û peyamgerên ku ji me re dibêjin; hûn pir ne baş in, hûn pir ne ciwan in, hûn pir ne biaqil in, hûn pir ne xurt in û hûn pir ne dewlemend in, birevin û xwe xelas bikin. Bi hêviya ku em ê li gorî daxwaza wan biçûk bimînin, me dixin bin bombebaranê. Xwesteka me ya revê ya ji ber vê zilma her dem ku ji me re dibêje hûn qet ne temam in, tenê aliyê me yê xwezayî yê însanî ye. Ev tacîz gava gihîşt asteke qirîtîk, hin jî wê li gorî wê tevbigerin û hin jê jî wê qopya bikin û sitûyê xwe li ber deynin. Yên din jî wê tawanbariya xwe lê bar bikin û wê îsyan bikin.

Gava me hîs kir ku em hatine darizandin, îcar em jî didarizînin.

Gava mirov dikeve ber fediyê, mirov fedî dike.

Gava ku mirov li ber dilê xwe ne şîrîn be, mirov ji xwe nefret dike.

Gava ku mirov top davêje, pir derbas nabe mirov dixwaze hin kesan bixapîne. Çerxeke wisa ye ku her kes têk diçe û tu kes bi ser nakeve. Baş e eger gotinên Pawlos rast bin?

> Lê eger bi qinyatê be, jiyana xwedayî qezenceke mezin e.
> (Tîmotêyos I, 6:6)

Meşa di rêya Xweda de, ew têgihiştin e ku mirov nêrîna Xweda bipejirîne.

Ev tişt weke ku Ew çawa li kesên din dinêre û em vê nêrînê dipejirînin, ev tê wê wateyê ku em jî nêrîna Wî ya li hemberî me dipejirînin.

Gava ku mirov timayê neke û mirov bi rastî ji xwe bawer be, ev yek xemsariyê ava nake. Berevajî vê ev yek têgihiştinê azad dike! Ji kesên li hemberî we dixebitin û bala we belawela dikin, dûr bikevin. Çavên Xweda li ser me ne û bi vî awayî em jî dikarin berê xwe bidin Xweda.

Pişt re çi dibe?

Ji bedêla tiştekî ku qet ji bo te nehatiye avakirin, ji bo tişta ku tu xwediyê wê ye kifş bike, tu yê bibî xwediyê wê enerjiyê.

Ji bo ev pirtûk çareseriyê ji gemarên rojane re bibîne, ez duayan dikim. Ji bedêla reqabeteke ku wê tu tiştî nexe destên we ku hûn ê hewl bidin, ji bo hûn di şer de bi ser bikevin ez dixwazim hûn di cihê xwe de amade bin. Ji bo hêza canê we, lihevketineke pir rast heye ku tê ber bi we ve. Êdî dema ku hûn li vê dinyayê cihê xwe bigirin hatiye. Em derew û tiştên ku bala mirov belawela dikin, deşîfre bikin û di rastiyê de bê hûn kî ne em derxînin holê.

## Winda Bû û Hat Dîtin

Ji kûçikan hez dikim. Berî bi çendakî gava ji bo rêwitiyeke Koroya Başûr ji malê dûr ketibûm, kûçîkê me yê delal û hêja Tia xistibûn sitargehê. Li gorî tê zanîn, karkerekî deriyê mala me vekirî hiştibû û Tia germahiya mala me li dû xwe dihêle û ji bo berê xwe bide kolanên Coloradoyê ku germahiya van kolan di bin sifrê de ye, xwe diavêje derve. Ji ber sedemekê wê şevê bi ser rêya malê venebûye. Cîranekî me yê dilnazik ku hîn em nizanin bê kî ye wê şevê ew dîtiye û li mala xwe kiriye mêvan û roja din ew biriye sitargeha kûçikan.

Di situyê Tia de etîketek hebû lê hema bêje bi kêrî tiştekî nedihat ji ber ku telefona li ser dinivîsand me êdî bi kar nedianî. Bi ser van halan de îcar dema rûhseta kûçik jî qediya bû (biborînin, min digot qey ev karê rûhsetê carekê tenê çêdibe). Ha ji we re kûçikekî malê û yekî ku

pir jê tê hezkirin lê dengekî ku alîkariya me bike, em wî bibînin an jî işareteke ku nasnameya wî derxîne holê, tunebû.

Seul, gava li Koroyê bûm haya min ji meseleyê tunebû. Lawikên min, serpêhatiya bêşens ya Tia ji min veşartin û bi vî awayî baş tevgeriyan. Lê bêguman malbatiyan pir panîk kiribû. Li her deverî nêrîn lê kûçik li tu deverî nedîtin. Tirsiyan û gotin qey wawikan ew kuştiye. Weke çareya dawî, belkî jî hema ji xwe wisa, guh dan şîreta kesekî û li sitargeha kûçikan geriyan.

Gava Austin gîha sitargehê û Tia dît, pêşî bawer nekir ku kûçikê me ye. Êşa ku kişandibû tevgerên Tia wisa guhertibûn, ji bedêla ku gava Austin dît bi kelecan bibe, weke ku ketibû depresyonê. Di quncikeke qafesê de ji tirsan xwe qijilandibû û dilerizî. Piştî ku Austin pereyê sitargehê û cezayekî (diyar bû ku ji ber dema rûhsetê qediya bû, ev ne tiştekî baş bû) mezin da, îcar ji bo Tia bîne malê ji qafesê derxist.

Gava ez vegeriyam malê û min li hemû çîrokê guhdar kir, hinekî dilê min êşiya. Ne ji ber kurikên xwe lê ji kûçikê xwe. Ev zêdeyî deh salan çêbibû ku Tia kûçikê me bû û cara pêşî bû ku bi tena serê xwe derketibû derve û venegeriya bû malê. Ez tirsiyabûm. Çima aniha? Gelo nexweşiya çavên wî nedihişt bibîne? Gelo ji ber emrê xwe yê pîr şaş bibû? An li min digeriya?

Dawiya dawî sedema bê ji ber çi çûbû ne girîng bû. Ew endamek ji malbata me bû û sedema ku bi tena serê xwe bi ser rêya vegerê venebûye, vê rastiyê naguherîne. Lêgerîn hat kirin, ceze hat dayîn, rûhset nû bû, ji qafesa şermezariyê hat derxistin û li cihê xwe yê li ber lingên min vegeriya. Ji ber sedemeke ku şevekê bi xelet tevgeriya, ev ne bes bû ku em wî ji endama malbatiyê bavêjin.

Bêguman we fêhm kir bê min mijar anî kuderê. Eger em (xwediyê heywanên kedîkirî yên teqez bi qusûr) ji bo kûçikekî evqas tiştan bikin, îcar kî zane bê wê Bavê me yê asîmanî ji bo me çi bikie? Gava pêşî ya fêhmkirina nasnameyê, di kifşkirina bê hûn ji bo Wî kî ne re derbas dibe. Ayeta 3:1 ya Yûhennayê Yekem, şibakeyekê li ber me vedike bê Xweda me çawa dibîne:

> Binêrin, Bav çiqas ji me hez kir ku em zarokên Xwedê bên gazîkirin!
> Û em ew in. Ji ber vê yekê dinya me nas nake, çimkî ew nas nekir.
> (Yûhenna I, 3:1)

Em di derbarê bê hezkirina Xweda çiqas pir û mezin e de, bipeyivin. Bi xof, bêhempa û di ser her tiştî re ye. Tam berevajî tiştên ji rêzê an jî yên normal e. Kûrbûna hezkirina Xweda me ber bi heyranbûnê ve dibe. Û ev hezkirina bêhempa, xelatek e ku bi xwe re xelatekê tîne. Me xelata xelasiyê sitend.

Xweda di quncikekê de ku ola însanî ya civakê ji tirsan lê vedaye û di rewşeke sefîl û qafeskirî de em dîtin û ji bo me xelas bike bedel da. Lê li wir nesekinî. Em nêzî xwe kirin, rûhseta me nû kir û hişt ku em bibin aîdê Wî. (Ev hemû hîn berî ku em ji gunehên xwe paqij bibin bûn!) Bi rastî jî hûn aîdê Wî ne. Û ew ji hemû zarokên xwe evqasî pir hez dike. Lê wan bi awayekî bêhempa hez dike.

## Wekhev an Bêhempa?

Ji bo em her tiştî bi awayekî wekheviyê pêk bînin, di hewldanên xwe yên mirovî de gelek caran em difikirin û berê xwe didinê ku Xweda ji me hemûyan wekhev hez dike. Her çiqasî di destpêkê de xweş xuya bike jî, terma "wekhev" ewqasî ne mezin e. Tîne ziman ku em dikarin peyva "wekhev" bi awayekî biguherînin an jî serbiser bikin. Tu dibêjî qey dibêje: "Qeda pêkeve, min yek ji wan camên mor yên ku berî bi hefteyekê min ji marketê kirîbûn, şikerand; ez hêvî dikim ku di depoya wan de yeka weke wê hebe." An jî ez mînaka xwe ya heye bi kar bînim: "Kûçikê min yê ku ev deh sal zêdetir çêbûye ez wî xwedî dikim, ji malê reviya. Temam, li şûna wî ez ê yekî din ji xwe re bikirim û ez ê ji wî jî weke min çawa ji yê berê hez dikir, ez ê ji vî jî bi heman awayî hez bikim."

Ez nikarim vê bikim û ez bawer dikim ku ev ji bo Xweda jî ne derbasdar e. Ez ji we re sedema wê bibêjim.

Rojekê piştî nîvro min hinekî çavên xwe nerm kirin. Lê gava ez ketim

xew, ez ne li ser cihê xwe lê li ser kompîtura xwe bûm. Gava serê min ket ber min, ez veciniqîm û şiyar bûm û min dît ku li ser ekranê heyşt rûpel herfa “t”yê hatiye nivîsandin.

Tam di wê kêliyê de min hîs kir ku divê ez herim û têkevim xeweke giran. Min rahişt kûçikê li ber lingên xwe, xist hembêza xwe û bi lez ez derbasî odeya xwe ya razanê bûm. Gava ez di xew re çûm, min bihîst ku Giyanê Pîroz bi min re dike pistepist: “Ez ne weke hev ji zarokên xwe hez dikim.”

Bi awayekî ecêbmayî ez rabûm û li ser livînên xwe rûniştim. Ev fikra ku dişibiya kufrê ji kuderê derketibû? Ev gotin ji devê min derketin: “Divê tu weke hev ji me hez bike, naxwe wê ev ne karekî wekheviyê be.”

Îtîraza min wisa bersivand: “Na. Wekhevî tîne ziman ku hezkirina min tê pîvan û lê ez dikarim bi rehetî ji te re bibêjim ku ev nayê pîvan. Gava ku em bibêjin wekhev e, ev tê wê wateyê ku zarokên min dikarin bên guhertin an jî bibin yedekên hev lê ne wisa ye. Dilê min beş bi beş nehatiye veqetandin. Tu kes di dilê min de nikare şûna yekî din bigire an jî yekî din ji şûna wî biqewirîne. Ji ber ku weke tu dibînî; ez ne wekhev ji zarokên xwe hez dikim, ez bi awayekî bêhempa ji wan hez dikim.”

**Ez ne wekhev ji zarokên xwe hez dikim ez bi awayekî bêhempa ji wan hez dikim.**

Hilmeke kûr bikişînin û li min guhdar bikin. Xweda ne wekhev ji me hez dike, bi awayekî bêhempa ji me hez dike. Ji min bawer bikin, awayê bêhempa ji wekheviyê çêtir e.

Eger çend zarokên we hebin, bêguman jixwe hûn vê fêhm dikin. Gava ew zarokê duduyan, sisêyan an jî yekî din çêbû hezkirina we kêm nebû. Hûn biceribînin jî hezkirina we ya ji bo her zarokekî, hûn nikarin asta wê bipîvin. Hûn ê ya dilê xwe çawa bipîvin? Hezkirina we ya ji bo her zarokekî we, bêhempa ye. Her yek ji wan hezkirina dê û bavê xwe bi awayekî din şiyar dike. Bi awayekî ecêb, helwesta bêhempa ya zarokekî we ku hûn pir ji vê helwestê hez dikin, dibe ku di yekî din de tam berevajî

vê helwestê hebe û hûn pir ji vê hez bikin. Weke mînak, neviyekî min ku nikare di cihê xwe de bisekine heye. Lê neviyê min yê pêşî ku birayê wî yê mezin e, yekî keml û giran û dilnizm e. Ez wan nadim ber hev. Ez ji nêrîna wan ya ji hev cuda ku ne weke hev e, hez dikim. Wan pîroz dikim û ev yek li xweşa min diçe. Min tu carî nedixwest ku weke hev tevbigerin. Yek ji wan jî di dilê min de ji yê din bêtir cih nagire: ji her duyan jî bi temamî lê bi awayekî bêhempa hez dikim.

*Hekhev* di heman demê de diyar dike ku hezkirina Xweda tê pîvan an jî dikare bê pîvan lê ne her du jî ne. *Hekhevî* kûrahiyeke pir mezin di xwe de dihewîne. Yê dişibe me tuneye! Augustine vê yekê bi awayekî pir baş tîne ziman: "Tu dibêjî qey Xweda her yekî ji me weke ku tenê yek ji me heye hez dike."

Hevzkirina Bavê me, ji bo zarokên wê xwe bêqedir hîs nekin naşibe dêyeke danhevî ku pasteya biqrema ji bo her zarokekî xwe weke hev perçe dike. Hezkirina Wî ya bêhempa, bi kontrolkirina porsiyonan ve ne girêdayiye. Hûn fêhm dikin ku hîn berî avakirina dinyayê ji we hez dikir û dawiya hezkirina Wî ya li hemberî we tuneye? Hûn dikarin berê xwe ji Wî bidin alî, jê birevin û cihê xwe li dojehê deynin lê tevgerên we nikarin hezkirina Wî bi dawî bînin. (Bi rastî, kî dixwaze li dojehê rakeve?)

Reb, bi rêya Pêxember Yeremya re derbarê hezkirina xwe de wisa got: "Belê, bi hezkirina abadîn ji te hez kirim; bo vê yekê te bi qenciyê kişandim cem xwe." (Yêremya 31:3).

Li vir bala xwe bidin raweya demê. Dem dema borî ye. Hezkirina Wî ya li hemberî me mijareke temambûyî û kamilbûyî ye. Wî hûn, hûn yê bi rastî, hûn yê bêhempa; bi hezkirineke ku qet naqede ji we hez kir û ji bo hezkirina Wî bê hûn çiqasî ciwan an jî yextiyar, zeîf an jî qelew in, ferq nake. Gava hûn ciwan û cahil bûn ji we hez kir. Xweda hezkirin e. *Hezkirina Bavê me ya ji bo we tuneye... Ew ji bo we hezkirin e.*

Hezkirina Bavê me ya awarte ya ji bo me; bêdawî, samîmî û bêhempa ye. Û hûn bi awayekî bêhempa tên hezkirin ji ber ku hûn bi awayekî bêhempa hatine afirandin.

Peyva *bêhempa* tê wateya “mînaka tekane, pirototîp an jî tenê yek”ê û pênaseya min ya sereke ev e: “bêhempa an jî bêreqîb.” Bavê me Xweda bêreqîb û bi tena serê xwe ye, ji ber vê di çavên Wî de mirov bibe keçikên bêreqîp divê mirov şaş nemîne û ev rewş gava ku pêwistî pê hat dîtin ku em bi hev re reqabetê bikin, her sedemê ji holê radike.

Hûn mînaka xwe ya tekane ne!

Hûn dawî û destpêka xwe ne. Ji bo hilberîna serhev mînaka sêwirandinê ya pilankirî tuneye. Di sulaleya Wî de kesên hatine qopyakirî, yên eynî û wekhev tunene. Reqîbê ku nehêle hûn hezkirina Wî ji kesên din re bibêjin an jî yê ku rê li ber hezkirina Wî ya ji we bigire, tuneye. Tu kes ji ji we pê ve nikare we bike xwe!

Xweda AND’ya (DNA) we bi awayekî bêhempa afirandiye û di cihekî wisa veşartî de honand, ji bo ku bikaribe dinyayê şaş bike. Diyar kir bê wê dilê we çawa xwe bîne ziman, avahîsaziyê ken û melodiya di dengê we de bû. Hemû taybetmendiyên we bi hezkirina herî xurt û kûr tenê gava hûn li xwe difikirîn ava kirin. Beşişandina we ya pêşî bi malbata we re pîroz kir û gavên we yên pêşî bi kêfxweşî temaşe kir.

Bi xêra vê eleqeya nerm û aqilane, gelek aliyên jiyana we ya ku hezkirina Wî bi awayekî bêhempa tîne ziman û der dike, hene. Wî, ev taybetmendiyên awarte û yetenekên diyar di binyata keçika xwe ya rêzdar de, bi cih kir. Zanîbû ku wê her wesfek bi awayekî herî baş di formata we ya jinbûnê de bê îfadekirin.

Zanîbû ku hûn ê weke keçikekê bi awayê herî baş Wî temsîl bikin û pê re têkiliyê deynin. Ha ji ber vê zayenda we jin hilbijart. Di navbera bav û keçikan de girêdayiyeke pir nazik heye.

Gava ku şikl û şêmal da we, di hişê Wî de keçikeke din tunebû... Hûn zewqa Wî ne.

Ev, eger hûn hîn dirêjtir, hîn kintir, hîn reştir an jî hîn spîtir bûna, ev tê wê wateyê ku we yê ji vê baştir tiştekî din nikarîbû bikira. Ev di heman demê de eger hûn zilam bûna, ev tê wê wateyê jî ku hezkirina daye we hûn ê ne hilgirê herî baş yê vê hezkirinê bûna. Xweda ji kurikên xwe hîn bêtir û ji keçikên xwe hîn kêmtir, hez nake. Û ne jî

wekhev ji her zayendê hez dike. Bi awayekî bêhempa hem ji jin û hem jî ji mêran hez dike. Belkî jî gava hûn mezin dibûn, bav an jî dêya we bi awayekî aniye ziman ku hûn kurik bin û we ev bihîstiye. Belkî jî hin deman we jî xwestiye ku hûn weke zilam bihatana dinyayê. Lê vê zanibin… Xweda ev tu carî nexwestiye.

Gava ku we hilma pêşî kişand hinavên xwe, kêfa Bavê me hat û gava sal derbas bûn û hûn bûn keçikeke ku ji Giyan ji nû ve çêbûye, îcar ferîşteyên li asîmanan jî tevlî kêfa Wî bûn.

Hûn kesên ku bi awayekî bêhempa ji we tê hezkirin, hemû tiştên derbarê we de bêguman ne jixweber in.

## Keçikeke Bêreqîp

Wê demê ev hemû tên çi wateyê? Ji bo me hemûyan tê wateya hezkirina naqede û tam nayê pîvan. Hûn ne mecbûr in ji bo cihê xwe yê li ser masê têkoşînê bikin an jî ji bo hezkirîna Wî bi dest bixin. Tu kes nikare we biqewirîne an jî cihê we bigire… Hûn bêreqîb in.

> Hezkirîno, niha em zarokên Xwedê ne û hê ne eşkere ye ku emê bibin çi. Lê em vê yekê dizanin: Gava ku ew xuya bibe, emê bibin wek wî. Çimkî ew çawa ye, emê wî wisa bibînin. Her kesê ku hêviya xwe bi wî ve girêdide, wek ku ew paqij e, xwe paqij dike. (Yûhenna I, 3:2-3)

Bi hev re, ji bedêla ku em xwe li ber çavê kesên din şîrîn bikin û xwe têxin çavên wan, divê em li nasnameya xwe ya tam bigerin bê em ê çawa bi dest bixin. Em ê dev ji danberheviya xwe ya bi kesên din re berdin, ji ber ku danberhevî îlhamê nade me. Danberhevî me û dinyayê bê di rastiya xwe de çi ne, dixapîne. Eger nirx û nasnameya me di dawiya dawî de bi bêhempabûna me ya ku ji zikmakî de tê, girêdayî be wê demê çi wateya qiyas û reqabetê heye? Tenê em xwe diqedînin. Ji bo hûn şerekî bêreqîb li dar bixin, hûn keçikeke wekheviya wê tune û bêhempa ne û bi roniyê hatiye dorpêçkirin.

> *imkî wek ku di bedena me de gelek endam hene û karê hemû endaman cihê ye, wisa jî em ên ku gelek in, em bi Mesîh yek beden in û em hemû endamên hev in. Û li gor kerema ku ji me re hatiye dayîn, diyariyên me yên cihê hene. Eger diyariya yekî pêxemberîtî ye, bila li gor pîvana baweriyê bike.* (Romayî 12:4-6)

Ev pasaja di Nivîsên Pîroz de, îma dike ku du unsûrên li hemberî jiyaneke bêreqîb heye: xurûr û hesûdî. Gava hûn keçikeke bêhempa û bêreqîb bin, ev nayê wê wateyê ku hûn gîhane armanca xwe. Wateya wê ev e; hûn di rêwitiyekê de ne û wê alîkariya wê bigihê vê xaçepirsê û hûn ê di vê xaçepirs û rêyê de perçeyek û bedenek bin.

*Xurûr;* xeyalên ku me bêpîvan bilind dikin, dipispisîne û ji bo em bibêjin "Erka min ya herî girîng e. Ez bi tena serê xwe dikarim, ez têra xwe dikim, ez girîng im û ez yekî mezin im." me tev dide û me ji bedenê diqusîne.

Ji aliyê din ve, peywirên me yên hesûdiyê biçûk dibînin û ji bo em li vê dinyayê rolên ku Xweda dane me îhmal bikin, me li gorî dilê xwe bi rê ve dibe. Hesûdî wisa dibêje: *Ez qedir û qiymetê nadim rol û erka xwe, ji ber ku ji bo ez bibim xwediyê ya te, ez dixwazim tu xwe ji ser rê bide alî.*

Ev her du jî, ji bo şexsan derxîne derve û ji bo komên mirovan yên eleqedar ji erk û cihên wan qut bike, weke şûrekî du alî yê mirdar hatine avakirin. Carina dijmin vî şûrî bi kar tîne û bi xurûra zilamtiyê ya ji rêderketiye û bi reqabetê êrîşî zilamên di bedena Mesîh de dike û jinan jî dixe xafika hesûdiyê.

Hûn weke kesekî heqiqî, bibin hevalekî me yê ji dil û can. Êdî dema ku Xweda dev ji pîrozkirina ku keçikên xwe "bêhempa" û wan "wekhev" bibîne an jî ji bo "zêdetirî vê" reqabetê bikin, bibîne hatiye. Gava ku we xwe bi rastî neanî ziman, ya rastî hûn dihêlin ku kesên din li hemberî we bêrêziyê bikin. Mirov her dem dikarin yan sixte hîs bikin an jî dikarin ya orîjînal qopî bikin. Nebînim jî, wê bêsamîmiyeta peyv, kirin û nêrîna we hîs bikin an jî wê bibîhîzin. Ferqeke gelekî mezin di navbera temaşekirin û qopîkirina mînakekê de heye. Gava ku mirov hewl dide

ku bibe kesekî din, yek ji wan sedemên ku mirov evqasî diêşîne jî ev e. Jiyan ji zûde ye weke testeke hilbijartî ye û bersivên xelet yên tekane ew in ku we ji bo xwe nehilbijartine.

Gava ku me îfadeya xwe ya bêhempa înkar kir, wê demê em hezkirina Bavê xwe qels dikin. Û ji kerema xwe re fêhm bikin ku di nav pirsgirêkên we de ya herî biçûk divê cil û bergên we bin. Gelek mirov difikirin ku bêhempabûna xwe bi rêya cil û berg, por, xişr û makyajan îfade dikin. Di rastiyê de ev tiştên ji derve de xuya dikin, tenê aksesûar in. Ji îfadekirina nasnameya we ya kûr pir dûr in.

Rastî ev e, dibe ku hûn cuda xuya bikin lê dîsa jî dibe ku hûn di bêhempabûnê de negihêjin.

Ne hewce ye em li derdorê binêrin û îmaja gelemperî ya ku her dem tê guhertin an jî destûrê bidin ku fikrên wan li ser me tesîrê bikin û bi vî awayî dema xwe winda bikin. Ji bo em bi awayekî bêhempa rengvedin, her tiştê ku Xweda ava kiriye divê em bi baweriyê hembêz bikin.

## Hûn Aîdê Kê Ne?

Ne hewce ye ez zanibim bê hûn bi kê re didin û distînin. Pêdiviya min bi navê dê û bavê we, dibistana we an jî karsazê we tuneye. Ji bo we bikire ez dixwazim navê kesê ku jiyana xwe dide ber, hîn bibim. Û eger hûn xeyal bikin ku fedekariya wî li wir sekiniye, wê demê hûn di ser gelek tiştan re diqevizin. Gava ku Wî hûn dîtin, wê dîsa daneyne heman cihê ku toza li ser we dawşandiye. Hûn bilind kirin. Û bi rastiya xwe hûn kêfxweş kirin.

Aniha, di dilê we de tenê pistepisteke biçûk be jî vê bibêjin: *“Ez yê Wî me û Ew yê min e.”*

Bavê we yê ebedî, ew Kes e ku xwediyê mafê we yê pênasekirinê ye. Dêya we hûn di malzaroka xwe de mezin kir, bi we daket lê Bavê we yê Asîmanî we xuliqand, afirand û hûn çêkirin. Gava hûn winda bûn, hûn xelas kirin, bi vî awayî careke din îlan kir ku Ew xwediyê we ye. Roja ku zeman bi dawî bû wê bê, piştre wê Ew her yekî ji me ji nû ve

çêbike û em ê fêhm bikin ku jiyana vê dinyayê tenê toximek e û em ê li asîmanan şikl û şemala xwe bigirin.

Ez niha nizanim bê jiyan we çawa bi cih dike lê ji kerema xwe re fêhm bikin ku mekan, demsal û şert û merc her gav û kêlî tên guhertin. Di vana van hemû çûn û hatinan de ya herî girîng ev e: hûn kî ne û aîdê kê ne.

Di destpêka vê beşê de min gotineke Ralph Waldo Emerson ku ez pir jê hez dikim, nivîsand: “Kesê li ser serê me, ew kes e ku ji bo em bibin tiştê em pê dizanin ku em bibin ew tişt, îlhamê dide me.” Ha ew kes Xweda ye. Her tiştê bûye û kiriye îlhamê dide me. Afirînerê me; her tiştê em dibînin, dibihîzin û weke afirandinê dizanin, ji bo em dîsa xwe bi nasnameya xwe ya îlahî ve girê bidin, çêkiriye. Ji bo dîsa em têkiliya xwe bi Wî re ava bikin, Kurikê xwe şand.

Piştî ku me dîsa bi nasnameya xwe ya rastî re têkilî danî, gelek mirov bê *çi kirine, xwediyê çi ne an jî bê ji kê hez dikin* qîma xwe bi vî sînorê teng yê ku wan pênasê dike, tînin. Lê tiştekî ku bi rehetî ji we dikare bê stendin, hûn nasnameya xwe pê ve girê bidin karekî bêaqilan e. Kar tên guhertin, huner winda dibin û dibe ku tişt bên dizîn. Dibe ku em têkiliyên xwe yên girîng jî winda bikin. Bê hûn xwediyê çi ne, we çi kiriye û bê li derdora we kî heye, dibe ku di vê kêliyê de bê guhertin. Lê bê hûn kî ne û Afirînerê ku hûn aîdê wî ne, pir girîng e ku hûn Wî winda nekin.

Eger tenê hûn zanibim bê hûn bi kuderê ve diçin, di nava rê de hûn ê têkevin wê rîska ku hûn xwe winda bikin. Eger tenê hûn zanibin bê ji bo çi bang we kirine, ji bo hûn bigihêjin armanca xwe hûn dikarin hinekî ji xwe kêm bikin.

Û bi vî awayî pirsa dem û dewranan: “Mirovek hemû dinyayê bi dest bixe jî, lê jiyana xwe winda bike, çi feyda wî heye?” (Metta 16:26).

Xwezanîn, ji çûyîna bê hûn bi kuderê ve diçin an jî ji zanîna bê hûn dikarin çi bikin, pir girîngtir e. Xwedayê we yê afirîner helbet derbarê bê hûn kî ne de, gelek tiştên ku bibêje hene. Û pirsa bê hûn di rastiyê de kî ne, di nava xwe de wehiya bê hûn ê bibin kî, dihewîne.

## Hûn Kî Ne?

Ne hewce ye hûn lê binêrin bê hûn çi dikin an jî hûn di çi re derbas bûne. Xwe bi tiştên ku we kirine re pênase nekin. Wê pêdiviya we bi statuya we ya şexsî; ango hûn bekar, veqitiyayî, zewicî an jî xwedî hezkiriyekê ne, çê nebe. Ev ne têkiliyeke Facebookê ye ku hûn rewşa xwe guncav bikin. Ev ne ji bo min an jî heta ne ji bo wan e. Ez dixwazim hûn bi xwe zanibin bê hûn kî ne.

Berî em hîn bêtir herin bi pêş de, rahijin pênûsekê, çavên xwe bigirin û ji Afirînerê xwe pênaseyên bêhempa yên derbarê we de jê bixwazin ku di guhê we de bike pistepist. Ji peyvên hezkirin û qedirdayînê netirsin. Ev peyv dîtina Wî ya rastî ya derbarê we de ye. Kêliyekê sakîn bin û vê yekê bizanibin. Ez dixwazim hûn sê peyv an jî îfadeyên ku ji we re kiriye pistepist, hûn not bistînin. Piştî ev xebat xelas bû şûnde, ji pênaseyên kesên din yên derbarê we de kirine dûr bikevin û gava we pistepista Xweda ya derbarê we de bihîst, li wan peyvan binêrin û bala xwe bidinê. Lîsteya we hûn hinekî şaş kirin ne wisa? Gelek çêbû ku we ji vê nêrînê li xwe nenêriye?

Bila gumana we jê tunebe ku Xweda tu carî tiştekî berevajî Gotina xwe nabêje. Giyanê Pîroz, rastiya ku Gotina Xweda datîne holê, bi can dike. Lêbelê ji ber ku di destê me de Pirtûka Pîroz heye ma tenê em bixwînin û lê guhdar bikin? Ayeta 12:28'an a Îbraniyan ji me re tîne ziman ku Xweda amadekariya desthilatdariyeke ku tu carî naheje kiriye. Di pirtûka Peyxamê de, pirsa giyanî ya ku heft caran tê pirsîn, ez bawer dikim ku di roja me de weke vexwendinekê berdewam e:

> *Ewê ku guhên wî hene, bila bibihîze ku Ruh ji civînan re çi dibêje.*
> (Peyxam 2:7, 11, 17, 29; 3:6, 13, 22)

Gava ku ev di beşeke Pirtûka Pîroz de tam heft caran dubare dibe, ev tê wê wateyê ku binê girîngiya vê tê xêzkirin. Û gava ez şiyar bim jî dibe ku guhên min bihêlin ku ez fêhm bikim ku ez di xew de me. Hêviya min ya herî mezin ew e ku ev pirtûk ji bo guhên we bibihîzin, bihêle ku wan şiyar bike.

Dîsa jî em dikarin lê vegerin û dengê Xweda bibihîzin. Eger me giyanê pîroz ji bo ji cihê jiyanên me yên ku me berê diyar kirine ku ji wan re bêdeng maye, bipeyive; vexwendiya wê çi bibûya gelo? Hûn destûrê didin ku rûbirû ji we re bipeyive? Destûr heye ku Xweda li ser hevaltiyên we, zewaca we û derbarê malbata we de bipeyive? Ji gelek aliyan ve tebîetekî me yê ku em guhên xwe ji hişyariyên Xweda re bigirin heye û di nava pêvajoyê de tiştên din yê ku dixwaze ji me re ragihîne, em nagihêjin wan û ji kîsê me diçin. Weke bedenekê ji bo em bibihîzin, bi birayara ku em li kesan guhdar bikin, dest pê dike. Ji bo em guhên xwe şiyar bikin, ma gelo cesareta me heye?

Tu luksa me tuneye, em ji qedera ku Xweda ji me re diyar kiriye, gumanê bikin. Eger em wisa bikin, her tiştên ku emanetî me kirine em ê bi guman, tirs an jî bi hêrsê wan bibirin. Xweda dixwaze nasnameya me rizgar bike, vegerîne û biguherîne. Bi vî awayî dixwaze ku di jiyana we de tu bûyer, serdem an jî paşgotinên ku derbarê we de hatine kirin, nemînin û we pak bike. Belê, dibe ku serdem, rexne û bûyer jiyana we biguherînin û xwediyê wê hêzê ne ku dikarin jiyana we berevajî bikin lê ne bingeha jiyana we ne. Bingeha jiyana we Xweda ye.

Hûn bi dilxwazî hatin pakkirin ji ber ku hûn bi awayekî bêhempa hatine hezkirin û hûn îfadeyeke bêhempa ya Xweda ne ya derbarê hezkirina mirovan de. Weke zarokên Xweda wateya vê nasnameya me; gava ku Xweda her zarokekî xwe ji bo bibin ew tiştên ku dixwazin bibin, îcar ev nasname bi cih dibe û wateya wê diyar dibe. Li dinyayeke ku her kes xwe kifş dike an jî ji nû ve pênase dike, Xweda karê ku daye ber xwe temam dike. Ev pirtûk ji bo hûn li dû Wî bin, vexwendinek e. Da ku we bi vî awayî kifş bike!

## Pirsên Nîqaşê

1. Xwenasîn çima ji zanîna ku hûn ê herim bi kudere ve, pir girîngtir e?
2. Nîqaş bikin, bê çima bêhempabûn ji wekehevî an jî hemanbûnê baştir e.

3. Çend reqîbên ku nahêlin hûn li nasnameya xwe xwedî derkevin û hunera pêjirandina hezkirina Xweda qels dike, çi ne?

4. Bi we zor tê ku hûn li derveyî pênasekirina tiştên hûn dikin, xwe bînin ziman? Eger wisa be, naxwe çima?

5. Xweda çi ji we re dike pistepist?

2

# Xwedayê Me yê Bêreqîb

Peyvên li vir nivîsandî term in.
Divê serpêhatî pên serê we.

AUGUSTINE'Ê PÎROZ

## Ê Weke Wî Tunene

Di dawiya salên 1980'yî de, şîrketa muzîka ya bi navê Integrity ji bo muzîkên hebandinê yên parzemînên cuda, bi kesên weke me ku li Amerîkaya Bakur dijîn, bide naskirin; bi lêkolîneriya ku li dinyayê kirin re nêrîna muzîka hebandinê ya Xirîstiyaniyan dest bi guhertinê kir. Her meh em bi kelecaneke mezin û bi malbatî li benda qaseta xwe ya ku em aboneyê wê bûn, diman (belê, ez ewqasî pîr bûme) û pişt re me gelek caran û li ser hev li qaseta xwe dixist. Stranên ku me ji wan hez dikir, me gelek caran dîsa li wan guhdar dikir, gava ku zilamê min diçû rêwitiyekê û li wan guhdar dikir û li wan cihên ku bi baldarî hatine qeydkirin, dengê muzîkê bilind û kêm dibû û hema bêje nema dihatin bihîstin. Qaseteke ku me bi malbatî pir dieciband hebû: *Hez Bike Afrîka.*

Ji ber çavên min naçe ku lawikê min Austin; yê bi dû serê yê mezin de bi derpîkinikê xwe yê ku Mickey Mouse li ser e, li ser hespa xwe ya textînî dida çargavan û gotinên stranên diqêriya.

Di nava gotinên stranekê de, rêberê hebandinê yê Afrîkaya Başûr, nakarata "Ê weke Wî tuneye" digot.

Bêyî ku qet dudulî bibe, lawikê min yê sê salî çi gava ku stranê lê dixist, heta jê dihat nakarata bi arezû ya rêberê hebandinê weke wî dikir û digot.

Rojekê Austin, bi pirseke ku divê haya min jê hebûya nêzî min bû.

"Dayê, çima yê weke Xweda tunene?"

Ê min jî heta ji min hat min jê re behsa bê çima yên weke Xweda tunene, kir.

Xwedayê me bi awayekî neaktîf nasekine û temaşe nake. Ji her tiştî heq derket û aniha piştî ku karê xwe qedandiye û xwe paldaye, îcar gava zarokên wî jê dixwazin ku çîrokê bibêje kêfa Wî tê.

Yeka din jî, yên Pîroz û Mezin, li derve nasekinin û li hundur nanêrin.

Nêrîna Wî ya li paşeroj, îro û pêşerojê bi hev re yeksengî ye, bi vî awayî, di destpêkê de dawiya xwe dibîne û piştî ku karên Wî xelas dibin, dest bi wan dike.

Di ser me re dixwaze ji hundur ve li derve binêre lê ne ji ber ku pêdiviya Wî bi çavên me heye vê dike, ji ber ku pêdiviya me bi nêrîna Wî heye, vê dike.

*Xwedayê li Lûtkeyên Herî Bilind,* Xwedayekî pênase dike ku em li Wî weke bilindahiyekê dinêrin û Wî di ser her tiştî re dibînin. Nivîskarê Zebûra 96'an, ha li hemberî vê peyxama mezin û evînê, bi saweke mezin bi ser ve diçe:

Lavijek nû ji Xudan re bixwînin! Ey tevahiya dinyayê, ji Xudan re lavijan bêjin! Lavijan bêjin, navê Xudan pîroz bikin, Her roj mizgîna rizgarkirina wî bidin! Berziya wî li nav miletan, Karên wî yên nedîtî li nav hemû gelan belav kin! Çimkî Xudan mezin e û hêjayî pesindanê ye, Ji hemû îlahan bêtir, ji wî tê tirsîn. Çimkî hemû îlahên gelan pût in, Lê yê ku ezman afirand Xudan e. Berzî û mezinahî li pêş wî ne, Hêz û

xweşikî li perestgeha wî ne. Ey hûn malbatên gelan, pesnê Xudan bidin, Pesnê hêz û berziya Xudan bidin, Pesnê berziya navê Xudan bidin, Pêşkişiyan bînin û têkevin hewşên wî! Di nav berziya pîroz de biperizin Xudan! Ey tevahiya dinê li pêş wî bilerizin! Di nav miletan de bêjin, «Xudan serweriyê dajo.» Dinya saxlem hatiye avakirin, naleqe. Ew bi dadperwerî gelan dadbar dike. Bila ezman şa bin, erd dilşa be! Bila derya û hemû yên tê de, bikin gurmîn! Bila zevî û hemû yên tê de şa bin! Hingê tevahiya darên daristanê, Wê li pêş Xudan bi şahî bistrên. Çimkî ew tê! Ew tê, ji bo dadbarkirina erdê. Ewê dinê bi dadperwerî, Û miletan bi rastdariya xwe dadbar bike.

Pirtûka Pîroz vê pirsê bi gelek awayên cuda, gelek caran dubare dike û dipirse: “Ma kesekî weke mezinê her tiştê mezin heye?”

Ev ne tenê pirseke retorîk e ku avêtinê holê ji bo em kûr bifikirin. Lêpirsînek e ku jiyanê pênase dike û heq dike ku bersiveke deng vede: “Tu kes tuneye!” Berteka me ye ku em ê bidin vê gotina Wî bilind; wê rê li ber me veke ku em tişta Xweda ji me re veqetandiye an jî em bi awayekî nezan red bikin. Weke hûn dizanin, demekê yekî ku ew weke “Mezinê Mezina” xeyal dikir hebû. Ji gelek aliyan ve hebûneke asîmanî ya lûtkeya herî bilin ya afirîneriyê bû. Em aniha wî weke şeytan dizanin lê wê demê Kerûv’ek bû, serferîşteyê stêrka siharê bû û hebandin bi rê ve dibir. Ji ber vê, li mezinahiya Xweda dinêrî û li odeya Wî ya textî li ber hebûna Wî disekinî. Ayetên 28:12-17’an yên Hêzekîelê wî wisa pênase dikin:

> Yê ku mohra gehîştî, bi zanyariyê ve tijî û di xweşikiyê de bêkêmasî ye, tu bû. Tu li Adenê di bexçê Xwedê de bû dorûberên te bi yaqûda zer, heqîqa sor, heqîqa sipî, zimrûdê ezmanî, heqîq, yeşîm, yaqûtê şîn, yaqûtê gewez kevirên zimrûdê û bi hemû kevirên biqîmet û bi zêr ve hatibûn girtin; karên tef û zirneyên te ji te bûn; roja ku tu hatibû afiradin hatibûn amade kirin. Tu Kerûbiyek parêzker, yê ku hatiye mesh kirin bû û min te çikand, tu li ser çiyayê pîroz yê Xwedê bû; tu di nava kevirên ji agir in de geriya. Heta ku di te de xerabî hate dîtin ji roja ku tu hatiye afirandin tu di rêyên xwe de bêqisûr bû. Ji ber zêdebûna danûstendina te hundirê te bi zordestiyê ve dagirtin û te sûc kir û mîna tiştê mindar, te ji çiyayê Xwedê avêtin

> û te, Kerûbiyê ku siyê belav dike, ji nav kevirên ku agir in avêtim û tune kirim. Dilê te ji ber xweşikiya xwe bilind bû; ji ber rewnaqiya xwe, te zanyariya xwe xera kir; te li erdê xistim; bona ku bibînin te avêtim li ber çavên qiralan.

Xweda ev ferîşte; mezin, zane û bi awayekî bêqusûr ku bi kêrî her tiştî bê, afirand. Hebandina wî dibe ku astekê daketibe jêr. Belkî jî daket asta heyraniyê. Ne diyar e bê çawa ketiye rêya nebaşiyê lêbelê ev mexlûqê zane û bêhempa, Afirîner ji xwe re weke reqîbekî dît. Di nava dînamîka hebandinê de, têgihiştineke vala ya ji Xweda cuda heye. Îşaya ketina wî bi vî awayî diyar dike:

> *Ya stêra birqok, kurê seherê,*
> *Tu çawa ji ezmanan ketî!*
> *Te milet têk birin,*
> *Lê tu hatî jêkirin û li erdê ketî!*
> *Te di dilê xwe de digot:*
> *"Ezê rabim ezmanan,*
> *Ezê textê xwe deynim ser stêrên Xwedê.*
> *Ezê li çiyayê dîwana îlahan, Li bilindahiya Safonê rûnim.*
> *Ezê hilkişim serê bilindahiya ewran,*
> *Ezê xwe bikim mîna Xwedayê Herî Berz."*
> (Îşaya 14:12-14)

Xwe nedikir weke Mezinê Mezinan… Tenê dikarîbû xwe *xera bike* û stêrka bişewq, kurikê seherê bû Şeytanê xapînok. Ev xerakirin di dilê wî de dest pê kir. Bêqusûr dest pê kir û biqusûr bi dawî bû. Em ji dayikbûnê ve biqusûr û kêm in lê ya ku Mesîh ava kiriye ji nû ve bi rêya çêbûnê re em temam dibin û em bêqusûr dibin. Gava ku xurûr xwebûnê teşwîqê hebandinê dike, dilnizmî xweperestiya xurûrê ji ser text hildiheşîne. Gava ku Îşaya Reb dît, helak bû:

> "Wey li min! Ez helak bûm. Çimkî ez zilamekî lêvqirêj im û di nav miletekî lêvqirêj de rûdinim. Lê çavê min Padîşah, Xudanê Karîndar dît." (Îşaya 6:5)

Ev rewşa helaknûnê rê li ber avakirina Xweda vekir û gava demekê Şeytan li nava wan kevirin sincirî digeriya, ango yek ji wan pizotan anîn ji Îşayayê nizm bûyî re:

> Ji Serafan yek ber bi min ve firiya û di destê wî de sotikeke êgir hebû. Wî ew bi maşikê ji ser gorîgehê hildabû. Wî ew bi devê min ve danî û got: "Va ye, ev agir li lêvên te ket. Loma sûcê te hat rakirin û gunehê te hat bexişandin."(Îşaya 6:6-7)

Gava em li Wî bigerin miheqeq em ê Wî bibînin. Bi vê peyxamê re em Wî dihebînin û em îlan bikin ku tenê Ew pîroz e, tenê Ew baş e, tenê Ew rê ye û tenê Ew rast û jiyan bi xwe ye. Tenê Ew Mezinê Mezinan e.

Hebûneke ku bişibe Xweda tuneye. Mînakek an jî referanseke sereke ya Wî tuneye. Berî Wî kes tunebû. Xwedayê me neguherî. Xwedayê me çêbûye, heye û yê pêşerojê ye. Çawa em hîn bûn ku em bêhempa ne, Xwedayê me jî bêhempa ye.

Îlahên berî Wî tunebûn û ji ber vê jî divê em îlahan nexin ber Wî. Xwedayê me bi çavên seriyan neyê dîtin jî, hebûna Wî nayê înkarkirin. Nameya Romayiyan vê yekê tîne ziman:

> Çimkî tiştê ku li ser Xwedê tê zanîn ji wan re diyar e; ji ber ku Xwedê ji wan re eşkere kiriye. Hê ji afirandina dinyayê ve hêza wî ya herheyî û Xwedêtiya wî, bi ser ku nayên dîtin jî, bi tiştên ku hatine çêkirin bi zelalî tên dîtin û fêmkirin. Loma hêceta wan tune. (Romayî 1:19-20)

Hemû afirandin, hebûna Afirînerê xwe piştrast dike lê pênasekirina Xwedayê me tiştekî din e. Ez hêvî dikim ku ev beş; derbarê têkiliya we ya îlahî ya bi Wî re giyanê we hîn bêtir şiyar bike.

Me anî ziman ku em keçikên bêreqîb in ji ber ku Bavê me yê Asîmanî bêreqîb ji me hez dike. Bi nasnemeya we ji Xweda stendiye re, ji bo hûn têkiliyê ji kûr ve ava bikin, tiştên ku ev xelata îlahî di xwe de dihewîne hûn mecbûr in bi rastî hîn bêtir fêhm bikin. Em têgihiştina

xwe ya derbarê Xwedayê xwe yê bêreqîb de berfireh bikin. Ferhenga Merriam Webster Xweds wisa pênase dike: “Hebûneke bêqusûr ku di mijara hêz, xizmet û başiyê de hêjayî hebandinê ye û weke rêvebir û afirînerê fezayê tê dîtin.”

Hûn dikarin bifikirin ku ev pênase her tiştî di xwe de dihewîne û pênaseker e lê ev tenê destpêk e. Di navbera qelsiya zimanê xwecihî û noksaniya me ya nêrîna dinyayê de, em bixwazin û nexwazin jî di şîrovekirina Yê Bêsînor de, em bi sînor tevdigerin. Bi peyxama dide re, gelo em dikarin peyvên wê me şaş bihêlin ku wê Xweda pênase bikin, pêde bikin?

Xweda, di ser pênasekirinê re ye.

Ji bo pênasekirina tiştekî, bi peyvên ku heybera diyar bike re, divê hûn koka wî tiştî bi dest bixin. Xwedayê ku di ser zimanê me re ye, nakeve hundurê van kêmasiyan.

Temam. Pênaseyê ji bîr bikin. Baş e îcar ev pênase? Dîsa bê derfet e. Ji şewqa ku em nikarin nêzî wê bibin û ji ber wê kor bûne, îcar em ê çawa pêşnumeya çiravî zelal bikin?

> …Ew Desthilatdarê yekta û Pîroz e, Padîşahê padîşahan û Xudanê xudanan e. Ew bi tenê bêmirin e û di ronahiya ku tu kes nikare nêzîk bibe de rûdine. Û ji mirovan tu kesî ew nedîtiye û nikare bibîne. Hurmet û karîna herheyî ji wî re be! Amîn. (Tîmotêyos I, 6:15-16)

Eger nêrîna me ya ji cihê em lê dinêrin, dîtina Xwedayê me jî zeft neke; wê demê em ê bikaribin bêhempabûna Wî ji bilî zilamekî riziyayê zêdetir bînin ziman gelo? Peyvên me qels dimînin û piştî ku Xweda di nava tofaneke mezin de xuya kir û şûnde, gotinên ku ji devê Eyûb derdikevin tên bîra me:

> *Min li ser te bi guhan bihîstibû, Lê niha ez bi çavê xwe te dibînim. Loma ez xwe kêm dibînim Û di nav toz û xweliyê de tobe dikim.* (Eyûb 42:5-6)

Ev peyxama ku ji Xweda girt, hişt ku Eyûb hîn bêtir birçî bibe. Gelek ji me derbarê Xweda de, qîma xwe bi peyxameke herî baş ku qaşo jê

re dibêjin “piç û parî” tînin. Em qîma xwe bi guhdariya wazan, ya podcastan, bi “ecibandina” parvekirinên Facebook û Instagramê û parvekirina keskî din ya Twitterê ku em dîsa wê parve dikin, tînin. Yek ji van jî ne xelet e lê li ber xwarin û vexwarina ku Xweda ji we re amade kiriye, incex dikarin bibin weke “piç û parî”yekî. Ya rastî Xweda dixwaze hûn bi dilsoziya Wî xwe têr bikin. Ez dixwazim hûn hîn bêtir birçî bibin ji ber ku di navbera axaftina derbarê Xweda û guhdarîkirina Xwedayekî ji we re dipeyive de, ferqeke pir mezin heye.

Ez dizanim kesên ku dibêjin em êdî ji Xwedayekî ku napeyive re xizmetê dikin, hene. Lê ev mantiq bi xwezaya Wî re li hev nake û heqaret e. Eger bêdengî hilbijarti be jî, hemû afirandin dibe dengê Wî. Ji bo dilxweşî û alîkariyê, Giyanê Xwe yê Pîroz şand. Gava ku em Pirtûka Pîroz dixwînin, Giyanê Pîroz yê Xweda ye ku me hîn dike û ber bi rastiyê ve dibe. Xweda, ne pûtekî kerr û bê ziman e. Xweda ne bavekî ku bersivê nade û guhdar dike. Eger em nepeniya bê Xweda kî ye hembêz nekin, em ê nizanibin bê em ê çawa nêzî Wî bibin. Hin rêyên ku Xweda dipeyive ev in: Gotina Wî, afirandin, xizmetkarên Wî, xeyal û dîtin û endamên bedena Wî. Min dua kirin û ez bawer dikim ku wê Xweda bi rêya rûpelên vê pirtûkê re, bi we re bipeyive. Xweda her kêliyê dipeyive. Pirs jî ev e: Em li Wî guhdar dikin an em Wî bi sînor dikin? Divê em Xwedayê ku kesekî weke Wî tuneye, bêsînor û bêhempa ye hembêz bikin û em bawer bikin ku dixwaze rû bi rû bi me re bipeyive.

Teologê bi nav û deng Thomas Aquinas, jiyana xwe hemû bi nivîsîna derbarê Xweda de bihurand. Hem weke rahîbekî û hem jî weke felsevanekî, hewl da ku nûvedanên zanistî bi têgihiştina derbarê Afirînerê me de li hev siwar bike. Lêbelê Aquinas berî mirina xwe bi sê mehan, derbarê alema ebedî de xewnek dît û ji ber vê xewna bi bandor ha ev gotinên dawî nivîsandin û pişt re destê xwe ji nivîsê kişand. Aquinas wisa nivîsandibû:

> Ez gîham dawiya hewldanên xwe. Hemû tiştên min nivîsandin, piştî tiştên ji min re hatina ravekirin incex weke qirşikekî xuya dikin.

Û ev zilam, zilamekî wisa ye ku bi baldarî xebitiye û mezinahiya Xweda û tekûzbûna dêrê, bi gelek cîldên pirtûkên nivîsandiye re aniye ziman. Û di heyameke ji ya pir cuda de jiya ku di vê heyamê de peyv xwedî kûrahiyekê pir mezin bûn û ji ber vê bi baldariyeke mezin dihatin hilbijartin. Derfeta xwendin û nivîsandinê îmtiyazeke dewlemend, mîr an jî oldaran bû. Thomas Aquinas, heta tu bêjî bes hosteyekî peyvan bû lêbelê ji bo hemû xebata jiyana xwe pênase bike, xebata xwe şiband qirşikekî. Peyva qirşik, gelek caran ji bo tiştekî ku bi kêrî tiştekî nayê tê bikaranîn. Çop hilberîneke ji ber zadên baş derdikeve holê û bi piranî ji bo nebat û heywanan tê bikaranîn. Tiştê ku bi esasî dixwaze bibêje, xebatên ku di seranserê jiyana xwe de ava kir hemû layiqî qirşikekî dîtin û avêt bin lingan.

Ji bo ferqa di navbera tiştên derbarê Xweda nivîsandin û rastiya ji aliyê Xweda ve hatiye fermankirin de bibêje, şibandineke ji vê baştir çênedibû. Ev her du hevokên ku di dawiyê de nivîsandin; ji hezaran rûpelên ku di nava bîst salan zêdetir de nivîsandin, bêguman ji van hemûyan bêtir tişt dianîn ziman. Ev gotin bi dilnizmî û heyraniyê hatine hûnandin ji ber ku Aquinas, tişta ku Augustine berî bi hezar salî beyan kiribû, tecrube kir: “Xweda herî baş bi nenaskirina Wî tê zanîn.”

Peyxama derbarê Xweda de ya rastî gava me pejirand ku em hîn Wî nas nakin, dest pê dike. Her pênaseya di destê me de ji aliyê mirovan ve û bi termên wan ve hatiye dabeşkirin. Em dikarin hewldana xwe ya ku em Xweda pênase dikin, bişibînin zarokekî ku nikare bipeyive û dêya xwe tîne ziman. Li vê gerdûna bêdawî ku jiyan lê heye, mirov incex perçeyekî biçûk yê afirandinê dadigirin. Tu dibêjî qey em li ser libek qûmê ne û em hewl didin ku okyanûsên bêdawî û kûrahiyên ku di xwe de dihewînin, bînin ziman.

## Xwedayê Me Kî ye?

Lêbelê Xwedayê me dîsa jî, ji bo em Wî baştir nas bikin, hebûna Wî tecrube bikin û ji bo em dengê Wî hîn bibin, dixazwe em nêzî Wî bibin. Çawa ji bo mirov agir binase, divê mirov şewq û têhna agir û şewitîna

agir tecrube bike ku ev du hêmanên ji hev cuda ne; Xweda jî ne tenê dixwaze em derbarê Wî de xwedî agahî bin, bang me dike ku em Wî tecrube bikin. Li jêr hin rastiyên derbarê Xweda de hene ku em van teqez dizanin. Ji ber ku di seranserê Nivîsên Pîroz de, xwe bi vî awayî ji me re dide nasîn:

**Ez… tenê yek im.** Dubarekirina Şerîetê 6:4; Marqos 12:29; Galatî 3:20; Tîmotêyos 2:5; Aqûb 2:19

**Ez… alfa û omêga me.** Peyxam 1:8; 21:6; 22:13

**Ez… ez im.** Derketin 3:14

**Ez… ji qalûbelayê û heta hetayê heme.** Dîrok I 16:36

**Ez… pêşeng û temamkarê baweriya we me.** Îbranî 12:2

**Ez… afirînerê erd û ezman im.** Destpêk 1:1

**Ez… xwedî hêza her tiştî me.** Metta 3:9

**Ez… hez im.** Yûhenna I 4:7-8, 16

**Ez… baş im.** Marqos 10:18; Lûqa 18:19; Tîmotêyos I 4:4

**Ez… di nava we de me.** Dubarekirina Şerîetê 6:15; Lûqa 17:21; Korîntî I 14:25

**Ez… rastî me.** Yûhenna 3:33

**Ez… şîfayê didim we.** Derketin 15:26

**Ez… giyan im.** Yûhenna 4:24

**Ez… bav im.** Yûhenna 6:46; Filîpî 2:11

**Ez… di ser Kurikê xwe re têm bilindkirin.** Yûhenna 13:31

**Ez… şahidê we me.** Romayî 1:9; Filîpî 1:8 Selanîkî 2:5

**Ez… diyar dikim.** Romayî 1:17

**Ez… alîgirê we me.** Romayî 8:31

**Ez… desthilatdariya her tiştî dikim.** Romayî 9:5; Efesî 4:6

**Ez… dil rehm im.** Dubarekirina Şerîetê 4:31; Romayî 12:1

**Ez… pêbawer im.** Korîntî I 1:9; 10:13; Korîntî II 1:18

**Ez… ji mirovan zanatir im.** Korîntî I 1:25

**Ez… ne sedema tevliheviyê me.** Korîntî I 14:33

**Ez... sedema aştiyê me.** Korîntî I 14:33

**Ez... dikarim bihêlim ku hûn di ser her karî re derkevin.** Korîntî II 3:5

**Ez... comerd û dilrehm im.** Derketin 34; Nehemya 9

**Ez... zû bi zû aciz nabim.** Yoel 2:13; Nahûm 1:3

**Ez... pir bilind bûm.** Filîpî 2:9

**Ez... li ser we bi bandor im.** Filîpî 2:13

**Ez... bi çavan nayêm dîtin.** Kolosî 1:15

**Ez... Xwedayê ku xezebê didim.** Kolosî 3:6

**Ez... dadgerekî xwedî edalet im.** Selanîkî 1:15

**Ez... xelaskerê hemû mirovan im.** Tîmotêyos I 2:3; 4:10

**Ez... bi zincîran nehatime girêdan.** Tîmotêyos II 2:9

**Ez... avakarê her tiştî me.** Îbranî 3:4

**Ez... ne bêedalet im.** Îbranî 6:10

**Ez... zindî me.** Îbranî 10:31

**Ez... agirekî ku her tiştî didim ber xwe.** Dubarekirina Şerîetê 6:3; Îbranî 12:29

**Ez... şewq im.** Yûhenna I 1:5

**Ez... ji dilên we mezintir im.** Yûhenna I 3:20

**Ez... Xwedayê hebûm, heme û di pêşerojê de jî ez ê hebim.** Peyxam 1:8

**Ez... pîroz im.** Peyxam 4:8

**Ez... Xwedayê ku hêza wî digihêje her tiştî me.** Peyxam 11:17

**Ez... hêza we me.** Derketin 15:2

**Ez... awaza we me.** Derketin 15:2

**Ez... xîretkêş im.** Derketin 34:14; Dubarekirina Şerîetê 4:24

**Ez... ne însan im.** Hejmara Beyebanê 23:19; Dubarekirina Şerîetê 4:24

**Ez... xwedayê xwedayan û rebê reban im.** Dubarekirina Şerîetê 10:17

**Ez... bi hêz, bilind û bi heybet im.** Dubarekirina Şerîetê 10:17

**Ez... kesî di ser kesî re nabînim.** Dubarekirina Şerîetê 10:17

**Ez... pesindarê we me.** Dubarekirina Şerîetê 10:21

**Ez... bi we re di nava şer û cengê de me.** Dubarekirina Şerîetê 20:4

**Ez… şervanek im.** Derketin 15:3

**Ez… şikefta te me.** Dubarekirina Şerîetê 33:27

**Ez… latê we me.** Samûêl II 22:32-33

**Ez… bêhempa me.** Dubarekirina Şerîetê 4:32, 35; Qral I 8:60

Û ev hîn ne lîsteyeke bi giştî ye! Ez dixwazim hûn her yekê ji vê kifş bikin lê di vê beşê de ez dixwazim tenê li ser sisê heban kûr bibim. Ya pêşî ku ez dixwazim li ser bisekinim, yekbûna Xweda ye.

## Xweda Yek e

> Bibihîze, ya Îsraîl! Xwedayê me Xudan yek Xudan e. Hûnê ji Xwedayê xwe Xudan bi hemû dilê xwe, bi hemû canê xwe û bi hemû hêza xwe hez bikin. (Dubarekirina Şerîetê 6:4-5)

Ev pênaseya ku em dibêjin "yek" e, xelet fêhm nekin ev ne pêşbirkeke gerdûnê ye ku di nava xwedayan de çêdibe û Xwedayê me di vê pêşbirkê de bûye yekem. Na ne wisa ye. Îfadeya "yek"ê ne ew e ku hejmarekê li Xweda bar bike, armanca wê ew e ku ji Wî pê ve xwedayekî din tuneye. "Yek"bûn tê wateya tenêbûn û tekaneyê. Xwedayekî duyem, sêyem an jî çarem tuneye. Tenê ew hêja ye ji ber ku tenê ew Xweda ye. Ev yek bi fermana herî mezin ya Îsa re girêdayî ye:

> Îsa lê vegerand û got: Ji Xudan Xwedayê xwe bi hemû dilê xwe, bi hemû canê xwe û bi hemû hişê xwe hez bike. Emrê pêşî û mezin ev e. (Metta 22:37-38)

Hezkirina me ya li hemberî Xweda divê diyarkirineke hevpar ya aqil, can û dil be ku di nava hevkirinekê de be. Tenê Xweda navenda lêhûrbûna me ye û yê tekane ku hêja ye hebandinê Ew tenê ye. Xweda bi dilekî parçekirî re zane ku em ê ne di rewşeke baş de bin û bi çavekî baş li xwedayên reqîb nanêre, bi vî awayî ji bo me rêkûpêkiyeke baş ava kiriye. Ev ferman derbarê cihê Xweda de yê li hemberî me, ne ji ber bêewlebûnê hatiye dayîn, armanca Wî me biparêze, bi vî awayî ji bo ku baldariya me neçe ser tiştekî din û em ji rê dernekevin.

Dibe ku ev, di roj û heyama me de serê mirov tevlihev bike, ji ber ku gelek mirovên din nayinin ziman ku hin xwedayên din dihebînin. Ji bedêla ku em ji îlahên ku xwedî navên kevnar in bawer bikin, li şûna van li ber pûtên ku mirovan çêkirinê bejna xwe bitewînin baştir e. Hîn berî her tiştî Xweda zarokên xwe şiyar kirin:

> Hûnê ji bo xwe pûtan çênekin, pûtên qewirandî yan kêlên kevirîn çik daneyinin û li welatê xwe kevirên qewartî çênekin ku hûn li ber wan herin ser çokan. Çimkî ez Xwedayê we Xudan im. (Lêwiyî 26:1)

**Pût, ew tişt e ku hûn hêzê didinê an jî hûn ji wî hêzê distînin.**

Gelekan ji me li mal an jî li bexçeyên xwe sitûnên ji keviran an jî kevirên neqişandî neçikandin lê ev nayê wê wateyê ku di dilê me pût tunene. Pût, ew tişt e ku hûn hêzê didinê an jî hûn ji wî hêzê distînin. Ji bo hûn lê bijîn ew cihê ku hûn lê digerin. Dibe ku stargehek be ku hûn bazdidin bi ber wê ve. Pût, weke tiştekî xwarinê û heta bi bengîtiya torên civakî dikare here. Eger hûn çavekî li lîsteya jor ya derbarê nasnameya Xweda de bigerînin, wê demê hûn ê bibînin ku Ew hêz, jiyan û stargeha me ye. Ji Xweda pê ve divê tu *kes, têkilî, organîzasyon* an jî *tiştek* li ser we nebe xwedî hêz û bandor.

Ji bo me hinekan hîs pût in. Eger em xwe baş hîs bikin, em ê bawer bikin ku em xweşik in. Eger em xwe baş hîs bikin, em ê bawer bikin ku em baş in. Eger tenê em li gorî hîsên xwe bijîn, wê me bixapînin û gelek derbas nabe em ê ji rê derkevin.

Ya rastî hûn xweşik in ji ber ku ew nefsbiçûkan bi taca serketinê dixemlîne (Zebûr 149:4). Hûn xweşik in ji ber ku Xweda her tiştî di wextê wê de xweşik çêdike (Waiz 3:11). Ji ber ku Xweda jixwe bereketa xwe bi ser jiyana me de dakiriye, destûrê nedin ku pûtên bêaqil û tiştên ku dinya xweşik dibîne bandorê li jiyana we bike! Dawidê şervanek bû û Xweda diheband, pûtperestiyê bi vî awayî pênase dike:

> Pûtên wan ji zîv û zêr in, Ew karên destê mirov in. Devê wan heye, napeyivin, Çavên wan hene, nabînin, Gohên wan hene, nabihîzin,

> Pozên wan hene, bîhnê nastînin, Destên wan hene, hîs nakin, Lingên wan hene, rêve naçin, Deng dernakeve ji gewriya wan. Yên ku wan çêdikin û yên ku xwe dispêrin wan, Ew jî wê bibin mîna wan! (Zebûr 115:4-8)

"Yên ku wan çêdikin û yên ku xwe dispêrin wan, Ew jî wê bibin mîna wan!" Ev îfade tê çi wateyê? Gava ku hûn tiştekî mirovî mezin dikin, hûn dikevin wê astê ku hûn bi tiştên mirov dikarin bikin re, bi sînor dibin. Pût tiştên bêkêr in. Her çiqasî xwediyê jiyanê xuya bikin jî, ew hêza wan tuneye ku jiyanê di hundurê kesên din de zindî bikin. Ji ber vê, kesên wan dihebînin; deng û azadiya xwe ya çalakiyan winda dikin û ji sehekên xwe yên ku Xweda daye wan tawîzan didin. Gava ku hûn Xweda dihebînin, bi mezinbûnê re hûn dişibin Wî û vediguherin Wî. Ji ber ku yê weke Xwedayê me tuneye û ji bo tişta bêhempa ya di nava me de derxîne, ji rêya ku em bidin dû Wî çêtir tuneye. Dibe ku hûn xwendekarên kesên din bin lê tu carî hûn mirovan nahebînin.

## Xweda Alfa û Omega ye

Rastiya duduyan ew e ku Xweda ji qal û belayê û hetahetayê wê hebe lê rêyeke din ku mirov vê bîne ziman ew e ku Ew Alfa û Omega ye. Alfa û Omega di alfabeya Grekî de yek jê herfa pêşî ye û ya din ya dawî ye. Di vê çarçoveyê de ev her du herf ji destpêkê û heta dawiyê her tiştî temsîl dikin. Alfa tê wateya "pêşî, destpêk, afirandin, çêbûn, berbang û şemûg"ê. Pênaseya Omegayê evqasî ne zelal e lê wateya "dawî, xala dawî û xelasbûnê" dihewîne. Belkî jî sedema ku pênaseya Omegayê evqasî çiravî ye, ji ber ku em mirov ji bûyerên wê biqewimin bêtir yên qediyane çavnas tên ji bo me. Sedema ji bo em bi Xweda bişêwirin ku divê em nêzî Wî bibin, ha ev e. Terma ku em weke zeman dizanin, tenê Ew bi temamî xwediyê wê ye. Yê weke Xwedayê me tuneye. Pêxember Îşaya wisa dibêje:

> Tiştên di demên berê de bûne bi bîr bînin,
> Çimkî ez Xwedê me û yekî din tuneye.

Ez Xwedê me û yekî wekî min tuneye.
Ez dawiyê ji destpêkê didim bihîstin
Û tiştên ji demên qedîm ve ku hê nebûne dibêjim.
'Wê pîlana min pêk were,
Ezê hemû daxwazên xwe pêk bînim.' (Îşaya 46:9-10)

Xweda dawiya tiştekî di destpêka wê de diyar dike. Piştî ku Alfa nivîsand û îcar piştre Omega diyar kir. Bang me dikin, ji bo ku em li dawiyê binêrin û dilsoziya Wî bibînin. Ew hîn gava roj hiltê dizane bê wê ew roj çawa bi dawî bibe:

Min tiştên berê ji demên berê ve gotin. Ji devê min derketin,
Min ew dan bihîstin. Paşê min ew ji nişkave kirin Û ew pêk hatin.
(Îşaya 48:3)

Qediyaye û gîhaye dawiya dawî. Wî tu tişt nîvco nehiştiye, fikra xwe neguhertiye an jî nefikiriye ku bi dawî de vekişîne. Îsa bersiva Wî ya dawî bû:

Min ji demên berê ve ev ji te re ragihand,
Bêyî ku çêbin bi te da bihîstin
Ku tu nebêjî 'Pûtê min ev çêkirin,
Pûtê min ê rijandî û qewirandî ev emir da.'
Te ev bihîstin, niha li hemûyan binêre.
Ma tê ranegihînî?
Ezê ji niha ve tiştên nû,
Tiştên veşartî yên tu nizanî bi te bidim bihîstin.
(Îşaya 48:5-6)

Xwedayê me hîn di serî de dibêje ku baweriya xwe bi mirovên wê we di dawiyê de bixapînin an jî baweriya xwe bi van tiştan neyînin. Ma ne hewce ye ku em li şûna tiştên me kirine divê em li ser tiştên Wî kirine bipeyivin? Ji pêşbîniyên mahlûqan bêtir, ma divê ne em çavnas bin bê Afirêner hîn di serî de çi dibîne?

Xweda peyva xwe berdewam dike:

> Ew ne ji demên berê ve, Niha hatin afirandin. Beriya îro te ew nebihîstibûn Ku tu nebêjî: 'Min ev zanibûn.' (Îşaya 48:7)

Ha ev e…

Xwedayê me dawiyê ji destpêkê diyar dike.

Xweda, hîn berî em ji Wî hez bikin, bi rêya Mesîh ji me hez kir, berî em bikevin bi destê me girt, berî em li ber bigerin em efû kirin, berî ku ferq bike em tazî ne em bi rastiya xwe nixumandin û berî ku qirêjiya me bibîne em pak û paqij kirin. Xweda; gava em hîn jê re dijmin, biyanî û xerîb bûn, weke zarok û dostên xwe bang me kir. Û hîn berî ku em hilma xwe ya pêşî bistînin, çîroka jiyana me nivîsand.

Ev yek Xwedayê me yê ku qiyasê qebûl nake û ji bo hûn Wî bi rastî bibînin û ji bo hûn weke zarokên bêhempa ku ji wan hez dike hûn Bavê xwe taqlîd bikin, ez ji we re dibêjim hodrî meydan.

## Xweda "Ez Ez im"

Aniha jî dixwazim navê "Ez Ez im"ê bipeyivim. Di ayeta 3:13-14an de ya Derketin'ê de em wisa dixwînin:

> Mûsa ji Xwedê re got: "Gava ez herim ba gelê Îsraîl û ji wan re bêjim: 'Xwedayê bav û kalên we ez şandim' û ew ji min re bêjin: 'Navê wî çi ye?' wê gavê ezê ji wan re çi bêjim?" Xwedê ji Mûsa re got: "Ez EZ IM. Tê ji gelê Îsraîl re bêjî, 'EZ IM' ez şandim ba we." (Derketin 3:13-14)

Gava cara pêşî Mûsa ev nav bihîstiye ez bawer im fikiriye û gotiye ev çawa nav e. Ka lê bifikirin gava hûn yekî nas dikin û hûn navê wî jê dipirsin û ew jî dibêje "Ez Ez im." Û gava hûn jê hinekî din agahiyan dixwazin, tenê vê ji we re dibêje "Ez Ez im." Wê serê we tevlihev bibe ev pir normal e. Ka li sohbeta wê di nava we de derbas bibe bifikirin: "Silav, tu çawa yî, "Ez Ez im?" Tu dibêjî qey gava tu bi wan re dipeyive, tu bi xwe re dipeyive. Tevliheviya serê me tê wê wateyê ku Xwedayê me desthilatdarê her tiştî ye û tenê ew Xweda ye. Ez tu carî nikarim

xwe weke “Ez Ez im” bidim naskirin. Dibe ku pênaseya me ya rast ev be: “Ji ber ew heye ez jî heme.”

Xweda çi be Ew e. Ji ber Xweda heye, Xweda heye. Ne ji ber ez heme an jî heta ji ber dê û bavê min bi hev re bûn, ez heme. Di dawiya dawî de, ji ber Xweda heye ez heme. Ew Afirînerê hemû giyanên ku dijî ye.

Gava ku Ew bû “Ez Ez im” wê demê ez dikarim bibêjim ku ez di Mesîhê “Ez, Ez Xwe me” de cih digirim. Ez nafikirim ku me hêzdariya vî navî bi rastî fêhm kiribe, eger bi rastî me fêhm kiribûya, em ê di rewşeke baldartir de bijiyana. Wê dinya ji me re hewl bide bê Xweda kî ye lê Wî di dawiya dawî de, di ser Kurê xwe re rû da. Xweda bi rêya Kurê xwe dixwaze Xwe derxîne holê û bi pêvajoyê re jî dixwaze hûn bibin xwe û we derxîne holê. Rojekê Îsa, ji bo xwendekarên Wî vê yekê fêhm bikin di Mettaya 16:13-18an de ev pirs ji wan kirin:

> Gava Îsa hat herêma Qeyseriya Filîpos, wî ji şagirtên xwe pirsî: «Li gor gotina xelkê Kurê Mirov kî ye?» Wan lê vegerand û gotin: «Hinek dibêjin Yûhennayê imadkar, hinek dibêjin Êlyas û hinekên din jî dibêjin Yêremya an jî yek ji pêxemberan e.» Îsa ji wan re got: «Lê hûn çi dibêjin? Bi ya we ez kî me?» Şimûn-Petrûs bersîv da û got: «Tu Mesîh î, Kurê wî Xwedayê jîndar î.» Îsa lê vegerand û got: «Xwezî bi te, ey Şimûnê kurê Ûnis, çimkî yê ku ev ji te re vekiriye ne xwîn û goşt e, lê Bavê min ê li ezmanan e. Û ez ji te re dibêjim: Tu Petrûs î û ezê li ser vê latê Civîna xwe ava bikim. Hêza diyarê miriyan nikare wê bindest bike. (Metta 16:13-18)

We ev bihîstiye? Gava derbarê bê Îsa kî ye de me peyxam stend, wê demê em tên wê astê bê em jî kî ne derdikeve holê û em vê dibihîzin. Simun di rastiyê Petrus bû. Wê her dem weke masîvanekî ku bi hîsên xwe ve tê bi rêvebirin, nemabûya. Wê bibûya kevir û rêberekî ku bi Giyan ve tije ye. Ez heyecana Îsa ya ku di Mettaya 16:18-19an de gotina xwe berdewam dike, hîs dikim:

> Û ez ji te re dibêjim: Tu Petrûs î û ezê li ser vê latê Civîna xwe ava bikim. Hêza diyarê miriyan nikare wê bindest bike. Ezê mifta

> Padîşahiya Ezmanan bidim te, tu her çi li ser erdê girêdî, ewê li ezmanan jî bê girêdan û tu her çi li ser erdê vekî, ewê li ezmanan jî bê vekirin. (Metta 16:18-19)

Gava hûn zanibin bê hûn kî ne… Hûn ê zanibin bê çi ji we re tê amadekirin. Nasnameya dêrê û peyxama bi Mesîh re têkildar ji bo xwe bigihîne bereketên asîman re ji nêz ve girêdayiye. Gava em bi Gotina Xweda zanibin, em ê Gotina Xweda bi duayan îlan bikin û ji asîmanan wê dengên "erê û amîn" olan bidin.

## Hûn Îsa Çawa Pênase Dikin?

Têgihiştina we ya derbarê Îsa de, wê di gewdeyê we de reng vede. Têgihiştinên we yên derbarê Xweda de, di jiyan û hilbijartinên we de çilo be wê xwe diyar bike. Yek ji wan rêyên ku Xweda xwe di jiyana me de diyar dike, pênaseya me ya derbarê Îsa de ye. Eger em Îsa weke mamosteyekî baş pênase bikin, wê me hîn bike. Eger em Wî weke şêwirmendekî zana pênase bikin, wê zanebûna xwe bide me. Di ola Îslamê de Îsa, hem weke pêxemberekî û hem jî weke şîfagerekî tê pênasekirin. Ev hemû pênase tenê qal û qutk in. Lê eger hûn Îsa weke *Mesîhê* Kurê Xweda yê *Dijî* bi nav bikin, wê demê ev tê wê wateyê ku peyxama derbarê Reb Îsa de di nava me de ye. Nameya 1. ya Yûhenna wisa dinivîsîne:

**Têgihiştina we ya derbarê Îsa de, wê di gewdeyê we de reng vede.**

> Eger yek bi eşkereyî bêje: «Îsa Kurê Xwedê ye», Xwedê bi wî re dimîne û ew jî bi Xwedê re dimîne. Û em hezkirina Xwedê ya ku ji bo me ye dizanin û jê bawer dikin. Xwedê hezkirin e û yê ku di hezkirinê de dimîne, bi Xwedê re dimîne û Xwedê bi wî re dimîne. Hezkirin bi vî awayî di nav me de temam bûye, da ku di Roja Dawî de cesareta me hebe, çimkî ew çawa be, li vê dinyayê em jî wisa ne. (Yûhenna I, 4:15-17)

Di nava vê daxuyaniyê de têkiliyeke ebedî hatiye avakirin û bi

xelasiya Wî avakiriye re, valahiya rastiya me tê dagirtin. Gava em Gotina Xweda dibêjin, valahiya ku me ji rastiyê qut dike pirek tê de ava dibe. Ne di bingeha em kî ne de, di bingeha Ew kî ye de em ê bên rewşa bi Xweda re bibin wekhev. Bi vî awayî Ew, bibêje bê ez kî me ez ê bibim ew. Pêkhatin û wehiykirina hemû sozên Xweda yên di "Mesîh" de, bi pênasekirina min ya Îsa re girêdayiye. Ew; Reb, şîfager, Rêberê Saxiyê, serokê îmana min û yê temamkirinê ye gelo? Ez ji Îsa re dibêjim *Xweda* an tenê mamosteyekî baş e?

Ji ber Ew hezkirin e, ez hez dikim û têm hezkirin.
Ji ber Ew jiyan e, ez dijîm.
Ji ber Ew desthilatdar e, ez xwedî qabîliyet im.
Ji ber Ew birayê min e, ez qîza Xweda me.
Ji ber ew xwediyê her tiştî ye, ez bi şiyan im.
Ji ber Ew şîfayê dide, ez rehet bûm.
Ji ber Ew zanyar e, ez zana me.
Ji ber Ew heye, ez heme me.
Ji ber Ew Xweda ye, Ew bibêje ez kî me ez ew im.
Ez bi awayekî bêhempa û bêqusûr hatime afirandin.

Ji bo hûn Gotina Xweda vexwînin jiyana xwe, ez we re dibêjim hodrî meydan. Ji bo em aniha dest bi vê pêvajoyê bikin, em vê kêliyê bi duayan derbas bikin.

*Rêzdar Bavê Asîmanî,*

*Derbarê min de çi tiştên te gotin û ji ber ez bûm ew tişt, ez spasiya xwe dikim. Ji ber wan demên min Tu biçûk didît û min pût dihebandin, ez lêborîna xwe dixwazim. Ez hêmayên bisînor yên ku bi destên mirovan hatine çêkirin, red dikim. Giyanê Pîroz, qadên ku van pûtan ez ji ser rê dam aliyekî di jiyana min de deşîfre bike. Tu hezkirin e û ji ber vê ez ne tenê ji te hez dikim lê ez jî weke Te dikarim ji kesên din hez bikim. Tu çavkaniya jiyana min û sebebê bêhstendina min î.*

*Hêza te heye çi tiştên di jiyana xwe de min dest pê kiriye, tu temam bikî û ew qabîliyeta ku çi tiştên min daye ber xwe ez xelas bikim, te daye min. Di Mesîh de ez qîza te me û Bavê Asîmanî ji ber tu xwediyê her tiştî ye, bi alîkariya Giyan re çi tiştên pêdiviya min pê heye, ez xwediye wan im. Tu şîfaya xelasiyê dide min, ez ê êdî ji bo birînê di min de vekirine ku bikewîne li dinyayê nenêrim. Ji ber ku çavkaniya hemû zanabûnê tu yî, ez ê li şîreta te bawer bim.*

*Ji ber min destûr da ku hebûna te ya di jiyan min de bi gotinên xelkê bisînor bibin, ez dixwazim tu min efû bikî. Ez dixwazim te ji nêz û kûr ve nas bikim. Ez bawer dikim ku tu ji xeyalkirina min pir mezintir î û ez dixwazim tu min ber bi jiyaneke bêreqîp û bêhempa ve bibî. Ji ber tu Xweda yî, tu bêjî ez kî me, ez ew im. Aniha ez çi hîs bikim jî bikim, ez bêhempa û bêqusûr hatime afirandin.*

*Bi navê Îsa, amîn.*

## Pirsên Nîqaşê

1. Di paşerojê de gelo we Mezinê Mezinan bi tiştên hûn dizanin an jî we tecrube kirine, daye ber hev an jî we pîvaye? Weke mînak hûn fikirîne ku Ew bavê we ye (baş an jî xerab)? Hûn aniha Wî çawa dibînin?
2. Cihên ku hûn lê bi qal û qutkan lê dijîn hene? An jî bi galgalan?
3. Li gorî we gava Augustine got “Xweda herî baş bi nenaskirinê tê nasîn” gelo xwest çi bibêje?
4. Li kîjan cihên ku Xweda xwe weke *Ez* dide naskirin, bêtir pêdiviya we bi naskirina Wî heye?
5. “Pût, ew tişt e ku hûn hêzê didinê an jî hêzê jê distînin” di vê girêdanê de we di kîjan qadên jiyana xwe de bi nezanî pût çikandine?
6. Gava di huzûra Xweda de we Ew bi nasnameya Wî bangkirê, ji we re dibêje kî ye gelo?

# 3

## Sozeke Bêreqîb

Eger em li soza xelatên ku di metnên Mizgîniyê de dane me bifikirin, dibe ku Rebe me, me ji aliyê xwestekê ve ne bi hêz lê pir qels dibîne bê hişê mirov. Em dudilîne; gava ku kêfxweşiya bêsînor ji me re tê pêşkêşkirin, em dema xwe bi alkol, zayendî û bi hêrsê derbas dikin. Ji ber ku bi teklîfa betlaneya li ber beraveke deryayê nikare xeyal bike û nizane bê tê çi wateyê; em weke zarokekî cahil in ku li cihekî çêkirina pasteyên ji heriyê berdewam dike. Em pir bi rehetî qîma xwe bi rewşa xwe tînin.

C. S. LEWIS

Derbarê jiyana we de sozeke bêreqîb heye û ev soz di heman demê de xezîneya we ye. Ev xezîne di ser pîvan û demê re ye. Ev xezîne di rewşeke manewî de tê ji we re. Ji bo hinekan ev xelat di rewşa xewê de ye… zindî ye lê di xew de ye.

Eger min bigota berî niha yekî milyarek dolar li hesabê we razandiye, dibe ku di destpêkê de hîn rehet û hîn bi kelecan bihata. Lêbelê tişta ji we re bimaya, ji tişta ku we yê di temenekî de xerc bikira zêdetir bûya jî… di rastiyê de wê tu carî nebûya ya we. Li gorî qanûna xezîneyên li ser rûyê erdê, divê ew xezîne li alema lê hatine dinyayê

bimînin. Gava hûn mirin wê ev li dawiyê bimînin. Lêbelê ev xezîneya asîmanî ya ku hûn xwediyê wê ne, her ku dewlemend dibe diguhere û hetahetayê wê bide dû we.

Ev soza ez behsa wê dikim ne tenê ji aliyê dewlemendiyan ve, ji aliyê xwegîhandinê ve jî bêreqîb e. Fêkiyê vê sozê piştî hûn çûn bi gelekî îcar wê bi zarokên we re be û wê li asîmanan we pêşwazî bike. Ev soz tu carî nikare bê dizîn lêbelê dîsa jî weke ku Esav kiriye, beramberî taseke nîskê dikare bê firotin (Destpêk 25). Gava ku di nava xeyal û hêviyan de bi awayekî pêçayî hat veşartin, di rewşa herî baş de û di ewlehiyê de tê girtin. Gava ku em bi axa dilê xwe dakevin wê ev xezîne gur û geş bibe. Di dilê bi milyonan mirovan de bizrê vê sozê heye lê çiqasî pir mirov bibêjin ku şirîkê vê xezîneyê ne jî, ev xezîne tu carî kêm nabe.

Ez di derbarê bereketa Qralê qralan û Rebê reban de dipeyivim. Xezîneyeke wisa fireh e ku tu carî bi sînor nabe û bi dolar û zêr û zîvan nayê hesibandin. Eger tenê kincên li ser we mabûna jî ev xezîneya we bi we re ye. Ev dewlemendiya we bi tiştekî ku mirov çêkiriye re ne girêdayiye, ebedî ye û bi duayeke ku bi pistepistê tê gotin re dikare veguhêze. Hûn, hevala min ya delal, bêguman hûn weke dotmîrekê ji malbata qral in.

## Vexwendina Qral

Xeyal bikin ku kesek li deriyê we dixe. Ji bo hûn vekin hûn çeng dibin û li devê derî hûn tirimpêleke ku qral şandiye, dibînin. Ez dixwazim hûn xwe weke dotmîrekê bifikirin lê li ber devê derî li şûna qasidekî ferîşteyek sekiniye. Ev ferîşte pir girs e û şewqeke wisa jê diçe ku hûn gaveke şûnde nabînin lê li dawiyê qelebalixeke ku dixwaze berteka we bibîne bi meraq sekiniye û hûn vê qelebalixê hîs dikin. Qasidê îlahî navê we dibêje û bi dengê bilind îlan dike ku hûn dotmîreke alema asîmanî û mîratgirê wê ne. Dengê çepikan bilin dibe û qiyamet radibe. Bi awayekî şaşmayî, hûn bi pirsekê bersiva wî didin. “Te got ez?” Ferîşte serê xwe dihejîne û zerfeke ku weke vexwendnameyekê xuya dike, dide destê we. Destên we direelin û bi vî awayî hûn zerfê dizîvirînin. Hûn

dibînin ku navê we bi herfên zêrîn û bi bi awayekî bêhempa lê hatiye nivîsandin. Hûn hilmeke kûr dikişînin û gava hûn bi çavên xwe yên şil serê xwe radikin û dinêrin, hûn dibînin ku hûn li devê derî bi tena serê xwe ne. Ferîşte û yên pê re hatine çûne. Dengek ji hundurê mala we tê.

"Kî li devê derî ye?"

Hûn bi pistepist bersivê didin, "Ez im."

Hîsa ku her tişt hatiye guhertin we ji serî û heta binî direelîne û gava hûn li şertên derdora xwe dinêrin, hûn dibînin ku tu tişt nehatiye guhertin. Armanca vê serîdanê, tu carî bi guhertina şert û cih re tuneye. Ev vexwendin bi guherîne hundurîn re ya bêreqîb re, girêdayiye.

Hûn serê xwe berdidin ber xwe. Heman kincên gava ku we derî vekir li ser we ne lê bi awayekî hûn xwe hîn siviktir hîs dikin, tu dibêjî qey êdî ne xwediyê wê hêza we qels bike, biterpilîne an jî pênasekirinê ye. Gava hûn berê xwe didin hundur û vedigerin, serê we zelal e û hûn fêhm dikin ew cihê hûn lê dijîn evder e lê êdî mala we ya bi rastî ne evder e. Bajarekî dûr ku avakarê wî Xweda û Qralê we ye, bang li we dike. Hûn di ber hezkirinên xwe yên ku bi çavekî ecêb li we dinêrin re, derbas dibin û diçin odeya xwe ye razanê. Di nava bêdengî û tenêtiya odeya xwe de hûn zerfê vedikin û hûn vexwendnameya xweşik bi baldarî derdixînin.

*Keçika min ya delal û hêja, tu dotmîreke Mezinê Mezinan, ango weke Sara ji nû ve çêbû.*

*Her ku tu Îsa ji nêz ve nas bikî, wê tendirustî û xweşiya Wî di jiyana te de zêde bibe.*

*Ev kirina qraliyetê, ji bo tu di rêya Xweda de bimeşe û jiyana xwe bidomîne, tê wateya ku çi pêdiviya te pê hebe tu yê bindest bixî û tu yê bigihêje her tiştî. Gava ku tu daket kûrahiya Nivîsên Pîroz, jê bawer be ku wê gotin û fikrên te nû bibin û tu yê dewlemendiya sozên bi nirx û mezin ku ji te re hatine dayîn, tu yê ferq bikî. Her yek ji van bi awayekî mûcîzeyî ji te re hatine avakirin! Keçika min ya delal û hêja, eger tu bikevî şikê, vexwendina herî baş ya ku heta niha ji te re hatiye kirin, ev*

*e! Îcar aniha tişta ku divê tu bikî ew e ku tu pişta xwe bide vê dinyaya ku jixwe ji berê de pişta xwe daye te.*

Min hinekî însiyatîf bi kar anî û ji Petrûs 2 ayetên 1:2-4an sûd vergirt û nivîsand. Lê hûn li jêr ayetan rasterast bixwînin:

> Di naskirina Xwedê û Xudanê me Îsa de kerem û aştî bi firehî li ser we be. Bi naskirina wî yê ku bi rûmet û qenciya xwe gazî me kiriye, hêza wî ya xwedayî, her tiştê ku ji bo jiyan û xwedênasiyê pêwist e, da me. Bi van tiştan wî sozên giranbiha û gelek mezin dane me, da ku hûn bi wan bibin hevparên tebîeta xwedayî û ji wê xerabûnê birevin, ku ji xwestekên dinyayê tê.

Eger Îsa li deriyê dilê min nexista, wê tu tişt di destê min de tunebûya. Min mîrasek bi dest bixista, wê ev ji bo min mûcîze bûya! Malbata min ne di wê rewşê de bû ku ji min û birayê min re mîrasek bihişta. Lê ez kîjanê tercîh bikin ji bo bibim xwediyê wê, kurtêlan an mîrasê? Ji berê de ez hîn bûm, sozeke ku ji aliyê Xweda ve tê; ji dewlemendiya dinyayê bêtir xwe li ser lingan digire.

**Lê ez kîjanê tercîh bikin ji bo bibim xwediyê wê, kurtêlan an mîrasê?**

Baş e em ê çawa xwe bigihînin van sozên bêhempa? Bi rêya îmanê re dibin yên me. Galatî 3:14, ji me re wisa dibêje:

> Ev hemû weha bû, da ku bi Mesîh Îsa pîrozbûniya Birahîm bê ser miletan û em bi baweriyê soza Ruh bistînin.

## Bi Avram û Saray re Hev Nas Bikin

Derbarê van sozan de ji bo em hîn bêtir bibin xwedî agahî, em serîdaneke çîrok û pasajekê bikin ku em wê ji Nivîsên Pîroz nas dikin. Xweda çîrokan dixe nava Nivîsên Pîroz û bi vî awayî dixwaze em ji serpêhatiyên kesên din hîn bibin. Gava ez dixwînim, ez dibînim ku hevokên îskeletê her çîrokê zindî dibin. Ez çîrokê di serê xwe de ava dikim

û li Giyanê Pîroz guhdar dikim, îcar ne tenê weke ku di rûpel de xuya dike ez peyvan dixwînim, bi vî awayî gelek tiştên ku nabînim edî dibînim û guhdar dikim. Pirsan dipirsim: Di şûna wan de bim ez ê çi hîs bikim? Gelo wê hêza min ya herî mezin an jî tirsa min ya herî mezin çi be?

Ev rê, ji wan gelek rêyên ku mirov nêzî Nivîsên Pîroz bibe, tenê yek jê ye. Ne dijberî Pirtûka Pîroz e, rêbazeke fikirandina kûr ya ku dihêle Nivîsên Pîroz zindî bibin. Dê û bavên baweriyê di vê rêyê de xwuşk û birayên me ne. Ha ez wisa dikin, disekinim û difikirim.

Pêşî, ez dixwazim hûn bi Avram re hev nas bikin. Bavê me yê baweriyê ye. Li zilamekî ku sadiq, yên qusûrên wî hene, ji Xweda ditirse û gihîştî ye, bifikirin. Piştre Saray tê. Dêya me ya sozdar e. Jineke heta tu bêjî xweşik û di heman demê de sadiq, yeka qusûrên wê hene, ji Xweda ditirse û gihîştî ye.

Li ser vexwendina Xweda, ev her du kes tiştên ku dizanin li dû xwe hiştin û bi wêrekî tev geriyan. Xweda jiyana van her du cotên ziwa bi bereket kir û ew zêde kirin. Bi hev re derketin ser rêya macerayekê. Li tiştekî ku berê nedîbûn û li neteweyekî ku ji aliyê Xweda ve hatibû afirandin, digeriyan. Gava ku me hev dît, bi dehan salan çêbibû ku wan rêwitî dikir. Avram ber bi sed saliya xwe û jina wî Saray jî ber bi not saliya xwe ve diçû.

Gava ku li beyebanê dabûn ser rê, di gelek çûn û hatina re derbas bibûn. Kurteya min ya kin ev e: Gava ku Xweda ew bi bereket kiribûn, nîqaşeke ku derketibû holê bi dawî kiribûn; vêya hişt ku ji xwarziyê xwe Lût veqetin, Sara xistin harêma firawûn, Saray ji harêmê hat derxistin. Piştî ku demekê warê xwe danîn, di şerekî biçûk de bi ser ketin, xwarziyê xwe Lût ku hatibû revandin xelas kirin û bi baweriyê ji deh paran parek dan kahînê Xwedayê Mezin Melkisedek. Hêvîşkestineke mezin hat serê wan û Saray ji bo ku cariya wan Hacer lawikê bi navê Smaîl bîne dinyayê li mêrê xwe mahr kir û bi vê yekê re gaveke xetere avêtin. Saraya ku hêvîşkestî bû, ji ber şîdeta navmalî û hêrsokbûna xwe hat sûcdarkirin. Ez nafikrim ku ev meseleya jin-mêr-cariyeyê meseleyeke xweş e.

Di çîroka Avram û Sarayê de ya ku bi kurtasî min behs kir, ji bo ku em di

ser re neqevizin ez dixwazim çend tiştên ku li ser bisekim, li jêr parve dikim.

1. Her tişt dan ber çavên xwe. Avram û Sarayê li dû xwe nenêrîn û bajarê Ûrê terk kirin. Veger tunebû. Xweda bang wan kir û wan jî da dû vê bangê. Xelas. Destpêk 12:1-2 wisa dibêje:

> Xudan ji Avram re got: “Dev ji welatê xwe, ji gelê xwe û ji mala bavê xwe berde û here wî welatê ku ezê nîşanî te bidim. “Ezê te bikim miletekî mezin û te pîroz û bereket bikim. Ezê nav û dengê te derxim û tê bibî kaniya bereketê.

Xweda di ser rêyeke nû re, tiştekî nû ava dikir. Bi rêya bawerî û hêviyê re ji wan re rêbertî kir. Xete kirin lê tu carî li dawiya xwe nenêrîn.

2. *Xwe ji şer û pevçûnan veqetandin.* Avram û Saray bajarê Ûrê terk kirin û Lût jî bi xwe re birin. Bereketa li ser Avram hişt ku Lût jî bi bereket bibe. Piştî ku welat têra her duyan nekir, di navbera şivanên wan de pevçûn qewimî. Ji bo pevçûn mezin nebe, Avram ji Lût xwest ku kîjan erdan dixwaze bila li gorî dilî xwe ji xwe re hilbijêre. Ji bedêla ku li cem hev bimînin û bi hev re şer bikin, veqetandin ji bo wan baştir bû. Not: Eger di jiyanê de hûn bi kesên ku divê hûn bi hev re rêwitiye nekin re bin, heta hûn dev ji hev berdin wê hin demên ku Xweda we her duyan jî bilind bike, çêbibin. Şer û pevçûn, bereketa Xweda û hêza jiyana we qut dike.
3. *Weke çalakiya baweriyê ji deh paran parek danê.* Gava Avran ji deh paran parek da Melkisedek, baweriya xwe bi sozên Xweda anî û ev kir. Ji bedêla ku qîma xwe bi ganîmeta ji Sodomê bê, bîne; bi xêra baweriya ku bingeha xwe ji hêviyê distîne ev ava kir.

Ev her sê tişt, Xweda gava ji Avram ve hat dîtin û weke ku di ayetên 17:4-5an ya Destpêkê de soza xwe diyar kir, ev yek çêbû:

> Va ye, ev peymana min bi te re kiriye ev e: Tê bibî bavê gelek miletan. Êdî tê bi navê Avram neyê gazîkirin, wê navê te Îbrahîm be. Çimkî min tu kirî bavê koma miletan.

## Peymaneke Heta Hetayê

Gava we kifş kir ku hûn mîratgir in, wê Xweda navnasê we biguhere. Gava ku Xweda navê Avram kir Brahîm û guherand, jiyana wî xweş û geş bû. Êdî wê bibûya zilamakî ku neteweya wî tuneye lê wê bibûya bavê hemû neteweyan. Di beşa 17an ya Destpêkê de Xweda, mezinbûn û berfirehiya vê peymanê bi awayekî kîtekît nîşan da. Wê jiyana Brahîm bi peyvên weke binemal û mayînde bihata dorpêçkirin. Brahîm weke yekî ji derve hatiye, erdên ku li ser wan dimeşe wê rojekê heta hetayê bibin mal û milkê yên ji malbata wî hatine. Çawa ku Xweda bi Avram re bû, soz da ku wê bi binemala Brahîm re jî be. Gava Brahîm li pêşeroja xwe ya rewnaq ji dûr ve dinêre, ez xeyal dikim ku li huzûra Xweda digirî.

Ez di hişê xwe de dibînim ku Brahîm li ber Xweda diçe sicûdê. Piştre radibe ser kabokan û berê rûyê xwe yê ku bi hêsiran şil bûye dide stêrkan. Di nav tariya asîmanê beyebanê yê vekirî de, weke ku wê dest bi stêrkên ku diçirisin bide, destên xwe radike hewa. Dilê wî tije spasî û kêfxweşî ye. Her soza jê re hatiye dayîn, di hestiyên wî de olan dide. Bi carekê re temenê wî lê vedigere û Brahîm ji nû ve ciwan dibe, her şaneya wî bi mûcîzeyan tije dibe.

Navê wî yê nû, ango Brahîm, dilê wî bi xweşî û hêviyê mezin dike. Li Smaîl dinêre û wisa difikire; wê ev hemû bibin yên te, kurikê min wê bereket li jiyana te bibare û wê bi pîroziyeke fireh re mezin bibe.

Reb ji Brahîm re dibêje ku divê işaretek ji bo vê peymanê hebe. Ev, ne işareteke eşkere û weke keskesora ku dabû Nûh e; berevajî vê, işareteke taybet û êşê dide mirov. Divê hemû zilamên malbata Brahîm sinet bibin. Jêkirina vî çermikî tê wateya ku Brahîm û malbata wî bi Mezinê Mezinan re peyman bi hev re girê dane. Piştre axaftina wî ya bi Xweda re, ber bi derketineke mezin ve tê veguherandin:

> Bi ser de Xwedê ji Îbrahîm re got: "Herçî Seraya jina te ye, êdî tê jê re nebêjî Seray. Wê navê wê Sara be. Ezê wê pîroz bikim û ezê ji wê jî kurekî bidim te. Ezê wê pîroz bikim û wê bibe dayika miletan. Wê padîşahên gelan ji ziriyeta te rabin." (Destpêk 17:15-16)

Hema bêje ez dibînim ku serê Brahîm tevlihev dibe. Şaşmayîna li ser rûyê wî berevajî bibû û birhên xwe şkerandibûn… Sara? Peyman bi min re ye û jixwe kurikekî min heye… Smaîl. Ew kurikê min yê ji Hacerê çêbûye. Ev pêkhatina nû hişt ku Brahîm ji nû ve xwe dernixûm bike.

> *Îbrahîm deverû çû erdê, keniya û di dilê xwe de got: "Zilamekî sed salî dikare bibe xweyî zarok? Wê Sara di nod saliya xwe de zarok bîne?"* (Destpêk 17:17)

Gava Sara bihîst ku kurikek welidandiye, em pir dibînin ku keniyaye lê kesê pêşî ku ji soza Xweda re keniyabû Brahîm bû. Lêbelê ne tenê keniya. Xweda hîn bêtir jê re xweş dike û hilbijartineke din jê re pêşkêş dike:

> Paşê Îbrahîm ji Xwedê re got: "Bila Îsmaîl mîrasxurê min be!". (Destpêk 17:18)

Li gorî min Brahîm, hewl dida Smaîl tevlî pilanê bike. Ma çima bi Sara re van hemû pirsgirêkan li xwe bike bar? Navekî wê yê nû hebe an jî tunebe, malzarokeke wê ya stewr û pîr hebû û mêrekî wê yê pîr jî. Ez baş fêhm dikim bê çi difikire. Lê wê Xweda guh nedaya van hemûyan û bersiveke wisa dide:

> Xwedê got: "Na! Wê jina te Sara kurekî bîne û tê navê wî Îshaq deynî. Ezê bi wî û ziriyeta wî re peymana xwe her û her berdewam bikim. (Destpêk 17:19)

*"Na! Wê jina te Sara…"* ev îfade pir zelal e. Tu dibêjî qey Xweda bi tiştên di hişê wî de derbas dibin dizane. Li vê bifikirin! Xweda Brahîm dibihîze û Smaîl bi bereketa xwe şa dike lê *ne weke perçeyekî* ji peymana ku heta hetayê wê bidome.

Gava ku du kes bi tekiliya zewacê re bûn yek, her du jî bi peymanekê re tevlî Xweda dibin. Bêguman Brahîm ji Smaîl hez dikir û tiştekî pir xwezayî bû ku dixwest her tiştê ku Xweda soz jê re dabû, ew jî bibe xwediyê wan. Lêbelê Smaîl kurê jineke kole bû, ji kar û dinyaya

kesayetiyê re kole bû. Soza bêreqîb; bi işareteke ku berî niha nehatiye dîtin û bi awayekî bêhempa divê bihate dayîn. Wê zarokekî jinikeke pîr û stewr çêbibûya:

> Lê ezê peymana xwe sala bê vî çaxî, bi kurê ku Sara ji te re bîne, yanî bi Îshaq re girê bidim.” (Destpêk 17:21)

Heman tiştî em çiqasî pir dikin? Xweda ji me re dibêje ku wê tiştekî nû û mûcîze bike lê em di nava bêbaweriyê de tewş dibin. Ew, dibêje ku wê jiyanên me geş û xweş bike û em jê re dibêjin ku ne hewce ye xwe evqasî têxe tengasiyê… *Tenê yên di destê min de bereketa xwe li wan bike.* Tişta di destê me de û em dikin bi têra xwe ne mezin e. Xweda dixwaze midahele bike. Ew li nifşên pêşerojê difikire. Peyman, wê bi Îshaqê hîn çênebûye re bidomiya. Wê Brahîm ne bi zarokê pê re keniya û bi awayê bedenî ku bavê wî ye re ev peyman bidomiya!

Ez ji ber aliyên Brahîm yên însanî teşwîq dibim. Di vir de ji bo me hemûyan dersek heye. Xweda bi xêra dilovaniya xwe, bi tiştên ku em dikarin bi hêza xwe bikin jî bi bereket dike lê peymana Wî ya heta hetayê di ser hemû avakirinên însanî re ye.

## Navê Nû: Qedera Nû

Li gorî kevneşopiya Îbraniyan, nav qeder û potansiyela kesekî di xwe de dihewîne. Ji ber vê, guhertina nav xwediyê wê hêzê ye ku xwezaya we û pê re jî qedera we biguherîne. Weke mînak, bi hêviya ku li gorî navê xwe mezin bibin me navên kurikên xwe li gorî wê hilbijartine. Ez vêya ji Bavê me Xweda hîn bûm ji ber ku her cara ez navê wan dibêjim, li ser jiyana wan ez wateya van navan diyar dikim.

Xweda, êdî gava dît ku navê kesekî xwezaya wî kesî hew diyar dike, bi piranî navê wî kesî diguherîne. Navê Saulê ku zilm dikir bû Pavlus û Simunê masîvan ji aliyê Îsa ve navê Kevir lê hatkirin. Navê Yaqûbê kurê Îshaq, weke Îsraîl hat guhertin ku wateya navê wî tê wateya “Mîrê Xweda.” Xwedayê me girîngiyê dide guhertina nav. Carina ez vê yekê wisa xeyal dikim: Ev weke bernameyeke şahidiyê ye ku em hemû

şahidiya navê Îsa dikin ku di nasnameyê de wisa ye.

Gava Xweda bi Avram re peyman girê da, bi armanca navê wî biguherîne hêza wî qewîntir kir. Hevalekî min î pir baş yê bi navê Brian Bileci ku rebbê Messîanîkê ye, heye û girîngiya guhertina van navan ji min re rave kir. Xweda ji bo navê Avram bi Brahîm biguherîne û berfireh bike, ev nav di nêvî re kir dudu û ji navê xwe yê resen herfek li navê Avram bar kir. Wateya navê Avram "Bavê Mezin" e. Wateya navê Brahîm jî "bavê gelekan" e.

Ev navê nû diyar kir bê wê Brahîm kî be. Di hemû jiyana Brahîm de, navekî wisa bû ku wê tu carî tam pêk nehatibûya. Ji ber ku jiyana Avram Xweda bilind û mezin kir, wê mîrata wî bi awayekî nayê hesibandin bihata zêdekirin. Tu carî ji bîr nekin, *nasname bi qedera we ve ji nêz ve têkildar e.* Rebbê wî Brian wekî din bal kişand ser heta Xweda navê jina Avram jî berfireh nekir, soza Wî bi cih nebû. Navê wateya Saray dihat "Reb Mîr e" lê navê nû Sara dihat wateya "Dotmîra Xweda." Xweda ji navê xwe REB herfek li navê wê bar kir.

Ev guhertina nav, pênasedikir bê Sara kî ye. Ji bilî ku bi Xweda ve ji nêz ve dihat girêdan, diyar dikir ku wê hemû keçikên sozdayî yên li pey wê jî, bi heman awayî wê bibûna ji malbata qraliyetê. Ev navê nû, tiliya Sara ji nav bûyeran kişand û ya Xweda xist nav de.

Ji ber ku navê Saray'ê ji nerîneke nêr (Reb Mîr e) ber bi nerîneke mê (Dotmîra Xweda) ve çû, wateya navê wê nerm bû û kete rewşeke balkêş. Navê Brahîm yê nû ji bo gelekan di xwe de bihewîne, berfireh bû û ev bizrê sozê jî wê pêdiviya wê bi erda sozê re jî hebûya. Jiyana Sara, erdê Brahîm ango bû malzarokeke bi sozê re zindî bûye.

Navlêkirina ji nû ve ya Sara, erdê şûvmayî cot kir û ji bo bereketa ku bi emanetî hem dabû Brahîm û hem jî dabû Sara, hat amadekirin. Xweda got, wê Brahîm bibe *bavê gelek neteweyan* û wê Sara jî bibe *dayika neteweyan* û anî ziman ku wê *qralê gelan ji ziruyeta wî derkeve.* Xweda bi rastî jî helwest û xeyal li her duyan zêde kir.

Gava ku mirov rûmetê bidin hev û bi vî awayî bi Xweda re jî bên girêdan, Xweda ji bo tiştê ku nikare bibe wê gav bavêje. Malzarokên stewr bi jiyanê zindî dibin û ji bo welindandinê hêzê di xwe de dibînin,

zewacên bêhez şîfayê pêde dikin, keç û xort ji ber bayê cinan xelas dibin û zarok ji mirinê şiyar dibin. Hêvî ji nû ve ava dibe, bawerî geş dibe, hez rizgariyê bi dest dixe û gava dengên xapînokî tên tefandin dijmin berepaş vedikişe.

Belkî we ferq kiribe û belkî we nekiribe jî lê gava hûn ji nû ve çêbûn, guhertina nav bi serê we de hat. Navê we jî hat berfirehkirin. Ziruyeta Brahîm ya ku soz jê re hatiye dayîn Îsa, navê we ne tenê bi herfeke ji navê xwe berfireh kir û navê we guherand. Bi alîkariya navê Wî re hişt ku hûn xwe gelek caran bigihînin Bav. Weke Yûhenna di ayetên 16:26-27an de dibêje:

> Wê rojê hûnê bi navê min bixwazin; ez ji we re dibêjim, ne lazim e ku ez ji bo we ji Bav bixwazim; Bav bi xwe ji we hez dike, çimkî hûn ji min hez dikin û bawer dikin ku ez ji ba Xwedê hatime.

Îsa malmezin bû û gava ji bo me derket çarmîxê, bi şermizariya me hat nixumandin. Hemû jiyana xwe ya bêqusûr, teslîmî jiyana me ya bi qusûr û nasnameya me ya lewitî kir. Û bi mirina xwe ya xalasiya qurbaniyê re, em di dawiya dawî de xelas kirin û ji bo hemû keç û xortên soz ji wan re hatiye dayîn re li cem xwe cih ji wan re vekir.

## Ez Dibêjim Tu Henekan Dikî!

Çîroka me di beşa 18an ya destpêkê de gava ku Xweda hat serdana Brahîm berdewam dike. Brahîm li ber devê konê xwe bi hêviya ku bayekî hênik wî hênik bike, li ber siyê rûniştiye. Serê xwe radike û dibîne ku sê zilam li hemberî wî di nava deviyên Mamre'yê de sekinîne. Gelek pispor tînin ziman ku ev zilam ferîşte ne. Birahîm bazdide ku wan pêşwazî bike, xwe diavêje lingên wan û ji bo li cem wî bimînin li ber wan digere:

> Paşê got: "Ezbenî, heke dilê te bi min xweş be, di ser xulamê xwe re derbas nebe. Bihêlin, bila niha hinek av bînin, lingên xwe bişon û li bin vê darê bêhna xwe vedin. Madem hûn hatin ba xulamê

xwe, ez ji we re pariyek nan bînim. Piştî ku we bêhna xwe veda, bi riya xwe ve herin." Wan jî got: "Baş e, te çawa got wisa jî bike." (Destpêk 18:3-5)

Ez ji vê tevgera wî ya ku hat pêşiya rêwiyan û ew bi rûmet kirin, hez dikim. Û bêguman Brahîm kêm sozan dide lê pir tiştan pêşkêş dike. Pêşî bazdide cem Sara'yê û jê dixwaze ku ji ardê hûr pîdeyan çêbike. Piştre dibeze bi aliyê dewaran ve, goligekî qelew hildibijêre û ji bo serjê bike, dide xulamê xwe. Gava ev kar qediya, bi mast û şîr re golik li ber wan danî. Ev xwarin û vexwarina ji mêvanên xwe re raxist, ji gepeke nan pir zêdetir e!

Brahîm gava li cem mêvanên xwe ye pirsek jê tê kirin:

*Wan ji Îbrahîm pirsî: "Ka jina te Sara li ku ye?" Wî got: "Li wir, li hundirê kon e." Yekî ji wan got: "Sala bê vê demê, esse ezê vegerim ba te û wê kurekî jina te Sarayê hebe." Sarayê ji nav derê kon, li pişt wî guhdarî dikir.* (Destpêk 18:9-10)

Gava ez vê pasajê dixwînim, ji nişka ve ez bi Sara'yê re xwe di nava kon de dibînim. Li ber devê kon, di ser milên Sara'yê re ez li derve dinêrim. Li ber siya darekê, Brahîm li ber mêvanên xwe li ser lingan sekiniye. Bayê ziwa yê beyebanê, di nava dar û deviyan re diçe û dengên wan jî bi xwe re digihîne me.

Sara, li quncikeke kon guhê xwe daye ser gotinên wan û li wan guhdar dike. Pir baldar e ji bo deng dernexîne lê Nivîsên Pîroz tiştên di serê wê re derbas dibin, diyar dikin:

Îbrahîm û Sara pîr û kal bibûn û bi salan ve çûbûn. Sarayê, emrê zarokanînê derbas kiribû. Sara keniya û di dilê xwe de got: "Piştî vî emrî ezê bi çi yê xwe şa bim? Êdî malxweyê min jî kal bûye." (Destpêk 18:11-12)

Ev kenê wê, weke berteka Brahîm ya dubarekirî ez bi meraq kirim… Ya din jî ma Sara vê nûçeyê cara pêşî ye ku dibihîze? Diyar e ku ne li benda

vê bû. Carina sozek, ya rastî di rewşa herî zor û dijwar de nêz dibe.

Di Detpêka 17:21ê de me îfadeya "sala bê weke vî wextî" bihîstibû û gava soz li ber Sara'yê dubare bû, dîsa îfadeya "sala bê weke vî wextî" derbas dibe. Di navbera gava Brahîm ji Xweda ev soz cara pêşî girt û xuyakirina van ferîşteyan de bê çiqas wext ketiyê, rêyeke mirov zanibe tuneye lê diyar e ku pir dem neketiye nav wan. Li gorî texmînan ji mehekê kêmtir dem derbas bûye. Reb, dixwaze ku Sara jî bibe pereçeyekî ji vê axaftinê:

> Xudan ji Îbrahîm re got: "Çima Sara keniya û got: 'Ez pîr bûme, ma ezê piştî vî emrî zarokan bînim?' Ma ji bo Xudan tiştekî zehmet heye? Ezê sala bê, di çaxê ku hat diyarkirin de vegerim ba te û wê kurekî Sarayê hebe." Sarayê ji tirsa derew kir û got: "Ez nekeniyam." Lê Xudan got: "Belê, tu keniyayî." (Destpêk 18:13-15)

Sara ne tenê keniya, di heman demê de derew jî kir! Tirsiya bû ji ber ku tişta kir yek ji wan bişirînên ku dibêje *ez dibêjim tu henekan dikî…* bêtir weke tinazekê bû.

## Ka Jina Te Sara?

Pasaja berî niha û ayetên berê û yên piştre, hiştin ku ez meraq bikim bê hîn çiqas îma kiriye û bêaxaftin maye. Hin tiştên ku min dixwest li ser bisekim, min kirpandin. Hin ji van, ew mijar bûn ku berî niha ji balderiya min derketibûn.

Pêşî, ez dixwazim li pirsa "Ka jina te sara?" binêrim. Çima xwe di bin konê xwe de veşartiye? Çima ne li cem mêrê xwe ye û tevli sohbeta wan nabe?

Hûn bi dawiya çîrokê dizanin lê girîng e em ji hişê xwe dernexînin ku Sara bi meselê nizane. Eger em li temenê wê bifikirin, dibe fikirî be ku dawî li çîroka wê hatiye û jiyana wê bi avê de çûye. Têkiliya mêrê wê ya bi jinika din re û ji ber ji Hacerê re ne baş bû, dibe hîs kiribe ku van ew li derveyî meseleyê hiştibe.

Êşên ku kişandin û xeteyên ku di nava hêvîşkestinên xwe dubare dikin de ferq nekirin û şert û mercên zor di kûrahiya giyanê wê de xisar

lê kiribûn. Pêdiviya ducanîbûnê bi kûrahiyê tuneye. Bi awayekî qels û bê baldarbûn jî dibe ku hûn ducanî bimînin. Lê wê Sara, bibûya dêya Îshaq û gelê Îsraîlê û divê ji vê re amadebûya.

Sêzdeh salan Simaîl li ber çavên wê mezin bibû. Hêvî dikir ku kurê Hacerê weke kurê xwe mezin bike lê Smaîl jê re weke kurê wê nedihat. Brahîm ji halê xwe memnûn bû lê Sara dilşikestî bû. Te digot qey hemû şert û merc berevajî wê dibûn. Lê tişta ku ji van hemûyan trajîktir ew bû ku hem Sara û hem jî Brahîm, ya rastî weke ku ji bîr kiribûn bê Sara kî ye.

Tişta ku piştî vê û pir bandor li min kir, pirsa “Ka jina te sara?” bû.

Hinek bên mala me û li min bigerin, ji John re nabêjin “Ka jina te Lisa?” Ne hewce yî vê cudabûnê ye. Ev daxuyanî eger li mala me çend jinên bi navê Lisa hebûna wê demê wê ev bi mantiq bûya. Weke mînak, eger kurikekî min bi keçikeke ku navê wê Lisa ye zewicîbûya, wê daxuyaniyeke wisa lazim bûya: “Ez hatime jina te Lisa bibînin, ne bûka te Lisa.”

Kesekî ku me nas dike, wê tenê bibêje “Ka Lisa.” Eger me nas nekin û bixwazin bi jina malê re bipeyivin, wê ji John re bibêjin “Ka xanima te?”

Ev mêvan her çiqasî Brahîm û Sara nas bikin jî, Sarayê hem bi navê wê û hem jî weke jina Brahîm bi nav dikin û bang wê dikin ku ev yek dihêle ez pir bi meraq bibim.

Gelo nabe ku van ferîşteyan ev tişt gotibin: “Brahîm, em li vir in ji bo em bînin bîra te ku Sara jina te ye. Ez dizanim ku ev serdema jiyana we bi hev re derbas kir cuda xuya dike û ji Hacerê zarokek te heye lê Sara hîn jî jina te ye.” Ev rewş diyar dike bê çima axaftineke ku divê Sara *beşdar* bibûya lê tenê bi *guhdarîkirinê* qîma xwe aniye. Di jiyana wê ya koçberiyê de pir kêm mêvan dihatin mala wan. Çawa gava Brahîm her sê zilamên ku li nêzî darên li ber kon dîtin, di cih de ji cihê xwe çeng bû. Gava mirov vê çîroka di Pirtûka Pîroz de dixwîne, mirov dibêje qey xwarin di çend deqîqeyan de amade bûye lê di rastiyê de ev xwarin û vexwarina wisa xweş bi saetan amade nabe.

Ma çima mirov li şûna ku li ser sozên Xweda bipeyive û tevlî bibe îcar rabe tenê bi dizî li wan guhdar bike? Belkî jî mêvanan li derdora xwe nêrîn û gotibin “Bavê baweriyê va li vir e îcar kanî dêya wê?”

Eger rojekê komeke ferîşteyan an jî Reb bê mala min û John wan vexwîne xwarinê, divê John min bi zorê ji odeyê derxîne. Eger mirov bi rastî bibêje, ev li mala me tu carî nabe pirsgirêk. Mêvanên John, mêvanên min in û mêvanên min jî yên John in. Eger ji ber pirsgirêgekê ez ne li odeyê bim û min bibihîstiya ku li min dipirsin, min ê meraqa wan di cih de bişkeranda û di cih de ez ê biçûma cem wan!

Ez tu sedemê tê nabînim ku ez bawer bikim ku Sarayê ji xwe dûr dixin an jî Brahîm wê nedîtî dibîne. Ez merak jî dikim ka gelo ew xwe ji nava vê pirsgirêkê derdixîne an na. Gava ku mirov hînî hêvîşkestinê dibin û xwe ji bîr dikin, ev pirsgirêk derdikeve holê. Hêvî dilê mirov diêşîne. Ji ber vê sedemê, piştre dibişirin û piştre jî derewan dikin.

Sedema ku Sara li derveyî sohbeta wan ma û bi dizî guhdariya wan kir, her çi dibe bila bibe; Xweda tevlî bû û Sara xist nava meseleyê. Ez bawer dikim ku ev tevlîbûn, anîn bîra Brahîm ku Sara jina wî ye, dest pê kir. Vê yekê rê li ber vekir ku Hacerê biavêjin aliyekî û di nava pêvajoyê de anîn bîra her kesî bê Sara kî ye. Sara dotmîr bû.

## Çima ji Brahîm Hat Pirsîn?

Di vê çîrokê de mijara ku piştî vê derdikeve pêş, ew e ku Sara dikene lê pirs ji Brahîm tê pirsîn:

> Xudan ji Îbrahîm re got: "Çima Sara keniya û got: 'Ez pîr bûme, ma ezê piştî vî emrî zarokan bînim?' (Destpêk 18:13)

Tiştekî ku Sara kiriye çima ji Brahîm tê pirsîn? Gava min ev dît, min hîs kir ku axaftina di ayeta 17an a Destpêkê de bi Sara re nehatiye parvekirin. Belkî jî Brahîm hîn hewl dida ku gotinên Xweda biserifîne. Belkî Sara nexwestibû bibêje. Hin demên min û John çêdibin ku me ji bîr dikin em hevdu agahdar bikin. An jî belkî peyivîn lê guhê xwe pir nedanê. Lê tiştek diyar e: Soza ku wê kurikekî biwelidîne, hîn di jiyana wê de qewîn nebibû. Ferîşte ji Brahîm dipirsin:

> Ma ji bo Xudan tiştekî zehmet heye? Ezê sala bê, di çaxê ku hat diyarkirin de vegerim ba te û wê kurekî Sarayê hebe." (Destpêk 18:14)

**Xweda ji bo gelê peymanê ava bike, pêdivî bi kûrahî û bêrîkirina Sara dît.**

Piştî salekê wê Sara kurikek anîbûya dinyayê. Her çiqasî pirs ji wê nehatibe kirin jî, ez pir eletewş dibînim ku Sara înkar dike ku derew nekiriye û nekeniyaye. Pirs ji Brahîm hat pirsîn. Ya din jî Bavê me yê Xwedayê peymana ebedî ku kenê Sara bihîstiye, heta tu bêjî bes ez pir xweş dibînim ji ber ez jê bawer im ku niqirîskên dilekî ku digirî dibihîze.

Ferqeke pir mezin di navbera ku mirov ji fikrekê hez bike an jî jidil û can ji wê fikrê hez bike, heye. Jiyana Sara ji ken qusiyabû. Bi çêbûna Îshaq re wê ev rewş berevajî bibûya. Brahîm û Sara bi hev re dest bi rêwitiya xwe kiribûn û gava bi hev re bikeniyana wê soza Xweda derketaya ser avê. Ji bo soz derkevin ser avê divê ku jin û mêr, xwuşk û bira, jin û zilam li hev bin û be hev re bipeyivin. Ev demeke dirêj çêbûye ku jin xwe vedişêrin lê Xweda dizane ku divê hûn bibin parçeyekî ji axaftinê. Xweda ji bo gelê peymanê ava bike, pêdivî bi kûrahî û bêrîkirina Sara dît. Em di ayetên 4:22-23yan ên Galatiyan de wisa dixwînin:

> Hatiye nivîsîn ku du kurên Birahîm hebûn: Yek ji cêriyê û yek jî ji jina azad. Lê yê ku ji cêriyê bû li gor bedenê û yê ku ji jina azad bû jî li gor soza Xwedê çêbûye.

## Kî Sara Diparêze?

Berî ku Sara Îshaq têxe hembêza xwe, axaftineke din ku nedixwest bibe perçeyekî jê qewimî. Ji bo min tam sirek bû lê gava vê carê bêdeng ma û derew kir, Xweda ket navberê:

> Li wir Îbrahîm ji bo jina xwe Sarayê got: "Ev xwuşka min e." Wî Avîmelekê Padîşahê Gerarê şand pey Sarayê û ew anî. Lê Xwedê

> bi şev hat xewna Avîmelek û jê re got: “Ji ber ku te ev jinik anî, tê bimirî. Çimkî ev jinik zewicandî ye.” (Destpêk 20:2-3)

Kêfa min hat ku Xweda li ser navê wê peyivî ji ber ku li gorî tê dîtin her du jî di mijara bêdengiyê de tu pirsgirêkê nabînin. Li çi difikirîn? Xweda tiştekî nû dikir lê wan hîn têkiliyeke li gorî berê bi hev re dikir. Ev dînamîka xwuşk û biratiyê qet ne rast bû lê aniha li gorî berê tekez xelet bû. Guherandina navekî pêk hatibû û hindik mabû Sara bi Îshaq ducanî bimaya.

Diyar bû ku Sara jineke pir xweşik bû. Lê not salî bû! Têra xwe yextiyar bibû an jî belkî ji bo Îshaq biwelidîne Xweda ciwaniya wê lê vegerandibû. Her çi dibe bila bibe, li gorî ku zanîbû wê Sara di nava salekê de bi hemil bibe û wê zarokê xwe bîne dinyayê, divê Brahîm jî jina xwe ji kirinên Qral Avîmelek bisitiranda. Eger ne wisa bûya, wê Brahîm çawa bizanîbûya ku bi zarokî wî ducanî ye? Gelek caran em difikirin ku bêdengî tê wateya teslîmiyetê. Lê carina derewkirin e. Teslîmiyet ew e ku divê mirov bizanibe bê wê çawa û kengî bipeyive. Teqez ev demeke wisa bû.

Brahîm û Sara, dibe ku di vî temenî de weke xwuşk û bira bi hev re dijiyan lê êdî ew roj li dawî mabûn. Berî ku navê Sara bê guhertin, têkiliya wan ne wisa ve jî, piştî serdana ferîşteyan êdî divê têkiliya wan teqez zelal bûya. Navê nû yê Sara û Brahîm êdî têkiliyeke nêz û nû nîşan dida. Her duyan jî fêhm kir ku wê di nava salekê de Sara bi hemil bimîne. Sara xwe bi vê rastiyê re tam girê neda lê helbet em meraq dikin gelo di hişê wan de çi hebû?

> Avîmelek gazî Îbrahîm kir û jê re got: “Te çi bi me kir? Min çi neheqî bi te kir ku te ev gunehê mezin anî serê min û padîşahiya min. Te tiştê nebûyî bi min kir.” (Destpêk 20:9)

Piştî ku Brahîm sedema xapandina biguman diyar kir, Avîmelek dîsa jî ew pîroz kir û bang wan kir ku bên li welatî wî bi cih bibin. Brahîm ji Avîmelek re dua kirin û Xweda Avîmelek hemû malzarokên

jinên malê şîn kirin. Ji bo tiştê di jiyana xwe de dixwaze bibîne, duakirina Brahîm îronîk e. Mêrê wê ji bo ewlehiya xwe ew avêt nava talûkeyê lê Xweda Sara parast. Xweda ji bo wê biparêze di xewna qral de pê re peyivî ji ber ku ji bo Wî xezîneyeke mezin bû. Divê em lê bawer bin ku wê Xweda me biparêze û kesên nêzî me heta mêrê me jî me hêvîşkestî bike jî, em dikarin bawer bikin ku wê sozên Xweda yên derbarê jiyana me de pêk bên.

## Jina Azad û Jina Kole

Di ayeta 3:6 ya Petrûs I'e de em wisa dixwînin: “Eger hûn jî qenciyê bikin û ji tu tiştî nebizdin, hûn keçên wê ne.” Sara keçîkek neanî dinyayê lê ev ayet diyar dike ku dibe em zarokên wê bin. Gava me nehişt ku tirs tevgerên me kontrol bike û me nehişt ku xem wêrekiya me bişkîne, wê demê em jî zarokên sozê ne û zarokên jina azad in.

Sara ew jina azad bû ku hesabê Xweda û mêrê xwe dikir û rûmet dida wan. Ji aliyê din ve Hacerê jineke kole bû ku xanima xwe Sara biçûk didît. Smaîl kurê Hacerê jî da ser rêya dêya xwe û henekê xwe bi Îshaq kir. Sara wê demê fêhm kir ku divê kole û kesên azad ji hev veqetin. Û divê em jî wisa bin. Di ayeta 4:30 ya Galatiyan de em wisa dixwînin: “Cêriyê û kurê wê bavêje derve. Çimkî kurê cêriyê, Bi kurê ya azad re nabe wêris.”

Şirîkatiya kurê jina kole ku bibe mîrasger, hat redkirin. Bavê xwe û hemû tiştên ku weke malbatê dizanîbû, winda kirin. Hem jina kole û hem jî ya azad xwediyê heman mêrî bûn. Kurê her duyan jî hebû. Lêbelê têkiliya wan ya bi Brahîm re pir ji hev cuda bû. Hacerê ezîtî û kolebûna ezîtiyê temsîl dikir. Sara jî azadî û soza hatiye dayîn temsîl dikir. Ayetên 4:22-26 yên Galatiyan vê wisa diyar dike:

> Hatiye nivîsîn ku du kurên Birahîm hebûn: Yek ji cêriyê û yek jî ji jina azad. Lê yê ku ji cêriyê bû li gor bedenê û yê ku ji jina azad bû jî li gor soza Xwedê çêbûye. Di vê yekê de mînak heye: Ev herdu jin du peyman in. Yek ji wan peymanan ji Çiyayê Sînayê ye û ji bo koletiyê

> zarokan tîne; ew Hacer e. Hacer, Çiyayê Sînayê yê li Erebistanê ye û bi Orşelîma niha re hemdeng e. Çimkî bi zarokên xwe ve koletiyê dike. Lê belê Orşelîma ezmanî azad e, diya me ew e.

Ez ji gotina ku dibêje “Dêya me ew e” pir hez dikim. Saraya xwediyê xweşikbûneke ku qet xera nedibû, mînakeke xwezayî ya xweşikbûna bi serê xwe û qet xera nedibû ya ji dema Mesîh vediqetiya. Hûn di encama sozekê de çêbûn.

Brahîmê bavê baweriyê û dotmîr Sara, mînakên Mesîh û ya bûka dêrê ne. Bang me dikin ku em bibin bengiyê Mesîh û li ber Wî bejna xwe bitewînin. Ew serikê me ye û her kesê ku jê bawer dike tebayî efendîbûn, rêbertî û desthilatdariya Wî ye. Lê ji bo em bitirsin tu sedemeke me tuneye. Ew zilamê me yê ku me bi şikl û şemal dike. Em bi hezkirinê xwe ava kirine.

## Dev ji Xweveşartinê Berde!

Eger Xweda di nava we de bêrîkirinek bi cih kiribe, wê demê ji bo hûn sebir bikin û derxînin meydanê, wê Xweda hêzê bide we. Dema ku Xweda bi sozê serdana jiyana we kir, wê ev hêz xwe li we bigire. Belkî jî ev rûpel weke mêvanên Sara ne. Belkî jî ev gotin ji bo bîne bîra we bê hûn kî ne, hatine gotin.

Rastî ev e ku tu tişt cihê ku Xweda rasterast bi we re bipeyive, nagire. Divê hûn xwe bavêjin nav axaftinên bi Xweda re yên ku têkildarî qedera we ne. Pêdiviya we bi tişta ku hûn di jiyana xwe de hildigirin heye. Dem ne dema ku jin xwe veşêrin. Gava ku li cihekî navê me derbas bû, dem dema ku em biqîrin, derkevin pêş û bibêjin: “Li vir im! Li vir im û dixwazim bibihîzim!”

Eger hûn jiyaneke bêreqîb bixwazin, divê hûn dev ji xweveşartinê berdin û divê hûn bibin parçeyekî axaftinê.

Di salekê de dibe ku gelek tişt biqewimin. Ew sal ji bo Sara jî bû saleke ecêb. Eger hûn bi serdana Xweda re dest bi salekê bikin, ev rewş ne rewşeke ecêb e.

Hûn ferq dikin ku wê ev sal jî ji bo we heman sal be? Dibe ku ev sal bi bişirîneke di nav tariyê de û bi derewan dest pê bike û bi hembêzkirina sozekê dawî lê bê.

Hûn dikarin wisa bifikirin, bise deqîqeyekê, ez derewan nakim.

Lêbelê eger hûn yek ji wan gotinên li jêr dibêjin, wê demê ev tê wê wateyê ku hûn derewan dikin:

Ji bo min dereng e.
Ez hîn pir ciwan im.
Pir yextiyar im.
Ne têr û tije me.
Min pir xete kirin.
Ez baş im.
Pêdiviya min bi xeyalekê heye.

Derewan nekin û nebêjin em bêriya hîn bêtirî dikin. Xeyalên xwe înkar nekin. Gava we ev kir, pêşî bi bişirînekê û piştre bi derewekê wê deriyê dilê we bê girtin. Dilê xwe vekin û hembêza xwe jî ji bo hemû bêhempayên mûcîzeyî ku hûn li wan hatine vexwendin, vekin. Di heman demê de li şûna ku em henekê xwe bi vexwendineke jiyanî ya hem îlahî û hem jî mûcîzeyî bikin, em li hemberî bêhempabûna van bi kêfxweşî bikenin! Em weke dotmîran in û vê dinyayê jî mirov dikare bişibîne keçikên jinbava xwe. Gava ku mîr li ber deriyê me sekinîbe, em ê hîn çiqasî bi dilên xwe yên ku hîn ji xweliya berê tije ye biqîrin? Ji bo hûn jiyana ku Ew tenê ji bo dixwaze hûn bijîn, hûn xwediyê her tiştî ne.

Naxwe hûn ji bo çi xwe vedişêrin?

Aniha ew xeyala ku hûn henekê xwe pê dikin çi ye? Hêvî çi ye? Eger mirov bi awayekî cîdî lê binêre, bi hewldana nuxumandina wî tiştê ku aniha pir êşê dide we, hûn dizanin ku di qewriya we de asê dimîne? Guhdar bikin! Hûn ne têr û tije ne û ne jî kêm in. Bi xêra Mesîh hûn şirîkê vê sozê ne.

An jî belkî êdî di jiyana we de êş tuneye. Êş kêm bûn û êdî tenê

bêhîsbûn ma li dawiyê. Gava ku Xweda destê xwe dide wir, gelo hûn li wî cihî ne, ew cihê ku hûn lê digirîn? Gelek kes vîkîvala ne, ji ber vê ji bo henekê xwe bi hêviyê bikin, tinazê xwe pê dikin.

An hûn bawer dikin ku hin tişt ji bo Xweda pir zor in û hûn ji aliyekî ve dişibin bavê xwe Brahîm?

Biwatekirina jiyana we ji bo Wî pir zor e gelo? Ji bo hezkirina xwe li ser dinyaya we bireşîne, gelo pir dereng ma? Tişta ku hûn lê difikirin ku ji bo Wî pir zor e çi ye gelo?

Em di ayetên 4:4-7 yên Galatiyan de wisa dixwînin:

> Lê gava ku dem temam bû, Xwedê Kurê xwe şand. Ew ji jinê çêbû û di bin Şerîetê de bû, da ku wan ên di bin Şerîetê de ne bi berdêl xilas bike û em kurîtiyê bistînin. Û ji ber ku hûn kur in, Xwedê Ruhê Kurê xwe yê ku gazî dike: «Abba», yanî «Bavo!» şand dilê me. Loma êdî tu ne xulam î, lê tu kur î. Madem ku tu kur î, nexwe tu bi destê Xwedê wêris î jî.

Hûn mîrasgerekî ku hatibûn revandin û bi pereyan xelas bibûn. Tişta herî wêrek û bi navûdeng ku hûn bikin, ew e ku hemû bereketên ku mirina Îsa ji bo we bi dest xistine re hûn bijîn. Gava ku we Gotina Xweda; ne weke qeydeke dîrokî ku hatiye nivîsandin, weke nameyeke taybet ku ji we re hatiye nivîsandin, xwend; wê demê hûn ê kifş bikin ku hûn xwediyê van hemûyan in. Piştre ji bo hûn gotina Wî di dilê xwe de îlan bikin, dengê xwe bi kar bînin. We divê wisa hîs bikin we divê hîs nekin, hûn her tiştê ku Gotina Xweda derbarê we de gotiye û hûn xwediyê her tiştî ne. Îro jî Xweda navekî nû li we dike, sozên xwe tîne cih û weke zarokê Xweda cihê we vediqetîne. Pêşnûmeya Xweda ya derbarê jiyana we de û gotinên derbarên we de, bi rewşa we ya aniha re ne sînorkiriye. Soza ku Wî daye we bêreqîb e. Xwe jê veneşêrin.

Wî hembêz bikin.

## Pirsên Nîqaşê

1. We dizanî bu ku Xweda bi alîkariya sozên bi Mesîh re dane, me vedixwîne şirîkatiya xwezaya xwedayî ya Kurê xwe?
2. Berî ku Xweda soza xwe ya derbarê jiyana we de derxîne holê, dûrketina we an jî mijareke ku her dem nîqaşê derdixîne holê ku divê hûn tamîr bikin an jî têkiliyek heye gelo?
3. Gelo hûn xwe vedişêrin? Eger bersiv erê be, ji çi?
4. Hûn li axaftinên ku Xweda pêdiviyê pê dibêne ku divê hûn parçeyek ji wê axaftinê bin, bi dizî guhdar dikin? Çima?
5. Bêdengî kengî ne teslîmiyet e?
6. Sozeke ku Xweda daye we lê hûn pê keniyane û we derew kiriye, heye gelo?
7. Hûn dikarin kîjan gavan bavêjin ku hûn li derve bimînin û li hundur binêrin û vê yekê veguherînin rewşeke çalak û azwer?

# 4

## Ceger Neke ji bo Danberhevdinê!

Danberhevdin dizê kêfxweşiyê ye.

THEODORE ROOSEVELT

*Divê hişyariyek di ber vê beşê re hebe!*

Ev tiştên ku aniha hûn dixwînin xam û eşkere ne. Tiştên li jêr tên behskirin, mixabin çîroka min e û ji ber vê çîrokê fedî dikim. Ez hêvî dikim ku tu kesî ji we ew xisara dînbûna derbasdar ya ku êş û elemê dide mirov nedîtibe ku ez ê li vir bînim ziman. Lê eger hatibe serê we, hûn ne tenê ne. Ha va em dest pê dikin.

Roja min weke her rojên normal dest pê kir. Ji bo ez sar û seqema sibeheke sar ya Koloradoyê ya meha çeleyê ji ser xwe rakim, min bi ser bêcemeyê xwe de sebehiya xwe li xwe kir û berê xwe da midbexê. John berî bi saetekê rabibû û di bêdengiyê de xwendina xwe ya rojane dikir. Her du kurikên min li ber deriyê pêş ji bo derkevin derve amadekariya xwe dikirin û ez li ber mekîneya espressoyê ya li midbexê sekinîbûm. Austin diçû kar û Alec jî diçû dibistanê. Gava ku deriyê pêşî hat girtin, ez li ser koltixê xwe bi cih bûm û min espressoya xwe ya bêhempa ya ku kakao, darçîn, şekirê qahweyî tê de bû û hinek dermanê tûj min bi ser

kefa wê dakiribû û min gulpek lê xist (min dixwest ez yekê ji vê ji hemû hevalê xwe re çêbikim). Tava zivistanê hîn nû li bexçeyê me hilatibû. Ji bo li tîrêjên pembe yên ku siya wan şîn e, temaşe bikim min xwe di koltixê xwe de bir. Îro şerekî ku ez bikim tuneye. Civîneke ez mecbûr bimînim ku serê xwe bişom tunebû. Ez azad bûm ku roja xwe li gorî dilê xwe derbas bikim. Min axîn kişand û qedeha xwe bir ber devê xwe û bi kêfa germ û xweş ya ku xwe ji qirka min ve xwe berdida jêr ve min hîs dikir ku mejiyê min bi ser xwe ve dihat. Bêdengiyeke bêhempa hebû.

Tam jî ji ber vê divê ez rahijim Pirtûka xwe ya Pîroz û divê paragrafên li ser wan dixebitim bixwînim an jî tenê ji bo zewqa başiya ku Xweda ji min re ava kiriye, derxînim; divê kûr û dûr bifikiriyama.

Divê min tiştekî ku ji awiqandina telefonê baştir bûya, bikira. Bawer bikin, ez aniha pê dizanim. Lê yek ji aliyê min yê qels di heman demê de yek ji aliyê min yê herî bi hêz bû jî. Ez tora civakî weke rêyeke ku bi hevalên xwe re têkiliyê deynim, dibînim. Gera di nava parvekirinan de ji bo min weke vexwarina qahweyê ya bi şirîkên derdan re ye. Bêrîkirina têkiliya bi kesên din re ya di cih û dema rast de tiştekî bêhempa ye. Ev ne cihê rast û ne jî dema rast bû. Berî derkevim nava mirovan, ez yek ji wan kesan im ku divê pêşî bi qahweyê re û piştre bi Giyanê Pîroz re têkiliyê deynim.

## Lîste

Gava min çavên xwe li parvekirinên xwe yên Twitterê gerandin, min ferq kir ku hevalên min filodekê dişopînin. Mirovên wan nas dikim, ji wan hez dikim û heta yên dixwazim wan biparêzim, min dît ku spasiya xwe ji kesekî ku wan dixe nava lîsteyekê re dikin. Lê ev ne lîsteyeke ji rêzê bû. Ev ew LÎSTE bû. Min jî bi dil û can hewl dida ku têkevim nava vê lîsteyê.

Belê, di vir de girîng e ku hin agahiyan bidim we.

Ev lîsteyek e ku her sal nû dibe û tê nûkirin. Di bîst û sîh salên dawî de ji aliyên kes û organîzasyonên cuda ve, ev “lîste” tê amadekirin û ji vê yekê berpirsiyar in. Vê carê li şûna organîzasyonekê jinekê ev

lîste amade kiribû. Min bi nav zanîbû lê min weke şexs ev jinik nas nekiribû. Lê ji ber me hevdu nas nedikir, ev yek nedihat wê wateyê ku min nedixwest ez di lîsteya wê de cih bigirim. Min li navên lîsteyê nêrî. Nav li gorî alfabeyê hatibûn rêzkirin û ji ber ku paşnavê min bi tîpa “B”yê dest pê dikir, min di cih de dît ku navê min di lîsteyê de tuneye, dîsa. Ya rastî ez tu carî neketibûm lîsteyê. Lêbelê li gorî min didît vê carê çi kesên ku min nas dikirin, hemû di lîsteyê de bûn. Kesên ku min şêwirmendiya wan dikir hemû ketibûn nav lîsteyê. Kesekî ku pirtûkên min wergerandibûn Îspanyolî ketibû lîsteyê. Belkî we meraq kir… Ev lîste çi lîste bû û ji bo çi ji min re evqasî girîng bû? Ev lîste lîsteya sed jinên pêşî yên xizmetkarên Amerîkayê bû. Bû kutkuta dilê min. Pirs û berhevkirinên eletewş di hişê min re derbas bûn. Ez çima ne di lîsteyê de me? Ji ber ku ez pir bi blogê danakevim gelo? Gelek fikir di serê min re derbas bûn. Firotina ji milyonekê zêdetir ya pirtûkan û ji bîst salan zêdetir ku ez rêwitiyan dikim û xizmetê ji jinan re dikim, çima cihek ji min re di lîsteyê de venekiribû? Ez hevaleke baş im. Baş e ma zewaca min ya ku ji sîh salî zêdetir çêbûye, çar kurik û malbateke ku ji hevrebûnê hez dike û xwediyê malbateke wisa?

Min dîpnota ku di bin lîsteyê re bû, xwend. Li gorî dihat dîtin, kesa ku lîste derxistibû ji bo jinên ku di ser wan re qeviziye wê cih ji wan re vekira û li xwe mikur dihat ku hin jinên ku divê têkevin lîsteyê, nexistiye lîsteyê. Ji bo vê sererast bike û hin kesan lê zêde bike, cih vekirî hiştibû.

Ez daketim binê rûpel.

*Gelo wê xelet çêbibûya ku min navê xwe lê zêde bikira?*

Ez cîdî bûm gelo? Helbet wê ev ne rast bûya!

*Belkî jî min dikarîbû bi rêya asîstana xwe navê xwe lê zêde bikira.* Gava min fêhm kir ku ez weke xwendekareke lîseyê li ber xwe didim û di rewşeke pêkenok de me, ez rabûm ser xwe ji bo ez mêrê xwe bibînim.

Min bêcemeyê xwe bi vir de û wir de kir û bi awayekî ecêb ez ketim ofîsa wî, “John, ez dîsa neketime nava lîsteyê!”

Mêrê min yê ku Pirtûka xwe ya Pîroz dixwend, di ser berçavka xwe ya xwendinê re li min nêrî. Fêhm nekiribû bê ez çi dibêjim. Haya wî ji

lîsteyê tunebû. Min destên xwe vekirin û min behsa lîsteyê jê re kir bê çi ye. Bi dawî de venekişiya. Min pê re parve kir bê kî di lîsteyê de ne û ji ber ku ez tevlî lîsteyê nebibûm, min hêvîşikestina xwe jî jê re anî ziman. Ji ser kursiyê xwe ranebû. Pênûsa di destê xwe de danî û birhek xwe rakir bi jor de. Piştî ku pelpela min qediya, ji bo ez di ber çavan re derbas bikim bi dengekî sakîn çend ayet pêşniyar kirin.

Tişta ez li bendî bûm ne ev bû! Min dixwest ku ji min re wisa bibêje: "Lisa, ez pir xemgîn bûm. Ez bawer im xeletiyeke mezin çêbûye. Ka ji min re telefona min bîne. Ez ê te tevlî lîsteyê bikim." Lê wisa nekir.

Ez li ber wî derketim: "Ez ê wan ayetan nexwînim, jixwe ez wan jiber dizanim! Aniha tişta ku ez dixwazim ji te bibîhîzim ne ev tişt e! Ma tu nabînî? Min pêncî sal derbas kir û ez ê tu carî nekevim wê lîsteyê!"

John pirsî û got: "Kê ev lîste çêkiriye? Min navê wê ji wî re got lê ew nas nekir.

"Tu vê jinikê nas dikî?

Min serê xwe hêjand. Li ser vê yekê, li Pirtûka xwe ya Pîroz vegeriya û ayeteke din li yên ku dixwest ez bixwînim zêde kir û dîsa dubare kir.

Min fêhm kir ku piştigiriya ez hêvî dikim wê li cem mêrê min tunebe. Bi qêrîn û hawar ez ji ofîsa wî derketim: "Ji bo ez bizanibim ku ez xelet im ne hewce ye ez wan ayetan bixwînim. Ez dizanim ku ez xelet im! Lê hayjêhebûna ku ez dizanim ez xelet im, dihêle ku ez xwe nebaş hîs bikim!"

Divê ez bi jinekê re bipeyivîma. Ji bo mêrê min çirçira min nebihîse, tevlî bêcemeyê xwe yê şevê xwe min xwe avêt hembêza sarbûna li derve ya ku di bin sifrê re bû. Li şûna ku wê yek nêzî min tevbigeriya, ez ê xwediyê lêgerîna ku wê kesekê rastî ji min re bigotaya. Di serê çîrokê de min got ez dizanim ku ez bi xete me û min mijar anî ziman. Piştre min hemû lîste jê re anî ziman û li ber wê raxist.

Hevala min pirsî û got: "Ez di nava lîsteyê de me gelo?"

"Helbet tu tê de yî! Ji bilî min her kes di lîsteyê de ye!"

Lê zêde kir got: "Xema kê ye?

Ez li hemberî wê derketim û min got: "Diyar e ku xema min e û

helbet ne xema te ye ji ber ku tu di nava lîsteyê de ye.” Piştre ez li xwe mikur hatim: “Ez naxwazim bibe xem ji min re lê nikarim bi xwe. Ez dizanim ku ev xelet e û divê ez vê ji kesekê re bibêjim. Jixwe, John ji bo ez bixwînim çend ayet pêşkêş kirin...”

Bêdengî.

We qet ji derve de li xwe nêriye û weke ku hûn li jineke dînokî temaşe dikin, we xwe hîs kiriye gelo?

Ha ez di kêliyeke wisa de bûm. Bi her gotina ku ji devê min derdiket re, ez hinekî din diketim rewşeke pêkenokî. Divê kêlî berî kêliyekê ev telefona ku min hêvî dikir min nekira, di cih de bi dawî bikira. Min di cih de got: “Ez ê bem cem te û li xwe mikur bêm. Ez dixwazim derbasî aliyê din yê vê bibim. Divê ez li aliyê din yê vê meseleyê bim.”

Ji dil û can bi min re di heman fikrê (mijara ku ez xelet im) de bû û me telefon bi dawî kir.

Min dizanîbû bê çi rast e. Mêrê min dizanîbû bê çi rast e. Hevala min dizanibû bê çi rast e. Lê dîsa jî ji min ve weke ku xelet dihat.

Aniha ez li hemberî terma lîsteyê bi hêrs bûm û ji nivîskara îsal aciz bûm. Ango, kî dikare tiştekî wisa bike? Di dawiya dawî de, gava dîsa min lê nêrî min dît ku divê gelek kesên din li lîsteyê zêde bibin lê xuya bû ji ber çavê wê filitîne... Belkî jî divê min lîsteyek amadekiribûya. Min dikarîbû ew jî lê zêde bikirina! Ma ne jixwe, ji yên wê nivîskarê zêdetir şopîner û hevalên min yên Twitter û Facebookê hebûn. Tişta ku lîsteya wê derbasdar dikir çi bû? Ez li pilana vê çalakiyê fikirîm... bê guman weke deh saniyan. Tu derfetên ku ez vê bikim tunebûn!

Hewldana ku ez ê mirovan têxim lîsteyekê, bi gumana herî baş wê bi sînor mabûya û gava min lîste amadekiribûya ez çiqasî baldar bûma jî wê hin kes li derveyî lîsteyê bimana. Îcar ahina ev pevçûna di nava min de, gelo min dixwest di nava wan de jî ava bibe? (Lêbelê helbet ji bilî kesên ku min bi xeletî li derve hiştine, ez bi guman bûm ku wê ev tiştên min di hundurê vê nîv saeta dawî de kirine, wê wan bikira.)

Min telefona xwe danî cihê wê, çavên xwe girtin û hilmeke kûr kişand û berda. Gava min hilma xwe berda, min bihîst ku Giyanê

Pîroz bi awayekî hêdî bi min re dipeyive: “Lisa, eger di lîsteyê de navê te hebûya tu yê evqasî bi dû lîsteyê biketa gelo? Navê te di lîsteyê de hebûya, te yê dîsa jî lîste beradayî û nederbasdar bidîta gelo?”

Dem dema rastiyan e. Helbet min ê negota. Ji bedêla hêrsbûnê, di ser tora civakî re min ê spasiya xwe li vê xanima ku min nas nedikir, bikira û ji bo kesên din jî berê xwe bidin lîsteyê, min dikarîbû RT bikira.

Ez hatibûm zeftkirin.

Belê. Ez hevjînek im, dêya çar kurikan im û pîrik im lêbelê gava ji nasnameya xwe qut dibim, hîn jî bi zilma danberhevdinê re dikevim nava têkoşînê. Bi vê nêrînê lîste xelatek bû ji ber ku şanî min da bê ez li kuderê me.

Gava ji bo pesindkirinê (onay) em li mirovên din binêrin, em ê her dem weke ku ji derve de li hundurû dinêrin hîs bikin. Eger mirov ya rastî bibêje û li xwe mikur bê, kesekî tenê jî ku valahiya pesendkirinê di jiyana me de dagire tuneye. (Lêborîn -mêrê we bêqusûr be jî ev ne pêkan e.) Ji bilî gotinên Xweda yên di dilê we de nivîsandine, bi heman baweriyê ne xelateke serkeftinê heye ne lîsteyek heye û ne jî teqdîrnameyek heye:

*Ya ku jê tê hezkirin, xweşik tê dîtin, qedir û qiymetê didinê û ji nêz ve tê nasîn… ez im.*

## Dizê Kêfxweşiyê

Ji derve de çawa xuya dike bila xuya bibe, sedema hilweşîna di dilê jinekê de pêk tê tenê Xweda dikare fêhm bike û ji ber danberheviyê tenê Xweda dizane bê wê jinên dînoke yên bi bêceme yên ku başiya wa ji wan hatiye dizîn, çawa baş bibin. Ez dikarim ji dilê safî ji we re bibêjim, çalakiyeke ji rêzê ya ku piştgiriya reqabetekê dike wê hêza we qels bike. Weke gotina Theodore Roosevelt ku tespîteke di cih de ye, “Danberhevdan dizê kêfxweşiyê ye.”

Wê sibehê ez bû şahidê wê ku kêfxweşiya min teqez ji min dizî. Ez difikirîm ku wê tevgereke wisa di min de xuya nebe. Bi rastî jî, bi salan

bû ku hêrseke wisa dimmin de xuya nebibû! Lêbelê vê sibehê bi giyanekî hatiye îhmalkirin û bi menepozê re teqîneke hevpar di min de ava kirin. Diyar bû ku hin çavkaniyên min yên jiyanê girikî ne û pêdiviya lez bi bexçeyê dilê min heye. Li gorî tê dîtin pêdiviya wan bi kesaxeke baş heye lê min pişta xwe daye wan şaxên bi kêrî tu tiştî nayên.

**Çalakiyeke ji rêzê ya ku piştgiriya reqabetekê dike wê hêza we qels bike.**

Baldariyeke danberhevdanê heye. Eger destûra wê bê dayîn wê we her dem ji navenda we ya rastî dûr bixe. Danberhevdan, bi rêya xurûreke binkol wê we binepixîne an jî wê we têxe nava zordariya ku ji ber bêbaweriyê ava bûye. Di her rewşê de, di demeke kin de weke ku we dengeya xwe winda kiriye û weke ku hûn ji derve de li hundurû dinêrin, wê bi we bide hîskirin.

Gava ku kesek bi awayekî zaneyî li derveyî meseleyê tê hiştin û ez vê rewşê dibînim, hişê min ji serê min diçe. Dîsa jî hîskirina ku em xwe li derve dibînin, tekane tişt e ku dihêle em li hundurû binêrin. Ez ê derbarê vê jina ku ev lîste amadekiriye de bibêjim. Jineke ciwan, zîrek û biaqil bû. Ez vê tevgera wê bipejirînim jî û nepejirînim jî, ez minetdarê wê me ku hişt ev lîste tişta di nava min de ye eşkere bibe.

Min ji wê hevala xwe ya ku bi min re sebir kir û bêguman niha fikiriye ku ez dîn bûme, di cih de peyamek şand. Ji bo ez mêrê xwe yê pîroz hembêz bikim, ez dîsa li ofîsa wî vegeriyam. Ez bi lez û bez ketim hundurê xwe yê razanê, min derî li xwe girt û min çonga xwe da erdê. Li jêr ez parçeyekî ji duaya xwe ya ku min kir, parve dikim:

*Bavê Asîmanî,*
*Ji ber tu kêmasiyên min nîşanî min dike, ez spasiya xwe dikim.*
*Min bibexşîne. Koka vê dînbûnê eşkere bike. Bi navê Îsa amîn.*

Ji cihê ez lê mabûm min dest bi roja xwe kir û gava ez li wê saeta ku ez weke dînan tevgeriyam, fikirîm; kenê min bi min hat. Di saetên pêş de min û asîstana xwe hev dît. Gava me bi hev re li posteyên hatine

dinêrîn, me nameyeke balkêş dît. Li gorî dihat dîtin, di demeke nêz de wê konferanseke jinan bihata lidarxistin û ez jî yek ji wan jinan bûm ku weke mêvanê birûmet hatibûm hilbijartin. Ji bo me bi rûmet bikin jî bûkên naylonî yên li dor sîh santîmî yên her yekê ji me çêkiribûn. Bûka min, bi hêviya ku wê di ofîsa John de cih bigire ji wî re hatibû şandin. Gava ku min bûka xwe di nava destên xwe de dibir û dianî, bi dengekî bilind bû tîqtîqa min û ji aliyekî ve jî min di hişê xwe de not kir ku li sahneyê pantorê kont yê sipî qet bi min nakeve. Min bûk danî aliyekî. Min bihîst ku dengekî nas bi min re dike pistepist: “Binêre wa bûka te çêkirine, ev te bextewar dike gelo?”

Min li fîgura naylonî ya ku pantorê kont yê sipî lê ye û di destê wê de mîkrofon heye, nêrî û min serê xwe hejand. Bûk jî weke lîsteyê sexte bû. Ez dîsa keniyan. Min hewl da ku bûkê biavêjim lê mêrê min bi bîr anî ku bûk ne ji min re lê ji wî re hatiye û dest danî ser bûkê. Ez jê guman dikim ku bûk ji bo min ji dînîtiyên min yên di pêşeroja nêz de vegerîne, veşartiye.

## Sê Çalakî

Baş e, ew ayetên ku John pêşniyar kirin ku zaten min bi wan zanîbû, kîjan bûn? Ya pêşî ayeta 10:12 ya Korîntî II bû:

> Ji xwe em newêrin ku xwe bi hinekên ku xwe tewsiye dikin re yek bigirin an jî rû bi rû bikin; lê ew ên ku xwe bi hev re dipîvin û xwe bi hev re rû bi rû dikin, bêfêm in.

Min bibîhîzin! *Cesaret nekin* û xwe bi kesên din re weke hev nebînin, xwe nedin berhev û xwe ji wan re pêşniyar nekin. Çima? Ji ber ku ev çalakiyên pozbilindiyê ne. Her çiqasî denberhevdan ji bo we baş be jî ev wisa ye. Em hemû dizanin ku piştî pozbilindiyê têkçûn tê. Û gava we bi van her sê çalakiyan re daûstend, hûn ê hem bi talûke bibin û hem jî wê we bîne ser cihekî bi tirs.

### *Xwewekhevdîtin*

Zanyar xwe bi kesên din re weke hev nabînin. Zanyar naxwazin xwe di ser kesî re bibînin. Beşkirina mirovan ne tiştekî xweş e. Gava ku tiştek hat beşkirin ev tê wê wateyê ku em wî tiştî dixin cihekî an jî di nava kategoriyekê de bi cih dikin. Hin îfadeyên ku dişibin terma beşkirinê; *biderecekirin, tasnîfkirin, bimerqekirin, kategorîzekirin, rêzkirin* û belkî jî ya herî ne xweş *jirêzêbûn* e. Ferhenga Merriam-Webster vê peyvê wisa pênase dike: “Tişta ne resen, ya ku guherînê nake û ya ku xwe tiştê tê zanîn dubare dike.”

Di jiyanê de kategoriyên wekhev tunene. Jiyan bi îfadeya herî baş telihev e. Rastî ev e, jiyana her kesî ji gorî ku tê dîtin bêtir tevlihev e. Û kîjan mirovê ku rast difikire, dixwaze ku jiyana wî ya resen weke ji rêzê bê nirxandin? Tora civakî tenê yek ji wan gelek fersendan e ku hem pêşdarazên me hem jî têgihiştinên me bi sînor dike an jî xwediyê kapasîteya firehkirinê ye.

Di roja me de fikreke baş e ku mirov van pirsan bi rêkûpêk bipirse: Di dawiya dawî de ez dixwazim bibim parçeyekî avakirina çi? Bi kesên din re gelo ez dixwazim bêm bi derecekirin, bêm beşkirin û arşîvkirin? Ez dizanim ku lîsteya min xwend, tê hewldana pîrozkirina wekheviya ku ev jin gîhaştinê! Ji bo tiştekî ku her dem nehatibû pîrozkirin, hatibû avakirin… jinên xizmetkar!

Lêbelê gava me girîngî da kategorîzekirinê, dibe ku em xwe di nava qabekê de bibînin. Zanyerekî yextiyar carekê mêrê min wisa hişyar kir: “Destûrê nede ku te bi etîket bikin. Eger bikaribin vê bikin, di pêşerojê de ji bo te dîskalifiye bikin wê wê etîketê bi kar bînin.”

Ez ji we re vê bibêjim ku gelek mirov li ser xetekê nikarin bên bi derecekirin. Û kesên ku tevgerên ne baş bi wan hatine kirin an jî yên li derve hatine hiştin, wê pir bextewar bibin ku we bi dereceyên *hîn kêmtir* bi derece bikin.

## *Xwedanberhevdana bi Kesên Din re*

Kesên bi ceger, ceger nakin ku xwe û kesên din bidin ber hev, ev danberhevdan wan derxîne asteke bilind jî vê nakin. Ew fekq dikin ku hîn li ber wan gelek gavên din hene. Li ya ebedî dinêrin û fêhm dikin ku li tiştên wan bi ber jêr ve girê didin, wê xwe nedin berhev. Vîzyona bereketên mezin, wan teşwîq dike. Danberhevdan; ji bo tirsonekên ku cesaret nakin ku hîn zêdetir heye, parastinek e.

Navê çiyayê em pê ve hildikişin çi ye? Populer bûn e? Ji aliyê nêrîna ebedî ve tenê ji tirabêlkê pêk tê. An jî eger ji bo li gorî Pirtûka Pîroz be em ji ayeta 3:8 ya Filîpîniyan bigirin incex danheveke qirş û qal be. Qirş û qal ne ew tişt e ku bilind bibe, tiştekî ku divê mirov jê bireve û xwe di ser re biqevizîne. Pirsgirêk ew e ku gelek ji me bi qirş û qala binê lingên xwe ve dimeşin û em li dawiya xwe şopeke ku bêhna pîs jê te, dihêlin. Em hînî bêhnê dibin lê ev nayê wê wateyê ku ev bêhn xweş e. Em ayetên 3:7-9 ya Fîlîpiyan bixwînin:

> Lê belê her tiştê ku ji bo min qezenc bû, min di ber Mesîh de zirar hesab kir. Hê zêdetir, ez ji bo feyda zanîna bilind a Xudanê xwe Mesîh Îsa, her tiştî zirar hesab dikim. Di ber wî de min dev ji her tiştî berdaye û ez wan wek zibil hesab dikim, da ku ez Mesîh qezenc bikim û bi wî re bibim yek. Êdî rastdariya min ne ji kirina Şerîetê, lê ji baweriya ku bi Mesîh e, tê. Ev rastdarî ne ji min e, ji Xwedê ye û bingeha wê bawerî ye.

Fersenda ku me Îsa weke efendiyekî nas kiriye, ji bo me tişta herî mezin e. Li şûna ez Wî hîn bêtir ji nêz ve nas bikim, gava ez xwe dirêjî telefona xwe dikim û vê hildibijêrim, bi vî awayî ez ya kêmtir hildibijêrim. Naskirina Xweda, ji nasîna ku mirov ji aliyê mirovan ve bê naskirin, pir baştir e.

## *Xwepêşniyarkirin*

Baş e, îcar xwepêşniyarkirina xwe bi xwe? Carcaran çi eyba tiştên ku "me" kirine em pîroz bikin, heye? Belê, demeke ku em pêşketinê pîroz bikin û jê re li çepikan bixin, heye. Lêbelê gava em bi awayekî weke ku serkeftineke şexsî ye nêzî tiştên ku bê beramber dane me, dibin; pirsgirêk tê wê rewşê ku em hew dikarin ji nav derkevin. Fêkî digihêje, xelat tên kirîn û em tenê kahyayên ku bi vî awayî xelat emanetî me kirine.

Hin mirov xwedî xweşikbûneke ecêb in. Hin kes di malbatên pir dewlemend û xwedî navûdengekî pir mezin de tên dinyayê. Kêm kes jê jî xwediyê van her du rewşan in. Lêbelê kesên ku tam berevajî van şert û mercan in jî hene û di nava vê rewşê de tên dinyayê. Ev kes di nava feqîriyeke pir dijwar de ne û di nava malbatên ku tu navûdengên wan tuneye de dijîn. Kesên ji xweşikbûneke fizîkî mehrûm hene. Gelek ji me di nava van her du seriyan de dimînin. Û dîsa jî dînamîkeke ji van jî di dawiya dawî de ew hêza wê tuneye ku hûn çîroka xwe binivîsînin an jî bandorê li nirxê we bike. Xweda li bejn û bala we nanêre... li dilê mirov dinêre. Dibe ku dewlemendiyên nifşekî baskan bi xwe veke û bifire lê dibe ku nifşa piştî xwe biterikîne.

Gava ez li vê dinêrim, ez difikirim ku ev ne rewşeke bi edalet e lê ez bi vê dizanim: Xweda bi edalet e. Bi hemû zordarî û avantajên canekî bê wê çawa di nava destên xwe de bipîve, dizane. Tenê ew mêzêna bêhîle di nava destên xwe de digire. Ha ev sedemeke din e ku divê em tu kesî nedin ber hev. Ji ber her tiştê di vê alema derbasdar de tê pîvan, rûyekî rastî yê ebedî heye.

Ev der ew dinya ye ku carcaran em dikevin cihên teng û ji bedêla Xweda em rîska ku mirovekî bi rûmet bikin, distînin. Û gava ev dînamîk tê berçavkirin, em reqabetên beradayî ava dikin. Em bi pêş de herin, perdeyê vekin û li parçeyê duduyan a ayeta 10:12 ya Korîntî II'yan binêrin:

> Ji xwe em newêrin ku xwe bi hinekên ku xwe tewsiye dikin re yek bigirin an jî rû bi rû bikin; lê ew ên ku xwe bi hev re dipîvin û xwe bi hev re rû bi rû dikin, bêfêm in.

Min ev kir. Ez difikirim ku me hemûyan ev kiriye. Me xwe pîva û xwe bi hinekan re da ber hev. Weke çawa kesên ku xwe bi hineke din re weke ehmeqan didin ber hev hene, îcar bi ser de kesên bêaqil ku dihêlin ev danberhevdan rê li ber tiştên ku Xweda dixwaze di jiyana wan de pêk bîne, qels û kêm bike.

Pozbilindî aliyekî spektrûmê bê denge dike û bê ewlebûn jî aliyê din kulek dike. Her du serî jî bi talûke ne. Tenê pîvaneke heqîqî heye: qralê qralan Mesîh e ku ew jî nayê pîvan. Tenê Ew pîroz, pak û bi qudret e. Em bi awayekî beredayî xeyal dikin ku gêrexur nêzî me dibe û em dişibin gêrikeke ku ji nava axa xwe hewl dide ku derkeve derve lê ya rastî di temamê vê pêvajoyê de gêrexur; li ber şêrê ku em di bin siya wî de sitirîne de, diricife. Em çiqasî bi hewldan bin an jî xwediyê pesindayînê bin, em nikarin xwe bidin ber Rebê me yê ku em ji nû ve çêkirine.

Ayeta din ya ku ez ê lê binêrim -Yûhenna 5:44:

> Hûn ên ku rûmetê didin hev û li rûmeta ku ji Xwedayê bi tenê tê nagerin, hûn çawa dikarin bawer bikin?

Hîn ku em li huzûra Xweda hatine vexwendin, îcar çima em dema xwe di ber dora reqîbên xwe de xerc dikin? Ez kengî destûrê bidin ku jiyana min ji aliyê mirovan ve bê pênasekirin, ez dibînim ku têkiliya min ya bi Bavê Asîmanî re qels dibe. Nêrîna min; di demeke kin de bi gotin û peyvên mirovan yên derbarê min de, xera dibû û ez nasnameya xwe ya ku Xweda diyar kiriye, ji bîr dikim. Ez carina meraq dikim bê çiqas encamên min hene yên ji ber tevgerên min yên li ser wan nafikrim û têgihiştina min ya bi sînor ya ez tê dernaxin.

Ez hêvî dikim ku hûn li ser tevgerên min yên wê sibehê bikaribin bikenin û hûn meylên xwe yên danberhevdanê ferq bikin. Eger ev ne bûyereke carekê tenê bûya ango tevgereke her roj bûya, wê pir westiyer bûya. Sedema ku danberhevdan di jiyana min de ne sabît e, ji ber ku mêrê min pir bi min dadikeve û hevalên min yên pir dilsoz hene, pêk tê.

## Gezkirin û Xwarin

Tora civakî rêyeke vexwîner e ku gelek mirov û dengan di jiyana we de li hev kom dike. Dibe ku ev tiştekî baş be lê di heman demê de gelek kesên ku ne dostên we ne dibe ku li we bike cîran. Eger hûn ji wan hez nekin, belkî jî wê tiştekî baş be ku hûn hin sînoran di nava xwe de deynin. Eger yek bi nefretê tije be, weke wan bersivê nedin, astê bilind bikin. Jiyana di bin xweşxwaziyê de, mafê ku em ji hev re ne baş bin nade me. Fermaneke “Xwe û cîranê xwe bide ber hev û her dem zanibe ku tu li pêştir î.” tuneye.

Pawlûs wisa dinivîsîne: “Çimkî tevahiya Şerîetê di gotinekê de, yanî di vê de temam dibe: «Wek ku tu ji xwe hez dikî, ji cîranê xwe hez bike.» Lê eger hûn hevdû gez bikin û bixwin, hay ji xwe hebin ku hûn ji aliyê hevdû ve neyên telefkirin.” (Galatî 5:14-15). Ev resmê li vir tê xêzkirin qet ne xweş e. Du kesên ku weke cenawerên bêhîs heta ku tune bibin her du jî gepa ji hev jê bikin, wê ji kesên weke me ku me Mesîh ji xwe re îlan kiriye, divê tu carî ji me re nebin model. Lêbelê hin blogên me û gotinên ku em di civatên elektronîk de dibêjin tam jî dişibin vê. Belkî ev qetlîam di telefona we de an jî di malpereke înternetê de bi çavan neyê dîtin lê di asta giyanî de teqez xwînê dirijîne. Berê tu kes evqasî bi rehetî xwe nedigîhand kesekî din. Lê aniha heta hûn li dora xwe dizîvirin hûn dikarin kesekî gez bikin û bixwin. Ne xweş e, ez dizanim ji ber ku min jî kiriye.

Tiştên ku ez dev wan dikim bi piranî hîn ew tiştên di nava min de ne ku divê ez li ser wan bixebitim. Eger kesek dest cihekî min yê hesas bide, refleksa min ya pêşî wê ew be ku ez birîna xwe biparêzim. Ez hîn bûm ku telefona xwe deynim û weke ku çekeke tije fîşek e jê dûr ketim.

Hin rojên mirovan çêdibin ku pir ne baş derbas dibin. Wan fêhm bikin.

Di navbera îlhamdayînê û gurkirina hesûdiyê de ferqeke pir mezin heye. Eynî weke vexwendina hundurû ya kesên din û hîskirina hin kesên din ku bi awayekî zaneyî li derve hatine girtin ku di navbera van her du rewşan de ferqeke mezin heye. Eger kesekî ku hûn li ser tora

civakî wî dişopînin û nebaşiya di nava we de şiyar bike, ji bedêla ku hûn wan sûcdar bikin belkî jî hûn gavekê bi paş de vekişin û divê hûn ji xwe bipirsin û bibêjin “Çima?”

Tişta ku dijmin ji bo nebaşiyê niyet dike, heta ku hûn hîn nebin ku Xweda dikare ji bo başiyê veguherîne tiştekî din, wê reqabet û qayiş we bişelihîne. Ayetên li jêr cih û warên bi qayiş û berberiyê tije ne, berçav dike:

> Heçî kirinên nefsê ne, ew eşkere ne: Ew fuhûşî, pîsîtî, şehwet, pûtperestî, sêrbazî, dijminahî, pevçûn, çavnebarî, hêrs, hevrikî, dubendî, partîkarî, zikreşî, serxweşî, kêfkirina bi harîtî û sefahet û tiştên wek van in. Wek ku min berê ji we re got, ez careke din dibêjim: Yên ku tiştên weha dikin, Padîşahiya Xwedê mîras nastînin. (Galatî 5:19-21)

Ya rastî gava ez van gotinan dixwînim, ez dixwazim bigirîm. Van rojan ev tevgerên ku Pawlûs ji bo me weke lîsteyê çêkirine, gelek ji wan xuya dikin. Û ez bi tiliya xwe dinyayê işaret nakim; Nameya Galatiyan bang li dêrê dike. *Çavnebariya* kesekî tê çi wateyê? Rêyek e ku mirov kesekî ji kesayetiya wî biqusîne. Wan ji takekesî û kesayetiya wan ya bêhempa, bêpar dihêle. Naziyan çavnebariya Yahûdiyan kirin û Almanan êdî ew weke ferdên ku di sûretê Xweda de nehatine afiradin dîtin… Berevajî vê ew weke ku nîjada Aryanan tesîl nakin dîtin û weke pirsgirêkeke giştî lê nêrîn. Mixabin, ev rê û rêbaz hem ji bo koman û hem jî ji bo kesan hîn jî têbikaranîn.

Mirov, pir zû serî li darizandin û navlêkirinê dixin. Dilê mirovan heye û we divê ferq bikin û we divê ferq nekin, peyvên elektronîk dîsa jî dilê mirovan diêşînin. Weke ku Aesop çavdêrî kiriye: “Tiştekî pir rehet e ku mirov ji mesafeyeke ewle wêrektiyê bike.” Piraniya tora me ya civakî “mesafeyeke ewle” ava dike. Ev dînamîk rêyekê li ber tirsonek an jî rexnegiran vedike ku kesên çavnebariya wan dikin bêbextiyan dixin hustiyê wan û zordariyê li wan dikin ku ev yek jî wan bi cesaret dike. Tiştên ku li vir dibêjin û dinivîsînin tu carî cesaret nakin ku rû bi rû ji kesekî din re bibêjin. Çima? Ji ber ku kesên hûn di çavên wan de hêsiran dibînin, zor e ku mirov wan weke robotan bibîne. Ji

xirîstiyaniyên ji rêderketî û heta bi fahîşeyan bigirin, min dîtiye ku gelek gotinên ne xweş ji hev re kirine… Di vê kêliyê de Şeytan dikene. Em karê wî çiqasî bikin, karê ku divê ew bike wê ewqasî kêm bibe.

## Erzşikerandin û Sererastkirin

Hin ji me dibe ku vê bibêjin: "Lê kesên ku bi xetere tevdigerin gelo divê eşkere neyên sererastkirin?" Temam, agahiya baş ev e ku rêyeke Xweda ji bo vê heye:

> Erzşikandina eşkere, Ji hezkirina veşartî çêtir e. Birînên dostan ewle ne, Lê maçên dijminan xapînok in. (Şîretên Silêman 27:5-6)

Gava ku erzşikerandina eşkere tê teşwîqkirin ev ayet dixwaze çi bibêje? Di vir de peyva sereke eşkere ye. Di îfadeyên weke dilên eşkere, destên eşkere û rûyên eşkere de pir baş tê fêhmkirin. Bê em çawa dixwazin kesên din me sererast bikin, divê em wisa sererast bikin. Weke îdeal, ji aliyê mirovên ku di nava min de tişta herî baş bibînin; dixwazim bêm sererastkirin.

Ev ayet; erzşikerandina di nava hevalan de dikirpînin, dibe ku ev kes rêberek, mamoste an jî karsazek be. Her cure erzşikerandin gava ku ji aliyê kesê we nas dike an jî ji kesekî ku jidil bi we dadikeve tê, dibetiya ku bandoreke baş li we bike mezin dibe. Ev hevdîtin eger rû bi rû bê kirin wê bibe îdeal. Eger hevpeyvîn rû bi rû pêk neyê, vêbijêrka piştî vê ya herî baş axaftina bi telefonê ye.

(Weke agahiyeke li teniştê, ez pêşniyar nakim ku bi rêya peyaman bê sererastkirin. Dibe ku di nava îfadeyan de gelek tişt winda bibin. Peyam zimanê bedenê û tona deng ava nakin. Gava ku min û John bi rêya peyaman bi hev re têkilî datanî, gelek tiştên xelet û pêkenokî hatin serê me. Yek ji me, bi piranî ez, gava ku peyvek ji bo KIRPANDINÊ bi herfên mezin dinivîsand, yê din ev weke QÊRÎNÊ şîrove dikir!)

Me hemûyan erzşikerandina veşartî tecrube kiriye, gava ku mirov bi dû we de hûn sererast kirin ev pêk tê. Gava ku mirovan pêdiviya we ya sererastkirinê bêyî we kir, divê hûn li jidilbûna erzşikerandinê bipirsin.

Di gotinên xwe de mafdar bin jî, eger tevlî pêvajoyê nebin wê alîkariya we ya mezinbûnê nekin. Ya rastî, ev erzşikerandên wisa zerarê didin pêvajoyê ji ber ku gava mirov bi dû we de dipeyivin, we dixin wê rewşa parastinê ku hûn bi vî awayî berteke bidin. "Erzşikerandina eşkere" ya dostekî jidil ku rû bi rû dike, fersenda ku her du alî bersivê bidin hev û hev du sererast bikin, dide.

Sererastkirina kesekî ya di ser rêya tora civakî re, ji ber ku ji her kesî re vekiriye ev nakeve nav erzşikerandina eşkere. Hevalên min yên xweşik û bihêz ku ji wan hez dikim û rêzê ji wan re digirim, hene. Em bi van kesan re ewqasî nêzî hev in ku ez dizanim bê jiyana xwe çawa berdewam dikin. Ev havalên min yên ku ji Xweda ditirsin; ji bedêla ku xemê wan kêm bikin, ji aliyê mirovên rastiyan berevajî dikin ji bo wan birîndar bikin ku tu carî nêzî wan nabin, min dît ku van kesan êrîşî wan kiriye. Pirtûka Pîroz di vê mijarê de pir eşkere ye:

> Piştî ku te carek du caran şîret kir, xwe ji mirovê cudaker dûr bixe. Tu dizanî ku yekî weha ji rê derketiye, gunehkar e û wî bi xwe, xwe sûcdar derxistiye. (Tîtos 3:10-11)

Blogên kesên wisa nexwînin, tevlî nîqaşên wan nebin, hesabê wan yên Twitterê neşopînin, di ser Facebookê re bi wan re nebin heval… Tu tiştî nekin. Wê ev ji bo we ne baş be. Nedûn dû parçekirinê, li îlhamê bigerin.

Di pêvajoya jiyanê de hevalên min kêm bûn lê bêtir yên heqîqî man. Hevalên min nîşanî min dan bê ez dixwazim bibim kî, dijminên min jî eşkere kirin bê ez naxwazim bibim kî. Rewşeke ku reqabetê gur dike, di serî de dibe ku tişta di nava me de ya herî nebaş derxîne holê. Gava ku em dikevin rewşeke têkçûnê, dibe ku Xweda midahalê bike û ji bo karekterê di nava me de bi pêş bixe dibe ku zoriya me bi kar bîne. Ayeta 7an ya beşa 27an ya Şîretên Silêman rêyeke baştir pêşkêş dike:

> Kesê têr hingivê jî naxwaze, Lê ji kesê birçî re xwarina tehl şîrîn e.

Di jiyana xwe de ez bêtir birçiyê ku hilberîna Giyan bibînim. Hîn bêtir birçî me ku mezintir bibim. Her ku nêzî Xweda dibim, ez di nava xwe de hîn bêtir dibînim ku jiyana Wî dibe sedemên çi. Di jiyana min de hin tiştên herî xweş hevalên min in, yên ku bi min dadikevin û min bi rastiyê birîndar dikin. Dibe ku dijminên me, me bêrûmet bikin an jî bi derewan me birîndar bikin. Bi lîste an jî danberhevdanên ku mirovan çêkirine, divê dilê me nekeve cih. Gava ku me êşên kêmasiyê yên ji ber reqabetê pêk tên an jî xwe ecibandina ji ber pozbilindiyê û îzalosyonê me ferq kirin, em çongên xwe bişkînin. Eger em herin cem Bavê xwe, çi tiştên ku me ji nêzîkatiya Wî dûr dixin, wê pir zewqê jê bistîne ku van tiştan ji holê rake.

## Pirsên Nîqaşê

1. Qet tu nav li we hatine kirin an jî hûn ji rêzê hatine hesibandin? (Ji aliyê cinsî, nîjad an jî ji aliyê temen ve dibe) Van navlêkirinan hûn çawa bi sînor kirine? Hûn çawa dikarin xwe ji vê beşkirinê xelas bikin?
2. Danberhevdan di kîjan qadên jiyanê de kêfxweşiya we ji we didize?
3. Gava ku me xwe weke hinekan dît, xwe da ber wan û me xwe pêşniyar kir; di rastiyê de ev işareta çi tişta di kûrahiyê de ye? (Binêrin: Şîretên Silêman 29:25)
4. Tora civakî îlhamê dide we an we li hemberî hin tiştan tûj dike? Ji bo bandoreke avakariyê pêk bîne, hûn dikarin kîjan gavan bavêjin?
5. Ferqa di navbera nêzîkatî û motîvasyona erzşikerandina eşkere û veşartî, diyar bikin.

5

# Gava Reqîb Hat Dîtin

Di hin astan de muxalefet pir bi kêrî mirovekî tê. Bafirok ne bi ba re, gava li hemberî ba disekinin bilind dibin.

LEWIS MUMFORD

Berî bi çendakî ez bi hevaleka xwe ya nêz re bi telefonê dipeyivîm. Mêrê wê muzîsyenekî jêhatî ye û çêkerê muzîkê ye jî. Ew bi xwe jî xizmetkareka bi hêz e û ji her awayî yeka bêhempa ye. Min ew her dem weke kesên pak, dilnizm û azwer nas kirin lê di van demên dawî de dev ji gelek tiştan berdan. Bêbextî li wan hatkirin, hatin qewirandin û bi awayekî neheqî hatin darizandin.

Hevala min ji min re ev gotin “Em pîs û nebaş kirin...” û di vir de navê hin kesên derdikevin pêş diyar kirin. Min guhdar kir. Min fêhm kir. Piştre min nema dizanîbû çi dibêje ji ber ku êdî min nema didît bê dev ji çi berdane an jî aniha li kuderê ne disekinin. Min dît bê pêşeroj wan ber bi kuderê ve dibe. Ez pir bi kelecan bûm û peyv ji devê min rijiyan: “Ev baş e! Ji bo wan divê tu spasiya xwe ji Xweda re bike. Tevgerên wan yên xelet, hişt ku hûn bibin ev kesên aniha.”

Fêhm bikin, tişta min pîroz dikir ne ew bû ku neheqî li wan hatibû

kirin. Tişta ku van jin û mêran dît; berteka ku dan neheqiyê bû sedem ez bibînim ku pêşeroja wan xweş û geş e.

Helbet gava mirov li derveyî meseleyê be û ji derve ve li hundurû binêre û van bibêje, pir rehet e. Ji bo min jî wisa bû. Piştre min xwe jî tevlî pîrozbahiyê kir û min ev got: “Di jiyana xwe de ji bo muxalefeta reqîban ez hîn bûm ku heta tu bêjî bes *minetdar* bim.”

Tişta ku wê rojê tam pêdiviya min pê hebû ev axaftin bû. Rojeke ku ji bo min jî zor bû, ez di rojeke wisa de bi ceger kirim. Ez hêvî dikim ku neheqî li tu kesî ji me neyê û em weke kesên rêya xwe şaş kiriye neyên bi navkirin. Eger hûn di rêyeke wisa re derbas bibin hûn ê zanibin ku êşê dide mirov.

Lê devjêberdan û li şûna di nava bêçaretiya ji ber têkçûna wêrektiyê de, ez hîn bûm ku li paş xwe binêrim û dilsoziya Xweda ya bê dawî bibînim. Her cara ez fikirîm ku ez ê hew karibim rojekê din jî îdare bikim, vê rewşê ez hinekî din bi pêş de birim. Derbarê dilsoziya Xweda de, ji hevalên xwe bêtir ez ji dijminên xwe hîn bûm. Ez ê tiştekî hîn mezintir bibêjim; derbarê xwe de ji hevalên xwe bêtir ez ji dijminên xwe hînî gelek tiştan bûm.

Heval ji we re parastgehan ava dikin. Ev tiştekî baş e lê her dem ne ew dînamîkên esas in ku pêşketinê teşwîq bikin. Gava ku heval dixwazin we ji ba û bahozên jiyanê biparêzin, îcar dijmin ji bo we li ber baranê şil û pil bikin çi ji destên wan tê dikin. Lê îcar Xweda, eger dixwaze hûn bizanibin ku di van demên wisa de ew parastgeha dawiya dawî be? Naxwe wê kîjan bibe perwerdekarê herî baş, reqîb an heval?

Kesên reqîb rastiyeke jiyanê ne. Ez dizanim. Xemgîn im. Ez jî ji vê hez nakim lê ev rast e. Lêbelê hebûna reqîban ne bê armanc e. Avakirina jiyaneke bêreqîb nayê wê wateyê ku hûn di jiyana xwe de reqîban ji holê radikin. Berevajî vê, armanca Xweda ew e ku gava ji bo hişyarkirinê bang li me kir, divê em bizanibin ku ji bo qenciya me derbarê her tiştî de bi me re dikare bixebite. Dînamîka reqabetê em dikarin ji bo pêşketinên hîn mezintir û ji bo têgihiştina fikran weke teşwîqekê bi kar bînin.

Bi nêrîneke rast û baş re; reqîbên me dikarin bihêlin em aliyên xwe

yên qels kifş bikin û ji bo em aliyên xwe yên bi hêz jî bi pêş bixin dikarin erka katalîzorekê hilgirin ser pişta xwe û gefan li me bixwînin. Me ber bi aliyê din yên sînoran ve dahf didin û gava em xwe tenê hîs dikin dihêlin em li jor binêrin.

Belkî jî di hişê we re ev derbas dibe, bise berî deqîqeyekê keliya din te ji min re gotibû ku tu keçikeke bêreqîb î, te got tu mîrasgerê sozeke bêreqîb î û te got tu ji bo Xwedayekî bêreqîb bihebînî hatiyî afirandin.

Hemû rast in. Hûn di çavên Xweda de keçikeke bêreqîb in. Divê hûn xwe bi Afirînerê xwe re ji aliyê *têkiliyê* ve wisa bibînin û nêrîna we ya bê hûn ê bi kesên din re çawa têkiliyê deynin, ev e. Lê gava em weke ku reqîb tunene tevbigerin û em ferz bikin ku soz bêyî şer tên bi dest xistin, wê demê em ê xelet bikin. Gotina "Roniya dinyayê hûn in" (Metta 5:14) hebûna tarîtiyê înkar nake. Çawa ku hûn dibêjin ez ronî me û ev nayê wateya ku hûn ê bi tarîtiyê re rû bi rû nemînin, îcar çawa ku hûn keçikeke bêreqîb in jî ev nayê wateya ku hûn ê tu carî bi reqîban re nekevin rûyê hev.

Peyva *reqîb* bi sê awayan berçav dibe: nav, hevalnav û lêker.

Qaîdeyên bingehîn yên gramerê gava ku behsa reqîb dike ji me re behsa kesekî, cihekî an jî tiştekî dike; û çawa ku dikare kesekî, cihekî an jî tiştekî pênase bike û di heman demê de weke dawî dikare *çalakiyên* kesekî cihekî û tiştekî bîne ziman. Peyva *reqîb* ya nav; dibe ku wekheviyekê, mînakekê an jî ji termên sivik yên ku bêşbazekî diyar dikin ber bi termên dijber, dijmin an jî nasekî ve diçin, hildigire ser pişta xwe û bi vî awayî dirêj dibe. Peyva *reqîb* ya di halê hevalnavê de; ji zehmetbûna ku mirov bi hevalekî re dikeve nava zehmetiyan bigirin, heta têkoşîna bi dijminekî re dirêj dibe û hemûyî di xwe de dihewîne. Û ya dawî, peyva pênaseya *reqîb* ya di halê lêkerê de; ji danberhevdan, şibandin an jî peyva weke hevcotkirinê ku bêtalûke ne bigirin, heta bi ber lêkerên bitalûke yên weke liberderketin, serdestkirin û biserketinê dirêj dibe û diçe.

Reqîb rast in. Bêguman aniha jî hin kes *we* weke reqîbê xwe dibînin lê hûn ne di ferqa vê de ne. Gelek mirov heta ku di nava têkiliya spor, akademî, dinyaya şanedanê, fûarên zanistê an jî di nava têkiliyeke

hilbijartinê de bi hev re nekevin pêşbirkekê bi hev re bi awayekî eşkere nakevin nava reqabetê. Gava hûn diçin kar, hûn li hemberî xwe ne li bendî reqîban in an jî li dêrê hûn nafikirin ku hûn ê li hemberî xwe reqîban bibînin! Lê reqîbên me di jiyanê de li her deverî derdikevin pêş me û kontroleke we ya pir biçûk heye bê wê mirov we çawa bibînin û li we binêrin. Xemgîn im. Ji bo li ser navê we bi mirovan re hevkarîgeriyê ava bike, hûn şîrketa PR'yê ya herî baş bigirin jî, dîsa jî hûn ê tenê têgihiştina wan bi rê ve bibin. Hûn çiqasî zû vê qebûl bikin ewqasî baş e. Ya baş ev e ku hûn xwedî kontroleka tam in ya derbarê mirovên din de bê hûn ê wan çawa bibînin. Û hin dem hene ku hûn nêrîna xwe ya derbarê kesên din de biguherînin û ew jî nêrîna xwe ya derbarê we de biguherînin. Di beşa pêş de ez ê derbarê vê mijarê de bipeyivim.

Motîvasyona reqîbekî çi dibe bila bibe, hûn dikarin reqabetekê ber bi aliyê xwe ve veguherînin. Hemû tişta ku divê hûn bikin, derbarê kontrolê de du tiştên bingehîn di bîra xwe de bigirin:

1. Hûn nikarin kontrola kesên din bikin; bê çi dibêjin, çi difikirin, çi dikin an jî çi hîs dikin. Û hûn ji vê ne berpirsyar in.
2. Hûn dikarin kontrola bê hûn çi dibêjin, çi difikirin, çi dikin an jî bê hûn çi hîs dikin, bikin û ji van hemûyan hûn berpirsyar in.

Em hemû dizanin bê wê reqîbên me çi bînin serê me lê di vê beşê de ya rastî ez dixwazim berçav bikim bê reqîbên me wê ji bo çi bikin.

## Reqîb Hêza Xweda Diyar Dikin

Mûsayê gava çêbû hat veşartin, yê ku ji aliyê malbata qral ve hat dîtin û li saraya firawîn mezin bûye; hîn di serî de jiyaneke wî ya ecêb hebû. Xweda wan bandoran ji bo jiyana Mûsa biparêze bi kar anîn. Lê eynî weke me Mûsa jî hînî vê dersê bû: *Qedera me ji demên rehetiyê pirtir, di demên têkoşînê de derdikeve holê.*

Di encama ku Mûsa hemû kar xistin destê xwe de, ji gelê xwe û

ji hemû tiştên ku heta niha dizane, bi surgunê re ango di ser rêya zor re hînî van bû. Ez xeyal dikim ku dema li beyebanê derbas kiriye dişibe bêhvedanekê ya koçberiyeke dirêj. Piştre gava li beyebanê weke penaberekî dijiya Xweda bang wî kir. Di vir de dersek heye. Eger di paşerojê de we karek xelet kiribe ev nayê wê wateyê ku hûn ê di pêşerojê de destê xwe navêjin wî karî. Haya Mûsa jê hebû bê jiyana wî ji bo çi tê texsîrkirin û xwediyê wê hîsê bû bê Xweda dixwaze wî bike çi û ji bo bibe kî bang li wî dike lêbelê ne xwediyê karekterê xelaskerekî bû. Divê Xweda di nava Mûsa de binyadeke kûr avabikira û bi jiyaneke ku wê li sarayê derbas bikira ev ne pêkan bû. Xweda bi tiştekî ku rojekê em ê pê re rû bi rû bimînin me bi dizîka amade dike. Û rojekê Mûsa weke kesekî ji nû ve çêbûye li xwuşk û birayên xwe Harûn û Miryam û gelê Îsraîlê vegeriya. Piştî ku dema wî hat Xweda ew weke xelaskerekî û weke peyamberekî ku wê derkeve hemberî firawûn ew mesih kir.

**Qedera me ji demên rehetiyê pirtir, di demên têkoşînê de derdikeve holê.**

Xweda; bi awayê ku Mûsa şand cem reqîbê wî firawûn, hindik mabû jê re ku wî li dinyayê bîne asteke pir bilind. Gava ku Xweda Mûsa şand cem firawûn, jê re anî ziman ku wê li gotina wî guhdar neke:

> Her tiştê ku min ji te re got, ji birayê xwe Harûn re bibêje. Bila Harûn ji Firewn bixwaze ku ew Îsraîliyan ji welatê xwe berde. Lê ezê dilê Firewn hişk bikim û nîşan û kerametên xwe li welatê Misrê zêde bikim. Gava Firewn guhdariya we neke, ezê destê xwe deynim ser Misrê û bi giranî ceza bikim. Ezê gelê xwe yê Îsraîlî ref bi ref, ji welatê Misrê derxim. Gava min destê xwe dirêjî Misrê kir û gelê Îsraîl ji nav wan deranî, wê Misrî bizanibin ku Xudan ez im.” (Derketin 7:2-5)

Di vê peywira ku dişibe mîsyoneke mahkûmî tekçûnê de, armanceke Xweda hebû. Tekane sedema ku firawûn di vê asta herî bilind de bû, Xweda li ber çavên hemû gelê dinyayê bilind û mezin dikir:

> Çimkî min destê xwe dirêj bikira, bi kulê tu û gelê te ceza bikira, wê lingê te ji ser erdê bihata birîn. Lê ji ber van sedeman min destûr da ku tu bijî: Ji bo hêza xwe nîşanî te bidim û tevahiya dinyayê navê min bizanibe. (Derketin 9:15-16)

Reqîb hêza Xweda berçav dikin. Têkoşîna bi Misrê re hat kirin; xizmet ji gelekî pûtperst yê ku di nava zilmê de bû kir û dîsa xizmet ji gelekî ku Xweda'yê xuya nedikir diheband ku hişt bilind bibe û bê ferqkirin re kir. Xweda aniha ji bo we û yên din ji bin tundiyê xelas bike û destê xwe yê li ser jiyana we nîşan bide, gelo dibe ku kîjan pevçûnê bi kar tîne? Li hemberî qedera we bê çi şer dike bi baldarî lê binêrin û di jiyana we de reqîbekî weke xelatekê heye an tuneye, baş lê binêrin.

Kê Qral Dawid bi navûdeng kir? Pêxemberekî, bavekî an hevalekî? Na, ew kes reqîbek bû: Golyat.

Eger bi reqîbekî Filîstînî re neketaya şer, dibe ku Dawid li beyebaneke nebihîstî bimaya. Çawa be jî ji heyşt birayan yê herî ciwan bû. Her çiqasî Dawid, ji aliyê pêxember Samûel ve weke qral hatibe mesîhkirin jî, berî ku bibe qral bi gelek reqîban re mecbûr ma ku şer û pevçûnê bike. Mesîhkirin we dineqîne lê şer û pevçûnên bi Golyat re we bi cih dike.

Gava ku Golyat xwe li qada şer da nasîn, bêguman hêvî dikir ku wê bi Saûl re bê hemberî hev. Saûl; weke Golyat ne girs û mezin be jî şampiyonê Îsraîlê bû û şervanekî bi tecrube bû. Pirtûka Pîroz dibêje ku qama Saûl bi hostekê di ser ya hemû Îsraîliyan re bû. Pisporên Pirtûka Pîroz texmîn dikin ku qama Saûl di navbera 1.80 cm û 2 metreyan de bû. Îcar ji aliyê din ve, ango qama Golyatê weke dewekî di ser 2.70 cm.yî re bû.

Bi her awayî Golyatê şervan bi ser serê Qral Saûl diket. Qral Saûl jî bi ser serê Dawidê şivan diket. Lêbelê Dawid xwediyê tiştekî bû ku qama wî telafî dikir. Xwediyê "mêrbûna" Dawid bû. Gava ku kesek xwediyê "mêrbûnê" be, ev tê wê wateyê ku ew kes mêrxas, biceger, bi biryar û bi israr e. Li gorî xebateke ku di nêz de hatiye kirin, têgeha "mêrbûn"ê; li akademiya leşkeriyê ya West Poîntê, di mijara diyarkirina bê wê kîjan

leşker mezûn bibin de ji notên SAT'ê an jî ji nîşaneya rêza akademiyê pir baştir e. Xebat di heman demê de bandorkera mêrbûna şexsî ji 1ê heta 5an rêz dikir ku nirxandineke şexî di xwe de dihewand.

Ez jê bawer im ku bejna Dawid herî pir 1.60 cm e. Eger mirov ne xwediyê mêrbûneke cîdî be, bi şêr an jî hirçekî re şer nake. Xwediyê wê asta mêrbûnê bû ku li encama gava ku bi dêwekî re şer bike wê çi bibe, ne dinêrî. Her çiqasî bejna Saûl dirêjtir be jî, ez bawer im ku ji aliyê mêrbûnê ve ji Dawid kintir dima. Kesek ne mêr be nikare bibe afsaneyek. Di şerekî de gava ku hêz weke hev bin tiştekî ku bibe destan tuneye. Li gorî ku tu kesê li wir dernediket hemberî Golyat, naxwe newekheviyeke mezin hebû. Ji bo Dawid mezin bibe reqîbekî gelekî tirtire jê re lazim bû. Şohreta şervanê bi navûdeng Saûlê diltirs û tirsa ku şampiyonê Filîstîniyan ava kiribû, hişt ku Dawid bibe şervanekî bêreqîb.

Nivîskarê pirtûka bi navê *David and Goliath* (Dawid û Golyat) Malcolm Gladwell, li ser vê mijarê bi awayekî zîrek disekine:

> Li dinyaya me gelek tiştên bi qedir û qiymet ji vê rewşa ne weke hev pêk tên ji ber ku çalakiya tişt û zordariyên ku qeweta me nagihêje wan û em bi wan re rûbirû dimînin, mezinbûn û xweşikbûnê ava dikin… Bûyîna kesê ku zilm lê tê kirin gelek caran bi rêyên ku em naecibînin re dibe ku mirovan biguherîne: Dibe ku deriyan veke, fersendan çêbike, perwerde bike, bi pêş bixe û berevajî vê dibe ku tiştên nayê bîra mirov pêk bîne.

Gava ku we li hemberî reqîbekî zehmet cihê xwe girt, du rêyên we hene: An hûn ê teslîm bibin û stûyê xwe li ber bitewînin an jî hûn ê li ber xwe bidin û bang wî tiştê hîn mezintir yê di dilê xwe de bikin. Dawid; xwe ji kêmxistina zirxa Qral Saûl daweşand û bang li navê Xwedayê wî kir:

> Dawid ji Golyat re got: "Tu bi şûr, mertal û riman bi ser min de têyî. Lê belê ez, bi navê Xudanê Karîndar Xwedayê Artêşa Îsraîliyan ku tu gef lê dixwî, bi ser te de têm. Îro wê Xudan te bide destê min. Ezê

> te bikujim û serê te ji gewdeyê te veqetînim. Ezê bedena leşkerên Filîstî jî bidim teyrên ezmanan û heywanên çolê! Bi vî awayî wê dinya bizanibe ku Xwedê li Îsraîlê heye. (Samûêl I, 17:45-46)

Golyat, ne tenê ji bo qedera wî Dawid bi cih kir lêbelê bi xêra serketina li hemberî Filistîniyan, hemû dinyayê fêhm kir ku destên Xweda li ser serê Îsraîlê ne. Eynî weke Dawid hûn jî ji bo li ser navê Xweda hûn şohretê bi dest bixin, hûn pir dilxwaz in. Lêbelê li dinyaya me Golyat hene. Ev gefan li me dixwin û li hemberî hebûna Xwedayê me derdikevin. Ev dewên wisa li dibistanê, li cihê kar û li raya giştî zordariyan dikin. Dem ne ew dem e ku em xwe li pişt keviran veşêrin, dem dema ku em xwe bi Gotina Xweda bidin pêş. Hûn bi giyanê ku Mesîh ji mirinê şiyar kir, tije ne. Reqîbên we dixwazin li gorî şertên xwe û li hemberî hêza we şer bikin. Divê hûn wisa nekin. Divê hûn ji vê mezintir bibin. Weke zarokên bêreqîb şerê we yê li hemberî zordariyê baş e. Di dawiya dawî de ev ne ji bo mezinbûna me ye, her tişt ji bo Wî ye.

Golyat, navûdeng bi Dawid xist. Dibe ku tora civakî kesekî bi navûdeng bike. Lê şohret kesekî nake qral. Eger bi awayekî şaş bê bikaranîn, şohret; li şûna ku xizmetkaran bike avahî, wê dîktatorên ku ji xwe pê ve li kesî nafikirin ava bike. Xweda; rêberekî bêewle yê weke Saûl ku bi rêve dibir, nema xwest. Li kesekî ku Wî bihebîne û bi awayekî eşkere hêza xwe jê re diyar bike, geriya. Em ji bo qralan û Xwedayê xwe weke civateke kahînan hatin peywirdarkirin. Girêdana me divê ne ji ber populerbûna mirovan be, divê ber bi Xweda ve be. Dawid ji Xweda tirsiya lê Saûl ji mirovan tirsiya.

Aliyê din yê şohretê ew e ku mirov xwedî heyranan be; ne xwedî xwendekar an jî şopîneran be. Dibe ku heyran li mirov biqulipin. Kêliyekê ji we hez dikin û kêliya din te dît ku nefret ji te kirin. Pêdiviya Qral Dawid bi heyranan tunebû. Pêdiviya wî bi kesên ku xwe di ber wî de bikujin hebû. Pêdiviya qralên ku ji Xweda ditirsin; bi şêwirmendên zane, bi artêşeke bêtirs û bi xizmetkarên sadiq heye. Ji bo kesên bi vî awayî ber bi xwe ve bîne, pêdiviya Dawid hinekî bi pakbûnê hebû. Xweda, ji bo Dawid amadeyî qraltiyê bike wê reqîbekî din derxistaya hemberî wî.

## Reqîbên We Qedera We Diyar Dikin

**Wê reqîb bi ser we bikevin... An ya baş wê we derxînin derve?**

Hêza reqîbên we heye ku we ji nediyariyê derxînin an jî we ji cihê we yê bilind daxînin erdê. Ya baş, hilbijartin ya we ye bê wê reqîbên we di jiyana we de çi hilberînin. Wê reqîb bi ser we bikevin... An ya baş wê we derxînin derve? Ha ji ber vê yekê dibe ku reqîbên we qedera we diyar bikin.

Dawid Xweda weke kurekî û şivanekî nas kiribû. Gava ku li dora wî mîh hebûn, li bin asîmanê Rojhilata navîn ya bi stêrk Xweda hebandibû. Li çolterê bi şêr û hirçê re şer kiribû û mîhên xwe xelas kiribûn. Îcar aniha Dawid weke ku heywaneke dirinde êrişî wî kiribe û hatibe dûrxistin wê fêhm kiribûya bê tê çi wateyê.

Qral Saûl, namzetekî baş bû ji bo Dawidê bi ceger ji huzûra gel ber bi huzûra Xweda ve bibe, wê Dawid li wir bihata mesihkirin û wê qedera qraliyetê li wir derketa holê.

Têkiliya Saûl û Dawid weke ku bi dawî bibû nehatibû destpêkirin. Ji pêşî ve Saûl ji Dawid hez kir û ferq kir ku destê Xweda li ser jiyana wî ye. Gava ku Saûl xwe qels hîs dikir û êş dikişandin, Dawid nêzî xwe kir û meseleyên derbarê qraliyetê de emanetî wî kirin. Ayeta 18:5 ya Samûêl Iê ji me re wisa dibêje:

> Dawid her cihê ku Şawûl jê re got here, diçû û serfiraz dibû. Şawûl ew kir yek ji serleşkerên xwe. Ev bi dilê tevahiya gel bû. Leşkerên Şawûl jî jê razî bûn.

Saûl genarelekî ji wî baştir nedidît. Û gava ku giyanekî ne baş Saûl aciz dikir, Dawid ji bo giyanê wî bitepitîne li lîrê dixist û stran digotin. Heta ku Qral Saûl rojekê straneke nû bihîst her tişt normal bû. Bêguman hûn bi çîrokê dizanin:

> Dema ku Dawid Golyatê Filîstî kuşt, di vegerê de ji hemû bajaran jinên Îsraîlî bi def û tembûrên xwe yên sê têlî, bi kêf û şahî, bi

> govend û stranan pêşwaziya Şawûlê Padîşah kirin. Diketin govendê û digotin: "Şawûl kuşt bi hezaran, Dawid kuşt bi deh hezaran." Gava Şawûl bihîst hêrsa wî rabû. Di dilê xwe de got: "Deh hezar dane Dawid, lê hezar dane min. Hew maye ku padîşahiyê bidinê." Ji wê rojê ve Dawid li ber çavê Şawûl reş bibû. (Samûêl I, 18:6-9)

Van her du zilaman tam di van hejmaran de mirov ne kuştibin jî, Saûl ji ber vê danberhevdanê dilê xwe hişt. Te digot qey stranên jinan ji nişka ve çavên Saûl vekirin û piştre devê xwe vekir û derbarê dawiya xwe de pêxembertî îlan kir. Jinan ev stran weke ku wî diricimînin digotin lê ev stran ji bo Saûl ne xweş çêbû. Kêr gîha hestî. Gelek sal di ser gotina pêxember ya ku ji Saûl re gotibû wê qraltî jê bê stendin, derbas bibûn. Samûêl diyar kir ku qraltî jê hatiye stendin û daye yekî ji wî çêtir (Samûêl I 15:28). Bi vê stranê re jiyana Saûl jê hatibû stendin. Di nava saniyekê de hîs kir ku li şûna wî Dawid weke qral hatiye tayînkirin. Lêbelê tu niyeta ku Saûl tunebû ku bi awayekî aştiyane xwe bide aliyekî.

Eger hûn di nava bêewlebûnê de li ber xwe didin, wê demê bi danberhevdaneke neyênî dibe ku hevalek ji we re bibe reqîbek. Saûl; êdî Dawid weke serkeftinekê ji xwe re nedidît. Dawid êdî ji bo wî tehdîtek bû û her tişt di şevekê de berevajî bibû:

> *Dotira rojê Xwedê ruhekî xerab bi awayekî xurt bi ser Şawûl ve şand. Di malê de bêhemdê xwe dipeyivî. Dawid wekî her car li çengê dixist. Di destê Şawûl de jî rimek hebû.* (Samûêl I, 18:10)

Ev ayet têgihiştina me ya teolojîk hinekî tevlihev dike û ji bo me hemûyan rêya bîranînekê vedike… Xweda ji bo ku armanca xwe pêk bîne çi tiştên dixwaze dikare bi kar bîne. Di vê rewşê de, ji bo zorê bide sînorên qralekî hesûd, giyanekî ku zilmê lê bike şand.

Wê rojê Dawid weke her roj karê xwe yê her dem dikir û li lîra xwe dixist lêbelê aniha di destê Saûl de tiştekî cuda hebû ji ber ku di dilê wî de hin tişt guherî bûn:

> *Şawûl ji nişkave bi armanca ku Dawid bi dîwêr ve bimîxîne, rima xwe avêtê. Lê Dawid du caran xwe ji ber da alî.* (Samûêl I, 18:11)

Tezata di vir de di serê xwe de xêz bikin. Gava ku Dawid di nava huzûrê de li enstrumana xwe ya hebandinê dixe, Saûl bi çeka xwe û li mala xwe weke bahozekê xwe winda dike û hêrs dibe. Dibe ku tezat ji vê xerabtir bibe gelo? Kî li mala xwe di destê wî de bi rimê digere? Saûl bibû barbarek.

Gava ku derbarê şûran de min nivîs dinivîsandin, di mala xwe de li hin cîhan min hin şûr veşartibûn lê kêm caran min radihişt wan. Di rojên ku hormonên min gur dibûn de jî min newêrîbû rahijim yekî. Ji ber ku di kêliyên ku mirov di bin tundiyê de ne, çi di nava destê wan de be dixwaze bavêje yê hemberî xwe (ji ber ku xwedî tecrube me dibêjim). Dawid, ji ber zilamê ku hîn çend roj berê di şer de piştgiriya wî dikir û pê re hespa xwe dida çargavan, mecbûr mabû ku jê bireve. Rewşa Dawid ya herî baş, rewşa Saûl ya herî xerab diyar dikir û hîsa ku hişê Saûl dixwar, tam veguherîbû giyanê tirsekê.

> Şawûl ji Dawid tirsiya, çimkî Xudan pê re bû lê ji Şawûl dûr ketibû. Şawûl Dawid dûrî xwe xist û ew kir fermandarê hezar leşkeran. Êdî Dawid bibû pêşengê leşkeran. Dawid di her karî de serfiraz dibû. Çimkî Xudan pê re bû. Şawûl dît ku ew gelek serfiraz e. Loma jî jê bêtir tirsiya. (Samûêl I, 18:12-15)

Serkeftinên leşkerî yên Dawid, divê weke serkeftinên Saûl bihatana pîrozkirin. Lê Saûl; li şûna ku camêriya Dawid ji qraltiya xwe re weke ewlehiyê bibîne, ferz kir ku bi her serkeftina Dawid re raya wî winda dibe. Êdî Dawid ne weke kurekî dît û nejî bi hevaltiya wî re dilê xwe xweş kir. Nedixwest çav bi Dawid bikeve. Lê ne tenê bi vê fikrê ma. Wî nebîne jî ji hişê wî dernediket. Qral Saûl, bi hêviya ku Dawid bimire ew dişand şeran. Lêbelê careke din ev kirina wî hişt ku Dawid hîn bêtir bi navûdeng bibe. Gava ku Saûl hewl dida ku wî bitemirîne, Dawid hîn bêtir bilind dibû.

> *Şawûl dît ku Xudan bi Dawid re ye û keça wî Mîkalê jî jê hez dike. Şawûl piştî vê yekê ji Dawid zêdetir tirsiya. Ji wê rojê pê ve herdem dijminatiya Dawid kir.* (Samûêl I, 18:28-29)

Di demeke pir kin de fikra Saûl ya derbarê Dawid de, ji şikê veguherî tirsê û piştre veguherî nefretê. Kurikê rêzdar, lehengê qada şeran û Dawidê ku weke piştgirekî dihat dîtin, êdî tunebû. Dawid êdî weke qaçaxê qanûnê dihat binavkirin. Ew dema kin ya ku li saraya Saûl li kêfa xwe dinêrî bi dawî bibû. Her çiqasî tu tawanbariya wî tunebe jî ji ber vê guherîna Saûl, ji bo canê xwe xelas bike reviya.

Piştî ku Dawid ji saraya qral veqetiya û şûnde, serdemeke nipînû di jiyana wî de dest pê kir. Ev serdem berevajî statu û xelatan; her dem dihat redkirin, tevgeren eletewş dikirin û li çolteran talûkeyên mezin dihatin serê wî. Hin pispor dibêjin ku ev serdem nêzî heyşt salan berdewan kiriye. Dawid; dersên amadekariyê yên ji bo ku bibe qralekî li gorî dilê Xweda, li erdên bejî û qelaç û gava ku li surgunê bû, stendin.

Dawid ji ber gurekî har ku dida dû wî, ji vê şikeftê direviya wê şikeftê. Gava Dawid bihîst ku Saûl ji bo alîkariya wî kirine malbat û kahîn qetil kirine, xemgîn bû. Di nava salên bi êş û elem de reqebeta Saûl ya bi Dawid re, hînî Dawid kir ku çi li sarayê û çi li şikeftê ya herî girîng baweriya ji Xweda ye. Dawid bi Golyatekî din re hatibû hemberî hev.

Destûrê bidin ez diyar bikim.

Mirov bîne ziman ku hin pirsgirêkên Dawid bi bavê wî re hene, ez bê hema wê ne tiştekî eletewş be. Gava ku Dawid li beyebanê bû, çi gava ku bi qral re dipeyivî jê re digot “bavo.” Ayeta 24:11 ya Samûêl Iê, êş û izdiraba wî dest nîşan dike:

> Bavo, li vî perçeyî destê min binêre ku ji dawa xiftanê te hatiye jêkirin. Belê lê binêre! Min ji dawa xiftanê te perçeyek qut kir, lê min tu nekuştî. Ji ber vê yekê, baş bizane ku di dilê min de xerabî û fikra serhildanê tuneye. Dîsa jî, tu dixwazî min bikujî.

Ji bo mirov bifikire ku di navbera Dawid û bavê wî de fesadî heye, sedemek tuneye lê ji ber ku Dawid kurikê heyştan e, dibe ku qedir û

qiymetekî wî ya mezin tunebe. Li gorî tê xuyakirin, Dawid di bin siya heft birayên xwe yên mezin de tepisiye. Weke hemû lawan Dawid jî hêvî dikir ku bavê wî, wî teqdîr bike û pesnê wî bide lêbelê gava ku Pêxember Samûêl hat ku kurekî Yêşa mesih bike, Dawid nehat bîra bavê xwe:

> Yêşa bi vî awayî heft kurên xwe di ber Samûêl re derbas kirin. Samûêl jê re got: “Xudan yek ji wan jî hilnebijart.” Samûêl ji Yêşa re got: “Kurên te hemû ev in?” Wî got: “Yekî biçûk jî heye, lê ew li ber pêz e.” Samûêl ji Yêşa re got: “De ka yekî bişîne bila bê. Heta ew neyê, em nayên ser sifrê.” (Samûêl I, 16:10-11)

Ji ber çi Samûêl mecbûr ma ku ji Yêşa bipirse bê ma kurekî din heye an na? Gava Samûêl hat, em bi hêvî bûn ku Yêşa ji Dawid re jî bêje were malê. Diyar e ku Yêşa ji bo asta hilbijartî Dawid layiqî nirxandinê nedidît. Eger Pêxember Samûêl bihata mala me, ji bo hemû malbata min li wir amede be, çi ji destê min bihata min ê bikira. Eger yek ji wan ne li malê bûya, di ser Skype, FaceTime an jî bi rêya telefonê min xwe bigîhanda wan û min ê bihişta bi pêxember re hev bibînin. Ji bo bala bavê xwe bikişîne heft reqîbên Dawid ango birayên wî yên mezin hebûn. Di Nivîsên Pîroz de, axaftinên di navbera Dawid û birayên wî re derbas dibin, ne jidil in an jî piştgirî di wan de xuya nake. Di esasê xwe de birayê mezin wî weke kesekî qure tawanbar dike, pêywira wî ya li mala bavê biçûk dibîne û wî weke kesekî ku xwe diecibîne û weke kesekî zikreş pênase dike (Samûêl I 17:28).

Gava ku min zebûrên Dawid xwendin ji gotinên wî bêtir, dibe ku sedema min dengê dilê wî bihîst ev bû. Ez dibînim ku eş û elema ji ber salên ku di acizî û tecrîdê de derbas bûne di çarînên zebûrê de hatine honandin. Dawid gelek caran ji Saûl re îspat kir ku ne sûcdar e lê gurbûna şerê di nava wan de berdewam kir.

Piştî demekê Dawid fêhm kir ku masûmbûna wî wê tu carî di huzûra mirovan de neyê pejirandin. Wê Saûl tu carî Dawid nebexşanda. Lêbelê wê Xweda ev bikira. Gava ku ji Saûl direviya, hîn bû ku here xwe bavêje Xweda û xwe veşêre. Gelek mirov dixwazin mesih bibin lê ji bîr dikin ku mesihkirin wê xizmeta armanceke li ber dijminan bike.

Dawid di dawiya jiyana xwe de gava ji Avşalom reviya wisa lavan dike:

> Ya Xudan, çiqas zêde bûn dijminên min, Gelekan serî rakir li ber min. Gelek kes li ser min dibêjin: «Li ba Xwedê ji bo wî xelasî nîne.» Belê tu ya Xudan, tu mertal î li hawirdora min, Tu yî, berzî û serbilindiya min. Bi dengê xwe ez bang dikim Xudan, Ji çiyayê xwe yê pîroz dide bersîvan. Ez razam di xew re çûm, Ez cardin hişyar bûm, çimkî Xudan ji min re bû destek. Tirsa min, Ji peraniya ku çaralî dor li min pêçaye tune. (Zebûr 3:1-6)

Dijminên ku li ber wî serî rakirin çawa wisa pir bûn? Pirseke baş e. Xweda çima ew ji holê ranekirin? Weke mînak çima ew bi firtoneyeke beyebanê re tune nekirin?

Xweda, ji Samûêl nexwest ku wî weke qral mesih bike. Dawidê bi ceger, nikarîbû bêyî ku ji bo Xweda mîrantiyê bike û bisekine. Weke kurekî sadiq tiştên ku Bavê wî emanetî wî kiribûn, şervanekî bi qralê xwe re jî sadiq bû. Yonatan dostekî weke wî heqîqî nikarîbû bidîtaya. Heta wê kêliyê gava ku mirov li karê Dawid binêriya, wê bidîta ku Dawid bê sûc bû. Lê dîsa jî di seranserê jiyana wî de dijminên wî lê zêde bûn. Çima?

Em dixwezin ku sedemeke vê hebe ji ber ku eger hebe wê ev tevlihevî hinekî bê fêhmkirin. Lê her tişt bê mentiq tê dîtin. Ev gotin her çiqasî serpêhatiyên Dawid bin jî, gotinên pêxembertiya pêşerojê ne. Pirsgirêkên hatin pêşiyê, şerên kesekî din pênase kirin. Gotin gîhaştin pêşerojê û tiştên ku wê bên serê Îsa diyar kirin. Gava ku di jiyana me de reqîb derdikevin em çima şaş dimînin? Ayetên 4:12-13 yên Petrûs lê ve tîne bîra mirov:

> Hezkirîno, li ber tengahiyên wek êgir dijwar ên ku ji bo ceribandinê tên ser we, şaş nemînin û vê ecêb nebînin. Lê belê şa bibin ku hûn bûne hevparên cefayên Mesîh, da ku çaxê rûmeta wî xuya bû, hûn bi dilgeşiyeke mezin gelek şa bibin.

Tundiya ji derve ve ji bo vegiherîna hundurîn dixebite. Reqîb; qedera ku Xweda ji bo me amadekiriye, derdixînin holê. Ji bo mezinbûna Xweda di jiyana me de bilind bibe, em nizm dibin. Reqîb di pakêta hînbûn, pakbûn û perwerdehiyê de, xelatek in. Reva ji ber zordariyê di xwezaya mirov de heye. Lê gava em êşê dikişînin, em ne tenê êşên Îsa parve dikin, di heman demê de her gava xwe ji me re diyar dike em dibin şirîkê mezinbûna Wî.

## Reqîb Zorê li We Dikin ji bo Hûn Dilê Xwe Biparêzin

Gava ku dilê we yê kevirî şikest wê dilekî ji goşt derkeve holê. Gava ku we xwe di nava reqabeteke eletewş de dît, wê dilê we hîs bike ku di bin êrîşê de ye. Hûn ê êrîşî bombebarana pirsên ku bûne sedema rexneya li we û motîvasyona we dibe, bibin. Hûn ê meraq bikin û ji xwe bipirsin gelo xeletiyek di min de heye. Xwedayo, tu li kuderê yî? Ev çawa çêbû? Ev çima her dem dibe?

Gelek caran bersiva ku em ji van pirsan digirin bêdeng e. Em lê dipirsin û dest pê dikin gelo Xweda me dibihîze an nanibihîze. Ez hîn bûm ku Xweda li pişt perdeyekê bi awayekî bêdeng disekine. Bi hewldana ku sahne bêguhertin, karekter di cihê xwe de cîh digirin. Bi ceger bin. Hindik maye serdema we bê guhertin. Li şûna ku hûn xwe li gorî cîhê hûn lê ne biwezinînin, bînin bîra xwe bê hûn di kîjan cîhan re derbas bûne.

Gava ku em di nava bêdengiyê de guhdar dikin, ji bo derbasiyekê em cîhê xwe distînin. Em ê ji gotinên Xweda bawer bikin an em ê guhê xwe bidin gotinên tawanbar yên reqîbên xwe? Heman Xwedayê ku di nava me de dest bi karekî baş kiriye, ji bo vê xelas bike wê sadiq be. Em destûrê bidin ku êrîş dilê me bikin kevir an em ê bihêlin ku Xweda şîfayê bide me? Em ê bala xwe bidin gotinên dijmin an em ê bidin gotinên Afirînerê xwe?

Lawo, guhdariya gotinên min bike,
Guh bide peyvên min.
Bila ew ji ber çavê te winda nebin,

Wan di dilê xwe de biparêze.
Çimkî ji bo kesên ew dîtin, jiyan in,
Ji bo tevahiya bedena wan şifa ne.
(Şîretên Silêman 4:20-22)

Nedin dû tiştên ku ew dikin. Guh nedin gotinên wan. Rewşa xwe ya aniha bi ya wan re nedin ber hev. Her soza ku li kûrahiya dil û canê we hatiye pifkirin, biparêzin. Xwe ji xirxira dengê radyoyê xelas bikin û qabîliyeta xwe ya ku hûn bi dengê Xweda re bibin yek, bi pêş bixin. Eger bêriya ku bi we re bipeyive nekira, nedihişt hûn vê bikin. Dengê Wî dilê we qewîn dike.

Di vê jiyanê de gelek parazît hene. Zindiya ku hûn bêriya wê dikin, jiyana xwedayî ya bêreqîb bi lêgerîneke tolfelaqî nayê dîtin. Dinyayeke ku bi tevliheviyên baldariyê tê bombebaran, jê re konsantrasyon lazim e. Eger hûn ne bi rêk û pêk bin û bernameya we tunebe, ji bo bala we bikişîne gelek tiştên bi we re reqabetê dike we berê we bide rêyeke din.

Peyama Mesîh armanca me ya dawî ye. Gotinên Afirînerê me, xwediyê wê hêzê ne ku qedera me berçav bikin. Ev nêzîkatiya hişmendî ya ber bi çavkaniya jiyanê ve, hevsengiyê di nava beden û canê mirov de ava dike û jiyana me bi tenduristî, bi armanc û bi hêzê tije dike. Ji bedêla reqîban gava ku em xala xwe bidin Gotinên Wî, em ê têkevin jiyaneke li derveyî têgihiştina wan.

Divê mirov tenê li Gotinên ku bizrê Wî tînin bîra me kûr nebe, di heman demê de divê em li bexçeyê ku dilê me temsîl dikin jî binêrin.

Di navbera ku em dilê xwe *biparêzin* û dilê xwe *hepis bikin* de, cudahiyeke kûr heye. Yek jê li ser serê tiştekî nobedar e, ya din jî mirov dikare bişibîne dilekî di bin kilîdê de.

Gelek mirov jê heta ku di nava ewlehiyê de şîfayê bi dest bixin bi hêviya ku xwe biparêzin dilê xwe ji her tiştî re dikin kevir û vê hildibijêrin. Gaav ku ez jî mezin dibûm gelek caran min ev rê hilbijart. Di serê pêşî de ew hîsa rehetiyê bi min gelekî xweş dihat. Gava ku mirovan êş dida min, min di cîh de ew ji jiyana xwe qut dikirin. Min deriyê dilê xwe ewqasî baş kilît dikir ku min xwe di bin ewlehiyê de baş hîs dikir.

Heta ku ez dikirim mahkûmek min deriyê dilê xwe digirt. Gava min xeyal dikir ku ez li hemberî êşê pir xedar im îcar di heman demê de min fêhm kir ku li hemberî kêfê jî ez bêhîs bûme.

*Parastina* dilê xwe nayê wateya ku mirov wî hepis bike, tê wateya parastinê. Eger we dilê xwe xilqandibe, demê ji duayan re veqetînin. Ji Xweda bixwazin ku dilê we ji zindana kevirî rizgar bike û jê bixwazin ku we bi kesekî ku hem kêfê û hem jî êşê hîs dike, biguherîne.

Ez dizanim ku êşê dide lê hêsirên xwe bernedin nava xwe. Berdin bila dilê we şil bikin û dilê xwe nerm biparêzin. Berê xwe nedin alkol an jî hebên tevizandinê yên ku êş û sehekên we berevajî dikin û dihêlin hûn ji dest û lingan bikevin. Bi fikrên tolhildanê yên ku canê we reş dikin, hişê xwe nelewitînin. Li ser vê pir nefikirin û nesekinin, rûnên û heta ku pêdiviya we pê heye bigirîn. Tenê bimînin, destûrê bidin ku êşên we bi hêza herî xurt li we bixe. Gava ku sakînbûn ber jêr bû, serê xwe ber bi asîmanan ve rakin û dengê xwe bigihînin Xweda. Mînaka Dawid bişopînin û can, dawe û reqîbên xwe her roj emanetî Xweda bikin û vê bi pêş bixin. Ayetên 51:8-12 yên Zebûrê her tiştî tîne ziman:

> Kêf û şahiyê bi min bide bihîstin, Da ku şa bin hestiyên ku te pelçiqandin. Ruyê xwe binixême li hember gunehên min, Paqij bike hemû sûcên min. Ey Xwedê, tu dilekî pak bide min, Nû û zexim bike, ruhê hundirê min. Min ji huzûra xwe navêje, Ruhê xwe yê pîroz ji min nestîne. Şahiya rizgarkirina xwe, bi şûn ve bide min, Bi ruhekî dilxwaz tu bike piştgiriya min.

Dilekî êsîr û bûye kevir, ker dibe û hestiyên pê ve girêdayî bertekê nadin. Yên ku kesên din didarizînin, her dem di bin giranbûna gunehên xwe de dijîn. Lêbelê Xweda dikare tiştên ku dilên me dilewitînin pak bike û xeletiyan dikare rast bike, bi vî awayî, em di hizûra Wî de serbilind bisekinin.

Dilên kevir nikarin di huzûra Xweda de bisekinin. Ji her tiştî dûr disekinin an jî di nava kesên ku henekê xwe bi kesên ku rêya şifaya nerm hilbijartine de cih digirin, disekinin.

Ez we dîsa hişyar dikim, gelek kes bi vê nêrînê dest pê dikin û gelekî dereng ferq dikin ku dilê wan nayê parastin û hatine hepiskirin. Empatî û dilovanî winda dibe, îcar li şûna wan zalimtî û nebihîstî cîh digire. Di navbera parastina tişta pîroz û xilqandina dil de, ferqeke pir mezin heye.

Gava me hîs kir ku dilê me şûv û vala ye, êdî dem ew dem e ku em dest bi stranan bikin. Saûl di nava êşeke wisa de bû ku wî bi xwe nikarîbû stran bigotana, ji ber vê ji bo êşa Saûl bitemire Dawid stran digotin. Stranên ku me dorpêç dikin tiştekî li dûr dihêlin lê gava di nava me de stran olan didin bi rastî jî tiştekî girîng dibe. Ji bedêla guhdarkirinê gava ku me stran gotin, xilqa dilê me vedibe û têkiliyeke me bi Afirînerê me re çêdibe.

Qral Saûl bi axaftin û tevgera xwe ya ecele dihat zanîn. Valahiya di dilê wî de xwe di tevgerên wî de dida der. Weke çawa Dawid hîn bû dilê xwe sakîn bike, em jî dikarin hîn bibin ku dilê xwe bihedînin:

> Belê, min xwe aş kir û ez bêdeng mam, Wek zarokê ku ji şîr hatiye birrîn û di himêza dê de ye, Canê min jî wisa bi min re ye. (Zebûr 131:2)

Gelo ez dikarim tiştekî ku pir ji ber fedî dikim parve bikim? Ji bedêla ku canê xwe weke zarokekî bihedînim, ez bêtir weke zarokekî tevdigerim û meyla min bi vî awayî ye. Berî bi salan di xizmeta hebandinê de dêra me peyvên zebûra 3. weke stran digotin û berteka min ew bû ku ez her dem weke zarokan digiriyam. Li malê min bi strana wê re dans dikir. Bi awayekî min şîna xwe dişiband hîsên Dawid gava zebûr dinivîsand. Pirsgirêka tekane ew e ku tiştên dihiştin ez bigirîm ji eslê xwe re hinekî qebehet bû. Erê. Wê demê ji min re hinekî mezin dihat. Ez jê bawer im ku min ji kûr ve diêşîne û hema bêje canê min parçe dike.

Gava aniha li dawiya xwe dinêrim ez cuda dibînim. Qebehatên dihatin kirin ne girîng bûn û dilê mirov pê dişewitî. Belkî îhmalek, gotineke xedar an jî pevçûneke ku min bi mêrê xwe re kiribe. Min

mirovên ku ji bo van qebehatan her tiştî xwe li ser bikin, nas kirin. Li welatên aliyê din yê oqyanûsê, min jinên ku ji ber baweriya xwe her roj di bin tehdîta mirinê de ne, nas kirin. Li kuderê bizîvirim, ez li dayikên bê mêr yên xabatkar ji bo li zarokên xwe binêrin bê sekin û hedan dixebitin, rast têm. Ez behsa yên lêxistinê dixwin, yên dest dirêjî wan bûye, yên ji aliyê malbata xwe ve weke malekî hatine firotin an jî yên ketine destê qaçaxçiyên mirovan, nakim jî.

Ez êşa we biçûk nabînim. Haya min jê heye ku êşeke bi rastî ye. Lêbelê gava ku me wahiyeke rast ji Xwedayê xwe stend ji bo rewşa herî xerab jî li gorî armanca xwe biguherîne, ew roja ku em ê weke Ûsiv bibêjin wê bê:

> *We niyet kir ku hûn xerabiyê bi min bikin, lê Xwedê wekî ku îro dibe ev niyet vegerand ser qenciyê. Loma gelek kes ji mirinê filitîn.* (Destpêk 50:20)

Eger hûn nêrîna xwe ya derbarê reqîbên xwe de biguherînin, wê Xweda birîna we bikewîne. Nivîskarê şanoyê Edmond Burke, dînamîk bi vî awayî dît: "Kesê bi me re pevdiçe sinirên xwe bi hêz dike û jêhatîbûna me bi şikl û şemal dike. Nêyarê me alîkarê me ye."

Ez hîn bûm gava ku em deriyan li hinekan digirin, di pêşeroja me de ev yek vediguhere deriyên girtî yên li hemberî me. Em kengî hewl bidin ku kesên din îzole bikin, em dikevin nava rîska ku xwe li derve bihêlin. Dilên vekirî deriyan vedikin û wê kesên din bi hembêza vekirî pêşwazî bikin. Xweda bi hêviya ku tu kes ji me li derve nemîne Îsa şand. Karê zor bi dilê xwe bikin, li şûna pozîsyona ku hûn hêvî dikin lê bin dilê xwe baş biparêzin.

Gelek mirov jê dixwazin bibin rêberek lê bûyîna xwedî bandorekê weke kêreke tûj ya du alî ye. Wê mirovên ku her dem ji we hez dikim lê we nas nakin, hebin. Di heman demê de wê mirovên ji we nefret dikin lê we nas nakin jî hebin. Ev şopîner in. Ne reqîbên we ne lê didin dû guhertinê. Mûsa li cem fîrawûn mezin bû. Dawid ji bo Saûl weke kurekî bû. (Golyat tenê yek ji wan dewê li jiyanê bû). Gelek deman, reqîbek ew kes bû ku demekê hûn baş nasdikirin. Dawid reqîbek wisa pênase kir:

> Yê ku tehn li min dida dijmin bûya, Minê di ber xwe bida; Yê ku li ber min pozbilindiyê dikir dijmin bûya, Minê xwe ji ber veşarta. Belê tu bûyî, yê ji min re yeksan, Hevalê min, dostê ji dil û can. Me bi hev re bi şîrînî hevaltî dikir, Bi civatê re em diçûn mala Xwedê. (Zebûr 55:12-14)

Bi vî awayî li gorî pênaseya ferhenga Urbanê, dikare weke “dijminekî ku xwe xistiye şûna dostekî” bê pênasekirin. Hîskirina bê kî dostê bi rastî ye, ji bo me xelatek e lêbelê dîsa jî tişta heqîqî ya ku me dike me, bi piranî reqîbên me ne. Em dikarin daweya xwe nîqaş bikin an jî em dikarin bînin huzûra Xweda. Em dikarin bi armanca ku reqîbek derxistiye hemberî û em pak kirine û ji nû ve me bi cîh kiriye, spasiya Xweda bikin an jî xwe bavêjin hembêza Wî. Em dikarin gilî û gazinan bikin an jî duayan bikin û stranan bibêjin. Hilbijartin di destê me de ye û tu reqîb nikarin vê ji destê me bistînin.

## Pirsên Nîqaşê

1. Behsa demeke ku reqîbê we bûye perwerdekarê we bikin.
2. Reqîbekî di jiyana we de çi derxistiye holê?
3. Hin qadên ku hûn di wan de bi ceger in çi ne?
4. Hin qadên ku divê hûn bi hêz bibin û hûn pir ne bi ceger in çi ne?
5. Sê ferqên di navbera heyran û şopîneran de bibêjin.
6. Hûn bi rimekî di destê xwe de li malê diçin û tên? Hûn wî rimî çawa dikarin ji destê xwe deynin erdê?
7. Bêyî ku hûn dilê xwe hepis bikin, hûn dikarin çawa wî biparêzin?


# MessengerX

***Sepana we ya rojane ya perwerdeya xwendekaran***

**Bi temamî belaş e!**

Tenê daxînin cîhaza xwe ya mobîlê û pêde herin!
An jî varyanta webê bi kar bînin:

**MessengerX.com**




## Bi 125 zimanan û hîn jî berdewam e

- Bi 125 zimanan naverokê bibînin û daxînin.
- Çavkaniyan bi hevalên xwe re parve bikin an jî koma xebatê ava bikin.
- Her dem naveroka wê nû dibe.

## Temaşe bikin. Bixwînin. Guhdar bikin.

Ji bo hûn qurs, e-pirtûkan, pirtûkên bideng û kurte fîlman temaşe bikin, bixwînin û guhdar bikin; vê pirtûkxaneya dewlemend kifş bikin.






## Di mijarên herî girîng de bi pêş bikevin

Van mijaran kifş bikin: rehên malbatê, têkiliyên baş, nasîna hevjîna xwe, xelasiya ji pornografiyê, avakirina bîr û baweriyê, guhdariya Xweda û pêşengiya kar û bar û hîn pirtir!

## Rêwitiya we ya pêşketinê


**MessengerX** ji bo hûn gava xwe ya din biavêjin, heye. Ji ber vê wê alîkariya we bike ku hûn bi pêş bikevin. Ji ber vê jî me alavên bi hêz yên ku alîkariya xwendekaran bike û rê li ber wan veke, ava kirin.



## Taybetmendiyên bêhempa yên ku hûn ê pir ji wan hez bikin!

- Alavên rehet û hêsan yên ku wê bihêle hûn notan bigirin û hetta wê bihêle hûn komên xebatê ava bikin.
- Bi alîkariya AirPlayê re hûn dikarin li ser televîzyona xwe û Chromecastê bar bikin.
- Li ser hemû cîhazên xwe pêşketina xwe qeyd bikin. Ji bo ragihandineke xurt favoriyên xwe li pirtûkxaneya xwe qeyd bikin.
- Ji bo gava hûn ne onlayn bin jî hûn bikaribin daxînin cîhaza xwe.
- Tişta hûn lê digerin ji bo hûn bê kêmasî bibînin, lêgerîneke xurt û parzûneke bêqusûr.
- Pirtûkên bideng, beşên li dû hev tên yên Pirtûka Pîroz ya bideng û hetta hebandinan hûn dikarin bi awayekî otomatîk guhdar bikin!

## MessengerX, bi qasî sê (1-2-3) gavan hêsan e.




**1** Sepana MessengerXê ji App Store an jî ji Google Playê daxînin.

**2** Hesabekî li ser navê xwe vekin û zimanê wê biguherînin.

**3** Çavkaniyên xwe yên sereke kontrol bikin, bixwînin, temaşe bikin, guhdar bikin, daxînin û parve bikin.

## Weke xwendekaran xwe perwerde bikin û piştre xwedekaran jî perwerde bikin

Weke endamê **MessengerX**ê, hûn ê alîkariya xizmeta çavkaniyan ji hemû mirovên li her aliyê dinyayê re bikin.

***Ji ber ku mafê her kesî heye ku hîn bibe!***

**MessengerX.com**

Daxîne ji ser App Store

Werbigire ji ser Google Play

</> Guncav e li ser hemû gerokên înternetê

# 6

## Zayenda Bêreqîb

> Taybetmendiyeke mirovan heye ku ew bi xwe nikarin rengê çermê xwe hilbijêrin û ji ber vê êrîşên nîjadperestî li wan dibin, dîsa taybetmendiya din zayendiya wan e ku nikarin vê jî hilbijêrin û ji ber vê jî neheqiyên mezin li wan dibin, lewra mirov nikare van êrîş û neheqiyan bi awayekî sakîn bipejirîne.
>
> SERPÎSKOPOS DESMOND TUTU

Rewşên min yên taybet hene, duayên min hene gava ez tenê me, ez wan dikim. Gava ez dibêjim *tenê,* ez bi piranî behsa odeya otelekê an jî erebeya xwe dikim. Gava ez erebeyê dajom, bi kirina duayên derasayî têm nasîn. Tiştekî jê xweştir tuneye gava ez muzîka hebandinê bi dengê herî bilind guhdar dikim ku ev dihêle ez xwe di nava hîseke ecêb xweş de hîs bikim. Berî bi çend salan jiyana min weke ku di nava çembereke pir xurt digeriya de bû. Carina min fêhm nedikir bê gelo ez têm an ez diçim. Payizî gava ez li Urdunê bûm pirtûka min *Lioness Arising* (Şepal Radibe Ser Xwe) çap bûbû. Em ber bi dawiya salê ve hatibûn û hindik mabû ji Roja Spasiyê re. Wan deman duaya min ya taybet wisa bû:

"Bavê Asîmanî, ez bawer im tu dizanî ku min pirtûkeke bi navê *Lioness Rising* nivîsand. Ji aniha ve di pênc ziman de çap bûye lê ez pir dixwazim ku ev xwesteka Te be. Ez dizanim ku ev pirtûk li dû rastiyê ye lê ez dizanim ku Tu bi demê ve negirêdayiyî jî, ji ber vê ez dixwazim tu piştrast bikî ku ev pirtûk tiştekî ku Te diyar kiriye. Bi bavê Îsa, amîn." Belê, ji aliyekî ve mirov ji ber vê fedî dike lê dîsa jî rast e. Min dizanî bû ku divê vê pirtûkê ji dilê xwe derxînim û bi destên Wî ve berdim.

Hemd ji Xweda re, piştgiriya ez li bendê bûm di demeke pir kin de hat. Wê şevê li dor saet heyştan bi awayekî min xwe di nava projeya dibistanê ya kurikê xwe yê herî biçûk de dît. Ji bo projeya xwe temam bike ji min re got ku pêdiviya wî bi hin cureyên qertonan heye û min jî ji projeyên kevin yên birayên wî yên mezin hin malzeme jê kiribûn. Ji bo qertona rast bibînim bi firtoneyke mezin re min li ber xwe dida û dawiya dawî ji bo alîkariya projeya birayên xwe bikin, min pejirand ku ez bertîlê bidim wan. Gava ez vegeriyam malê min dît ku mal bûye meydana cengê. Li ser maseya xwarinê qaxet, wêne, fotograf û nameyên ku ji kovaran hatibûn jêkirin, tije bû. Ji birayên mezin yekî jê gava tiştên ku Arden digotin dinivîsandin û yê din ji bo wan pê ve bizeliqîne fotografên lazim jê dikirin. Tam min qertona ku wê hemû parçe li ser bigihên hev li ser maseyê raxist, telefonê jî lê xist. John bû yê digeriya.

Dengê wî bi kelecan bû. Lê ez ji hal de ketibûm û aciz bûm.

Wê şevê kesek naskiribû û ji min re jî anî ziman ku divê ez jî teqez wî nas bikim. Tebîetekî mêrê min heye; min bi rêya telefonê bi kesên biyanî ku qet wan nas nakim dide naskirin. Çawa çê dibe jê ne bawer im lê çêdibe… hem jî gelek caran. Ev kes bêguman naxwazin bi min re biaxivin lê John wê kêliyê xwe tê de winda dike û hîs dike ku divê bin wan re bipeyivim.

Serê pêşî, ez li hemberî van hevnasînan derketim. Lê êdî baş dizanim ku nema dikarim xwe ji vê rewşê xelas bikim. Gotineke hişyariyê: Eger tebîteke ji deh salan zêdetir ya berdewam ya mêrê we hebe, êdî divê hûn biryarê bidin ku ev tiştekî xweş e. Ango tebîetekî xweş yê mêrê min yê ku min bi telefonê bi kesên biyanî re dide nasîn heye. Lê wê şevê min ev yek protesto kir.

“John, aniha dema min tuneye ku ez bi kesên biyanî re bipeyivim. Ez bi projeya dibistanê ya Arden dadikevim.”

“Dibe, aniha tu ne mecbûr î biaxive. Ew fermandarekî artêşê ye û aniha meşgûl e. Min nimroya telefona te da wî. Wî îşev li te bigere û teqez bersivê bide telefona wî. Divê ez aniha herim, ji te hez dikim!” Û bêyî bihêle ez tiştekî bibêjim, girt.

Xebata projeyê girantir bû. Piştî saetekê telefona min lê da. Min biryar da ku bi dengê xwe yê herî ne jidil bersivê bidimê.

“Alo”

Kesê digeriya weke ku dudulî bû.

“Gelo hûn Lisa Bevere ne?

“Belê...”

“Lisa xanim, mêrê we di civîna îşev de pirtûka we ya nû *Lioness Arising* (Şepal Radibe Ser Xwe) da nasîn. Ji me re got, şêrên nêr kujerên herî baş in lê nêçîrvanên herî baş jî şêrên mê ne.”

Min di dilê xwe de got, helbet wê wisa bibêje. Bi vê dizane ji ber ku min jê re got û... bawer im hîn pirtûk nexwendiye! Camêr berdewam kir: “Rast got. Di mijara anî ziman de ku got, şêrên mê nêçîrvanên herî baş in, mafdar bû.”

Min texmîn nekir bê wê ev hevpeyvîn berê me bide kuderê. Ev zilam vê êvarê ji bo tiştên ku mêrê min gotibûn lê ez weke nivîskara pirtûkê ku jixwe min bi vê dizanîbû, geriya bû gelo? Lê hindik mabû hîn bibim?

“Lisa, tu dizanî ku em di şerê Afganistanê de bi ser neketine?” Min weke erêkirinê got, imm. Ji ber ku ez li Kolorada Springs’ê dijiyam, gava li malê vedigeriyam di balafirê de li gelek personelên keşkeriyê yên ku ji peywira xwe vedigeriyan, min didîtin.

Got: “Tu dixwazî yek ji wan sedemên ku em di şer de bi ser neketin hîn bibî gelo?”

Bi dixwazî min bersiv da û min got: “Helbet,”

Got: “Em nikarin bi jinên wan re bipeyivin.” Û gotina xwe berdewam kir: “Eger tu nikarîbî bi jinan re bipeyivî, tu nikarî çandê biguherînî û eger tu nikarî çandê biguherînî, tu nikarî di şer de jî bi ser bikevî.”

Îcar aniha bala min kişandibû.

“Ez ji te re bibêjim bê ez li qada leşkeriyê çi dikim. Ez bi hêzên taybet re dixwebitim. Ji ber talûkeyên di xwe de dihewîne, di eslê xwe de me xala xwe da ser hêzên taybet yên ku ji zilaman pêk tên lê aniha em tîmên ku ji jinan jî pêk tên dişînin. Wê ev tîm ji jinên Afgan re bibêjin ku mafê wan yê axaftinê heye û ew xwedî nirx in. Wê ji wan re bînin ziman bê ji bo çi demokrasî ji kur û keçên wan re rêvebirina herî baş e. Wê bi pêdiviyên wan yên biçûk yên tibbê dakevin û wê ji wan re pîriktiyê jî bikin. Tu dizanî bê navê vê tîma taybet ya jinan çi ye gelo?”

Min anî ziman û min got bêguman ez nizanim.

“Navê *Tîma Şepalê* li wan hatkirin û hindik maye dest bi çalakiyan bikin. Ji bo her yekê gelo tu dikarî pirtûkeke xwe bide wan?”

Û helbet me ji wan re şandin!

Van jinan piştgirî heq kiribûn ji ber ku xwe gîhandibûn jinên Afganan û ji bo zarokên wan hêviya rêyeke din ku ji şer û birçîbûnê baştir heye, dabûn wan û ev hêvî mezin kiribûn. Van şepalan divê zanîbûna ku ne tenê hin fermanên leşkerî bi cih dikin, ji ber ku xwuşkan wan yên ku ji ber zayenda xwe hatibûn tecrîdkirin û biçûk hatibûn dîtin, şîfa û jiyan li wan belav dikirin û parçeyê armanceke vî nirxê ebedî bûn. Qedexe bû ku leşkerên mêr bi jinên Afganan re bipeyivin lê peywira leşkerên jin ev bû.

**Eger jin tevlî nebin wê mirov di gelek şeran de têk herin.**

Piştî ku telefon girt, min careke din fêhm kir ku eger jin tevlî nebin wê mirov di gelek şeran de têk herin.

Eger artêşa Amerîkayê, fêhm kiribe eger jin tevlî nebin neteweyek dikare şer bike lê wê bi ser nekeve, wê demê ne tenê ji bo şer lê êdî ji bo serkeftinê ma dema ku dêr jî keçikên xwe li cem mêran bigire û wan bi hêz bike, nehatiye gelo?

Tê zanîn ku reqabeta zayendî her du aliyan jî diêşîne lê bi piranî aliyê ku neheqî lê dibe jin in. Ji sîh salî zêdetir çêbû ku ez jinên birîndar yên ji ber reqabeta zayendî di dilê xwe de digirim. Ez tu carî nikarim pirtûkeke

ku vê mijarê di astekê de nexe nava destên xwe, binivîsînim.

Di vê mijarê de ji gelek aliyan ve pêşketin çêbûn lê hîn jî ez çîroka jineke ku her hefte di zewaca xwe de, di malbata xwe de, li karê xwe an jî li cihê hebandinê êşê dikişîne, dibihîzim. Di tora civakî de her dem ez peyamên bi nefret yên li hemberî jinan dixwînim. Jixwe ez behsa bazirganiya jinên spî, qira zayendî û meseleyên pornografiyê nakim jî.

Mixabin, pêşbiryarên zayendî xetên Mizgîniya me hîn jî şolî dikin. Em li cihên we yên ku ji zilaman re azadî û rizgariyê ava bike û jinan jî di bin kontrola xwe de bihêle digerin û dinêrin.

## Tevgerên Rêberên Olî

Ez naxwazim mijara pêşbiryarên zayendî vekim. Ji ber vê ez dixwazim li wê dema ku dêr hîn nû çêbibû, piştî vejîna Mesîh ku bi awayekî zindî mezin bibû û giyanê Xweda ku bi ser qîz û xortên wî de hatibû dakirin, vegerim. Mizgînî hem di peyvê de û hem di çalakiyê de belav dibû dihat îlankirin ku Îsa vejiniye. Rêberên perestgehan yên ku panîk dikirin, bi hewldana ku vê firtoneyê bisekinînin Petrûs û Yûhennayê ku zilamekî di nava kotiyê de ev çil salî dijiya rehet kirine, hatin binçavkirin.

> Gazî wan kirin û li wan emir kirin ku êdî bi navê Îsa qet nepeyivin û kesî hîn nekin. (Karên Şandiyan 4:18)

Peyva *wan* ya di vê ayetê de behsa rêberên olî yê vê demê dike û kesên ku bi awayekî pir cîdî hatine hişyarkirin Petrûs û Yûhenna ne. Ev mûcîzeya ku li ser navê Îsa pêk hatiye, ango başbûna kesê kotî, ji bo Mesîhê Xelasker yê vejiniye wazan bide, deriyekî fireh li ber wî vekiribû. Rêberên Yahûdiyan xwe di nava taloqekê de dîtin ji ber ku tu rêya vî zilamê kotî ku baş bibû û vê veşêrin û înkar bikin, tunebû. Di nava xwe de wisa peyivîn:

> Wan got: «Em bi van mirovan çi bikin? Çimkî ji hemûyên ku li Orşelîmê rûdinin re eşkere ye ku bi destê van nîşaneke berbiçav

> hatiye kirin û em nikarin vê înkar bikin. Lê ji bo ku ev hê bêtir di nav gel de belav nebe, em gef li wan bixwin ku ji niha û pê ve bi navê Îsa ji kesî re tiştekî nebêjin.» (Karên Şandiyan 4:16-17)

Em hemû dizanin ku tehdîtkirina van her du xwendekaran bi kêrî tiştekî nehatiye. Rêya ku hilbijartin berevajî derket û biryardayîna van xwedekaran hîn bêtir qewîn kir.

> Lê Petrûs û Yûhenna bersîva wan dan û gotin: «Ma li ber Xwedê kîjan rast e? Em guhê xwe bidin we, an bidin Xwedê? Hûn bêjin. Çimkî em nikarin tiştên ku me dîtine û bihîstine nebêjin.» (Karên Şandiyan 4:19-20)

Rêberên olî van di nava xwe de çiqasî nîqaş bikin jî, wê Petrûs û Yûhenna tu carî ji ser a xwe daneketina. Fêhm kirin ku îknakirina van rêberan hewldaneke belasebeb e. Nûçeyeke ku zanîbûn rast e ji ber wê tu rêyeka din ya wan tunebû ku vê îlan nekin û hîn nebin. Van zilaman zanîbûn ku hin deman bêdeng bimînin, wê ev bê wateya ku îteatê ji wan re dikin.

Di roja me de ev tehdît di guhên me de olan didin. Muxatabên vê tehdîdê aniha hîn cudatir xuya dikin. Ji ber ku ev talîmat êdî ji hin rêberên olî, nadin masîvanên bêperwerde yên Celîleyî. Ji aliyê dinyayê ve hatiye halê tundiyeke çandî. Xweş deng jê tê lê armanc heman tişt e. Dinyaya me ya sekuler heta hûn bêjin bes destûrê dide ku hûn derbarê Xweda de bipeyivin û bibin kesekî giyanî, lê tenê navê Îsa bi kar neyinin.

Û divê em şaş nemînin ku qadên sekuler destûrê nadin ku li ser navê Îsa hîn bikin û wazan bidin. Jixwe naxwazim ku dêr rê li ber endamên xwe digire û dengê wan ditepisîne… Ev rewş bi tena serê xwe pirsgirêkeke din e.

Ji du hezar salan zêdetir çêbûye ku rêberên olî, li qadên olî yên di bin rêveberiya wan de, perwerdeya keçikên dêrê qels kirine û carina jî qedexe kirine.

Em ayeta 4:18an ya Karên Şandiyan dîsa bixwînin:

> Gazî wan kirin û li wan emir kirin ku êdî bi navê Îsa qet nepeyivin û kesî hîn nekin. (Karên Şandiyan 4:18)

Gava li ser vê ayetê difikirîm, min bihîst ku Giyanê Pîroz dike pistepist; *gelek keçikên min yên ku min bang wan kiriye û bi Giyanê xwe min xelata xizmetê daye wan, ji aliyê dêrê ve li dawî hatin hiştin û hatin astengkirin.*

Dibe we bihîstibe ku rêberên olî gotinên wisa kiribin: "Jin dikarin jinên din *perwede* bikin lê nikarin mêran perwerde bikin." An jî "Jin dikarin parve bikin lê divê ev ne wazek be." Û: "Gava ku jin li derveyî dêrê bin dikarin rêveberiyê bikin." Ev tehdîtên sergirtî dibe ku bêtir bi serê mirov bikevin lê encam yek e: Mizgînî tê bi sînorkirin. Jinên ku di baweriyê de pak in zû û bi awayekî agresîf li pişt wan gotin tên gotin. Dibêjin ku jinên li Xweda ewle ne hêrsokî ne. Lêbelê pirsa li ber me sekiniye bi pirsa ku Petrûs û Yûhenna pirsiye yek e. Li ber Xweda ku mirov ne li gotina Xweda lê ku li gotina we guhdar bike ma rast e? Û Xweda hem ji kurikên xwe re û hem jî ji keçikên xwe re, çi ferman da ji bo bikin? Bersiva vê di gotinên Îsa yên berî ku hildin asîmanan de veşartiye:

> Û wî ji wan re got: «Herin her çar aliyên dinyayê û Mizgîniyê li hemû afirînê bidin bihîstin. Yê ku baweriyê bîne û bê imadkirin wê xilas bibe, lê yê ku baweriyê neyne wê sûcdar bê derxistin. Û ev nîşanên ha wê bi yên ku baweriyê tînin re bin: Bi navê min wê cinan derxin, wê bi zimanên nû bipeyivin, wê maran bi destê xwe bigirin û eger ew tiştên bi jehr jî vexwin, qet ziyanê nabînin. Ewê destê xwe deynin ser nexweşan û nexweş wê qenc bibin.» Îcar piştî ku Xudan Îsa bi wan re peyivî, hilkişiya ezmên û li milê Xwedê yê rastê rûnişt. (Marqos 16:15-19)

Ev talîmat li *her kesê* bawer dikir hat kirin. Peywira Bilind ruxset e, pêdiviya wê bi avahiyekê an jî organîzasyonekê tuneye û ev ferman her du zayendan jî di xwe de dihewîne. Bang li her kesê bi Mesîh re, ji bo nûçeya baş ya Xweda îlan bike tê kirin û her kes di kirina vê de azad in.

Piştî ku me azadî û rastiya Xweda carekê nas kir, divê em tu carî destûrê nedin ku tehdîtên mirovan me bêdeng bikin.

## Ji Qralê Xwe re Îteatê Bikin

Xweda Qralê me yê mezin û pîroz e. Qralê em bi peywir û bi hêz kirine. Li ser navê Wî xwestiye hûn bi gelê Wî re bipeyivin. Gava rewş ev be, hûn çawa dikarin destûrê bidin wan kesên di bin rêveberiya Qral de ku we bişemitînin? Her yek ji me divê em bibin diyardeyên ayeta Metta 4:10ê ku dijî û hilmê fistîne û dide:

> Çimkî hatiye nivîsîn: Biperize Xudan Xwedayê xwe û bi tenê ji wî re xizmetê bike. (Metta 4:10)

Eger bêîteatiya li hemberî gelê Qral, bê wateya ku li hemberî Qral jî bêîteatiye, wê demê pirsgirêka me ya sereke bi Qral re ye. Bê em ê çawa li ser vê mijarê bisekinin, mînaka wê di Esterê de tê dayîn. Qralê Persê bang li Ester nekiribû û li gorî rê û rêbazên sarayê, qedexe bû ku Ester derkeve huzûra wî. Lê Ester fêhm kir ku eger bi ya qral bike wê ev bê wateya bêîteatiya li hemberî Xweda. Ester ji bêrazîbûna mirovan bêtir ji Xweda tirsiya û çû dîtina qral. Bi awayekî stratejîk nêzî qral bû lê cesaret nekir gava ku jiyana gelek mirovan di talûkeyê de be ew bêdeng bimîne. Di roja me de ez meraq dikim bê dinyaya me çiqasî cuda ye. Gelek zarokên keçik di cîh û şertên stratejîk de xwe veşartine. Hinek jê aniha jî li cem xwuşkên xwe rojî digirin û duayan dikin, ji bo têkevin hundur û midaxeleyê bikin li bendî kêliya rast in.

Erê ez vê dibêjim lê ez tu carî piştgiriyê nadim ku hûn li hemberî mêrê xwe an jî dêrê îsyan bikin. Ez hêvî dikim ku li hemberî dijiminê we têgihiştina we bilind bikin û ne tenê we bêdeng bikim. Ew hem li dû jiyana we ye û hem jî li dû jiyana zarokên we ye.

Dema rast. Eger mêrê we nehiştaya hûn Mizgîniyê parve bikin, we yê îteat jê re bikira gelo?

Ez ne behsa ku hûn li gorî rola pastorekî pispor derdikevin ser kursiyê an jî li hemberî gel bi awayekî eşkere dipeyivin, dikim. Ez ji dilê

safî dipirsim, hûn azad in û hûn dikarin şahidiyê bikin. Hûn amade ne ku hûn pirsên jineke hîn ciwantir bibersivînin û duayan ji bo wê bikin an jî weke xwendekarekê wê perwerde bikin?

Ez û John berî bi çendakî li ser vê meseleyê dipeyivîn. Pirsî û got, ji bo çi gelek jin li mahmeyan digerin û xwe vedikişînin ji bo nebin elçiyê Îsa. Min got ez difikirim ku gelek jê tenê ji bo berteka berevajî ditirsin, ji ber wê dûr disekinin. Heman hefteyê di dema rêwitiya balafirê de, ez li cem zilamekî ku ji min re got hin kes li dû te gotinên nebaş gotine, rûniştibûm. Min wisa bersiv dayê: “Li rûyê min jî dibêjin!”

Ev serdem ne demeke li gorî mirovên bizdonek an jî yên tirsonek e. Çi jin û çi jî zilam be, dı sûretê Xweda de li hemberî wan şerekî bi gelemperî heye. Tişta dawî ya ku pêdiviya me pê heye, şerê me yê bi hev re ye! Piştî min ev got, ez difikirim ku divê hin jin li vê axaftinê bi awayekî wêrek xwedî derkevin. Dibe ew hatibin hînkirin ku girêdana bi wan re bêdengmayîn e û nizanin ku Xweda navên wan guhertiye. Xweda ji bo we bike çi dest bi tevgerê dike? Gelo dêyeke ciwan heye ku hûn wê weke xwendekarekê perwerde bikin? Baş e, an li mala we lidarxistina komeke duayan an jî xebata Pirtûka Pîroz? Girêdana bi Xweda re hem mêrê we bi rûmet dike û hem jî tê wateya ku hûn ji Xweda re îteatê dikin.

Jinên din ji hêza xwe ditirsin ji ber ku tu kesî ew hînî wan nekiriye bê wê çawa li aliyên xwe yên bihêz xwedî derkevin û wan bi rêve bibin. Me hemûyan jinên ku nebaş tevgeriyane dîtine û em bi xwe jî bûne (ez dizanim ku min karê nebaş kirine). Sedema vê ne ew e ku ez dixwazim bibim jineke zor û zehmet, sedem ew bû ku min nizanîbû ez ê xwe çawa derxînim pêş. Darkê hînbûnê rast e ji ber ku di demên dawî de li vê dinyayê kêm caran jin derketin ber çavan.

Bersiv ne ew e ku mirov dengê jinan qut bike, bersiv perwerdekirina jinan e. Eger fersenda mezinbûne ji min re neyê avakirin, ez mezin nabim. Eger ez mezin nebim, ez nikarim ji yên din re cîh vekim.

Weke jinên bi hêrs em ê destûrê bidin ku li dû me gotin bên gotin? An ji bo zarokên keçik gotina Bavên xwe bibêjin, em ê bi hîkmet bin? Kesên xwediyê parçeyekî bersivêne divê dengê wan bê tepisandin?

Xweda neke! Divê hûn zarokên xwe yên keçik bi awayekî çalak di soz û îteata Xweda de mezin bikin. Û ez vê ji bo kesên ku dipirsin, bibêjim; bê çawa ev yek bi beşa 3. ya Petrûs 1ê re li hev dikin ku dibêje divê jin sakîn û giyanê wan nerm û xweş be, bêguman tevlî vê dibim! Û ez dilnizmî û xuynermiya Îsa û Mûsa weke mînak nîşan didim:

> Mûsa ji hemû zilamên ku li rûyê erdê ne zêdetir dilnizm bû. (Hejmaran 12:3)

Û,

> Nîrê min deynin ser stûyê xwe û ji min hîn bibin, çimkî ez nerm û ji dil nefsbiçûk im û hûnê rihetiyê ji bo canê xwe bibînin. (Metta 11:29)

Hem Îsa û hem jî Mûsa mînaka dilnizmî û xuynermiyê nîşanî me kirin.

Hin pirsgirêkên me yên derbarê zayendiyê de weke yên zaroka ne. Ji bo hevalên xwe vehewînim malê ji John destûrê naxwazim û ew jî ji bo here bi golfê bilîze destûrê ji min naxwaze. Ji bo ez li Target'ê bi kesekî re Îsa parve bikim an jî ji bo li dêra me ya malî wazan bidim ciwanan, ez destûrê ji John naxwazim. Di mijarên me û yên derbarê malbata me de, em bi hev dişêwirin lê di meseleya bê em ê çawa roja xwe derbas bikin de, em bi hev naşêwirin. Ji bor her tiştên biçûk eger me hev aciz bikira, wê vê yekê em pir bibetilandana û ew li min bawer e û ez li wî bawer im! Ez hevserek im ne zarok im.

Em li heyameke ku gelek mirov bûne êsîrên tirsê, dijîn. Pêdiviya wan, bi hêviya hevdîtina bilind ya ku hûn di dilê xwe de vedişêrin, heye.

Di dawiya dawî de, ji bo em îteatê ji peywira Îsa daye me re nakin, tenê em tawanbar in. Erê, dibe ku bihêle em kesên din biterpilînin û rê li ber me veke ku em gunehan bikin (Metta 18:6; Marqos 9:42; Lûqa 17:2) lê îteata ji Qralê me re, di dawiya dawî de hilbijartina me bi xwe ye. Eynî weke Petrûs û Yûhenna em xwuşkên hev jî divê em bi mezinbûna Mesîh bimeşin û wateya vê eynî em jî divê weke wan tiştên em dibînin û dibihîzin bibêjin û wan veneşêrin.

## Êrîşên Devkî

Di serdema me de jinên ku vê rêyê hildibijêrin, dibe ku weke Petrûs û Yûhenna neyên kamçîkirin an jî neyên hepiskirin lê amade bin ji bo berxwedan û vederkirinê. Ev tê wê wateyê ku hûn têkevin rîska ku hûn xelet bên fêhmkirin û gelek caran êrîşê devkî li we bên kirin û tecrîd li we bê kirin.

Ez û John derbarê vê dînamîkê de xwediyê nêrînên cuda ne. Gelek jinên dêrên ku diçe wan, dabîn kirin ku ew qebûlî kursiyê xwe kirin. Her yekê ji wan li welatê me û derveyî welatê me navê sê jinên xizmetkar da. Ev jin rêbertiyê dikin, perwerde dikin û wazan didin. Mijara ku ev rewş di teoriyê de rast be jî, ez û John ne di heman fikrê de bin jî di pratîkê de ne wisa ye. Salê carekê ji bilî Roja Dayikan, yê ku bi awayekî rêkûpêk jinan vedixwîne ser kursiyê, gava ez jê dixwazim ku navên dêran bibêje, navê deh dêran nikare bihejmêre.

Gava nîqaşa me berdewam dikir, John bi awayekî tund anî ziman ku weke jinekê hemû tiştên ku ez ê bibêjim wê fikra teologên ku li hemberî rêbertî û kapasîteya jinan derdikevin, neguherûne. Pêşniyaz kir ku ez gotinên xwe di ber perwerdekirin û gotina ku jin bikaribin wazan bidin, bi kar bînim. Çi argumana ji rêzê ya ku min ê teklîf bikira, wê di çavê rêberan de bi avê de biçûya.

Min pejirand, rêber ne li ser bala min in. Hîn jî ji xwuşk, dê û zarokên keçik ku pêdiviya wan bi îknakirinê heye, ez bi tirs û lerizandinê dinivîsim. Li dêrê min  ji jinên ku hîn jî ji *mamoste* û *kesên wazan* dikin ne bawer in re got, ez ê perwerdehiya wazan nedim wan. Peyva zagonê ji bo dilên wan qul bike hatiye bikaranîn. Tu keçika samîmî ya Xweda, naxwaze ku daxwaza Bavê xwe îhlal bike an jî biperçiqîne. Tişta ku rêber destûrê nede wan ku hîn bibin, nikarin hîn bibin. Eger fîgura otorîteyeke ku Xweda temsîl dike ji we re bibêje ku hemû jiyana we di asta *dereceyeke binî* de ye, hûn ê jê bawer bikin. Eger hûn xwediyê paşerojeke xumamî bin, bawerkirina ji vê derewê hêsantir e.

Ez bi vê *dizanim* ji ber ku ev hat serê min jî.

Hûn ji xwe ne bawer bin, hûn ê her dem xwe û mafê xwe yê

heqdayînê, di ber çavan re derbas bikin. Ez dixwazim bergirka di guhê we de derxînim, perdeya li ber çavên we bidim alî û histiriyê qanûnî ku di dilê we yê hesas de çûye derxînim. Naxwe hûn bi xwe dikarin şîfayê bibînin û bibihîzin. Giyanê Pîroz dibe ku weke huqûq, tib, karê dinyayê, di qadên dewletê de an jî weke bermaliyekê bangî we bike ku hûn bibin elçiyeke Mizgîniyê. Çi tiştên ku hûn bikin divê ji bo mezinahiya Reb be. Ev yek tişta sekuler pîroz dike. Lêbelê kesekî hîs dike ku ji bo li dêrê perwerdê bide, wazan bike an jî heta dereceyekê rêbertiyê bike, gava ku bang lê hat kirin, mirov bibêje ku Giyanê Pîroz pê re nepeyiviye xelet e.

Meseleya zayendiyê, bi kapasîteya rêbertiya kesekî re pir kêm têkildar e. Sedema ku hişt Margaret Thatcher bibe yek ji wan serokê herî mezin yê Ingilistanê, ne ji ber ku jinek bû. Ya rastî zayendî ne pirsgirêk e; zehmetiya em dikişînin, tevgereke bi xurûr û darizandina kesên din û meyla ber bi pêşdarizandinê ve ye. Ev tişt, rêberekî baş jî dikin kole. Dilnizmî, serpêhatî, sedeqat, perwerde û dilpakî; tenê çend ji wan wesfên rêberan in ku wan dikin kesên baş û têgihiştî lê zayendî bi tena serê xwe nabe alîkar ku kesek bibe rêber. Û jixwe Mesîh tunebe em hemû bêehliyet in. Di Korîntiya 2. ayetên 3:4-6an de em wisa dixwînin:

> Bi saya Mesîh ewlehiyeke me ya weha bi Xwedê heye. Em têrê nakin wek ku tiştekî ji me bi xwe ye em bifikirin; lê belê karîna me ji Xwedê ye. Wî kir ku em têrê bikin, bibin xizmetkarên Peymana Nû; ne xizmetkarên herfan, lê belê yên Ruh. Çimkî herf dikuje, lê belê Ruh vedijîne.

Lêbelê dîsa jî rêberekî ku derdikeve pêş beşa 2. ya Tîmotêyos lê wisa şîrove kiriye: "Pawlos bi awayekî hêsan dibêje, gava ku kar hat li ser kirina rêbertiya li dêrê disekine, jin ne xwedî ehl in ji ber ku safik in û li gorî zilaman pir zûtir tên xapandin." Em ê bîsteke din bên ser ayetên di Tîmotêyosê de. Lê divê pêşî ez zanibim: Vê jêgirtinê hişt ku hûn xwe çawa hîs bikin? Fedî, tawanbarî an rûmetşkestî? An hûn rehet bûn û we berê xwe da mahneyan?

Bêguman tu kesî ji me bihêz û tevlîbûyî nade hîskirin. Kirî min ev jêgirtin nexista nav lê fikra li pişt ku jin di derdoreke fireh de sansur

li wan tê kirin, derdixîne holê. Vî rêberî gotinên xwe wisa berdewam kirin: “Gelek jinên bi hêrs di nava salan de tevlî gotinên Pawlos nebûne, li gorî tê dîtin jinên ku li hişyariyên wî ne ewle ne û nadin dû doktrînên wî, pir dişibin dêya xwe Hewa. Niyeta wan baş e lê cahil in.”

Ji bo fikra me ne yek be îcar divê em hêrsokî bin gelo? Bêyî ku ez hêrs bibim jî dibe ku ez û mêrê xwe weke hev nefikirin. Bêyî hêrs bibim dibe ku ez û xebatkarên xwe weke hev nefikirin, hevalên min û ez jî.

Li gorî dibetiyê, eger em bi nirxandina beşa 2. ya Tîmotêyos lê re li hev nekin, sedema vê ew e ku em jinên hêrsokî û cahil in. Gava em hewl didin ku ji Xweda re îteatê bikin, hewldana ku em dikarin bibin jinên xwedayî, bifikar, lêpirsîner ku di ser mijara zayendiyê re biqewizin, di ber çavan re nayê girtin. Tişta behs dike ku di çanda serdema Pawlos de heye lê di ya me de tuneye, dibetiya vê jî xuya nake.

Ev daxuyanî wekî din derbarê nasnameyê de çavkaniyeke xelet dide me. Em ne dêya xwe Hewa ne. Gava em ji nû ve çêbûn êdî em ne zarokên dê û bavên xwe yên ketî ne. Em dibin zarokên Xweda.

Ez di gotinên vî nivîskarî de arezûya bêdengkirin û fedîkirinê dibihîzim. Ez zordariyeke zayendî û dijminatiya jinê dibihîzim. Tişta ez nabihîzim jî Giyanê Pîroz e. Gava Îsa hîn dikir û hişyarî didan, her dem bi hezkirinê û her kes dipejirand û ev tişt dikir. Dêra xwe dişibîne bûkekê. Gotinên vî nivîskarî bêtir dijminatiya mar ya li hemberî jinê, tîne bîra mirov. Nameya Tîmotêyos ya yekem; gava Tîmotêyos ji dêreke çanda Grekî re rêbertî dikir, ji bo pirsên jê re bên kirin bibersivîne ji aliyê Pawlos ve hatiye nivîsandin. Ji bo wan tişta derbasdar, di xizmeta me ya hebandinê de an jî di çanda me de ku tu tişt di vê demê de teqez ne weke xwe ye, gelo wê ji bo me jî derbasdar be? Belkî hûn hîn jî jê ne bawer bin. Belkî jî ji bo hûn rûmetkirina Xweda û rêbertiya Wî nedarizînin, para ku di jiyanê de li para we dikeve we pejirand.

Em hinekî din tev bidin. Hûn dixwazin ku bi van gotinan bi qîza we re bê axaftin? Gava kesekî jê re bigota tu kêm î, naşî yî, tu zû tê xapandin an jî tu cahil î, we yê ev yek bi awayekî bêdeng erê kiribûya? Ev nêzîkayî, çi jin çi mêr; sererastkirina kesekî an jî pênasekina kesekî ku can dide wan, dibe ku bibe rêyeke îlhama Giyan? Bav Xweda, li qadeke

jiyana we ku binêre, we bi awayekî heyî bi van wesfên kêm ku bi nav bike, gelo we kêliyekê jî ev xeyal kiriye?

Belkî jî dibe ku we ev gotin ji xwe re gotibin. Eger ev demek e ku hûn Xirîstiyan bin, belkî jî heman fikir rêberekî an jî mamosteyekî, hin dem an jî deman derbarê jiyana jinên li dêra we de gotibin. Berî bi çendakî jineke ku bi salan e xizmet kiriye, li organîzasyona me geriya û ji ber zilma lê bûye, li xizmeta ku kiriye pirsî bê ma li gorî Pirtûka Pîroz e an na.

Ez dikarim vê sozê bidim we; keçika min, xwuşka min, hevala min: Zavê û Rebê me Îsa ji bo we tu carî ev gotinên fahş negotine. Carekê çi ye ji ber xizmeta min ji Wî re kiriye, ji min re negot te bêrêzî kiriye. Ev, nayê wateya ku ez ê bi pêş nekevim. Piştî her perestîşê ez xwe dinirxînim. Ji min bawer bikin, di her qada jiyana xwe de ez hîs dikim ku Giyan min sererast dike. Lê gava ji bo ez kar bikim bang min dike û ez têm kar, her dem pistepisteke Wî ya ji bo wêrektiyê heye. Guhdar bikin bê ji bo min û we çi gotiye: Dibêje ku hûn bi giştî hezkir in, bihevketî û bi qabîliyet in. Ji bo we bi hîkmet û heqîqî bike, dilekî nû û giyanekî zindî daye we. Hûn bi Giyanê Pîroz dagirtine û Gotina Xweda emanetî we kiriye, bi vî awayî, li şûna ku hûn bibin keçikeke xapandî, bila çavên têgihiştina we bi hîse bibiriqin (Zebûr 45:11; Hezekîêl 36:26; Korintî II 3:6; Efesî 1:18).

Bûka Wî ji zilam û jinan pêk tê. Qirêjiya her yekî ji me bi ava Gotinên xwe şûştiye û di vê pêvajoyê de bi xwîna xwe her du zayend rizgar kirine. Û şîroveya diyar ya beşa 2. ya Tîmotêyos Iê ji bo xebata Pirtûka Pîroz gava min ji jinên ku bi rêkûpêk li mala min kom dibûn dixwend, min di rûyê wan de ji bilî tirsê teslîmiyet jî dît. Tiştên ku zilam digotin, hin kes difikirîn ku hinek jê rast in, belkî jî li paşerojê zû hatine xapandin an jî qels û kêm mane. Yên din jî dev ji fikra ku wê bi awayekî din bê şîrovekirin, berdabû.

Gava min derbarê keçikên we de pirsî, di nava we de hin tişt çelqiyan gelo? Ez hêvî dikim ku tiştekî pizot û bi dêyêtiyê ve girêdayî şiyar bibe. Baş e îcar hûn? Li şûna azadiya ku Mesîh kiriye, hûn ji sînorên xwe razî ne gelo? Eger ji bo qîza xwe hûn destûrê nadin sînoran, divê hûn ji bo xwe jî destûrê nedin. Di Efesiya 2:10an de wisa ji

me re dibêje: “Çimkî em berhema Xwedê ne û em bi Mesîh Îsa hatine afirandin, da ku em di van karên qenc ên ku Xwedê ji pêşî ve amade kirine de, rê ve herin.”

Dua û hêviya min ew e ku hûn xwe tu carî teslîmî pênaseya kêmbûn, cahil û zûxapandinê nekin. Eger em cahil bin, em dikarin bi rêya perwerde û hînbûnê biguherînin. Min biryar da ku ev ji bo min bibe hodrî meydan û min bi vî awayî ji kesên ji min zîrektir çavkanî kom kirin. Pêşî, di ber roniya hev de em li hişyariyên Pawlos binêrin. Di ayetên 14:34-35 yên Korîntî Iê de em van dixwînin:

> Bila jin di civînan de bêdeng bimînin. Çimkî ji bo wan destûra peyivînê tune. Wek ku şerîet jî dibêje bila serî deynin. Eger dixwazin tiştekî hîn bibin, bila li mal ji mêrê xwe bipirsin. Çimkî di civînê de ji bo jinê peyivîn şerm e.

Û piştre di ayetên 2:11-15 yên Tîmotêyos Iê de:

> Bila jin bêdeng û tam bi guhdanê hîn bibe. Ez destûrê nadim jinê ku hîn bike, an jî serweriyê li mêran bike, lê bila bêdeng be. Çimkî pêşî Adem hat afirandin û paşê Hawa. Adem nehat xapandin, lê jin hat xapandin û sûc kir. Lê eger bi edebê di bawerî, hezkirin û pîroziyê de bimîne.

Hemû civaka Grekiyan Xirîstiyaniyê bi hev re hîn dibûn. Çênedibû ku êdî jin di pozîsyona ku di nava paganan de bûn, bimînin; ango di Perestgeha Artemîs de peywira kahîntiyê nema dibû. Pawlos; talîmatên dan Tîmotêyos yên derbarê nîzama dêrê de, ji Zagonê jêgirtin nedigirtin. Ji Îsa jî jêgirtin nedigirtin. Bawermendên nû yên ku ji çanda Grekiyan dihatin ji bo wan bi awayekî baş bide ser hev pêşniyar li Tîmotêyos dikirin. Wê serdemê, di wê çandê de, jin di meseleyên giyanî de otorîte dihat dîtin.

Di wergera Passion de ya ji Aramî hatiye girtin, gotinên Pawlos yên di ayetên 2:11-12 ya Tîmotêyos Iê de wisa tên neqilkirin:

> Jinên ku nû bawerî anîne bila bi ya rêberên xwe bikin, bila fi mijara hînbûnê de daxwazkar bin û bila zanibin bê wê li kuderê bipeyivin. Ez piştgiriyê nadim jinên ku nû bawer kirine li dêrê bibin mamoste û li ser serê mêran bibin desthilatdar lê bila di nava xweşiyê de bijîn. Ji ber ku Xweda pêşî Adem çêkir û piştre Hewa. Adem Hewa ji rê dernexist lê Hewa ew ji rê derxist û fermana Xweda binpê kir. Lêbelê wê jin bi rêya zarokên xwe rûmeta xwe dîsa bi dest bixin, wê wan weke zarokên ku bi bawerî û hezkirinê xwedî dibin û wê bereketa jiyaneke aqlê selîm bi dest bixin.

Ji bo bersivên derbarê bê wê ev çawa bê veguhestin ji bo sepana nûjen, min serî li dêreke ku jin wazan lê didin û bi rêve dibin weke pratîkê li telogekî û rêberê dêrê da. Profesorê koleja Wheatonê û rûspiyê dêra Willow Creek Dr. Gilbert Bilezikian; li ser mijara rêbertiya jinan xebateke ku hijdeh mehan berdewam kir, serokatiya wê kir. Weke pêşî di pirtûka xwe ya *Beyond Sex Roles* de hin keşfên ku tîne ziman ev in:

> Bi kurtasî, em gîhan wê encamê berî Ketin'ê têkiliya tê de ya hevpar ya jin û mêran; û her du jî şibhê Xweda nîşan didin ji bo li dinyaya ku Xweda ava kiriye binêrin, bang li wan hatiye kirin ku bên cem hev. Hem jin û hem jî mêr di hedê bawerî û xelatên ku Xweda daye wan de, ji bo mezinahiya Xweda, berpirsyar in ku xizmetên xwe bînin cih. Weke tiştekî trajîk di Ketin'ê de vê têkiliya hevkariyê ji binî ve darbe xwar. Plana xelasiyê ya Xweda, em jê bawer dikin ku têkiliya jin û mêran jî di nav de, her tiştê ku bi gunehê xera dibe, em hêvî dikin ku armanca wê ew xweşikbûna kêlîka pêşî ya Afirandinê dîsa lê vegerîne. Gelek oldar, Xirîstiyaniyên biaqil bi encamên me re ne di heman fikrê de ne. Hem di vê mijarê de hem di hin meijarên din de wê ew roja ku em ji zanebûna bêhempa ya Xweda bê çiqasî dûr ketine, bê. Heta wê demê, vê nêrînê bi dilnizmiyê lê bi awayekî şidyayî di nava destên xwe de digirim. Ji bo ez ji tişta Nivîsên Pîroz ku dixwaze bike, bawer dikim û dixwazim ku ew jî bikin; ango ji bo xwe ji hemû xelatên giyanî re vekin, ez razî me ku xwe têxim nava rîska ku jinan teşwîq bikim.

Eger jinek ji bo wazan, hînkirin an jî ji bo rêbertiyê bike bangkirinê hîs bike û eger bi dilpakiya ku di Nivîsên Pîroz de diyar kirine jiyaneke xemilandî bijî, wê demê di kapasîteya ku Xweda daye de ji bo wazan bide, hîn bike û rêbertiyê bike, wê perwerde bikin û destûrê bidinê ku perwerdê bistîne. Bi Dr. Bilezikian re ez jî vê nêrînê bi dilnizmiyê lê bi awayekî şidiyayî lê xwedî derdikevim.

## Derbarê Hewayê de Nêrînên Xaxemekî

Berî bi çendakî min û Xaxemê Mesiyanîk (mamosteyê olî) yê zîrek Brian Bileci, me bi hev re sohbeteke dûvdirêj kir. Min endîşeya xwe ya ku gelek keçikên Xweda qet nizanin bê kî ne, pê re parve kir. Nasname û qedirê keçikên Xweda ji aliyê giyanê vê dinyayê ve di bin êrîşeke bexîl de ye û ev yek her diçe hîn bêtir beloq dibe û gelek civat xelatên ku Xweda dane jinan nizanin wê çawa bi pêş bixin.

Min xwest ji pisporekî ku ji zikmakî de Îbranî ye, bibihîzim bê derbarê keçikên Xweda de çi difikire. Min jê rîca kir ku ji Hewayê dest pê bike û piştre bi Sarayê re berdewam bike û heta bûka Mesîh Kiliseyê fikrên xwe bi min re parve bike. Xaxem gelek tişt ji min re gotin û ez dixwazim ji gotinên wî hin tiştan bi we re parve bikim ji ber ku wê alîkariya we bikin ku hûn bi wan nasnameya xwe erê bikin.

Xweda Adem ji Hewayê bêtir hez nekir. Ji destpêkê ve Hewa her dem bi Adem re bû. Her çiqasî navê wê Adem lêkiribe û pêdiviya wî pê hebe jî, Hewa her dem fikra Xweda bû. Xweda nêrîn û îfadekirina bêhempa ya jinbûnê da Hewayê. Jin her dem di hundurê zilam de bû û ha ji ber vê yekê gava zilam pê re bû, ji dema ku ne pê re bû baştir kar dikir (Destpêk 2:18). Bi hatina Hewayê re "nebaşiya" Adem veguherî "pir başiyê."

Ji Nivîsên Pîroz em hîn dibin ku Adem xwe berdaye binê bîreke kûr û piştre hestiyê parsûyê wî vebûye û Hewa ji wir hatiye afirandin (Destpêk 2:21). Jin û mêr ji hev hatin veqetandin lê ev veqetandina du perçeyên nîvco ne ji cihê wan yê zêde pêk hatiye. Her du jî tam û tev in. Jin û mêr ji aliyê îfadekirinê ve ji hev cuda hatin afirandin lê ji

**Jin û mêr ji aliyê îfadekirinê ve ji hev cuda hatin afirandin lê ji aliyê armancan ve tu carî ji hev cuda nehatine afiradin.**

aliyê armancan ve tu carî ji hev cuda nehatine afiradin. Berî Ketin'ê girîng e em bibêjin ku di nava wan de tu cudahî tuneye. Ji ber vê, her du di armancê de yek, du dil de yek û di bedenê de dibe ku bibin yek.

Di rojeke trajîk de Hewa xapiya û Adem îsyan kir. Hilbijartina Hewa kir di meyla xapandina hemû jinan de weke çawa ku wan nake mehkûmî vê fikrê, îxaneta Adem jî nahêle ku hemû mêr îsyan bikin. Ez gelek caran dibihîzim û dibînim hewl didin ku gunehê Adem ji yê Hewayê weke nebaşiyeke kêmtir bidin xuyakirin. Min bihîstiye ku ev weke ku tenê "tawanbariya îhmalê" ye li ser disekinin. Xaxem li hemberî vê derket. Rastiya ku Nivîsên Pîroz dide hînkirin, kirpitand:

> Û çawa bi neguhdariya yek mirovî gelek bûn gunehkar, wisa jî bi guhdana yekî gelek wê rastdar bên derxistin. (Romayî 5:19)

Gunehê Adem ne tenê îhmalek bû. Bi îfadeya herî baş weke "bêîteatiya biqestî" dikare bê binavkirin lê hin pispor vêya weke îsyana bixayîntî tînin ziman.

Ez meraq jî dikim bê gelo Adem û Hewa teşebusî diziyeke nasnameyê dikin an na, ma ne jixwe xwestin bibin Xweda!

Li malê gava zarokên me biqestî hişyariyên dê û bavê xwe îhmal dikin û gava li gotinên hevalê xwe an jî heta li gotinên hev guhdar dikin, em ji çalakiya dikin re îhmal nabêjin. Em ji tişta dikin re dibêjin bêîteatiya hilbijartinê. Di termînolojiya leşkeriyê de, gava ku bi awayekî qestî li hemberî fermanekê tê derketin, navê vê serîhildan e ne îhmal e. Û îcar niha em bixwînin bê Xweda navê tawanbariya Adem çawa bi nav dike:

> Wî ji Adem re got: "Ji ber ku te guhdariya dengê jina xwe kir Û ji wê dara ku min ji te re gotibû 'Divê tu nexwî' te xwar, Ax ji rûyê te bi nalet bû. Tê di hemû rojên jiyana xwe de Bi zehmetî jê bixwî. (Destpêk 3:17)

Ji ber vê yekê modeyeke ku erka Adem biçûk dibîne derketiye holê. (Êdî ji ber ku em hemû di Mesîh de xelas bûne, ez fêhm nakim çima hinek jê xwe mecbûr dibînin ku çalakî û hilbijartinên Adem biparêzin.) Kesên ku vê fikrê diparêzin zilaman teşwîq dikin ku rabin ser xwe û bibin rêberên baş ku ez bi hemû dilê xwe ji vê re dibêjim “erê û amîn.” Ez tevlî dibim ku ji bo zilaman pêdiviyeke jiyanî bi kesan heye ku ev mînakek e. Lêbelê awayê piştgiriya vê pêvajoyê ez diltirsî kirim. Bawer dikin ku hişê xwe bispêrin Ketin’ê û bi vî awayî zilamên dêrê bi awayê herî baş dengê jinan bitepisînin û rêbertiyê bikin.

Ez difikirim ku gelek qusûrên di vî mantiq û vê nêzîkbûnê de hene. Eger Adem biqedimiya û rastî bigotana wê gelek zerar bihatana veşartin ku pir kêm gumana min ji vê heye. Bal û pêşdîtina wî ya derbarê fermana Xweda de, wê li ser mar/xapînera herî baş ya li şûna Hewayê bi kar bianiya. Divê Adem dengê xwe ji bo mar bêdeng bike bi kar bianiya; çawa be jî şerê me ne li hemberî goşt û xwînê ye. Bi heman awayî, divê mêr jî aniha dengên xwe ne ji bo jinên ku Xweda ew di wechê xwe de avakirine û ew xweşik anîne ziman, divê ji bo nebaşiyê bêdeng bikin bi kar bînin.

Ji bo ku mirov kesekî di pêşerojê de ji xeletiyan biparêze, rêya herî baş ne qedexekirin e, pewerdeya eşkere ye. Xeteyeke mezin ya ku Hewayê di paşerojê de kiriye divê di pêşerojê de dengê keçikên wê netepisîne. Eynî weke çawa ku divê gunehê Adem kurikên wî bi xwe ve girê nede!

Ji du hezar salan zêdetir çêbûye ku jin û zilam li dêrê û li tenişta hev hîn dibin. Dem ew dem e em ferq bikin bê em di Mesîh de kî ne û weke çawa em di bexçe de orîjînal hatine afiradin, dem dema ku em li tenişta hev rêbertiyê bikin. Wê zilam bi nasnameya xwe ya zilamtiyê û jin jî wê bi nasnameya xwe ya jintiyê, wê rêbertiyê bikin. Êdî mînaka me ya Îsayê ku rêya em bi Şeytan re têkiliya rast li dar bixin, heye:

> Hingê Îsa jê re got: Ji min dûr keve, Îblîs! Çimkî hatiye nivîsîn: Biperize Xudan Xwedayê xwe û bi tenê ji wî re xizmetê bike. (Metta 4:10)

Li şûna ku em di pêşbirkeke mantiqê de di heriyê de herin, divê em gotinên Xweda olan bidin. Em ji Xweda re wisa xweşik xizmetê bikin ku em bibin argumanên bêhnê distînin û jiyaneke bi baweriyê dom dikin. Û mînaka me ya dawiya dawî Îsa ye. Weke çawa Ew meşiyaye divê em jî bimeşin. Ji şopandina kesekî bêtir, heta ji şopandina Pawlos bêtir divê em Wî bişopînin. Pawlos çawa ku wî bi xwe Mesîh dişopand, şîret li Tîmotêyos kirin ku ew jî bi heman awayî bide dû rêya Mesîh: “Çawa ku ez mîna Mesîh dikim hûn jî mîna min bikin.” (Korîntî I, 11:1)

## Derewên Şeytan, Şîfaya Xweda

Gava ku em guhê xwe bidin şîretên şeytan û hêzê li zayendekê bar bikin û ji yekê derxînin, hem wê mêr û hem jî wê jin bên xapandin. Dem li benda kesî nasekine û diherike, diçe. Dem ew dem e ku em bidin dû fermana Îsa û ji bo kesên windayî xelas bikin em ê berdewam bikin (Lûqa 19:10). Ew dem hatiye û derbas jî bûye ku dêr li ber dinyayeke şikestî û perçebûyî; pir netewe, pir nifş û zayendiyan di jiyanê de bike tekane armanc ku wan bi ser hev de bîne. Em li ser mijara zayendiyê bi awayekî xelet sekinîn û me her du zayend jî anîn halê parçekirî û birîndarbûyî. Nasnameya xwe ya ku ji aliyê Xweda ve li me hatiye bexşandin gava me dîsa bi dest xist, wê başbûna zayendî jî dest pê bike.

Carina tevlihevî ewqasî mezin dibe ku jin li zayendiya xwe dipirsin û hîs dikin ku divê mêr bihatana dinyayê. Gelek ji wan zayendiya xwe diguherin an jî androjeniyê dipejirînin û bi vî awayî xwe bi xwe hewl didin ku xwe rehet bikin. Gotinên Xweda yên ku ji devê pêxember Îşaya derdikevin bixwînin:

> We her tiştî serobino kir! Ma cerçêker bi gilê re yek e? Ma avahî ji bo kesê ku ew çêkiriye dikare bibêje: “Ma wî ez çêkirime?!” Ma tiştê ku şikil lê hatiye dayîn, Dikare ji bo kesê ku şikil daye re bibêje: “Ma ew ji tiştekî fêm nake?!” (Îşaya 29:16)

Pirs her û her dimîne, em li Xweda ewle ne gelo? Em bawer dikin ku Ew baş û bi hikmet e û ji bo me di malzaroka dêya me de bi şikil

bike em jê bawer dikin ku xete nekiriye? Gava ku me kar hemû xistin nava destên xwe û em ketin xefkê, di xeyalşikestinên me de dibe ku armanceke Wî hebe?

Ji min bawer bikin, ez bi birînê dizanim. Ya din jî êşa ku gelek kes dikişînin, ez di ferqa wê de me ku ji texmîna min pir kûrtir e… Lêbelê Xweda, dikare destên xwe dirêjî cihên kûr bike û dikare destên xwe bide cihên ku tu mirov nikare xwe bigihîne wir. Xweş tê bîra min ku min ji rastiya ku ez jin im, nefret dikir. Sedema vê hîsê nizanim ne ji ber têkiliya min ya guherbar ya bi dêya min re bû an êrîşeke bergirtî ya dijmin bû ku dixwest têkiliya min û Xweda xera bike, nema dizanim. Çi ji ber bûyerên jiyana min, çi ji ber têkiliyên min yên bi jinan re an jî çi ji ber seknên dijber yên li dêrê, ez ji qelsbûnên ku bi jintiyê ve tên girêdan hez nakim. Gava mezin dibûm tam weke mêran bûm û ji keçikan bêtir hevalên min yên kurik hebûn. Bêtir kêfa min ji kurikan re dihat. Piştî ez kamilbûm, min xwe weke kesekî fezayî ku bi zorê ew şandine dinyaya wî ya xweş û pempeyî, hîs kir. Keçik bi pistepist û îmayên ku min ji wan fêhm nedikir dipeyivîn û te digot qey bi rewta helhelê ango bi nezaket û zerafetê hereket dikirin. Di seranserê jiyana xwe ya lîseyê de, bi piranî ji bo cihên xwe yên jinbûnê û feqitiya xwe ya êşê dide min veşêrim, min pantorê kont û tilûm li xwe dikirin.

Gava ez bûm dergistiya John, min bi awayekî baldar jê re anî ziman ku ez di nava bedeneke jinê de xwediyê mejiyekî mêran im. (John di cih de got ev ne tiştekî pêkan e!) Lê gava ji aliyê erênî ve lê binêrim, ez ji dilê safî jê bawer dikim ku sedema vê ew e ku Xweda ji bo bibim dêya çar kuran ez amade dikirim! Xweda ez derxistim rêyeke şîfayê. Weke jinekê ji bo ji dilê safî qedir û qiymetê bide min, bi min re kir pistepist. Li huzûra Wî, li şûna hemû fediya ku olê li ser îmaja jinê danîbû, ew kincê mezinbûnê xwe lê danî. Gîha kûrahiya canê min û li şûna hiş û tirsa ku bi jinbûna min ve hatibû zeliqandin ku dêya min ev bi nezanî kiribû, êdî werektî û hêzê xwe lê danî. Min ji bedena xwe ne tenê ji aliyê dîtbarî ve, ji aliyê tiştên ku dikare bike ve jî hez kir û ez hînî vê bûm. Ji bo kesên din jî şîfayê pêde bikin, rêwitî û pêvajoyek e ku dikarim parve bikim.

Baş e, di heyameke wisa de ku zayendî ji nû ve tên diyarkirin û tên teşwîqkirin, heta jê re li çêpikan dixin îcar eger ez bi jinbûna xwe re di nava têkoşînê de bim, wê çi bibe? Wê çanda me bibêje ku karên xwe têxe nav destên xwe û ji aliyê çalakî ve zilam be! Lê gava min ev bikira, min ê pêvajoya şîfaya Xweda û hemû dersên ku ez di rê de hîn bûm, min ê bavêtaya çopê. Gava me dev jê berda ku em xwe bi kesên din re bidin ber hev, wê demê em ê bên asta ku em xwe bi hemû qusûrên xwe bipejirînin.

Wê demê ji bo hûn başbûnê bi çavên xwe bibînin, hûn dikarin kîjan gavan biavêjin?

1. *Duayan bikin.* Ji Giyanê Pîroz; dilekî ku parçe nebûye bixwazin û gava hûn xelet fikirîn an jî di cihên we bêîteatî jê re kir, jê bixwazin ku vê derxîne holê. Dikare pêşbiryarên zayendî û nefreta zayendî û nêrînên me yên derbarê hev de, xera bike. Ne ji bo xizmetkarê parçebûnê, ji bo xizmetkarê li hevkirinê duayan bikin.
2. *Îradeya xwe teslîmî Xweda bikin.* Belkî li şûna ku hûn ji tiştа di Nivîsên Pîroz de dizanin û dibînin û di duayê de tê diyarkirin, we xwe li pişt rêbazên mirovan veşart. Belkî we destûr da û hişt ku tirsa (an jî tirsa jinbûnê) mirov we ji xwesteka Xweda dûr bihêle. Peywira Mezin di jiyana we û vê serdemê de bê wê çawa bê xuyakirin ji Xweda bipirsin ji ber ku dibe di serdemên pêş de cuda bê xuyakirin.
3. *Dijminê xwe nas bikin.* Şerê me ne li hemberî goş û xwînê ye. Û gava em bê biryar bin, em weke ajanên du alî tevdigerin. Di Nameya Yaqûb de, em dixwînin ku gava em teslîmî Xweda bibin em ê li hemberî Şeytan li ber xwe bidin û wê ji ber me bireve.
4. *Li jiyan û axaftinên xwe vekolin.* Hûn çi dibêjin an jî çi dikin ku dibe pêşbiryarên zayendî xwedî bike gelo? Eger Giyanê Pîroz di jiyana we de qadên hûn tawîzan lê didin, derxistibe holê, wê demê ev pêşbiryar an jî nefret bi îhtimaleke mezin hatine ragihandin.

5. *Nêrîna xwe piparêzin.* Mirovên ku tu fikrê neparêzin di her tiştî de dikevin talûkeya xapandinê. Kesên ku li hemberî xebata ku jin û mêr bi hev re dikin, derdikevin; bi nezanî li hemberî pergala resen ya Xweda derdikevin.
6. *Ji bo yekitiya di bedena Mesîh de şer bikin.* Jin û mêr ne reqîbên hev in. Em xwuşk û bira ne, parêzvan û hevpeymanên nêzî hev in. Divê em weke pardariya xwuşk û birayan, di nava sohbet û rêzgirtina li beramberî hev de, bi hev re bimeşin. Û divê em xelatên hev teşwîq bikin. Eger Xweda bixwesta ku jin bêdeng bimînin, wê tu carî dengek nedaya wan. Xweda, dizanîbû ku pêdiviya bandora Adem û jinên dinyaya me bi deng heye.

## Temamker û Bengiyê Hev

Ji bo nêviyên min yên keçik bifikirin, bixebitin û pirsan bikin ez dixwazim bi hêz bibin. Bi vî awayî bila hîn bibin û bi hînbûnê re bila karibin baweriya xwe di jiyanê de bi cih bikin. Em dibêjin ku jin ji nû ve dikarin xwe çêbikin lê dîsa jî dogma û doktrînên bicîhbûyî yên ku bi rastî û bintemamî azad bûne înkar dikin, hene. Gelek jin li şûna peywira Mesîh; di nava sînorên ku dêrê diyar kirine de ku em bibêjin azad in, wê rasttir çêbibe.

Jin û mêrên bêhîkmet; ji bo hilbijartinên nebaş ku li Bexçe'yê dikirin û vir ve, ber bi tawanbariya hev ve diçin. Fedî û tawanbarî, tu carî alîkariya kesekî nekirine ji bo ew kes bi pêş de biçe. Fedî û tawanbarî avê girikî dikin û îmaja kurik û keçikan şêlo dikin. Ev rê dibe sedema ku tişta Xweda di Mesîh de pak kiriye, qirêj û ne xweşik xuya bibe.

Zayendî ji bo xweşikbûna xwedayî îfade bike, hatiye afirandin. Mixabin, di dawiya dawî de incex pesend û erêkirina ku em dikarin ji Xweda bistînin, me hewl da ku em ji hev bistînin û bi vî awayî me hêz û rûmeta xwedayî ji destên hev stend. Xweda ne ji bo ku em cudahiyên hev biçûk an jî bi tiçtekî nehesibînin, ji bo em xelas bibin em afirandin.

Û aniha di Mesîh de tazîbûna me bi rastiya Wî hatiye nuxumandin.

Di Mesîh de jin û mêr ne dijminên hev in, em bînin bîra xwe ku hevpeyman in. Gotinên Pawlos yên di ayetên 11:9-12 yên Korîntî lê de, nêrîneke baş li ber me vedike ji bo gotinên me yên derbarê hev de bê em ji hev re çi ne û em ê bikaribin ji hev re bibin çi. Di ser vê pasajê re em ayet bi ayet lê herin. Ayetên 9 û 10an em wisa dixwînin:

> Îcar mêr ne ji bo jinê, lê belê jin ji bo mêr hat afirandin. Ji bo vê yekê û ji ber milyaketan, divê desthilatiya jinê li ser serê wê hebe.

Di Mesîh de jin û mêr ji hev ne qutkirîne, bi hev ve girêdayîne. Çavkaniya me di dawiya dawî de Xweda ye lê ev ayet weke berberiya di nava zayendiyan de, li ser reqabeta herî kevin ya tê zanîn disekine.

Cudahiyên me ji bo em hev temam bikin, hene. Li cihê girêdana bi hev re û beşdarkirinê, serdestî û hiyerarşî ji holê radibe. Di ayetên piştre de, ev veçirîn berdewam dike:

> Lê dîsa li ba Xudan ne jin ji mêr û ne jî mêr ji jinê serbixwe ye.

Pawlos li vir dev ji jin û mêran berdide û bi awayekî diyar derbasî kesên bi hev re zewicî ne dibe. Ji nirxa ku vê ayetê ji her du zayendan re bexşandiye, hez dikim. Mêrê min bi awayê hezkirina xwe ya ji Xweda, ji min û ji zarokan; min bi rûmet dike, bi heman awayî ez jî bi hezkirina xwe ya ji Xweda, ji malbatê û ji wî, ez wî bi rûmet dikim. Piştre Pawlos, ji dînamîka zewacê vedigere mijara zayendiyê ya giştî.

> Çimkî, ka çawa jin ji mêr çêbû, mêr jî bi jinê tê dinyayê.

Jin ji aliyê kokê ve ji parsûyê mêr hatiye honandin lê aniha mêr ji malzeroka jinê tê honandin. Jin ji mêrekî ango ji Adem cara pêşî çêbûye û piştre em hemû ji Adem'ê duyem ango ji Îsa ji nû ve çêbûne. Pawlos wisa berdewam dike:

> Lê her tişt ji Xwedê ye.

Mijara reqabeta bê kî pêşî hatiye û kî yê herî baş e, bi wehiya bê Xweda kî ye re, divê bigihêje dawiyeke teqez. Divê em dîsa bigihêjin perspektîfa ku tenê Xweda pîroz e. Ew tenê yê yekem û dawî, destpêk û dawî, Alfa û Omega ye. Tu kes nikare weke Bavê me rêbertiyê bike an jî hez bike.

Wateya vê ne ew ku bêtir ji kurikan û hindiktir ji keçikan hez dike. Nayê wê wateyê ku weke hev ji her du zayendan jî hez dike. Ji jin û mêran bi awayekî bêhempa hez dike. Gava em aliyekî di ser yê din re bigirin, em ê ji sûretê Wî dûr bikevin ji ber ku Xweda zayendî weke îfadeyeke xwe hilbijart.

## Jin û Mêrên li Dêra Pêşî

Eger em dîroka xwe bi awayekî tenduristî fêhm nekin, em ê gelek caran pêşeroja xwe biçûk bikin lê ji bo dijmin têgihiştina me binuxumîne perdeya dixwaze bide ber tu gumana min jê tuneye ku Giyanê Pîroz dixwaze vê perdeyê biqetîne. Gava em li Nivîsên Pîroz vedikolin, ji rastiya ku dêra pêşî hêzeke em lê baldar bin pê ve tu rev tuneye. Gava ku çanda wan tevgerên wan bi sînor kirin, vê rewşê tenê xizmeta ku fireh bibin û derbasî cîhekî nû bibin, kir. Li hemberî fermanên qralên dinyayî ji tirsan çong neşkerandin ji ber ku halê hazir li ber Xwedayê Mezinê Mezinan çong şkerandibûn. *Her roj diyarde,* tiştên bêhempa û mûcîze dihatin serê wan. Bi têgihiştina ku desthilatdarê dawî li vê alema naxuyeye, tevdigeriyan.

Bi Giyanê Xweda hatibûn nîşankirin û ji bo karên mezin hatibûn veqetandin. Xeyal nekin ku li cîhê perestîşê ji aliyekî ve jin û ji aliyê din ve jî mêr kom bibûn; bi piranî li malan, li sûkê, li civînên bi dizî yên li binê erdê û heta li keştî û zindanan kom bûn. Van bawermendan ji her neteweyî, ji her zimanî, ji her çandê mirov dipejirandin lê dîsa jî di heman Giyanê Pîroz de dibûn yek. Her du zayend bibûn bedenek ango ji bo bûka Mesîh ava bikin, pişta xwe dabûn hev. Gava em bibin yek, tenê aliyê Xweda heye. Mizgînî ji malekê dibirin maleke din. Di ayetên 2:42-44 yên Karên Şandiyan de, şibakeyeke bê ev beden çawa bi awayekî zindî mezin dibe tê de xuya dike:

> Wan herdem xwe da hîndariya Şandiyan, hevpariya ruhanî, şikandina nên û duakirinê. Tirs ket dilê her kesî. Û gelek karên mezin û nîşan bi destê Şandiyan dihatin kirin. Hemû bawermend bi hev re bûn û her tiştê wan hevpar bû.

Divê ev îfadeya "bi hev re bûn û hevpariyê" tenê bi pêdiviyên wan neyê sînorkirin; asta hebandinê, nefsbiçûkî, beşdarî, xwarin, dua û hemû tiştên xwediyê wan in, di xwe de dihewîne. Wateya hevpar, tê wateya beramberî, berbelav, rojane û civakiyê.

Jin û mêr, hem di qadên hevkariyê de û hem jî di yên hînkirinê de alîkariya hev dikirin. Hevkarî tunebe û mirov hînkirinê bike; civakeke ku xizmeta pêdiviyên kesên din bike, ava nabe. Tu tişt tunebe û mirov li dora maseyeke girover bênîqaş hînkirinê bike, wê ev yek mantalîteyeke elîtîst ava bike an jî wê rastiyê berevajî bike. Tiştên em hîn dibin, ne bi tiştên ku em raste rast re dizanin, bê em rastiya çawa dijîn re tên ceribandin. Gelek mirov bi tiştên ku di serê xwe de dizanin lê di jiyana xwe de nikarin wan bi pêk bînin, dijîn û hêsîrên van tiştan in. Ji bo em di helwest û pêkanîna rastiyê de hevgirtî bin, pêdiviya me bi malbat û hevalên me heye.

Di dêra pêşî de dengeke jinan hebû. Eger ne wisa bûya, wê çîroka Hananya û Safîra bi awayekî din pêk bihata. Di ayetên 5:1-11 yên Karên Şandiyan de, em çîroka gava jina wî ne li cem wî ye ya zilamekî piştî ku derewê li Petrûs dike dikeve û dimire, dibînin. Piştî sê saetan jina wî tê. Haya wê jê tuneye ku mêrê wê miriye lê dîsa jî dizane bê divê bersiveke çawa bide. Gava Petrûs ew darizand, derewa ku ji berê de bi mêrê xwe re li hev kiribûn xwe dubare dike û ew jî weke mêrê xwe dimire. Tişta ez dixwazim bibêjim; li gorî hînkirina bengî bengî ya ku di roja me de pir tê hînkirin, Safîra bi derewê re wê "daxwazên mêrên xwe bianiya cih û wê bi vî awayî ew bi rûmet bikira." Lêbelê bi hilbijartina derewê re Safîra ji jiyana xwe bû. Dengê xwe bi nebaşî bi kar anî. Eger rastî ji Petrûs re bigota wê nemiribûya.

Gava ku mesele bû wahiyeke bêhempa ya baş û dilovan, cih ji kesî re tuneye ku li derve bê hiştin. Hem alîkariyên derbasdar yên jinê

û hem jî yên mêr hebûn. Gelek ji wan ev dînamîk cara pêşî tecrube dikirin. Çi tiştên ku Ketin'ê dane windakirin hebin, Xweda weke parçeyekî ku wan nû bike mesihkiribûn. Jin û mêran "li ser erdên bajarên xwe û li her çar aliyên dinyayê" bi hêz û başiyê ked dan. Ayetên 2:46-47 yên Karên Şandiyan, ahenga dêra pêşî wisa diyar dikin:

> Her roj bi hev re di Perestgehê de diciviyan, li malên xwe nan dişikandin, bi şahî û bi dilekî xwerû xwarin dixwarin. Pesnê Xwedê didan û di nav hemû xelkê de qedrê wan dihat girtin. Û Xudan jî roj bi roj hejmara yên xilasbûyî zêdetir dikir.

Ev ayet; ahenga rojane ya dêra pêşî ya ku di bin xweşiya Xweda de ava bûye, berçav dikin. Bawermendên Yahûdî bi hev re tevlî perestgehê dibûn, ji bo hevkariyê bikin li malan kom dibûn û bi dilên comert û spasiyê tije, li dora maseyan rûdiniştin. Jiyana wan bi hemda Xweda bi ser ve diçû û li ber dilên gel şirîn bibûn.

Em li ser bê wê çima dêr bûka Îsa li derve bihêle, biçûk bibîne, kêm bibîne an jî bi tiştekî nehesibîne; bifikirin? Ji ber çi me jê bawer kir hemû ne bi heman awayî leheng in?

Ji demeke zûde ye *fikra ku jin û mêr bi hev re tevdigerin* hatiye veşartin. Jiyanên ku bi xweperestî û pêşbiryaran hatine parçekirin, her du zayend jî birîndarkirin.

Lê gotina dawî an jî dawiya çîroka me ne ev e. Di pêşnûmeya Asîmanî de, zayendî ne mijara birîndariyê ne û ne jî qada şer ya reqabetekê ne. Bi cudahiyên xwe em hatin cem hev û gava em bi hev re ne em bêtir bi hêz in. Qîz û xortên Xweda mezinbûna jiyana bi hev re, di vê jiyanê de dibe ku derkeve holê. Û bi alîkariya me ya bi hev re, wê sûretê Xweda derkeve holê û mezinbûna Xweda di dawiya dawî de wê bi hemû şewqa xwe biçirise.

## Pirsên Nîqaşê

1. Hin şerên ku mêr mecbûr dimînin ku bi tena serê xwe şer bikin çi ne?
2. Weke jinekê we bi banga Xweda re hêrsdariya mêran ya di navbera wan û sînorên kevneşopiyê de, tecrube kiriye gelo?
3. Peywira Mezin, di jiyana we de çawa xwe îfade dike?
4. Pênaseyên "netêr, cahil û yên zû tên xapandin" we weke şexsî çawa dide hîskirin?
5. Ji aliyê ku hûn Mizgî'niyê rahijinê ve hûn çawa dikarin asta xwe ya kabîliyetê zêde bikin?
6. Di kîjan qadên ku we kesên din tawanbar kirine de, hûn ketine xefkê?

7

# Reqabeta Tirs û Hezkirinê

Hezkirin xweşikbûna giyan e.

AUGUSTINE'Ê PÎROZ

Berî bi çendakî ez û John li dêreke me jê hez dikir, bi hev re me li ser zewacê guftûgo kir û dem derbas kir. Ew êvara yekşemê me di nav kesên ku me ew ji malbatê dihesibandin, derbas kir. Gava dema me xelas bû ev pirsa mezin kirin. "Piştî zewaca ji sîh salî zêdetir, îcar gava hûn li dawiya xwe dinêrin tiştekî cuda ku hûn dixwazin bikin heye gelo?" Ev pirs ji bo bersivê li para min ket. Ji ber dema me hindik mabû, min xwest hem bersiveke rast û hem jî bersiveke kin û tîr bidim. Min hilmeke kûr kişand û li xwe mikur hatim, "min destûr dida ku John bêtir xeteyan bike, bi vî awayî min dikarîbû hîn bêtir bêtirs jê hez bikim."

Te digot qey teqlek li qelebalixê ket. Ji cihê lê rûniştibûm min dît ku jin û mêr bi awayekî ecele hêsirên xwe paqij dikin, axînên kûr û serhejandinên bêdeng hebûn. Tirs reqîba herî mezin ya hezkirinê ye... Ji aliyê tîrbûnê ve hekhev û ji aliyê feraseta xapandinê ve kujer e.

Di zewaca me de tiştên ku ji wan ditirsiyam ku wê bên serê min,

gelek ji wan qet nebûn. Xemên ku li şevan îşkence li min dikirin, tenê rûyê min diqermiçandin. Di tûwala jiyana min de tu carî bi qasî şûna firçeyekê jî cih negirtin. Sedema vê ne ji ber ku min wêneyên baş çêdikirin, bi xêra başiya bêhempa ya Xweda bû.

Ez jî weke her kesî hez nakim ku xeteyan bikim. Lê gava li dawiya xwe dinêrim, ez dibînim ku min bêtir xwe dixist bin barê rîskan. Li aliyê vî alî yê asîman, ez ê tu carî nizanibim bê tirsa min çiqas tişt ji me her duyan jî dizîn. Lê ez vê dizanim, tirs şêwirmendekî berebat ya zewacê ye. Çi tîştên ku hezkirin dixwaze wan têxe nav hewldanê, tirs wan felç dike û hêsîr digire. Em ferq bikin û nekin jî, hezkirin û rîsk bi hev re ji nêzîk ve têkildar in.

Ez li malbateke ku ji bedêla hezkirinê tirs di malê de bêtir desthilatdar bû, mezin bûm. Di zewaca dê û bavê min de her dem tirs hebû. Hevaltiya wan bi tirsê pêçayîbû û heta aboriya malbata me jî bi vê tirsê re têk çû. Tu carî têrî me pere, têrî me hezkirin û hevalekî ku mirov lê ewle be, tunebû. Tirsê li odeyên mala me ya xweşik û li dîwarên me yên bêtablo olan dida. Bavê min hosteyê avahiyan bû lê ji ber tirsê em her dem li malên ku ne weke malan bûn, rûdiniştin. Gelek şevan dê û bavê me heta derengê şevê gava şer dikirin, min û birayê xwe hewl dida ku di nava wî şerî de razên. Li ber şewqa lempeyekê min rojika xwe dinivîsand û di nava tariyê de min soz didan xwe. Ev notên ku bi hêrsê min dinivîsandin, ez difikirîm ku wê min biparêzin. Min soz da xwe ku ez ê tu carî *qels* nebim. Dê û bavê min di dawiya dawî de dev ji hev berdan, hem de du caran û bi awayekî dijminî dev ji hev berdan û her kes çû bi rêya xwe de.

Gava min bawer kir dilê min ji xwe re hêlînek dît lê ev yek nedihat wê wateyê bê ez ê çawa tevbigerim. Di deh salên pêşî yên zewaca me de, ez mecbûr mam ku bi tora ewlehiyê ya biqusûr ya ku min di zaroktiya xwe de ava kiribû re, rûbi rû bimînim. Redkirina qelsbûnê dihat wê wateyê ku min nizanîbû ez ê çawa bibexşînim an jî bêm bexşandin. Tayên vê torê li min hatin girêdan û hema bêje hindik mabû zewaca me bifetisanda. Aliyekî mêrê min ku bişibe bavê min tunebû û ez jî ne weke dêya xwe bûm lêbelê dîsa jî demên ku dê û bavê min

difikirîn ku ez di xew de me, ew gotinên wan yên bi êş û elem yên wan kêliyan îcar min digotin.

Mîrasa tirsa wan li dû xwe hiştibû min bi xwe re dikişand pêşerojê û berî ku tirsê mala me jî teslîm bigirtaya divê ez bisekiniyama. Bi qasî min xeyal dikir ji qusûrên John bêtir yên min serav dibûn. Li şûna ku divê ez tişta rast bikim, min senaryoya ku ji zarokatiyê hîn bibûm, dilîst.

Bi ser ku ez gelek caran hatibûm bexşandin, min pir kêm dilovanî ji John re nîşan dida. Peymana me ya zewacê bi awayekî pir xurt dihat halekî din û di vê pêvajoyê de hezkirina me biçûk dibû.

Min red kir ku ez bêtirs ji John hez bikim ji ber ku ez ditirsiyam.

Di nava teşebusa parastina xwe de, min dest pê kir ku cihên fireh yên dilê xwe bi şûnde bang wan bikim. Di salên pêşî yên zewaca me de, ez hîn bûm ku John pornografî û masturbasyonê dixe nav têkiliya me. (Ez û John di vê mijarê de her dem em bi hev re eşkere tevgeriyan.) Gava paşeroja min dibe mesele, ez ji bîr dikim bê John çiqasî fêhmbar e û bi vî awayî min her dem xwe jê vekişand. Tu dibêjî qey weke Îsa çawa em bexşandine, fermana li me kiriye ku em jî bibexşînin, bi guneha John ku derket holê re, winda bibû. Ez di nava tirsê de jiyam û bêyî ez piştgiriyê bidim wî hewl dida azad bibe û bi vî awayî min hişt li ber xwe bikeve. Ev ne têkoşîna *me* bû, ya wî bû. Sedema min alîkarî nekir, hinekî bi paşeroja min ve girêdayiye ku ez hîs dikim giraniyê li ser pişta min çêdike û di encama vê de ew tişta ku wê kêliyê min tecrube kir, min bawer nedikir ku ez ji vê baştir heq dikim.

Bê navber me dest bi pevçûnan kir. Ji aliyê hestiyarî ve ez dûr ketim û ji mesafeyeke diyar min têkoşîna wî temaşe kir. Heta astekê darizandina wî dihişt ku ez xwe di ewlehiyê de hîs bikim. Eger nehataya guhertin, ez ne mecbûr bûm ku wî bibexşînim. Vê ya hişt ku qadên din yên jiyana me jî li paş bimînin. Qet gumana min jê tuneye ku vê rewşê hişt salên pêşî yên zewaca me hîn bêtir bi zor zehmettir kir.

Şevekê di nava hemû hêrs û dilşkestiya xwe de, min xwe avêt Xweda: “Gava guherî ez ê wî bibexşînim.”

Bi qasî min didît hemû baweriya di nava min û John de hilweşiya bû

û min nedixwest careke din hêvîşkestî bibim. Xweda bi pirsekê bersiv da vê daxuyana min: “Tu li min bawer î, Lisa?”

“Erê.”

“Baş e. Ji bo biguhere divê tu John bibexşînî.” Heta bi gotinên ku ez ê bibêjim jî dan min: “Ez ji te bawer dikim ku tu yê biguherî û ez te dibexşînim.”

Ev hevok tam berevajî fikra senaryoya min ya her dem, ango “Gava tu guherî ez ê bawer bikim ku tu resen î” bû.

Ev şêweyê ramanê ji tiştekî ku min dizanîbû pir dûr bû ku min bawer kir Xweda rê li ber min dixe. Gava ku min ev dilovaniya bê bersiv û bê tiştek pêşkêşî John kir, ji bo me her duyan jî pêvajoya başbûnê dest pê kir. Fedîbûn ji tariya xwe derket û kete nava roniyê û ji hêsîrbûna xwe rizgar bû. Ev guhertina nêrînê xaleke man û nemanê bû. Min dikarîbû ji Xwedayê naguhere, bawer bikim.

## Hezkirina Bêtirs

Hezkirina bêtirs ne bi performansa şexs ve girêdayiye, xwe dispêre sedaqeta pak ya Xweda. Gava min guneh û qadên ez li wan dilteng bûm, bi navê Îsa li Bav mikur hatim, ez wê kêliyê qet ji bîr nakim. Ji ber ku Ew, bawer dike ku wê pêşeroja min hîn baştir bibe. Gava mirovan em hêvîşkesî kirin, ji bo em rîskeke di pêşerojê de daxînin asta herî kêm, di pileya qebehetê de ya ku em hezkirina xwe lê dihûnin, belavkirina me ye hêdî bi hêdî ne tevgereke eletewş e. Em ditirsin ku her tiştî xwe derxînin holê û ji ber vê jî em bi paş de vedigerin. C. S. Lewis di pirtûka xwe ya bi navê *The Four Loves* de, vê xeteya bi vî awayî bi awayekî pak û paqij derdixîne holê:

> Hezkirin bi her rewş û awayî bêparastin e. Eger hûn ji tiştekî hez bikin wê dilê we bitengije û bêguman wê dilê we bişke. Eger hûn bixwazin ku hûn ji xerabûna dilê xwe bawer bibin, divê hûn wî nedin tu kesî heta nedin heywanekî jî. Wî bi hobî û luksên biçûk, bi awayekî baldar bipêçin; ji hemû tevlîbûnê birevin. Wî di qutiya

> xweperestiya xwe de an jî di tabûtê de bi ewlehiyê veşêrin. Lê di nava wê qutiya ewlehî, reş, bêtevger û bêhewa de wê dilê biguhere. Wê neqermiçe, naşke, qul nabe û wê bê halê bêşîfayê. Hezkirin bêparastin e.

Ha ev e. *Hezkirin bêparastin e.* Dibe ku ev cotbûn li xweşa me neçe lê ez fêr bûm ku tu reva ji vê tuneye. (Û bawer bikin min ev ceriband.) Lê hesab nekin ku *bêparastin* tê wateya ku mirov di bin lingan de divê amade be. Ya rastî, hûn xwe bêtir amade dikin ku xwe *mafdar derxînin.* Ji ber ku hezkirin tu carî têk naçe.

Em hinekî jî li rîska bêparastinbûnê bikolin. Pênaseyeke terma *bêparastinê* jî tê wateya "teşhîrkinê." *Pêparastinbûn* bi awayekî hêsan miriv dikare bi *tazîbûnê* ve girê bide. Tazîbûn rîsk e ji ber ku tu tişt ne bi dizî û parastiye. Hezkirin weke îdeal cihekî biewle ye ku em lê tazîne û nikarin ji bîr bikin.

Çanda me bi awayekî pir xurt ji tazîbûna ber bi zayendiyê ve diçe. Ez dixwazim diyar bikim ku ji aliyê dil ve tazîbûn û bêtirsî ye. Gava ku bi awayekî eşkere em li ber Xwedayê xwe sekinîn, wê demê em di asta herî bi hêz de ne. Ev ji hîsên me yên giştî re dibe ku dijber bê lê li şûna ku em mirovbûna xwe bi qerpalên ji fediyê tije an jî bi kincên rastiyê yên şexsî bi awayekî belasebeb bipêçin, em li ber Xweda tazî bin ev pir baştir e.

Îsa; ji bo ku em bibin weke Wî, mezinbûna xwe danî aliyekî û gava rahişt navika evdên xwe, ji bo me hat asta bêparastinê. Îsa; ji bo hezkirina Xweda ji me re diyar bike, bêparastî ma. Ha ji ber vê em dikarin bêtirs hez bikin… Bê pîvan bawer bikin… Û bêsînor hêvî bikin.

Eger hûn ê bêtirs hez bikin, naxwe wê demê berdewam bikin û bêpîvan bawer bikin. Hêviyên xwe ewqasî di avên kûr de bi cih bikin ji bo erjeng be.

Bawerî, hêvî û hezkirin: Ev her sê mayînde ne. Ji bo hêza hedanê bidin me, di nava hev de û bi hev re di nava hevsengê de dijîn. Di nava van her sê hêzan de ya herî bilind hezkirin e. Bêyî hezkirinê çalakiya baweriya rastî nabe û bêyî hezkirinê hêvî jî nabe.

**Min fêhm kir ku tişta berevajî tirsê, ne bawerî an jî wêrektî ye, hezkirin e.**

Xweda hezkirin e. Hezkirin bêdawî ye. Hezkirin tu carî xelas nabe û tiştekî ku mirov emanetî hezkirinê bike tu carî winda nabe û tiştekî ku ji hezkirinê çêbibe namire. Lê hin cihên ku hezkirin li wan deran mezin nabe hene; hezkirin li cem reqîba xwe tirsê, geş nabe. Dawiya tirsê heye; ya rastî tirs bêçarebûnek e. Tirs giyanekî ku mirov ber bi îşkenceyê ve dibe û ev tişt li cem Xweda tuneye. Tirs, li ber siya gumanê rûdine û şîretan dike, hezkirin zanebûna xwe ji şewqa baweriyê distîne. Eger hûn guhê xwe pir zêde bidin şîretên tirsê, hûn ê têk herin.

Berî bi salan gava min pirtûka xwe ya pêşî dinivîsand, min fêhm kir ku tişta berevajî tirsê, ne bawerî an jî wêrektî ye, hezkirin e. Divê min dersên ku di zaroktiya xwe de fêr bibûm, hîn baştir bi bîr bianiyana, ji ber tişta ku Şêrê Tirsonek yê di *Sêrbazê Oz*'ê de bi ceger dike, hezkirin e. Di Korîntiya Iê beşa 13an de gava min li rengdêrên dijber yên tirsê siwar dikir ev fikir hîn bêtir diyar dibûn:

> Tirs bê sebir e, tirs bê dilovanî ye. Tirs hesûd e, pesnê xwe dide, xwe dinepixîne. Tirs qebe ye, li berjewendiyên xwe digere, zû hêrs dibe, hesabê nebaşiyê dike. Kêfa tirsê ji neheqiyê re tê, kêfa xwe ji rastiyê re nayine. Tirs tehamula tu tiştî nake, ji tu tiştî bawer nake, hêviya tu tiştî nake, debara tu tiştî nake. Tirs bi dawî dibe.

Fêkî û motîvasyona tirsê berevajî rêyên hezkirinê ne. Eger min tiştekî baş kiribe an jî di jiyanê de ez fêrî dersên pir baş bibim, ev incex gava ez derbasî aliyê din yê perdeya tirsê bûme, pêk hatine.

Hîsên ku talûkeyê avakirine, kesên ji bo hezkiriyên xwe dane dû van tiştan hene. Kesên wisa bi ceger in lê tenê kesên bi hezkirinê dizanin bêtirs in.

Xweda hezkirin e. Di hezkirinê de tirs tuneye. Xweda bê tirs e. Em eydî Xweda ne. Em dikarin bêtirs jê hez bikin. Gava em gihîştin

hezkirina bêtirs ya Xweda, em ê bigihêjin asta hezkirina bêtirs. Kesên bêtirs hez dikin, bêtirs dijîn.

Belkî ev buhurandin eşkere be lêbelê gelek kesên weke ku Xweda bê amadekarî zeft kiribin, tevdigerin hen. Tiştên em dibihîzin û dibînin me ditirsînin an jî me hêrs dikin û em xeyal dikin ku berteka Wî ya li hemberî zilm, nebaşî û bobelatê weke ky ya me ye berçav dikin. Lê ne wisa ye.

## Hezkirina Bêhempa

Eger motîvasyona hezkirinê tunebe, kesên bi ceger tenê wê xwe binepixînin û hew. Motîvasyona li pişt çalakiya wan veşartî ne ew e ku bi hezkirinên xwe bibin mînak, dixwazin bandorê li kesên din bikin. *Xuyakirina* bi ceger ne bes e ji ber ku çalakiya herî bi ceger ya kesekî ew e ku xwe ji bedêla kesekî din têxe bin zerar û xisarê. Wateya vê ev e ku carina di şer de gava em rabin ser xwe dibe ku em jiyana xwe dirêjkirî bibînin:

> Tu hezkirin ne di ser wê hezkirinê re ye ku mirovek di ber dostên xwe de canê xwe dide. (Yûhenna 15:13)

Ev çalakî ne ji bo xweşanîdanê ye, ji bo dostan e. Ayeta 13:3 ya Korîntî Iê, bêyî hezkirinê wêrektiya ku nîşan dide, derbarê vê fedekariyê de van dibêjin:

> Eger ez her tiştê xwe bi alîkarîtî bidim û bedena xwe ji bo şewitandinê teslîm bikim, lê hezkirina min tune be, qet feyda min jê tune.

Sonda hejariyê an jî çalakiya şehidiyê gava *bêhezkirin* bê kirin, ji qurbanake olî û zêdir nabe û naçe.

Îsa, ji aliyê Bavê xwe ve pir hat hezkirin û ji me jî weke çawa Bavê Wî jê hez kir, ji me jî pir hez kir. Hezkirin ji bo ku di baweriyê de li ber xwe bide hêz dayê û em hêviya Wî ya bi heybet in.

Îsa piştî paşeroja min ya kulek jî ji min hez kir. Ne ditirsiya ku ez ê

di pêşerojê de xeteyan bikim. Em hemû *her çiqasî xeteyan bikin jî,* ev nayê wê wateyê ku hûn xeteyek in. Eger hûn bifikirin ku hûn xeteyek in, ev ne rast e.

Ez gunehan bikim jî, ez ne gunehek im. Di vê mijarê de ez çi hîs bikim jî bikim, Îsa rêya rast li ber min xist. Bersiva herî bêtirs, ya herî baş ku ez ê bidim hêviyên Wî yên derbarê min de ev e ku bi jiyaneke îteatkar ez ê Wî bi rûmet bikim.

> Xwedê ewê ku guneh nedizanî ji bo me kir guneh, da ku em di şexsê wî de bibin rastdariya Xwedê. (Korîntî II, 5:21)

Îsa soz da me ku wê ji her pirsgirêka me re bibe tekane çareserî. Hûn hemû dem û enerjiya xwe dikarin bidin gunehê xwe lêbelê tişta ku hûn tikîtenê bikin wê ev be. Gunehkariya we wê we bitengijîne û ev rewş gava giran bû, îcar hûn ê çavên xwe bidin ser gunehkariya kesên din. Rêberekî ku ji kesên din re ne baş be, gava ez hîn dibim ku ji xwe re jî ne baş e, ez şaş namînim. Gava ez bala xwe didim xwe, ez qusûrên xwe dibînim, gava ez li Mesîh dinêrim, qusûrên min di nava şewqa Wî de winda dibin. Ez ji dîmena ji min re ava dike, bêtir hez dikim:

> *Yên ku li wî dinêrin, dibiriqe ser çavê wan, Ji şerman sor nabe rûyê wan.* (Zebûr 34:5)

Îsa destûrê nade ku guneh û siyên me perdeyê bide ber hezkirina Wî. Gava em xwe bê parastin hîs dikin, li şûna em ji fediyan serê xwe berdin ber xwe, dem tam ew dem e ku em bi hêviyê serê xwe rakin ber bi asîmanan. Hezkirina Wî ya bêhempa, li hemberî hemû tirsên me disekine. Ez ê çawa destûrê bidim tirsên min yên bi qusûr li hemberî hezkirina Wî ya bêhempa serî hildin? Ez "sedem"a vê hevkêşê fêhm nekim jî, ez hîn bûm ji "kesê" di hundurê wê de hez bikim. Ji ber ku hezkirina Xweda bêhempa ye. Wî ji min hez kir, ji ber vê ez hêviya xwe bi Wî ve girêdidim. Destûrê bidin min ku ez vê peyama Xweda ya di Zebûra 91ê de dide keçikên xwe parve bikim:

> Ji ber ku ji min hez kir, ezê wî xelas kim, Ezê wî biparêzim, çimkî navê min nas kir. (Zebûr 91:14)

Gava em bi rastî difikirin… Eger hezkirin têk neçe wê çawa me têxe nava rîskê? Hezkirin hemû birînên ku jiyanê di me de vekirine, xwedî wê hêzê ye ku dikare wan rehet bike.

Gelek rêyên ku mirov bêtirs hez bike, hene.

Hezkirina ku hûn ji hevserê xwe hez bikin, tenê yek ji van e. Divê mirov ji zarok û dê û bavan bê tirs hez bike. Hevaltiyên me; ji bedêla ku bi hesûdî, hêrs û tirsê divê bi hezkirinê bên xwedîkirin. Tiştê hûn dikin û cihê hûn lê dixebitin, hûn dikarin jê hez bikin. Hûn dikarin bibin parçeyê organîzasyonekê an jî dêrekê û ji vê hez bikin. Hûn dikarin ji xwendin û kenînê hez bikin. Li derveyî bê hûn ê hezkirinê li kuderê bibînin, zû an jî dereng wê zordarî derkevin pêşiya we û hûn ê hêvîşkestî bibin.

Ev yek wê bihêle em gava pêşiya xwe biavêjin: Hezkirina ji dijminên xwe. Îsa çima tiştekî wisa derxist pêşiya me?

Ji ber tişta ku nîsk û genim ji nava hev derdixîne, ev cure hezkirin e. Gava em li kesên ku ji me re nebaşiyê dixwazin, difikirin em bi awayekî bijarte tev digerin. Gava hûn ji kesên ku we bi xwe ve girêdidin û we diêşînin, hez dikin, tiştek tê guhertin. Şert û mercên we neyên guhertin jî êdî hûn ne di xefkê de ne, hûn azad in.

Di dema şerê navxweyî yê Amerîkayê de, tê bîra min ku min çîroka koleyekî ku gava efendiyê wî birîndar dibe, li şûna ku ji qada şer bireve û here, radihêje kolê xwe û wî dibe cem karmedên tenduristiyê. Ev ne hilbijartineke rehet bû lê ev hilbijartina kir, di halêhazir de derdixist holê ku ew di rastiyê de azad e. Bi xêra vê çalakiya xwe berî ku Bakurî îsyankaran têk bibin, ew azad bû.

Kesek dikare bîne ziman ku hûn di hemû rojên jiyana xwe de azad in lê hûn dîsa jî dikarin hilbijêrin ku bi wî kesî ve girêdayî bimînin an jî mirov bi awayekî beredayî gava dikarin bifikirin ku xwediyê we ne, hûn dikarin bi awayekî azad jiyanê hilbijêrin. Ji aliyê teknîkî ve belkî jî tu carî hûn ê nebin kole lê dîsa jî eger mirov hîs bikin ku deynê wan di hustiyê we de heye, ev cureyeke bi hev girêdanê ye. Kesên azad xuya dikin lê

bi kesekî din ve girêdayîne, hene. Hûn nikarin kontrol bikin bê mirov derbarê we de çi dibêjin an jî li çi difikirin lê hûn dikarin bersiva ku hûn ê bidin wan hilbijêrin.

Hezkirin hildibijêre. Tirs bertekê dide.

Hezkirin azadî ye. Tirs hêsîrtî ye.

Hezkirina kamil, tirsê dikuje û davêje dera hanê.

## Dîsa jî Hez Bikin

Jêgirtina li jêr ya Kent M.Keith gelek caran ji Rahîbe Theresa'yê re tê gotin, ji ber ku ev destûr weke bîranînekê her dem li ber girtine. Ez bawer im we hinek jê bihîstiye lê ez ê hemû metnê parve bikim:

### Fermanên Nakokî

Mirov bêmantiq, bêaqil û xweperest in.
*Lê dîsa jî ji wan hez bikin.*

Eger hûn qenciyê bikin wê mirov we weke kesên xweperest û niyet xerab tawanbar bikin.
*Lê dîsa jî qenciyê bikin.*

Eger hûn bi ser bikevin, hûn ê hevaltiyên sixte û dijminên rast qezenc bikin.
*Lê dîsa jî serkeftî bin.*

Qenciya hûn îro dikin wê sibe bê ji bîrkirin.
*Lê dîsa jî qenciyê bikin.*

Durustî û rastgo wê we bê parastin bihêle.
*Lê dîsa jî durust û rastgo bin.*

Jin û mêrên herî mezin yên ku xwediyê fikrên herî mezin in, dibe ku ji aliyê jin û mêrên herî biçûk yên xwediyê fikrên herî biçûk ve bên xistin.
*Lê dîsa jî mezin bifikirin.*

Mirov li aliyên kesên bindest disekinin lê tenê li kesên serdest temaşe dikin.
*Lê dîsa jî ji bo bindestan têbikoşin.*

Tiştekî ku bi salan we li ber xwe daye û ava kiriye, dibe ku di şevekê de li erdê rast bibe.
*Lê dîsa jî ava bikin.*

Dibe ku bi rastî pêdiviya mirovan bi alîkariyê hebe lê dibe gava ku we alîkariya wan kir êrîşî we bikin.
*Lê dîsa jî alîkariya mirovan bikin.*

Tişta di destê we de ya herî baş bidin dinyayê dîsa jî dibe ku kulmekê li argûşka we bide.
*Lê dîsa jî tişta di destê we de ya herî baş bidin dinyayê.*

Wê mirov we hêvîşkestî bikin... Lê dîsa jî ji wan hez bikin. Di van gotinên Keith de, ez gelek tiştan derbarê têkiliyên xwe yên bi mirovên din re, dibînim. We kesek hêvîşkestî kiriye? Min bi xwe kiriye. Dibe ku serê xwe li min hejandibin û di dilê de xwe de gotibin, "Tam hêvîşkestinek e ev" û ji min dûr ketibin. Wê dijmin û heta hevalên we jî wê zerarê bidin we û îxanetê li we bikin. Di rewşeke wisa de hûn dizanin bê hûn ê çibikin... Dîsa jî ji wan hez bikin. Eger hûn bixwazin li derveyî reqabetê jiyanekê ava bikin, divê hûn di ser feraset û têgihiştina xwe ya însanî re bijîn.

Ez dizanim ku wê ev tişt di serî de ne bi mantiq be lê eger hûn bexşî mirovan bikin ku ji xeteyên xwe dersekê derxînin, di pêşerojê de ji bo ku ya hîn baştir bikin, bi vî awayî hûn ê wan bi hêz bikin.

Mixabin, di vê xalê de ez hîs dikim ku divê têborînekê lê zêde bikim. Xeteyên ku ez behsa wan dikim van di xwe de nahewînin: Îstîsmara zayendî, îxanet an jî çalakiyên neqanûnî. Gava ez behsa xeteyan dikim; dikeve kategoriya şaşitî, tiştên şaş hatine fêhmkirin û darazên şaş. Ev ne çalakiyên jirêketî, xedarî an jî yên bi mexsedên weke hepsê re têkildar in. Gava em di rêya baş de diçin ez behsa ketinên ku her yekî ji me tecrube kiriye, dikim.

Hem kesên rast û hem jî kesên nebaş, lingên wan diawiqin, diterpilin û dikevin. Tekane ferq ev e; hezkirin hewl dide ku kesên rast bi zorê rake ser piyan. Kesên nebaş li jêr dimînin û gelek caran hewl didin ku kesên din bikişînin cem xwe lê kesên rast radibin ser xwe û yên din radikin û pêş ve diçin (Şîretên Silêman 24:16). Hezkirin her dem rabûna ser piyan, hildibijêre:

> Lê em bi hezkirinê rastiyê bêjin, di her tiştî de ber bi wî ve mezin bibin ku serî ew e, Mesîh e. Bi wî hemû beden hevdû digire û bi alîkariya her movikê girêdayî ye; bi wî her endam li gor qeweta xwe dixebite û bi vî awayî beden mezin dibe û di hezkirinê de tê avakirin. (Efesî 4:15-16)

Gotinên rastiyê gava mirov bi hezkirinê dibêje, bedena mirov ava dike. Hezkirin dihêle ku di her qada jiyanê de pêşketin çêbibe. Îcar gotinên nefretê, rê li ber kurmîbûnê vedike û pêşketinê disekinîne. Lêbelê hezkirin hem ji nefretê û hem jî ji tirsê bi hêztir e.

## Serîderketina bi Hêvîşkestinê re

Gava ku bendewariyên me bi cih nayên îcar hêvîşkestin serê xwe derdixînin. Hezkirin ji ya herî baş *bawer* dike û ev ji *xwestina herî baş* pir cudatir e. Weke çawa hezkirin bi pêş dikeve û fikeve şiklê hêviyê, bendewarî jî pir zû vediguherin daxwazan.

Ez li mêrê xwe bawer im lê hêviya min ya dawî ji Xweda ye. Ez û mêrê xwe em ji hev hez dikin lê ev nayê wê wateyê ku em carcaran hevdu hêvîşkestî nakin, helbet me hevdu kiriye. Ji bedêla ku em bibin hemwelatiyên hêvîşkestinê û wisa bijîn, me biryar da ku em sînorên wê yên xemgîn biterikînin. Ji bo bûyerên hatine serê me û em hîn kirine, em spasiya xwe dikin, em radibin ser xwe, em ji xeteyên xwe dersan derdixînin û em berdewam dikin. Em xeteyên hev bi awayekî din nîşanî hev dikin û ji bedêla ku em li dora hêvîşkestinên xwe herin û werin, me kifş kir ku ev nêzîkatî ji hemûyî çêtir e.

Bawer bikin, demeke ku me jê bawer kir ku ev fikreke baş e (an jî

belkî tenê min jê bawer kir) çêbû. Eger ez li her unsûrê bikolim û her aliyên wê bi fedîbûnê bipêçim, min jê bawer kir ku wê tu carî nebe. (Ez hem di ser xeteyên John û hem jî di ser yên xwe re, bi vê rûtîna bêşewat re derbas bûm.)

Ev nêzîkayî bi kêr nehat ji ber ku mantiqa min bi qusûr bû. Ji bedêla vê wisa bû. Em ewqasî li vî qalibî hatin ku hemû tişt û qusûrên me di hev de dîtin, qusûrên bi awayekî qurnazî bûn. Li şûna ku em derbarê hev de ji tişta herî baş bawer bikin, em li bendî man ku em ji hev li benda ya herî nebaş bisekinin. Me herduyan jî tiştên em lê digeriyan, me di hev de kifş kirin.

Ez ji hemû zarokên xwe hez dikim, lê ev nayê wê wateyê ku em di têkiliyên xwe de hêvîşkestî nebûne. Ev demên wisa ji çil salî carekê çêbibe jî (û pirî caran ya ku wan hêvîşkestî dike ez im) dîsa jî ev parçeyek ji têkiliyên me ye. Wekî din min hêviya hin hevalên xwe jî şkerandiye.

Hêvîşkestî nayê wê wateya ku hezkirina we miriye, tenê nîşan dide ku dema hûn ji Giyanê Pîroz randevûyekê bistînin û hinek şîretan li we bike, hatiye. Hezkirin kedê dixwaze û kedeke bi rastî divê ku pirsan bike û pêparastin bimîne.

Di dawiya dawî de, tiştekî ku tenê wê Îsa têde hebe; ez ê ne li bendî bim ku mêr, zarok an jî hevalên min lê hebin. Eger ez vê xeteyê bikim û ez wan weke xelaskerekî bibînim, wê min hêvîşkestî bikin û wê ev ne di destê wan de be ji ber ku ez ê wan bi destên xwe têxim cihekî ku wê li vir kêm bimînin.

Weke dawî, wê xete ne ji ber qusûrên wan be, wê ji ber bendemayînên min yên bi xete pêk were.

Gava hûn li benda ya herî baş bin û gava jê kêmtir kirin, hûn ê ji ber vê hêvîşkestî bibin. Gava we ji ya herî baş bawer kir û wan ya kêmtir kir, hûn ê fêhm bikin ku hîn karên wan neqediyaye.

Hîskirina ku Xweda bang wan mirovên ku we û wan bi hev re ava dike ku van kesan bidarizîne û tepisandina van kesan ku bavêje û here; mezanîzmayeke parastinê ye. Belê, ji ber ku we û hin kesan li hev

nekiriye hûn ji wan dûr dikevin. Û kesên ji we dûr dikevin jî hene. Lê bi piranî sedema ku mirov ji we dûr dikevin, piştî ku carekê êş kişandin îcar hew dixwazin pêparastin bimînin.

Xweda derbarê min de her dem ji min bêtir ji ya baş bawer dike. Ew min di paşeroja min de nahêle û naterikîne ji ber ku pêşeroja min di nava destên Wî de ye. Ji bo ku tişta herî baş ya ku ji min re diyar kiriye ku derxîne holê, min ji tirsonektiya min û tirsa min dikişîne derve. Pawlos, hin ji van pirsgirêkên bendewariyê bi dêra Korîntê re jiya:

> Çimkî ez ditirsim çaxê ku ez bêm, ez we ne wek ku ez dixwazim bibînim û hûn jî min ne wek ku hûn dixwazin bibînin, lê ez ditirsim ku pevçûn, çavnebarî, hêrs, hevrikî, ketme, paşgotinî, quretî û tevlihevî çêbin. (Korîntî II, 12:20)

Em dev ji bendemayîna hêvîşkestinê berdin ji ber ku em çi dawet bikin wê ew bê. Xwestina hîn zêdetir û heta ev pêk were gava em erêkirina xwe vekişînin wê ev rewş me dûr bixîne û me bi hêrs bike, eynî weke çawa înkarkina xeyalê dihêle ku em ne bextewar bibin. Tişta ku em dixwazin di derbarê me de hinek din jê bawer bikin, divê em jî di kesên din de bawer bikin, wê hîn rewşa me ya herî baş pêk were. Em jê bawer bikin ku xeteyên wan tenê gavên şaş bûn. Xeleteyên we kirine ne ew mafê wan tuneye ku we bigihînin cihê we ji xwe re diyar kiriye.

Dibe ku Îsa nêz bibe an jî dibe ku hûn ji paşeroja xwe aciz bibin. Tenê hûn vê hêzê di nava destên xwe de digirin.

Derbarê dilovaniya li me dibe eger em ne xwediyê wahiyekê bin, îcar mirov dilovaniya xwe jî nîşanî kesên din nade.

## Rêya Tirsê

Bedeleke tirsê heye. We kor dike. Hêz, xeyal, têkilî, pere, bawerî û hêviya we ji we didize. Tirs dixwaze; çi tiştên ku hezkirin bê bedel dide we, ji bo navê wan bi nebaşî derxîne an jî ji we dûr bixîne. Tirs carcaran dernakeve ser dikê, êrîşên wê bênavber in û dema wê buqusûr e.

Tirs, rêzê ji cihên ku hûn lê bêhna xwe vedidin, nagire… Xeyalên we xera dike û xewa we dagir dike.

Tirs hêzek e ku dijberî hezkirin û hêza Giyanê Pîroz û dijberî giyanê hişekî bingehîn yê saxlem e. Giyanê Xweda ji bo we azad bike tê lê tirs ji bo we pûç bike tê.

Tirs, wê ne tenê gelek firsetên pêşketinê ji destê we bistîne, di heman demê de wê armanc bike ku nêrîna we ya li pêşerojê jî ji we bidize. Hem hezkirin û hem jî tirs ji bo jiyana we planeke wan heye. Yek ji bo başiya we, ya din ji bo nebaşiya we ye.

## Rêya Hezkirinê

Berevajî vê hezkirin heta tu bêjî bes comerd e. Armac dike ku têkilî, xeyal û hêviya we bi ser hev de bîne. Em hemû dikarin xwe bigihînin vê rêya hezkirinê ku Xweda soza wê daye me. Lêbelê xete ye mirov bifikire ku sozên hezkirinê yên nû xwe li qumaşê kevin yê tirsê bigire. Xweda dixwaze ku ya nû, bide ber ya hatiye *nûkirin:*

> Ne jî kes şeraba nû dixe meşkên kevin. Eger bixeyê, meşk diteqin, şerab dirije û meşk ziyan dibin. Na, şeraba nû dixin meşkên nû û herdu jî tên parastin. (Metta 9:17)

Di nava we de tiştekî *nû* heye lê tirs dixwaze wê têxe nava xwe. Qet destûrê nedin. Hezkirina kesê bêtirs pêdiviya wî bi temamî bi ambalajeke nû çêbû. Gava carekê we şeraba hezkirina nû pejirand wê her tişt bi we cuda bê xuyakirin. Tiştekî ku we demekê ew weke karekî ku hûn aciz dikirin didît êdî hûn ê wî tiştî weke fersenda xizmetê bibînin. Li şûna ku hûn bidin dû jiyaneke ku bi danhevê derbas bûye, hûn ê li rêyên ku hûn comerdiyê bi awayekî çalak nîşan bidin, bigerin. Hezkirin hewl dide ku tirsê jê bibe.

## Jineke Bêtirs

Par hevaleka min ya nêz, qerteke rojbûnê ya ku min pir jê hezkiribû, ji min re şand û min ew xist ber mirêka xwe. Li ser rûyê qertê fotografê keçikeke ciwan ya ku pantorekî bi pîne li xwe kiribû, hebû û li binê wê jî “mesele ne kinc in, helwest e” dinivîsand. Bi gotineke din, ya girîng ne ku we çi li xwe kiriye, ya girîng we çawa li xwe kiriye. Hezkirin bi wêrektiya herî baş tê li xwe kirin. Hezkirin, tiştekî ku mirov li ser dixebite.

Ez ê ji we re rastiyeke balkêş bibêjim: Ji jineke bêtirs tiştekî hîn cazîbetir tuneye.

**Ji jineke bêtirs tiştekî hîn cazîbetir tuneye.**

Ne jineke bêtedbîr, jineke bêtirs. Keçikên bêtirs sozên Xweda yên dibiriqin, bi baweriyê li xwe dikin. Xwedîtin tiştekî mirovî ye û lixwenêrîna di ber şewqa Gotina Xweda de peywira me ye. Lê gava em xwe *biçûk* bibînin, em tu qenciyê li xwe nakin.

Tirs me li gorî kêmbûna me dipîve, hezkirin jî bêtirs me bi têrbûna Xweda ve girê dide.

Tirs me dahf dide, hezkirin me dikişîne.

Cazîbebûn tê çi wateyê?

Ji min bawer bikin, ji şikl û şemalê zêdetir e. Enqaza erebeyan pir balê dikişîne ser xwe. Ji bo em bigihêjin têgihiştineke hîn baştir, em li peyva *kişandinê* ya ku tê wateya “dibe sedema nêzîkbûn an jî girtinê” binêrin. Di heman demê de wateya wê ya “weke miqnatisekê nêzî xwe dike an jî dikişkişîne” jî heye. Yeka din tê wateya “hişyakirina hest û eleqeyê” jî.

Jiyana we weke miqnatisekê ye ku ya lanetan ya jî bereketan ber bi xwe ve dikişîne. Ji ber vê van ji xwe bipirsin:

Tişta hûn jê ditirsin çi ye?

Hezkirin ji bo hûn bi çi re têkevin rûyê hev, gefan li we dixwîne?

Heta ku bê guhertin, kesê hûn bexşandina wî/ê red dikin, kî ye?

Hûn hezkirina xwe bitirs û bi awayekî bipîvan ji kuderê parve dikin?

We toreke ku di gotinên tirsê de awiqiye, hûnandiye gelo?

Êdî dema ku hûn karan berevajî bikin hatiye. Destpêka vê pêvajoyê, bi qasî îlankirina bêhempayên asîmanî yên bêreqîb ku di jiyana we de cih girtiye, hêsan e. Wê demê ji bo hûn dest pê bikin, ez ji gotinên Pawlos yên ji Tîmotêyos re nivîsandine, ez derketim rê û min duayek ava kir:

“Keçika min ya delal, ji bo qencî, hezkirin û xweşiya bê kêmasî ya Bavê me Xweda û Rebê me Îsayê Mesîh pir û pir biherike jiyana te, duayan dikim! Ji bo xelata giyanî ya ku Xweda daye te, tu gur bikî; ez dixwazim te bi ber wê ve biqedimînim. Ji ber ku wê Xweda tu carî giyanê tirsonekiyê nede te lê wê Giyanê Pîroz hêz, hezkirin û xwekontrilkirina bişiyan bide te!

Ji ber vê tu carî fedî neke ji şahidbûna Rebê me Îsayê Mesîh re lê bi wehiya hêza Xwed re her cure nebaşiyê têk bibe. Wî jiyana vejînê bexşandiye ji me re û bi banga wî ya pîroz ya li ser jiyana me re, em qedimandin ber bi xwe ve. Xweda em ne bi kirinên xwe, li gorî qencî û armanca xwe xelas kirin û bang me kir ku em bên jiyaneke pîroz. Ev qencî berî destpêka zemên di Îsayê Mesîh de li me hatiye bexşandin, aniha jî bi hatina Wî re derketiye holê!” (Ji Tîmotêyos II 1:2, 6-9an hatiye adaptekirin.)

Vê bipejirînin. Jê bawer bikin ku ev gotin xwesteka Xweda ye ya ji bo jiyana we. Bi min re duayan bikin.

*Bavê Asîmanî,*

*Ji bo qencî, hezkirin û başiya te biherike jiyana min duayan dikim. Ez dixwazim xelata giyanî ya ku te daye min gur bikim. Xwedayo, ez dizanim ku te giyanê tirsê nedaye min, ji ber vê ez şîreta tirsê red dikim. Bavo, ji ber tiştên ku vî dizî ji min dizîne û te li min vegerandine, ez spasdarê te me.*

*Te têgihiştineke saxlem ya ku bi hêz, rayedarî, hezkirin û xwekontrilkirinê tije ya Giyanê Pîroz da min. Ez îro hezkirinê hildibijêrim. Ji Mizgîniyê fedî nakim, ez ê bi tirsê venekişim û ez ê bêtirs hez bikim.*

## Pirsên Nîqaşê

1. Hin rêyên ku hûn ê hîn bêtir bêtirs hez bikin, çi ne?
2. Di zewaca we de li şûna ku hûn bibêjin pirsgirêka “me” gelo pirsgirêkeke ku hûn jê re bêjin ya hevsera/ê min e heye?
3. Cihên ku hûn lê ne bêparastin in ku vediguhere cihê kêmasiya hezkirinê heye? Ji bo hûn vê biguherînin hûn dikarin gavên çawa biavêjin?
4. Di jiyana we de kirina xeteyekê, cihên ku hûn bi xeteyekê re li hev bînin, çi ne gelo?
5. Cihekî hûn lê ketine û hûn ditirsin ku rabin ser xwe, heye gelo? Di vê mijarê de ji hevalekî xwe an jî ji kesekî hûn jê hez dikin re eşkere bin.
6. Cudahiya di navbera jineke bêtirs û ya jineke bêtedbîr de, kurte bikin.

# 8

## Bîrên Kûr û Bîrên Xwestekan

> Ceribandin mê hîn dikin bê em çi ne, axê dikole û nîşanî me dike bê em ji çi çêbûne.
>
> CHARLES SPURGEON

Ez wisa difikirim ku hûn dixwazin bibin keçikeke jidil ya Xweda. Eger hûn jidilbûnê bixwazin, tiştekî normal e ku hinekî li bendî kolanê bin.

Ez tevlî Charles Spurgeon dibim: Ceribandin bi rastî jî wehiyek in. Ango yên min bi xwe wisa ne. Armanca wan ew e ku li ser serê me bibin mamoste lê di dawiya rojê de hilbijartina bê em dixwazin bibin xwendekarên çawa di destê me de ye. Min gelek rojên xwe bi nota Dyê ango bi zeîfê derbas kirine. Gava ev dibe, bi piranî ez dersê ji nû ve distînim. Rastî ev e ku her çiqasî jiyaneke min ya bêqusûr tunebe jî, ez dixwazim di asteke baş de serkeftî bibim. Tecrube û ceribandin; hilbijartina rewşa ku gelo wê her yek ji van ji min re bibin nûçegihan an wê min ji hev de bixin û bihêlin, di destê min de ye.

Li ser tiştên tên serê me an jî tiştên derbarê me de tên gotin, kontrola me an *kêm* e an jî qet tuneye lê gava mesele dibin tevger em

qet ne bêçare ne. Em xwediyê hilbijartinê ne û ev di mijara bê em ê çawa bertekê bidin de, kontroleke bêkêmasî dide me. Û li gorî ku me jêgirtin ji Spurgeon kiriye, em berdewam bikin û em li pêşniyarên wî yên derbarê bertekên em didin ceribandinan bê divê çawa bin, ji kûr ve li wan binêrin:

"Ez hîn bûm pêla ku min li binguhê latan dixe, maç bikim."

Ev, bertekeke ku em ne li bendîne û em hînê wê nebûne ku em dikiran li hemberî tiştên ku me bê wext zeft dikin, nîşan didin. Berî bi çendakî min li nêviya xwe Sophia gava bi pêlên bahrê re dilîst, temaşe dikir. Serê xwe li pêlan dixist û ji ber vê pir kêfa wê dihat. Her cara ku pêlan xwe li binguhê wê dixist û ew binav dikir, pir li xweşa wê diçû… Bi ken radibû ser xwe, çavên xwe paqij dikir û xwe ji pêla bê re amade dikir.

Spurgeon bi vê jegirtinê ne behsa beraveke bi lat dike, behsa Mesîhê ku Lat e dike. Her rojek ji bo me fersendeke diyar e bê em ê çawa bertekê bidin pêlên ku jiyan bi xwe re tîne. Eger em têkevin pozîsyoneke parastinê, wê demê meseleya ku derkeve ber roniyê wê weke pirsgirêkekê bimîne. Eger em xwe biçûk bikin, bi xêra ceribandina em li hev rast hatine, Giyanê Pîroz; jidilbûna me û pê re jî kapasîteya me ya ku em bibin kesekî xwedayî, wê zêde bike. Gefxwarinên jiyanê; bêyî ku bin me bikolin bê *em kî ne,* derdixîne holê bê *em ji çi çêbûne.* Nasnameya me ne li ser bê em çi dikin an jî me çi kiriye, ava dibe; li ser "Mesîh" hatiye bi cihkirin. Ceribandin me dişibînin Mesîh û pê re ji bo em zû bi zû hilneweşin, dihêlin ku em hîn mezintir bibin û me teşwîq dikin. Mesîh, ew Latê bi navûdeng e ku pir di ser min re ye. Ew bingehê me ye. Ew latê me yê şiyariyê ye, yê ku her şev em li ser Wî qenciyê dibînin û her sibeh ji bo em li ser Wî bisekinin. Tenê Îsa navend û rawestgeha me ya dawî ye.

## Amadekirina Axê

Em ji bahrê derbasî axê bibin. Ez li çoltera xweş ya Colorado ya ku carina şîn lê bi piranî ziwa ye, dijîm û ji ber sedema ku ez jiyana xwe dişibînim axê, bi min hêsan tê. Axa me hişk e ji ber ku em di şert û mercên zêde zor de tên hêrandin. Axa li bexçeyê min her çiqasî hişk be jî, ez dixwazim dilê min nerm be. Çi biçûk be û çi jî li gorî tê dîtin mezintir be jî, gava ji ber qebhetekê ez dikevim nava aciziya *zêde,* ez ji rastiya ku axa min li binguhê hev dikeve, nikarim birevim. Ji nava komikên ku ji binê axê derdikevin û dîsa hewl didin ku têkevin binê axê, ez kurmikên biziyan dibînim. Di bin rûyê erdê de, ez şopên tiştên ku kirine ferq dikim. Bêyî ku haya min jê çêbibe kokên zewaca min dikevêjin û ez fêhm dikim ku nahêlin kulîlkên min yên hevaltiyê mezin bibin. Gava ev dibe (û gava ez dixwazim bêtir dibe), sohbeta ku ez bi Bavê xwe re dikim, dikare bişibe vê:

> "Axx na, ev erjeng e! Ev çawa çê bû? Bavê Asîmanî, tu vê dibînî?
> Berî aniha te bihîst bê min çi got an jî ez li çi fikirîm?"

Ew jî wisa dibersivîne: "Lisa, ev ne ji bo min, ji bo te wehiyek bû. Ew kurmik ev demek e di bin axê de bûn. Aniha li ber te ev heye, tu dixwazî wan li cihê wan bihêle û paleyiya wan ya pêşerojê têxe nava talûkeyê?"

Di lêkolîneke nêz de ez ferq dikim ku hîn jî bizrê li ber zîldanê sekiniye heye. Pêdiviya van hîn bi demê heye. Ev sozên jidil yê Xweda ne, yên derbarê jiyan û malabata min de ne ku hîn pêk nehatine. Ez merak dikim gelo wê ew mezin bibin. Bavê min bi sebir diyar dike:

> "Cureyeke wisa bizerar, pir zêde dibe. Hilbijartin her dem ya te ye,
> tu dikarî mahneyên wan bi ser wan dake û bandora wan careke din
> tu dikarî binuxumîne. Lê wê ew berdewam bikin. Eger tu dixwazî
> ku ji van zeraran xelas bibî, divê tu wan di gotin û çalakiyê de înkar
> bikî û ji bo tu ji wan xelas bibî, divê tu li Min bawer bî."

Ez nasnameya wan ya bi rastî dibînim û van zerarên hesûdê pîs, biguman û tirsa mirovî, înkar û red dikim.

> "Her bijî -û halêhazir ku me dest pê kiriye, tu wan gîhayê bêxêr dibînî? Em wan jî ji cihê wan hilkin. Hên ku ax nerm e wê hêsatir çêbibe. Piştre em berdewam bikin û li şûna wan em bizrê Gotina Min deynin."

Bise deqîqeyekê... aniha mesele cîdî bû. Rahiştina kurmikên ku ez bi çavan nabînim tiştek e lê gava ez li benda dema wan dimînim ji holêrakirina her tiştên şîn ku bi çavan tên xuyakirin, tiştekî din e. Ji bo hinekî din bifikirim ku hin gîhayên bêxêr ji bo kêfa xwe hinekî din bisekinînim, disekinim. Yên nû mezin dibin heta ku xuya bikin gelo ez wan bisekinînim nabe? Bêyî wan ez ê weke qabeke vala ya axê xuya bikim. Li dijî wê derdikevim:

> "Lê Reb, wê demê axa min wê tazî û ziwa xuya bike."
> "Lisa, tu dixwazî bi fêkî xuya bike an bi fêkî be?"

Û ha pirsa vî nifşî ev e. Gelo çawa xuyakirina me ji çibûna me girîngtir e? Tenê qîmanîna xuyakirina bi fêkî, tê wateya tawîzdana ji serdemên pêşketinê yên pêşerojê. Çi tiştên ku bi dizî tên çandin rojekê wê bi awayekî eşkere xuya bibin. Axînekê dikişînim:

> "Temam, wan bikişîne."
> "Çê dibe."

Û ha vaye ez bi axeke tazî disekinim lê ez fedî nakim ji ber ku êdî ez dizanim ku sozên Wî di kûrahiyên min de wê bê asteng mezin bibin. Ceribandin û diltengî, zemînê pak dikin û çi tiştên ku ji mizinbûna li pêşerojê re dibin asteng, radike. Ev rastîhevhatin me pak dikin û me ji potansiyela me ya pêşerojê re amade dikin. Hin peyvên din jî hene ku bi hêsanî dikarin şûna peyva *caribandinan* bigirin. Fedî nekin ku hûn

van jî bi kar bînin; *dijwarî, ceribandin, nirxandin, êş û diltengî, ceribîn, azmûn* an jî tenê *test.*

Aliyên me yên bi hêz û qels, di nava rewşên nexweş yên ku van ceribandinan bi xwe re aniye, derdikeve holê. Bi awayê tevayî û şexsî, van azmûnan tiştekî nû û ji bo serdema pêş, wê peywira ku cihê canê me yê ziwa û bejî bên tevirdan, dibîne. Bêyî vê xebata zemînê, piraniya ava jiyana ji Gotina Xweda diherike, wê di bingeha jiyana me de neyê mijandin. Wê dilê me bişibe axa hişk ya ku nayê avdan û ji ber ziwahiyê terikî ye. Eger axa ziwa neyê amadekirin, wê baran bibaran herin û di nava hebûnê de em ê xelayê tecrube bikin.

Ceribandin di heman demê de me hîn dike bê Xweda kî ye.

Derbarê armanca ceribandinan de dema min hebû ku bi we re nîqaşê bikim. Eger hûn li gorî Gotina Xweda bijîn, min ê ji we re bigota ku wê tiştekî nebaş neyê serê we. Ciwan bûm, bê aqil bûm û ez xwediyê hînbûneke ku di testa demê re derbas nebibûm. Gava ez difikirîm ku hênbûn kûr û dûr e, ya rastî ez amade kiribûm ku ez tenê li cihên nizm bijîm.

Ji bo em jiyaneke pîroz bijîn, çi pêdiviya me bi çi hebe di Gotina Xweda de heye lêbelê ji bo ev rastî di jiyana me de bi her awayî bixebite, tişta ku ku me li ser çongan li ber xwe dibe ceribandin in. Di vê rewşê de Gotina Xweda êdî ji bo jiyanê bi halê herî baş berdewam bike, ne pêşniyarên xwendinê, tê rewşa gotinên jiyanê bixwe.

## Jiyana Min Bikole

Serdemeke kin û tevlihev ya jiyana min bû, sedema vê ya sereke ew bû ku min fen û fût dikirin û mesele binax dikirin ku ev ji min re tercihek bû. Ciwan bûm, hîn nû xelas bibûm, nû zewicî bûm û hîn kiryara serûbinkirina axê nû dest pê kiribû. Li ser rû tenê çend xêz hebûn. Ew dema ku her tişt guherî tê bîra min. Ez di demeke duakirinê û hebandineke kûr de bûm. Weke jina pastorekî ku nû hatiye tayînkirin, sirf ji ber ku li dêrê li cihên pêş rûdiniştim, ez ketibûm nava wê xeyala

ku divê ez pir tiştên kêm di jiyana xwe de li ser bisekinim. Bi baweriyeke bê kêmasî, min berdewam kir ku Xweda di jiyana xwe de baş bikolim. Di navberê de hîn bîst û çar saet derbas nebibûn, ji ber hilbijartina xwe ya peyvan ez poşman bûm.

*Bavê Asîmanî yê Dildar,*
*Min got kolandin? Ez dikarim vê bi paş de vekişînim gelo? Ji kêliyeke azwer ya ku bi hilbijartinên peyvên xelet tije bû pêk dihat. Tişta min dixwest bibêjim ku tu di jiyana min de peyzajê bikî û jiyana min bixemilînî.*

Nepejirand ku ez rast bikim. *Kolandin,* hilbijartina peyveke ku Giyan rê li ber xistiye. Weke gelek bawermendan, ez bi bêrîkirinên kûr û duayên qels dijiyam. Berî vê kêliya bi talûke ya hebandinê, ji demên duayan bi hîseke valahiyê vedigeriyam. Gotinên ku min dikirin pistepist di jiyana min de nedibûn katalîzor ji ber ku li şûna xwedayînê bi hişê peywirê min dua dikirin. Bi şiklê ku min kesên din dibihîstin, min dua dikirin. Belê, ji min re hatibû gotin ku di rastiyê de dua axaftina bi Xweda re ye lê ez xwe ji xeyala li odeyeke textî ya ku dora wê bi ferîşteyên li min guhdar dikin û gotinên min qels dibînin dorpêçkirî, nikarim veşêrim.

Ji ber vê fikrê min nizanîbû ez ê çawa peyvên ku serê firtoneya xam ya di nava min de pêk tê, ragire; derxînim holê. Ji bo zêdertirî birçîbûna min ya bêçare, min nizanîbû ez ê çawa jî bikim. Ji wê demê ve ji bo Xweda duayên min kûr bike, ez hîn bûm ku ceribandinan bi kar bînim. Berî ku Xweda vexwînim ji bo jiyana min bikole, min nizanîbû ez ê çawa destûrê bidim ji bo li kûrahiyên nava min bixebite. Her zorî an jî ceribîn di cih de dihat girêdan! Ji bedêla ku ez xwe bavêjim ser ceribînê, min xwe bi tebîetên xwe yên kevin û hêsîrbûna xwe ve girê dida. Eger berdewam bikira, ez direviyam. Eger rev bi kêrî tiştekî nehata, min dixwest dûr bikeve û min xwe vedişart.

Zordariyên di jiyana min de ez ditirsandim û ez hêrs dikirim. Li hemberî kesên din ez hişk bûm lê li hemberî xwe hîn hişktir bûm.

Xwuşka min ya delal, eger hûn jî wisa dikin, li min guhdar bikin, ev jiyan bi qasî ku hûn li hemberî xwe hişk tevnegerin, zor e. Piştî bi dehan salan ez hîn bûm ku Spurgeon mafdar e. Bi nêrîneke ku bi demê re nerm dibe, ez dibînim ku êdî Gotina Xweda bê ya *kê ye* û berteka em didin ceribandinan tekêz tîne ziman bê em ji *çi* çê bûne. Ew hêza ceribandinan heye ku me ji ew kesê em ew in, veguherîne ew *kesê ku em bêriya wê* dikin. Lêbelê me guhê xwe da wê derewa ku em destê xwe nedin tu tiştî û qet şer nekin û bibin leheng.

## Bîrên Kûr

Berî ku ez kesekî nas bikim, ez hez dikim ku ew kes bi min weke bîreke kûr bê. Ev pênase tê wateya mirovên wisa ku di ser re xuya dikin lê di rastiya xwe de pir kûr in. Bîrên kûr bi sir in, çîrokên wan hene ku mirov bibêje û ez ji çîrokên wan pir hez dikim.  Ev mirovên wisa ne ku bîrên din girikî nakin an jî bûyerên ku wê wan bilewitînin pêk nayînin û avên van bîran xera nakin. Bîrên kûr tên wê rewşa ku ji kesên din re bibin çavkaniyên ku jiyanê dibexşînin. Kapasîteya dengvedana bîrên kûr hîn mezintir e. Gava ku hûn bi bîreke kûr re bipeyivin, bêguman ji tiştên hûn derbarê bîrê de dizanin bêtir hûn ê derbarê xwe de hîn bibin.

Ez hin jinên ku weke bîrên kûr in nas dikim. Ez her dem bêtir dixwazim van jinan baştir nas bikim. Gava ez li dora wan im, ji ber ku hîn jî pirsên min hene ku ez bipirsim, di serî de ez hinekî fedî dikim. Eger ez li ser bîreke kûr bim, ji bedêla bipeyivim bêtir lê guhdar dikim. Her dem ji axaftina çalak bêtir, gelek tiştên mirov lê guhdar bike hene. Dixwazim bibim bîreke kûr û di jiyana min de hîn jî cih û demên ku dişibin pirikê hene.

Carina nasîna bîreke kûr, li ser navê xwe bibêjim divê dilê min bixebite. Ya rastî ew pir bala xwe nadin pirtûkên min nivîsandine an jî konferansên li wan peyivîme. Gelek ji wan di wan rêyan re derbas bûne û ev kirine. Li yên kûrtir dikolin. Naxwazin bibîhîzin bê nava min çawa hildiweşe, dixwazin hîn bibin bê ez nava xwe çawa dadigirim. Li mêr, zarok, nevî û dilê min dipirsin. Dizanin bê wê li kuderê bi awayekî

nazik bileqînin û li kuderê bikolin. Heta ez fêhm dikim bê ez çi dikim, her sînorên xwe yên şexsî îhlal dikim û ji wan re her tiştî dibêjim. (Kêfa mêrê min ji vê rewşê re pir nayê.)

Ji kesekî re di bi tehdîta êşê de ya nava xwe jê re nabêjim, gava ez nîşaneyên dilovaniyê dibînim ez vê dikim.

Her ku min ev bîrên kûr nas kirin, min çend tişt kifş kirin. Ji bo mirov bê rewşa bîreke kûr, divê bi awayekî tenduristî tevlî jiyanê bibe. Kûrahî nayê kirîn, divê mirov bide dû. Gava em bi qasî wêrektiyê durist bin tê. Ji ber vê, kûrahî; weke masûlkeyekê ku her dem tê bikarnîn e.

## Bîrên Xwestekan

Berî bi çendakî ez û John bi ajanseke castingê re civiyan. Şîrketeke televîzyonê hin pirsgirêkên kûr ku dinyaya me pê re rûbirû maye, di wê pêvajoyê de bûn ku wê bernameyeke  televizyonê çêbikin ku wê bi nêrîneke pir giyanî re vê bernameyê çêbikin. Ji bo em bernameyeke wisa çêbikin ev ne cara pêşî bû ku teklîf li me hatibû kirin. Piştî çend teklîfên ku ji ajansên li pey çêkirina Showa Realîteyê bûn, min biryar da ku ez naxwazim bibim parçeyekî ji vê pêşedanê. Min ji personela xwe re got, ez difikirim ku ev bi rastî jî ne karekî li rê ye. Lê vê ajansa castingê ji personela min re anî ziman û ew bawerî dayê ku wê ev bername pir cuda be. Ji bo çêker ji temaşevanan re bersivan bibînin, li amûrekê digeriyan ku gava diçûn dêrên xwe yên herêmî, bîne bîra wan. Bêdilî xwe me pejirand ku em hinekî din li ser vê fikrê bifikirin.

Ez û John em ne li heman bajarî bûn lê me biryar da ku em bi wan re konferanseke bi vîdeo çêbikin. Gelek pirsên ku me rasterast û ji dilê safî bersiva wan da, ji me pirsîn. Ez ne li bendê bûm ku em ê civîneke din bi hev re bikin lê me kir. Ji me re gotin ku me ji enerjiya we hez kir û xwestin ku pêvajoya hevpeyvînê derxînin asteke din. Ji bo vê hewce bi qeyda Skypeyê ya bi qasî saetekê, hebû. Ji me re lîsteyeke pirsan ya ku hêvî dikirin ku em di hevpeyvînê de bibersivînin, şandin. Pirsa pêşî wisa bû:

“Keçika min ya şazdeh salî; bi hevalê xwe yê kurik re ku bi emir jê

mezintir e û tecrubeya wî ya zayendiyê heye, dikeve têkiliya zayendî. Tecrubeya xwe ya zayendî ya pêşî bi wî re jiya. Weke dêyekê, divê ez rê li ber wê bixim ku testa nexweşiyê pê bikim an tenê ez bibim kontrola zarokanînê? Divê ez çi bikim?”

Li gorî min ev pirs ne pirseke ku mirov serê xwe pir li ser biêşîne. Keçik yeka kamilbûyî bû ku bi malbata xwe re dijiya. Bersiva ez bidim diyar bû.

Min anî ziman ku divê em li ber ronahiya Pirtûka Pîroz fihûşê hêsan nekin, divê em ji vê birevin. Min pêşniyar kir ku divê malbat li hev bicive û bê çima divê êdî ev keçika ciwan bi vî zilamî re hew hev bibîne, bi awayekî baş ev bê eşkerekirin…

Tam min dikir ku ez termê hinekî din vekim, peywirdarê castingê ez hişyar kirim. Ji min re ev her du şert ragihandin: (a) wê keçik û lawik têkiliya xwe bidomandana û (b) nedixwestin em ji Pirtûka Pîroz jêgirtinan bikin. Tenê şîretkarên giyanî dixwestin. Kesê ajansê diyar kir ku ajans bi xwe van cure pirsan kom dike û ev pirs wî bi xwe pirsiye. Keçika ku têkiliya zayendî kiriye xwuşka wî ye û jinika ku digot divê ez çi bikim, dêya wî bû. Ji wê xalê û şûnde me fêhm kir ku divê êdî em hew vê hevpeyvînê bidomînin.

Ajansê dizanîbû ku em mamosteyên Pirtûka Pîroz in lê dîsa jî nedixwest em bibêjin bê Pirtûka Pîroz çi dibêje. Dixwestin em kûr û giyanî bin lê nedixwestin em bi Pirtûka Pîroz re girêdayî bimînin. Ma tiştekî wisa dibe? Ji bilî şîreta Xweda ma zanyariya rastî heye gelo? Eger min ji oldarekî Serdema Nû jêgirtinek bikira, min meraq kir bê ma wê bipejirandana an na. Tişta ji me dixwestin bersivên weke ku kûr xuya dikirin lê di eslê xwe de nizm bûn, ango bîreke xwestekan bû.

Ji pevçûnê reviyan. Bi gotina tiştekî xelet re ku em tînin ziman, nexwestin em dilê kesî ji xwe bihêlin. Xwestin em bibêjin ku tiştê pîroz xelet in û em bînin ziman ku rêyên ne baş qenc in. Bingeha fikra wan “çi be ew e, ji ber vê ji bo wê rast nîşan bidin, çi pêwîst bibe wê bibêje” bû. Gava tu baş nêzî rastiyê be jî îcar di heman demê de tawîzan bide. Yeka din jî nedixwestin baweriya Xirîstiyaniyê li ber çavan be, dixwestin

em baweriya xwe veşêrin. Li gorî wan Xweda bêhempa bû lê divê Îsa û Pirtûka Pîroz li derveyî meseleyê bihatana girtin.

Bi gotineke din, min tiştekî wisa bigotaya ez bawer im wê pir kêfa wan bihata: "Belê, dêyeke dilovan be û ji bo nexweşiyên zayendî roj berî rojekê qîza xwe test bike. Lê bi vê yekê re, ji bo ji hemilbûnê bê parastin jê re metodeke kontrola zarokanînê ya dûvdirêj, pêk bîne. Piştre gava bi hevalê wê re we hev dît, tu û mêrê xwe hûn dikarin jê re bibêjin ku hûn pir qedir û qiymet didin qîza xwe. Jê re bibêjin ku tu bi emir mezin e û ji ber tecrubeya zayendî ya zêde em rêzê ji te re digirin. Jê bixwazin ku hûn ji aliyê malbatê ve jê re weke xelatê paketekê prezervatîfê bikirin. Bi vî awayî ji bo hûn jê ewle bin ku nexweşiyên bi rêya zayendiyê li qîza we belav nebin, çi ji destên we bê hûn ê bikin."

Hûn dibînin bê ev şîret çiqasî kenê mirov pê tê? Lê ez fêhm dikim bê çi dibe. Van kesên çêker nedixwestin rastiya Pirtûka Pîroz bibihîzin, ew li bîreke xwestekan digeriyan. Ya rastî ji min û John re wisa digotin: "Em ê hinek pereyan bidin we, li beramberî vê hûn ê jî xwestekên mirovan bînin cih. Gunehên wan pîroz bikin û bihêlin ku xwe baş hîs bikin."

Mixabin gelek Xirîstiyan ji bedêla ku bîreke kûr bikolin û bi pêş bixin, wisa xuya dike qîma xwe pê tînin ku li xwestekên baş guhdar bikin. Gelek jin hene ku xwediyê bêrîkirinên kûr in lê jiyanên wan yên teng hene. Şîretên dinyayî yên ku li wan temaşe dikin, dizanin ku olaneke vala ya dengê wan bi xwe ye lê difikirin ku her tişt ji vê yekê pêk tê... Bi vî awayî qîma xwe bi bîra xwestekan ya vala tînin. Gava di xwe de difikirin, dibêjin:

Xwezî me ew negota.
Xwezî me ew nekira.
Xwezî bi wî re nezewiciyama.
Xwezî bi wî re bizewiciyama.
Xwezî min dibistan berdewam bikira.
Xwezî hîn bêtir hevalên min hebûna.
Xwezî ez weke wî bûma.
Xwezî min ew nekiriya.

Xwezî min ew bikiriya.
Xwezî min hîn bêtir dua bikirina.
Xwezî min hîn bêtir Pirtûka Pîroz bixwenda.
Xwezî ez hîn bêtir bi disîplîn bûma.
Xwezî ez bi sebir bûma.

Eger tenê bi xwestekê bûya, em ê hemû bibûna kesên biaqil, xweşik, bi hêz û bi ceger. Walt Disney wisa gotiye: “Xewn gava hûn di xew de ne, ew xwestekên dilên we ne.” Ez bawer dikim ku ev rast e lê xewn û xwestekek; incex gava hûn şiyar bin û di vê mijarê de hûn tiştekî bikin wê ev tişt pêk were. Xwestek û arezû, *xewnê* motîve dikin û em jî *çalakiyê* motîve dikin. Ne bes e ku mirov tiştekî bixwaze, divê em baş bikin. Ha kûrbûn wisa bi pêş dikeve.

## Talûkeya Xapandinê

> Bila tu kes xwe nexapîne. Eger di nav we de yek xwe li vê dinyayê şehreza hesab bike, bila bêaqil be, da ku şehreza bibe. Çimkî şehrezayiya vê dinyayê li ba Xwedê bêaqilî ye. Wek ku hatiye nivîsîn: «Ew şehrezayan di hîleyên wan de digire». Û dîsa hatiye nivîsîn: «Xudan dizane ku fikrên şehrezayan pûç in.» (Korîntî I, 3:18-20)

*Bila tu kes xwe nexapîne,* wisa hatiye nivîsandin lê em hemû dizanin ku jinek bi rehetî dikare xwe bixapîne. Çi jin be û çi mêr be, kesek çima dixwaze xwe bixapîne? Bersiva vê ew e ku kesek bi dilê xwe nayê xapandin. Weke mêrê min her dem dibêje, *pirsgirêka xapandinê ew e ku xapînokî ye.*

**Hilbijartin a me ye -em zanyariya vê serdemê dixwazin an em zanyariya bêdawî dixwazin?**

Xapandin dibe sedema ku bûyer, mirov, şert û şîret di rastiyê de cuda bên xuyakirin. Xapandin dibe ku girêdana bi Xweda re weke êsîrtiya qanûnî nîşan bide. Xapandin dibe ku bihêle dijminê we weke dostekî xuya bibe. Heta

xapandin, dikare bihêle ku *nebaşî baş* û *başî nebaş* xuya bibe. Hêza xapandinê heta ku her tiştî girikî bike avê çiravî dike û bi vî awayî hûn bawer nabin bê hûn ê ji çi bawer bikin. Xweda dizanîbû em ê xwe di vê pozîsyonê de bibînin û ji ber vê bi demê re, mirov bi çand û hestan standarteke ku nayê guhertin ava kir. Standartên me Gotinên Xweda ne û kesên ji Xweda ditirsin ew kes in ku digihêjin van standartan.

Hilbijartin a me ye -em zanyariya vê serdemê dixwazin an em zanyariya bêdawî dixwazin? Kengî afirîdeyek xwe ji Afirîner bêtir bi aqil bibîne, xwe dixe xefka xapandinê. Gava şert û mercên me avan çiravî dikin, tenê Gotina Xweda dikara hêza pakbûnê ji me re ava bike. Bêyî şîretên Nivîsên Pîroz, em bi nêrîneke xelet bê aqiliyê zanyarî dihesibînin.

Gava ev bû, em xwe bi baweriyên xelet ve digirin û em dikevin nava talûkeya baweriya kesên qurnaz û xapînok ya ku em jê bawer dikin ku eşkere û durist e. Eger bê bîra we, zanyariya mar bi qurnaztî û fêlbaziyê pêçayîbû. Fêlbazî, tiştekî diyar îma dike û di rastiyê de bi temamî tiştekî cuda dixwaze bi dest bixe. Mar, di nava qilafetekî hevalbend de ku ji hundur ve agahiyê dide hev, nêzî Adem û Hewayê bû. Weke hevalekî samîmî ku pê re eleqedar e, gava gihîştin zanebûna ku başî nebaşiyê ji hev cuda bikin, îma kir ku wê bibin weke Xweda. Bêyî ku stuyê xwe li ber zanyariya Xweda bitewînin, soz da wan ku wê bigihêjin vê astê. Adem û Hewa nedixwestin bixapin, ew tişta ku mar soza wê dabû wan dixwestin. Li şûna tişta ku mar ji wan re gotiye ku ne rast e bawer bikin, bawer kirin ku Xweda ya derew ji wan re gotiye û ji vê bawer kirin. Ya rastî mar soz dabû wan ku gava bên rewşa bêxwedayîbûnê, wê bibin weke Xweda. Nivîsên Pîroz me hişyar dikin:

> Na, tu caran! Bila Xwedê rast û her mirov derewker be. Çawa ku hatiye nivîsîn: «Da ku, tu di peyvên xwe de rastdar derkevî Û çaxê ku bêyî dîwankirin, tu bi ser bikevî.» (Romayî 3:4)

Rêya xelasiyê ya ji xapandinê tobe ye, em ji zanyariya xwe re bibêjin bêaqilî û heta hetayê xwe li ber zanyariyê biçûk bikin. Tobe, bi armanca

em xwe bi heqîqetê bigirin û gava em ji derewê vegeriyan wê pêk were.

Sozên bi hîle yên şeytan îro roj li her çar parçeyên dinyayê olana berdewam dike. Berî bi demeke dirêj, pêşniyarên mar ji fermana Xweda bêtir bi dilovanî, bêtir nazik û bêtir bi tevgir xuya dikir. Her çi dibe, ma kîjan baştir tê guhê we? Bixwe û bimire an bixwe û zanyariyê bi dest bixe? Mar, xurûr û bêaqiliya me ya mirovî li hemberî me bi kar tîne. Kî naxwaze ji asta zanyariya me ye heye bêtir bi zanebe bawer nake? Ji ber vê xurûra me tê mizdan. Lê ya rastî ji bilî Mesîh zanyariya bi rastî tuneye. Tekane tişta ku em ê jê sûdê bigirin, nêrîna bi sînor e ya ku ji nêrîna me ya dinyayê pêk tê.

> Ruh bi eşkereyî dibêje ku di demên paşê de, hinek wê ji baweriyê bikevin û guh bidin ruhên xapînok û hînkirinên cinan. (Tîmotêyos I, 4:1)

Giyanê xapînok wê her dem ji we re bibêje ku li derveyî Gotina Xweda ronakbûn heye. Wê bibêje ku em li Serdemeke Nû ne û êdî ez ne behsa gotinên ku Xweda gotine, dikim. Ev giyan gotinên mar gotine dubare dikin: Li Xweda guhdar nekin, xwedayê xwe bin. Gelek kes jê difikirin ku xapandin ji hebandina Şeytan pêk tê û sêrbaziya eşkere ye ku vê nêrînê ji dest berdidin. Mixabin, gava ku giyan li pey tiştekî din bin, tiştekî pir cuda tînin ziman. Eger hûn Xirîstiyan bin, canê we nastînin, ji ber vê ji bo ku rayeya we bidizin û bîra we bilewitînin, çi ji destên wan tê wê bikin. Li vê dinyayê ya rastî gelek tiştên ku weke bêxwedayî tên dîtin, di serdema me de êdî berbelav bûne. Em bi awayekî pir tund tên hişyarkirin:

> Lê xwe ji çîrokên nepak û yên pîrejinan dûr bixe. Xwe di jiyana xwedayî de perwerde bike. Çimkî îdmana bedenî bi kêrî hindik tiştî tê, lê jiyana xwedayî bi kêrî her tiştî tê; soza wê hem ji bo jiyana vê dinyayê û hem jî ji bo jiyana wê dinyayê heye. (Tîmotêyos I, 4:7-8)

Ji ber ku weke pîrejinan û ji pîroziyê bêpar tê pênasekirin; nefikirin û nekevin wê xetaya ku van çîrokan weke yên zarokane ne an jî bê zerar in. Ne her du jî. Ev ji bo ku rastiyekê bidin hînkirin, ne çîrokên periyan

in yên ku bi fanteziyê hatine xemilandin an jî fabl in. Ji bo me bikujin, bişelînin û winda bikin, doktrînên cinan in yên ku hatine şandin.

Ji bilî şîretên Xweda, li tu deverî zanyariya rastî tuneye.

Îsa tenê *bi tişta ku em dixwazin bibihîzin* danakeve, dadikeve kûrahiyan û *tişta ku divê em bibihîzin* ji me re dibêje.

## Kişandina Avê ya ji Bîra Me

Di nava her yekî ji me de bi rastî jî bîrek heye. Ev bîr canê me ye û ji wir em avê dikişînin. Yeremya vê weke serdavekê bi nav dike:

> Ji ber ku netewa min du xerabiyê kirin; dev ji min, ji çavkaniya avên zindî berdan û ji xwe re sarincan, sarincên derizî yên ku avê nagirin kolan!  (Yêremya 2:13)

Bîrên canê me, ne nizm in kûr in û curbecur in, dibe ku li gorî kapasîteya me avên wan bilind bibin an jî nizm bibin. Ne girîng e bê bîrek çiqasî kûr e… Eger serdav derizî be, wê li xwe bixesirîne. Bi demê re bîrek ji bilî kûrbûnê dikare bê qewînkirin û bê saxlemkirin. Canê me weke bîrekê qabek û konteynirek e. Di hundurê wê de em bêrîkinin xwe, tirsên xwe û arezûyên xwe vedişêrin.

Carina avên bîrên canê me weke ku disekinin. Ez dikarim hîs bikim ku li demên din herikiye lê bîr vala be, nêvî be an jî bi ser ve here jî av her dem li wir e. Berê dijminan bîrên avê bi ax û keviran tije dikirin ji ber ku dizanîbûn av çavkaniya jiyanê ye. Kevirên muxurî yên jiyana me, dibe ku heman tiştî li canê me jî bikin.

Gava me hîs kir ku bîra me bi ser ve diçe, em dikarin destûrê bidin ku îfadeya keser an jî bêrîkirinên kûr yên canê me xwe bibînin û rê li ber wan vekin. Gava ku min xwe dilguvaştî, biherî û bêguman cirnexweş hîs kir, carina tişta ku divê ez bi temamî bikim bîra xwe vekim îlahiyeke ku canê min taze bike, vêxim. Demeke baş û xweş ya ku ez bi malbat û hevalên xwe yên bawermend re derbas dikim û em bi hev re dikenin, bîra min tije dikin. Xwendina Gotina Xweda, nivîsandina

rojikekê û duakirin; di rojeke germ de ji kaniyeke cemidî gava ez ava wê bi qurtequt vedixwim, min taze dike.

## Jinên ku Paşerojeke Wan Heye

Paşerojeke me hemûyan heye. Hin paşerojên me jê bi awayekî beloq ji yên din pir bi rengtir in. Hinek ji me paşerojeke wan ya baş heye. Hinekê din ji me jî paşerojeke wan ya kambax heye. Di rastiyê de pir girîngiya wê tuneye bê ma paşeroj ji we re baş e an nebaş e, talûkeya mezintir ew e ku mirov hewl bide di tişta êdî çûye û qediyaye de bijî û di wir de bimîne. Em ne ji bo ku di bin siya îhtîşam an jî fêdîbûnê de bijîn, hatine afiradin. Em ji bo ku li şewqa pêşerojê ya ku her diçe zêde dibe binêrin û di nava şewqa aniha de bijîn, hatine afiradin. Rêya rastiyê ev e.

Gava ku Xweda li pêş dinêre û pêşeroja me îlan dike, ez hîn bûm ku xwezaya mirov ber bi paşerojê ve ye û bi axaftina paşerojê re meyîldar e. Xweş e ku mirov çîrokên mirovan dibihîze lê ji bo pêşketinê girîntir e ku divê mirov bi xeyalên wan bizanibe.

Gava min rêwitî dikir û ez li gelek cihan diaxivîm, min hêvî da bi hezaran jinan. Gava min ev bi wêrektî beyan kir, min dixwest hûn bibînin bê şewqa têgihiştinê çaea rûyê wan dibiriqand:

> Êrîşên li jiyana we dibin li paşerojê bê hûn kî ne bêtir li pêşerojê bê hûn ê kî bin ve girêdayiye.

Ji nişka ve fêhm dikin ku çîroka wan hîn bi dawî nebûye. Gava tiştekî stratejîk derbarê jiyana wan de bû û gava dijmin wan bi awayekî hişmend dike hedef, vê yekê ferq dikin. Wê kêliyê, tişta ku divê hûn zanibin, fêhm dikin. Mijar *qet* ne paçeroja we ye. *Her dem* mijar pêşeroja we ye. Belê, encamên hilbijartinên we hene. Ez vê dizanim. Lê di paşerojê de we çi kiribe ne xem e, Xweda halêhazir li pêşiya we meşiya û gava ku tu rê nexiyabûn, ji bo we rêyek vekir. Hûn li dawiya xwe dinêrin û tiştên we kirine; tekane deriyê ketinê yê ku hûn ê bibînin,

hûn ê bifikirin ku girtine. Ma çawa çêbû. Ev derewek e. Belê, ew derî girtiye lê gava hûn li dawiya xwe binêrin, hûn ê bibînin ku deriyekî din li benda we ye. Dibe ku ji yê berê cudatir xuya bike, dibe ku hîn zortir be lê eger hûn bi Xweda re bixebitin, wê her dem we bibe cihê ku divê hûn lê bin. Ji bo hûn bîreke kûr û saxlem ya ku hûn ê avê jê bikişînin, bikolin; çi aletên ji we re lazim in wê bide we.

Pirsgirêk ew e ku gelek ji me li ber bîreke xwestekan ya derizî û nizm sekiniye û digirî. Em wisa dibêjin: "Xwezî min ev nekira! Min her tişt li binguhê hev xist!"

Bêderfet e! Tu, hevalê min yê xweşik, tu ewqasî jî ne bi hêz e. Tu jineke xwediyê paşerojekê be ev nayê wê wateyê ku tu yê nebe xwediyê pêşerojê. Tu jineke xwediyê paşerojekê be, ev yek wî mafî nade mirovan ku pêşeroja we kontrol bikin. Kontrola pêşeroja we Xweda ye.

Augustine'ê Pîroz, li ser mijara em dest pê bikin ku bîrên xwe kûr bikin, şîreteke pir baş li me dike:

> Hûn dixwazin bilind bibin? Ji nizmbûnê dest pê bikin. Hûn difikirin ku qûleyeke ku ewaran qul bike, çêbikin? Pêşî bingeha dilnizmiyê ava bikin.

Îsa bêriya ku bi me re li xala me ya herî nizm me bibîne, dike; hem ne carekê tenê, gelek caran. Bi piranî di dema me ya pêşî ya xelasiyê de, em fêhm dikin ku pêdiviya me bi hevdîtina Wî heye lê ji wê xalê şûnde em difikirin ku em hatine terkkirin û divê em bi tena serê xwe ava bikin. Fikreke ji vê xelettir tuneye. Bi Wî re cara pêşî weke Rebê xelasiya me em hev dibînin û piştre bi dilnizmiyê weke Rebê ku canê me taze dike û terkên li bîrên dilê me ketine nû dike û em bi Wî re gelek û gelek carên din hev dibînin û li hev rûdinên.

## Fetisîna di Ava Nizm de

Wan salên ku min perwerdeya canxelasiyê distand, ez hîn bûm ku her sal gelek kes di nava mesafeya cihê ewle de difetisin. Sê komên pir bi rîsk, yên pir biçûk (yên pênc salî û di bin re), yên ciwan û bêfikar (zilamên di navbera bîst û pîst û pênc salî de) û yextiyar (yên di ser şêst salî re) bûn. Tişta balkêş ew bû, nêvî jê yên ku jiyana xwe ji dest dan, du metreyan dûrî şerîda ewlehiyê difetisîn. Panîk dikirin û nizanîbûn wê ji şertên derdora xwe çawa sûd wergirin. Ha ji ber vê gelek mirov, ya rastî di ava metroyekê de an jî di cihê hîn nizmtir de difetisîn. Eger wê kêliyê xwedî kontrola hişî bin, dikarin lingên xwe bidin erdê û heta ku alîkarî bê dikarin wisa bisekinin an jî dikarin pê li erdê bikin û xwe çeng bikin, heta dikarin bimeşin û derkevin beravê. Tişta ku wan dikuje her dem ne kûrahî ye, tişta ku ne li bendî ne gava pêk tê li cihê nizm panîkê dikin û bi vê yekê diçin. Yên bêfikar, rêzê ji avê re nagirin û difikirin ku tu tişt nikare wan têk bibe.

Wê demê divê ez bibim nifşeke jinên ku di ava nizm de difetisin. Em destûrê bidin ku Giyanê Pîroz hîn bêtir û kûrtir bikole.

## Her Bijî

Gava ev jiyana me ya li vê dinyayê bi dawî bû em hemû dixwazin gotina *her bijî* bibihîzin. Peyva her bijî, ji bo pênasekirina xizmeta gava ku bang li me hatkirin bê em wê çawa çêdikin, tê bi karanîn. Di jiyan an jî hezkirina mirov de tiştekî ku em *bêqusûr* bi nav bikin tuneye. Tenê kesên biqusûr dikarin tiştên baş bikin, heye. Ji ber wê ev gotina her bijî, ji bo me hemûyan xelatek e. Gotineke ku tê wateya bitenduristî û saxlembûnê. Ji bo kesên têk diçin û dikevin lê her carê radibin ser xwe, tê gotin. Divê her dem bi qasî ketinên xwe zêdetir, em rabin ser lingên xwe.

Eger em bixwazin kûrahiyek ku me bibe bi pêş de ava bikin, helwesta ku divê em xwediyê wê bin ev e. Em çavekî li Şîretên Silêman 24:16 bixin:

> Çimkî rast heft caran bikevin jî, dîsa radibin, Lê di felaketê de kesên xerab wêran dibin.

Pirgirêk zanîngeha jiyanê ne. Pereyê dersa her polê ji bo hûn *carekê rabin ser lingên xwe* bi tişta pêwîst dikare bê pîvan. Rabûna ser xwe, nêrîna li mirêkê û li xwemikurhatina ku we kar li binguhê hev xistiye, zor e heta dibe ku pir baha be. Lê yên ne rast, ango ji bo nebaşan mirov bikeve, ev mirin e.

Kesên ku bi heman awayî diterpilin û dikevin lê di pêvajoyên nûbûnê de tê bîra min ku min jiyana du rêberên bi xelat û ronak yên ku bertekên pir cuda didan, şopand.

Pastorek jê bi plana ku heyeta rêveberiyê û tîma restorasyonê ku ji bo wî hatiye avakirin, girêdayî ma. Vê planê pêwîstî pê hebû ku rêper, hevjîna wî û malbata wî fedekariyeke mezin bikin. Dev ji her tiştî berdan, dêra ku ava kiribûn û bajarê ku demeke dirêj lê dijiyan û gelek hevalên xwe, li dû xwe hiştin û çûn. Di pêvajoya başbûnê de, tevlî malbata dêreke nû ya ku alîkariya wan kir ku ber xwe bibînin, bûn. Jê bawer kirin ku ev nêzîkayî ji bo her kes şîfayê bi dest bixe, rêya herî baş e û bi vê nêrînê ji her tiştî dûr ketin.

Ez bawer dikim, fikirîne ku ji wan gelek tişt hatine xwestin an jî fikirinê ku neheqî li wan bûye. Ez dizanim ku rastî helwestên henekpêkirinê yên kesên ku weke havalan li wan dinêrin, hatine û vê yekê ew birîndar kirine. Eger di meseleyekê de mirov hebin, her dem para xeteyekê heye. Lê dilê xwe ji dilmayînê pak hiştin û li şûna ku her roj li dû xwe binêrin, berê xwe dan pêşerojê û meşiyan.

John, bi vî rêberî re di serdema başbûn, hînbûn, xizmet û westîna bêdeng de ku pê re derbas kir, xwarinek pê re xwar. Di navberê re dem derbas bû, pêşketina xwe berdewam kirin. Ev malbat bi tendurist in, zewaca wan bêkêmasî ye û zarokên wan geş in. Bi organîzasyona avakirina dêreke mezin ya li Amerîkayê ji nêz ve têkiliya wan heye. Bi xêra vê têkiliyê, fersenda parvekirina eşkere ya dersên jiyanê dibînin, alîkariya başbûna rêberên din dikin û nahêlin ku kesên din jî weke wan

bikevin. Min berê jî ji wan hez dikir lê rêzê ku min ji wan re digirt hîn zêdetir bû. Ji bo ku li erdê neman ez dibêjim hemd ji Xweda re. Dîsa û dîsa rabûn ser lingên xwe. Pêvajoyeke zor bû lê rêya xwe domandin.

Rêberê din û hevjîna xwe rêyeke pir cuda hilbijartin. Ji berê de tê bîra min ku John bi vî rêberî re bi rêya peyaman dipeyivî. Di vê hevpeyvînê de, çi dibe bila bibe, ji bo pêvajoyê bidomîne, piştgiriya wî kiribû û ew bi ceger kiribû. Wî jî ev pejirandibû. Lê pirsgirêkek derket û pêvajo berdewam nekirin. Biryar dan ku dev ji pêvajoyê berdin. Tişta ku rêberê wan ji wan xwest maqûl nedîtin û hîs kirin ku neheqî li wan hatiye kirin. Ev heta cihekî dibe ku rast be jî, tenê Îsayê Mesîh dizane.

Lêbelê tirajedî ev e, hîsa dilmayînê ew di nava heriya ku têre derbas dibûn, dîsa kişand nava xwe. Bûn pisporê muameleya nebaş ya li wan hatkirin. Mixabin, di seran serê rêwitiya wan de tiştên ku jê hîn bûn tu fêdeya wan jê çênebû.

Rêya duyem ya ketinekê ku we li derveyî lîstikê dihêle, hilbijartina dîtina ye; ya ku terpilîna we ji derseke heyatê bêtir weke mahkûmiyeteke ku wê di seranserê jiyanê de bidome. Rastiya ku hûn bi ser neketine we nake neserketinek. Het ku hûn li jiyanê bin, hûn ê bi şertên berevajî re *rûbirû bibînin.* Nefikirin ku hin mirov jê muaf in. Hin mirov jê tenê mehitandina ku zordariyan ava kiriye li gorî kesên din hîn bêtir bi awayekî xweştir hildigirin. Min gelek tiştên dîtin ku ez dizanim reva ji vê tuneye. Wê mirov êşê bidin we û wê we li ziyanê biqelibînin, hin jê wê vê bi zanebûn bikin, yên din wê vê bi nezanî bikin. Jiyan wê we birîndar bike an jî bi dibetiya herî baş wê we aciz bike. Heta astekê pirsgirêk tên serê her kesî. Ha ev rastiyeke xweş e. Kêliya hat serê min, gelek tiştên bi êş yên ku ez difikirîm ku tu carî ez ê ji bîr nekim, ez jiyam. Lê aniha gelek ji van tiştan hema bêje nayên bîra min jî. Çima? Ji ber ku ez rabûm ser xwe û min meşa xwe berdewam kir. Bi meşê re pirsgirêkên nû dest pê kirin. Di bin pirê re gelek av derbas bûn û tiştên ku di sîh saliya min de hatin serê min û ez difikirîm ku ez ê tu carî ji nav wan dernekevim, di pêncî saliya min de asteke masterê dan min.

Her terpilîna me ji bo hînbûnê fersendek e. Em dest bi naskirina

asteng û talûkeyan dikin. Em jê bawer in ku pêlavên me girêdayîne. Em Gotinê dixwînin û rêya li ber me ronî dibe. Her gava em radibin ser xwe, kapasîteya me mezin dibe. Bîrên me kûr dibin û ji bo ava pak ya Giyanê Pîroz hîn bêtir cih vedibe.

## Xelasiyeke Dilsoz

Îcar aniha ka em li wateya duyem ya peyva xwe *bîrê* binêrin. Gava em dibêjin bîr, em behsa kanî an jî em behsa çavkaniyeke weke yanavê dikin. Gava ku me jiyan û hêza xwe ji ava kaniyên geş kişand, em ê bên wê astê û bibin çavkaniyeke ku yên din jî bi xwe re taze bikin. Ava geş ya bîrên kûr dizanin ku çavkaniya wan neçike. Wê demê gava mirov li me dinêrin, pereyên hesinî yên ku avêtine nava ava nizm di me de nabînin, dilsoziya Xweda ya ku hişê kesî têra wê nake dibînin.

Peyva her bijî bi her tiştî xwe têkildarî wî tiştî ye ku bigihîne temamiyê. Pirtûka Pîroz, bi çîrokên kesên ku jiyana xwe bi "her bijî"yê xelas kirine an jî ne baş xelas kirine û şibandinên weke van ve, tije ye. Çîroka Nûh ya ku projeya keştiyeke pir mezin ku bi salan domaye, heye. Li hemberî xeteya pir mezin, Şîmşomê ku hêza Xweda bi awayekî bêhempa nîşan da heye. Petrûsê ku Xweda înkar kiriye û Pawlosê ku zilm li Mesîh kiriye, rêya xizmetên bi hêz vekirin. Berevajî van, zilamakî bêyî ku mesrefên xwe bihesibîne hewl dide ku qûleyekê çebike, heye. Dest bi înşeata wê dike lê piştre ji ber ku xelas nake xelk henekê xwe pê dikin (Lûqa 14:27-29). Piştre koleyekî ku talantek dabûnê hebû û heta ku efendiyê wî hat ew talant xistibû bin axê. Pere di nava axê de pir nabin, ji ber vê gava kola û derxist dît ku hîn yê berê ye. Ji ber ku li cihê dest pê kir xelas kiribû, weke kole hat binavkirin û xwe avêt nava tariya li derve (Metta 25:14-30).

**ya girîng ne xurtbûna meşa me ye, ya girîng ew e bê em çawa pêşbirkê bi dawî dikin.**

Tişta ku ev çîrok hemû tînin ziman, ya girîng ne xurtbûna meşa me ye, ya girîng ew e bê em çawa pêşbirkê bi dawî dikin. Îteata bi biryar, dilovan û naguherî; her dem jixweber û çalakiya

hevnagire û hêrsbûnên dilbijiyê bi ser dikevin û eger di seran serê rê de em biterpilin û heta em bikevin, eger em xwe ji erdê rakin û ber di aliyê rast ve meşa xwe bidomînin, wê Xweda me bibe malê.

Di vê jiyanê de ji bo em rêwitiya baş bikin, pêdiviya me bi kolana bîrên kûr û saxlem heye û ji bo vê jî tiştа me dest pê kir divê bi dilovaniyê em biqedînin. Her kes dikare bîreke xwestekan ava bike lê em dixwazin bîrên jiyanê yên kûr ku bi Gotina Xweda xurt bûne û bi kaniya Giyan hatine tazekirin û nûkirin, bikolin. Em dikarin li wir bigihêjin jiyan û soza Xweda ya xelata mezin û bêreqîb.

## Pirsên Nîqaşê

1. Cihekî ku hîn jî Xweda lê "kolan"ê dike çi ye?
2. Jineke ku dişibe bîreke kûr hûn dikarin çawa bînin ziman?
3. Bêyî Pirtûka Pîroz ji aliyê giyanî ve mimkun e?
4. Çi bîra canê we tije dike? Çi vala dike?
5. Ji bo hûn li bîra xwe binêrin, hûn dikarin çawa hîn bi hişmendî tevbigerin?

9

# Keçikeke Xweda ya Bêreqîb

> Zalim dimire û desthilatdariya wî diqede; pakrewan dimire û desthilatdariya wî dest pê dike.
>
> SOREN KIERKEGAARD

Ev jin:

Li hemberî rêvebirê jirêderketî û herî bi hêz yê dinyayê derket. Bi wêrektiyeke ku mirov nikare bide ber tiştekî, şahidiya Mizgîniyê kir.

Lê xistin, hewl dan ku wê ji rê derxin û bi her awayî û her rêyê îşkence lê kirin lêbelê dîsa jî ji Mizgîniyê, dostên Wî û Rebê Wî re dilovanî kir.

Avêtin zindanê lê bandora ku ava kir nehat zindankirin.

Bi tena serê xwe bû lê ne tenê bû.

Di nava elçiyan de dihat hesibandin û li gorî dîroknasên dêra pêşî xizmetê diyar dikin û ji aliyê bêhempayan ve bêreqîb bû.

Belkî hûn meraq dikin bê ji bo çi hûn wê nas nakin.

Ez dizanim. Min jî ew berî demeke kin nas kir. Ew, tenê yek ji wan dêyên dêrê ye, yên ku navê wan di nava qûma demê de hatiye veşartin.

Di seran serê jiyana xwe de, min derbarê wêrektiyên wê de galgal bihîstibûn. Min xwest ez wê nas bikim. Qîma min nedihat ku ew tenê weke galgalekê bimîne, ji ber vê ji bo ez wê nas bikim, min li çavkaniyên derbarê dîroka dêrê de kolan. Di dema xebatên min de, ez bi pisporên Pirtûka Pîroz re peyivîm, li ser întenetê min lêkolîn kirin û min pirtûk kirîn. Piştî min navê wê kifş kir, ji bo ez wê nas bikim min parçeyên bi qasî ku bi kêrî min bên anîn ber hev û ez bi ser ketim. Her ku derbarê wê de gelek tiştan hîn bûm, ez fikirîm ku hûn jî wê nas bikin wê ev rast çêbibe.

Navê wê Photina an jî hin deman Photini bû. Navê wê bi Grekî bû û tê wateya “ronîbûye.” Gava ku Xirîstiyanî pejirand û piştî waftîz bû û şûnde, ev nav li xwe kiribû. Weke li me hemûyan kiribû, Îsa jiyana wê bi lehiyeke ronahiyê tije kir. Weke bawemendeke dilsoz ya Mesîh, di nava kesên li odeya jor diciviyan cih digirt. Gava Giyanê Pîroz, bi ser kesên li odeyê dirijiya ew li wir bû, zimanekî ji agir hat bi ser wê de, bi Giyan tije bû û bi zimanekî ku nizane dest bi berz û balakirina Xweda kir. Roja Pentîkost’ê Photina, ji bo Mizgîniyê li çar aliyên dinyayê waz bike, hat peywirdarkirin.

Ev xwuşka me ya bi ceger, rehetî û hemû sînorên vê jiyana ku dizane û nas dike li dawiya xwe hiştin û berê xwe da rêwitiya welatê Afrîkaya dûr. Gava çû ne bi tena serê xwe bû, piraniya malbata xwe bi xwe re anî. Rasthatina wê ya bi Mesîh re, di jiyana wê de guherîneke wisa bêhempa avakiribû ku du kurikên wê û pênc xwuşkên wê jî bawerî bi Reb anîn. Photina, bi kurikê xwe Joseph û xwuşkên xwe re, weke çawa Îsa di Karên Şandiye 1:8ê de ferman daye, rêwitî li her çar aliyên dinyayê kir.

Li Afrîkayê hemûyan bi hev re bi dilsoziyê xizmet kirin û Mizgînî li Kartacayê belav kirin û berhemên ku ew matmayî hiştin derketin holê. Împarator Neronê ku hişê wî çelqiya bû, piştî nûçeya ku zilm û zordariyê li Xirîstiyaniyên di nav axa desthilatdariya xwe de ye dike, Photina îcar piştî vê li hikmeta Xweda geriya. Îsa xwe di xewnekê de nîşanî wê da, ferman lê kir ku here Romayê û têkeve rûyê wî. Bi vî awayî li şûna ku ji Neron dûr bikeve, rasterast berê xwe dan nava dilê tofanê. Photina, kurikê wê û xwuşkên wê; komeke mezin ya ku ji bawermendên Kartacayî pêk dihatin, di cih de berê xwe dan Romayê.

Hatin hişyarkirin ku eger baweriyên xwe yên Xirîstiyaniyê bi awayekî eşkere bijîn wê hin encam biqewimin û şîret li wan hatkirin ku hebandina xwe bi dizî bikin. Li jêr axaftina di nava sûbayekî Romayî û sûbayekî din ku navê kurikên wî Victor û Sebastian e, heye.

> "Victor ez dizanim ku tu, dêya xwe û xwuşkên xwe hûn di rêya Mesîh de ne. Weke hevalê te ez şîretê li te dikim ku hûn bejna xwe li ber fermana împaratoriyê bitewînin. Eger tu derbarê Xirîstiyaniyan de agahiyan bide, wê serwetên wan bigihêjin te. Ez ê ji dê û birayê te re nameyekê bişînim ji bo ku Mesîh di nava gel de û di wazên xwe de olan nedin. Bila baweriya xwe bi dizî bijîn." Viktor jî wisa bersiv dayê: "Ez jî weke dê û birayê xwe dixwazim bibim waîzekî Xirîstiyan." Sebastian: "Ax Viktor, em hemû dizanin bê çi felaket li benda te, birayê te û dêya te ne."

Eger me zanîbûya wê ev biryar teqez bê wateya felaketekê, wê çendan ji me hîn jî baweriya xwe bi awayekî eşkere bijiya? Piştre kurikê wê Viktor da dû rêya dê, bira û xaltîka xwe. Li jêr ji heman belgeyê cih daye jêgirtineke ku şibakeyek li ber hevdîtana pêşî ya Photina û Neron vekiriye.

Hatina Photini (Photina) û kirinên wê li paytextê bi meraqî hatin pêşwazîkirin. Pirsîn û gotin: "Ev jinik kî ye?" "Bi qelebalixeke ku ji temaşevanan hebû, hat û bi wêrektiyeke mezin Mesîh waz didan." Ji bo leşker wê bibin cem împarator, emir li wan hatibû kirin lê Photini li benda wan bû. Berî wê bigirin; Photini, kurê xwe Joseph û bi rêhavlên xwe yên Xirîstiyan re çûm cem Neron. Gava împarator ew dêtin, ji wan pirsî bê ji bo çi hatine. Photini wisa bersiv da wan: "Em hatin ji bo em hînî te bikin bê tu yê çawa baweriyê bi Mesîh bîne." Rêvebirê Romayî yê hinekî dînbûyî, ew neditirsand. Dixwest ku Împarator bawer bike!

Neron ew şaş nehiştin û helbet ji fêhmkirina peyamê pir dûr bû. Yên ku angaşt dikin ku di destê Îsa de ye, ferman da ku bi şîşan li destên wan bixin. Nobedaran, Photina û yên li cem wê ji ber "bêrêziya" wan birin ji bo ku li wan bixin. Piştre sê seatan bi şîşên hesinî bi awayekî wahşî li destên wan xistin lê vê îşkenceyê leşker westandin û

Xirîstiyanan ew êş hîs nekirin û îlahî gotin. Birînek jî di destên kesên dane dû rêya Mesîh de çênebû.

Gava Neron fêhm kir ku bandora lêxistinê li ser wan çênabe, ew avêtin zindanê û ji bo Photina û xwuşkên wê qanex bike ku ji baweriya xwe vegerin, planek danî. Vê carê fikirî ku wan bi awayekî nerm vegerîne ser xwesteka xwe. Li saloneke mihrîcanê ya mezin, ferman da ku şeş textan ava bikin. Bi van textan re, çi dewlemendiya Romayê hebû li ber xwuşkan raxist. Ji bo amadekirina koleksiyoneke ku wê li giyanê jinan balkêş bê, ji tu mesrefê venekişiyan. Zêr û zîv li hêlekê, kincên û bergên pir xweşik û cewahîr li ber her jinê hatibûn raxistin. Eger baweriya Xirîstiyaniyê înkar bikirina û ji îlahê Romayê re pêşkêşî bikirina wê ev dewlemendî hemû û jiyana luks bibûya ya wan. Bi armanca ku wan qanexî vê hilbijartinê bike, peywir da qîza xwe Domnina ji bo ajaniyê bike.

Gava Domnina ket salonê, bi awayekî jidil û germ Photina pêşwazî kir û di nava silava xwe de navê Mesîh bi lêv kir. Photina ji ber vê got qey xwuşkeke bawermend e û piştî ku ew hembêz kir, mûcîze û hezkirina Mesîh ya ku diguherîne bi Domninaya ku digot xwuşkeke bawermend e bi awayekî eşkere parve kir. Domnina vebû û li şûna ku li hemberî Photinayê derkeve, Xirîstiyanî pejirand. Lêbelê gava bawer kir ne tenê bû, jinên li wir yên ku guhdarî li xwuşkên ku Mesîh bi wêrektiyê waz dikirin jî ketin rêya Reb. Piştre Photina; ji Domnina û rêhevalên li dora wê re got van dewlemendiyên li salonê hemûyan rakin û got çi kesên feqîr yên li kolanên Romayê hene bê tiştek belav bikin. Domnina waftîz bû û navekî nû li xwe kir.

Nero ji hêrsan dîn bû. Ferman da ku xwuşkên Photina û kurikên wê bi hev re bên şewitandin û bên şeneqandin. Firineke pir mezin çêkir lê gava ew avêtin firinê neşewitîn. Piştre Neron ferman da ku jahrê bidin wan û bên kuştin. Gava jahr hat Photina xwest ku di nava hevalên xwe de pêşî ew jahrê vexwe lê jahrê ne li wê û ne jî Xirîstiyaniyên din bandor kir. Piştre zilamê ku Neron şandibû ku jahrê bide wan, bawerî bi Îsayê Mesîh anî. Ew jî ji ber baweriya xwe

di zindanê de man û piştî vê sê salan li wan xistin û împaratorê ji rêderketî bi gelek cureyan îşkence li wan kir.

Lê çiqasî zilm li wan kir jî navdariya wan ewqasî mezin bû. Navûdengiya bawermend û hêzdariya wan li her çar aliyê împaratoriyê belav bû û dema ku di zindanê de man, zindan ji wan re bû mala hebandinê. Hemwelatiyên Romayî ji bo dua li wan bên kirin û Mizgîniyê bibihîzin, bi awayekî rêk û pêk hatin serdana wan. Sê salan Nûçeya Baş Ya Mesîh di nava sînorên zindanê de li Romayê belav bû û gelek kesan bawerî pê anî.

Neron bang xizmetkarekî xwe yê kevin kir yê ku ew avêtibû zindanê û zilam her tiştê ku qewimî anî ziman. Neron ferman da ku serê hemû Xirîstiyaniyên di zindanê de ne hema aniha bên jêkirin. Tekane awarte Photina bû. Bi rêya tecrîd û keserê, hêvî dikir ku baweriya wê bişkîne, ji ber vê ew ji zindanê derxist û ew xist binê bîreke kûr, reş û hêwî. Li gorî çend metnan pêşî ew pir baş qamçî kir. Photina, li cihekî ku dişibiya mezelekî ser vekirî, bi hefteyan di wir de ma. Tikî tenê bû. Ev ji bo Photina rojên reş bûn û giriya lê ne ji bo ku hezkiriyên xwe winda kiribûn. Dizanîbû ku ew ji her cure zindanên vê dinyayê rizgar bûn û halêhazir li mekanê asîmanî hatine pejirandin. Ji ber ku bi kurik û xwuşkên xwe re negîha mertebeya pakrewaniyê û taca pakrewaniyê bi destê wî neket, şîn girêdida. Bi qasî min xwendiye, ji bo wê serdema herî zor derbas bibû ev bû.

Di çi qeyda dîrokî ya min xwend de li ser vê serdema di bîrê de derbas kiribû, disekinî. Li gorî qeydekê di binê bîra reş de mir lê ne di nava bêçaretiyê de, bi xwesteka xwe mir. Weke Îstefanos di xewneke xwe de Xelaskerê xwe dît û giyanê xwe teslîm kir. Li gorî qeydên nivîskî yên din, piştî demeke dirêj ji bîrê hat derxistin û gava di zindanê de bû piştî ku Îsa xwe di xewnekê de nîşanî wê da û şûnde ji vê jiyanê rizgar bû. Di her du rewşan de jî, jiyana vê jinikê weke ava bîreke kûr bû ya ku jiyana gelek mirovan av dida û jiyana wan taze dihişt.

## Pakrewanên Serdema Modern

Photina, ji xwe re heyran an jî piştevan çênekirin, şahid û pakrewanan jiyan ava kirin. Bi vê jinikê re tiştekî ku min dixwest hebû. Bi wê re di pêşerojê de tiştekî ku pêdiviya me hemûyan pê heye, hebû: biryardariya qewîn. Gava ku dinyayê li Xirîstiyaniyan baş nêrî, tevlîbûna dêrê zêde dibe. Lê xwendekarên ku xwe didênê di demên pirgirêk de diwelidin. Dîroknasê Katolîk yê tê nasîn Christopher Henry Dawson, wisa diyar dike:

> "Dêr li bin siya dar û belteyê celad mezin bû û her Xirîstiyan di nava îşkenceya bedenî û talûkeya mirinê de jiyan. Fikra pakrewaniyê nêrîna hemû Xirîstiyaniya pêşî xemiland. Lê ev ne tenê tirs e, di heman demê de îdealek û hêvî bû. Ji ber ku pakrewan tam Xirîstiyan bû, leheng û şampiyonê civaka nû bû û pevçûna civaka kevin bû û di dema ceribandinê de Xirîstiyaniyên têkçûyî jî pakrewan weke parêzvan û xelaskerên xwe dîtin."

Em di serdemeke ji rêderketî û bi şîdetê tije ye de, dijîn. Êdî kengî bifikirim ku ji vê nebaştir nema dibe, îcar hîn nebaştir dibe. Di roja me de Xirîstiyan hîn jî tên şehîdkirin û ji hêrsê zêdetir berteka dinyaya me tam xwe li nebîstiyê datîne. Dilê min şkestiye lê ez bi tu awajî ne şaşmayî me. Berî bi çendakî, hem jî li Amerîkayê, yekî bi çek; bi taybetî jî xwendekarên Xirîstiyan ji ber baweriya wan, şehîd xistin. Bi awayekî biserûber yên ku Mesîh pejirandin di serê wan de û yên ku nepejirandin jî di lingê wan de berda. Li şûna ku ev weke sûcdariyeke hêrsê bê pênasekirin, medyaya me ya nûçeyan ev weke rewşa pirsgirêka kontrola çekê, anî ziman.

Eger Pirtûka Pîroz rast bê şîrovekirin, rehetî û xelasî diyar dibe ku wê ji rêberên vê dinyayê belav nebe. Lê ev rewş, nayê wê wateyê ku weke Photinayê em ê jî li hemberî tariyê bêdeng bimînin. Divê em wehiyeke zindî û dijî ya Yûhenna Iê ya 4:4an bin:

> Zarono, hûn ji Xwedê ne û hûn li hember pêxemberên derewîn bi ser ketin. Çimkî yê ku bi we re ye, ji yê ku di dinyayê de ye mezintir e.

Xirîstiyaniyên li welatên dijîn di serê wan tê berdan û vîdeoyên van wahşetan ji her kesê wêrektiyê dike ku xwe weke *gelê çarmîxê* bi nav dike, weke hişyariyekê ji wan re tê şandin. Gava min ev pênase bîhîst ez meraq dikim: Gelo ev kes di rastiyê de bê em kî ne bi bîr tîne û me jî ev ji bîr kir?

Berî demeke kin terorîstên Misliman li zanîngeheke Kenyayê girtin ser civîneke ku Xirîstiyaniyan li dar xistibûn û hemû kesên ku ji bo duakirina sibehê hatibûn cem hev qetil kirin. Piştre terorîstan xwendekarên li otel û yûrdên derdorê diman derxistin derve û li ber devê tivingê li baweriya wan ji wan pirsîn. Dîsa kesên ku wêrek derketin û xwe weke Xirîstiyan bi navkirin, hatin kuştin. Hema bêje 150 kes hatin qetilkirin û ji van pirtir jî birîndar bûn. Rêxistina ku ev wahşet pêk anî di hesabên xwe yên tora civakî de, pesnê xwe bi vê êrîşê dan û anîn ziman ku ev hîn destpêk e û îlan kirin ku wê ji vê zêdetir bê serê *gelê çarmîxê.*

Dem ew dem e ku em ji bo Mesîh êşê bikişînin. Ji bedêla ku em di xewê de bên zeftkirin û Wî înkar bikin, dilên me amade bin ku bersiva rast bidin û êşê bikişînin pir baştir e. Divê em xwediyê heman helwesta ku Elçiyan nîşan daye, bin:

> Îcar gava ku ew ji ber civîna giregiran derketin, pê şa bûn ku ew ji ber navê Îsa hêjayî bêrûmetkirinê hatin dîtin. Û wan dev jê berneda ku her roj li Perestgehê û li malan hîn bikin û Mizgîniyê bidin ku Mesîh, Îsa ye. (Karên Şandiyan 5:41-42)

We qet kesekî ku ji ber baweriya xwe ya bi Mesîh lêxistin xwariye, nas kiriye gelo? Hûn bi keskî ku *navê Îsa* hildaye ku heqaret lê bûye û ji ber vê kêfa wî hatiye, peyivîne gelo? Ez peyivîm. Ev kesên wisa pîroz, xwediyê pakbûneke biriqandî ne, ne ji ber ku lêxistin li wan hatiye kirin lê ji ber ku bûne hevparê êşa Wî û bi Îsa re li hev rast hatine. Bi xweşiyeke ku ez pê nizanim hatine xelatkirin. Kesên min

nas kirine, li erdên ku dizanin Xirîstiyanî talûkeyeke jiyanî ye xizmetê dikin. Hema bêje her roj di nava talûkeyê de ne. Bi piranî ev xwuşk û bira, ew xwuşk û birayên hêja ne ku pirtûkên me werdigerînin zimanê xwe. Tiştên ku ez di nava ewlehiyê de dinivîsînim, ew di bin talûkeyê de werdigerînin. Gelek deman ez hîs dikim ku ez ne layiqî wan im ku bi wan re bixebitim. Jiyana ew têde ne van gotinên Pawlos yên di Korîntî Iê de bi bîra min dixin:

> Îcar çima em her saet di nav talûkê de dimînin? Birano, ez her roj dimirim! Bi saya Xudanê me Îsa Mesîh ez bi we serbilind im û ev ji xwe wisa ye. (Korîntî I, 15:30-31)

## Qelsiya Rojava

Ez durist tevbigerim? Ji bo Dêra Rojava ez li ser agir im. Mixabin, di roja me de ku em bi kesên bêrûmetkirina navê Wî re rast bên dibetiyeke mezin e. Carina ji ber xemsarî û xweperestiya xwe nexweş dikevim.

Berî bi çendakî min û John û çend pastorên din bi hev re xwarin xwar. Pastoran, civata xwe ango mirovên ku Îsayê Mesîh weke Rebê xwe pejirandine, gotin ku em wan li hemberî xefka bêsinciya zayendiyê her dem hişyar dikin. Her çiqasî van hişyariyan dikin jî bi nêrînên vala û mahneyên qels re rûbirû dimînin. Hevserên bi hev re dijîn tên û rewşa xwe wisa tînin ziman: “Em difikirin ku rojekê bi hev re bizewicin, çima xelet e ku em aniha bi hev re bijîn û û bi hev re têkiliya zayendî bikin?”

Xizmetkarekî din; rêberekî Xirîstiyan yê naskirî tu sedemên ku xwe bispêrin Pirtûka Pîroz tunebûn, plan dikir ku jina xwe berde û ev bi awayekî pir xedar parve kir. Ev zilam ji ber devjêberdanê dizanîbû ku wê salekê dûrî kursiyê mabûya lê piştre plan dikir ku wê vegere nava her kesî. Mixabin, dibe ku mafdar be. Tirsa mirov êdî tu kesî ji me ranagire ku em nekevin gunehê. Reva ji nebaşiyê tenê tirsa ji Reb dikare pêk bîne.

Giyanê Pîroz, ji bo bi sedan jin çarmîxa xwe bavêjin ser pişta xwe û

bidin dû Îsa, xizmeteke ku ew peywirdar kirine, bi taybetî piştî demeke dijwar, rêber rabû ser xwe û ji jinan re got tundiyê li ser xwe hîs nekin; tu pêdiviya Xweda pê tunebû ku ew tiştekî bikin; pêdiviya Xweda pê hebû ku ew *bibin* tiştek. Bi rastî?

Ne tenê bi navûdengiya ku *bibe* Kurê Xweda lê li ser navê me bi hêviya ku karê evdekî bike; ji ber ku mezinbûn û îmtiyaza xwe deniye aliyekî, ez heta tu bêjî bes minetdarê Rebê me Îsa me. Ez li dêr û dinyayê dinêrim û gava ez dibînim ku evqasî binavbûye û hatiye şelihandin, ev rewş min ditirsîne.

## Jineke ku Paşeroja Wê Heye

Lê kar ji bo Photina wisa dest pê nekiribû. Ew jî di nava rewşa jiyaneke biguneh de kûr çûye û di nava fediyê de ji biyaniyekê wêdetir ne tiştekî din demeke wê heye. Di bin darazandina zagonê de jiya û xwediyê paşerojekê ye ku tu hêviya wê lê tuneye.

Nivîsên Pîroz li paşbûna jinekê şibakeyekê vedike. Gava pêşî me hev nas kir; bênav, hatibû berdan û ji cih û warê xwe hatibû qewirandin. Jiyana wê ji gelek aliyan ve ewqasî di nava pevçûnê de bû ku tu kesî xeyal nedikir wê bikaribe rojekê xizmetê bike. Ji ber ev dizanîbû, gava ku cara pêşî Mizgînî parve kir pirs û pêşniyar avêtin holê. Belkî weke vê hevala me we jî pêşniyarên mirovên din ewqasî ji kûr ve hîskirin ku hevokên we di xwe de pirs û delîl hewandine.

Wan bibexşînin.

Mirovên ku we bi paşeroja we ve girêdidin… divê dilovaniya Xweda û hêza ji nûve çêbûnê tecrube bikin.

Belkî jî hûn xwe didarizînin. Ji ber paşeroja min di serê min de gelek pirs çêbibûn. Lê dîsa jî cihên qirêj û tarî yên jiyana min; gava piştre xelas bûm bûn cihê bîrên min yên herî kûr. Her çiqasî bawermendên nû ku divê di cih de weke rêber tayîn nebin jî, her Xirîstiyan ji bo bibe şahidê hêza xelasiyê divê bê bicegerkirin. Lê başiya Îsa ya bi qedir û qiymet divê tu carî ji bo nebaşiyê neyê bikaranîn an jî ji bo hinekî din

guneh bên kirin divê tu carî weke mahneyekê neyê dîtin (Romayî 6:1-2). Berevajî vê, başiya Wî; divê bihêle ku em navên nû bindest bixin, divê me ber bi guherînê ve bibe, divê bihêle em jiyaneke ku her diçe vediguhere rastiyekê bijîn.

Berî ku navê "ronîbûnê" bistîne, Photina tenê xwediyê pênaseyeke etnîk bû. Gava ez û wê em li hev rast dihatin, sohbeteke taybet ya ku bi Îsa re dikir em bûn guhdarê wan. Ev hevala me ya jin jineke Samerî bû. Ev jina ku berê pênc mêrên wê hebûn ku wê rojekê bi pênc xwuşkên xwe re xizmetê bike çi tiştekî bêhempa bû! Ji vê hez dikim ji ber ku hejmara pêncan di Pirtûka Pîroz de sembola başiyê ye. Û di rewşa wê de başî li ser başiyê tecrube kir!

Min her dem ji vê jinikê hez kiriye. Bi salan min ew weke keseke xwediya kapasîteya mezin, dît. Jiyaneke teng dijiya ku bîreke kûr bû. Zordariyên ku hatin serê wê û encamên hilbijartinên wê, di nava wê de valahiyeke ziwa, tarî û kûr tê de vekiribû. Dixwest ku dijminê canê wê di vê valahiyê de her dem îzole bike û dixwest ku xeyalên wê bigihêjin heta hetayê. Di beşa 4an ya Yûhennayê de gava ez axaftina Îsa ya bi vê jinikê re dixwînim, ez xwe her dem di nava sahneyê de xeyal dikim. Dibe ku xwendekar fikirîbin ku Îsayê ji westandinê ji halde ketiye ew bi tena serê xwe li ser bîrê hiştibin û fikirîbin ku wê ev bi ewle be. Ji bo şivan kêriyên xwe av bidin hîn ji wê demê re hebû ku bînin ser bîrê û jinên li herêmê jî ji bo ava mala xwe ji zûde hatibûn û ava xwe biribûn. Ji honandina gava pêşî peyivîbûn hez dikim:

> Îsa wisa ji rêwîtiyê westayî li kêleka bîrê rûnişt. Wext nîvro bû. Jineke Samerî hat ku avê bikişîne. Îsa ji wê re got: «Avê bide min ez vexwim.» Şagirtên wî jî çûbûn bajêr ku tiştên xwarinê bikirrin. (Yûhenna 4:6-8)

Îsa piştî meşeke pir dirêj westiyabû. Ez Wî gava li ber bîra antîk ya Yaqûb rûdinê dibînim. Tava Rojhilata Navîn ya xedar lê dixe lêbelê hewa hênik ya ku ji bîra kûr bilind dibe, hîs dike. Îsa li hundurê bîrê dinêre û gava bûyerên rojê di ber çavan re derbas dike, li dîroka bîrê difikire.

Xizmetên Wî yên li Yahûdistanê ji nişka ve bi dawî bibûn û rêwitî dirêj û bi toz bû. Gava hîn bû ku rêberên olî di nava xwendekarên Wî û Yehya de van vediguherîne pêşbirkekê, dawî li waftîza wan anîbû (Yûhenna 1).

Çima ev xizmet bi awayê rastî ne didîtin? Weke kedyarên hev bi hev re xizmet dikirin. Belê, girseyên qelebalix hatin. Piştî ziwahiya gelek salan îcar ketibûn nava xelayeke mezin. Aniha pêxembertî û gelekî ku soza wî daye amade dikir. Jiyan bi tobe û avên waftîzan vedigeriya. Çalakiya waftîzê pir pîroz bû û bi hêviyê tije bû lê wan ev veguherandibû şanîdaneke sîrkê. Ji ber vê avên Şeria'yê li paş xwe hiştibûn û hatibû vî welatê ziwa.

Di nav toz û bin roka şewat de, kêliyekê çavên xwe digire. Li cem vê bîra antîk wê bêhna xwe vede û wê li benda vegera xwendekarên xwe be. Hilmekê kûr dikişîne. Ji nişka ve dikeve nava hesteke bendemayînê û hîs dike ku Giyanê Pîroz dipeyive: Li vê çoltera Samerî'yê armanceke min heye. Îsa peyvekê dibihîze, paleyî. Çavên xwe vedike û dibîne ku keçikeke Samerî ji bo avê bikişîne bi tena serê xwen nêzî bîrê dibe.

Rahijtiye cêrekî mezin. Dişibe cêrê wan jininên ji bo avê bikişînin ku di hingûra rojê de hatine vê derê. Weke cêrê wê dilê wê jî vala ye. Ev keçik ewqasî ketiye binî ku ji hebûna jinên din jî direve. Pisporên Pirtûka Pîroz, radigihînin ku jinikê ji ber zanîbû ku di qelqela germa nîvro de wê tu kes li ser bîrê tunebe, hatiye ser bîrê.

Îsa li wê dinêre. Gava Wî dibîne, ferq dike ku jinik di cih de berê xwe jê diguhere. Li kincên Wî dinêre û fêhm dike ku ew Yahûdiyek e. Têkiliya Yahûdiyan bi Sameriyan tuneye, dilê wan ji wan dixele. Berî vê serê jinikê ketiye teşqeleyan, teşqeleyeke nû naxwaze.

Nêzî aliyê din yê bîrê dibe û cêrê xwe datîne û hewl dide ku avê ji bîrê bikişîne. Îsa bang wê dike. Bi awayekî matmayî serê xwe radike û lê zîq dibe. Di dengê Wî de ton û tingîniyeke ku bala wê bikişîne heye. Xwestina Wî ya avê, ji talebekê bêtir weke vexwendinekê dihat. Bêyî ku jê bawer be bersiv dayê:

> Jinika Samerî jê re got: «Çawa dibe ku tu ji min avê dixwazî? Tu Cihû yî û ez jî jinikeke Samerî me.» Tu têkiliya Cihûyan bi Sameriyan re tune. (Yûhenna 4:9)

Ka carekê xeyal bikin, pêşniyareke ewqasî mezin e ku eger hûn bi vê jinikê re heman qedeha avê parve bikin wê we ji aliyê olî ve qirêj bike. Ne tenê Samerî ye di heman demê de jin e. Lê Îsa natirse ku bi wê re di heman tasê de avê vexwe… Amede ye ku li şûna wê tasa wê ya xezebê vexwe. Îsa, berevajî mêrên din naxwaze wê bi kar bîne. Dixwaze wê nas bike. Belkî jî dixwaze pê re sohbeteke xweş bike. Belkî ji ber rêberên olî yên nebaş, ji bo ku xelet hatiye temsîlkirin aciz e. Belkî jî weke gelekan ji me, ji ber ku barê dilê xwe bi kesekî biyanî re parve dike vê weke tiştekî ku dilê wê rehet dike, dibîne.

> Îsa bersîva wê da û got: «Eger te bi dayîna Xwedê û yê ku ji te re dibêje: ‹Avê bide min ez vexwim› bizaniya, teyê jê bixwesta û wiyê ava jiyanê bida te.» (Yûhenna 4:10)

Jinik tewşomewşo dibe. Ev zilamê ku behsa xelata Xweda dike, îcar kî ye gelo? Dixwaze ew kesê derbasî aliyê din yê bîrê bûye ku behsa îdeayeke wisa ku hedê xwe nizane dike bê vê wêrekiyê ji kuderê distîne, bibîne. Gelo cêrê Wî li ber lingên Wî ye? Li cem xwe ku vê îdeayê îspat bike tu tiştî nabîne. Sozên ku ev zilam dide weke gotinên zilamên ku berê nas kirine, gelo ev jî vikîvala ne? Bi helwesteke meraqdar dipirse bê wê vê ava jiyanê çawa bikişîne:

> Jinikê jê re got: «Ezxadim, tiştekî te yê ku tu pê avê bikişînî tune û bîr jî kûr e! Tê ava jiyanê ji ku derê bînî? (Yûhenna 4:11)

Ev ava ku evqasî zidî dike, digihêje encama ku divê ji binê kûrahiya bîrê derkeve. An ev Yahûdî heqaretê li bîra Yaqûb dike gelo? Ev bîr xwediyê mîraseke mezin e û ji gelek bîran kûrtir e. Tişta ku dixwaze bibêje hinekî din dikirpîne:

> Ma tu ji bavê me Aqûb mezintir î, ku ev bîr daye me? Wî bi xwe, zarokên wî û pez û dewarên wî av jê vexwarine.» (Yûhenna 4:12)

Li vir bîra ku behsa wê tê kirin balkêş e ku bîra Yaqûb e. Navê *Yaqûb* tê wateya "tiştê ku cihê xwe diguherîne, hîlekar an jî li gorî rîtma wê diçe." Gava ku Xweda ferqa dijminahiya sulala jinê û ya mar ragihand, got ku wê mar êrîşî pahniya sulala jinê bike. Xweda, navê Yaqûb di serdema jiyana wî ya mayî de weke *Îsraîl* guherand ku ev nav tê wateya "mîrê Xweda." Jê bawer dikir ku wê zilam tîbûna wê bişkînin û bi vî awayî ev jinika ku gelek caran hatiye xapandin, çi bûyereke sosret e di bîra Yaqûb de axaftina wê ya bi Mîrê Xweşiyê yê Îsraîlê re! Jinik xelek be jî, Îsa teqez dizane bê çi dibe û çi nabe.

**Her bîra dinyayî di dawiya dawî de bi kêrî me tê ku tîbûna me ya însanî ya bêçare derdixîne holê.**

Ev sohbet di dawiya dawî de ne bi rewşa bîrê re, bi tîbûna bêçare ya jinikê re têkildar e. Tişta ku Îsa pir baş dike, dîsa wê dike... Guh nade pirsên wê û bang li bêrîkirinên herî kûr yên jinikê dike:

> Îsa bersîv da û jê re got: «Her kesê ku ji vê avê vexwe, wê dîsa tî bibe. Lê kî ji ava ku ez bidimê vexwe, tu caran tî nabe. Belê ew ava ku ezê bidim wî, wê di dilê wî de ji bo jiyana herheyî bibe kaniyeke ava ku diherike.» (Yûhenna 4:13-14)

Di nava îfadeya *her kesê* de Îsa kesên tî yên ku ji vê dinyaya ku dikare ji me re ava bike û zêdetirî vê, li hev kom dike. Hem Yahûdiyan hem Sameriyan û hem jî her kesê ku berê û aniha serdana vê bîrê kirine, di xwe de dihewîne. Her bîra dinyayî di dawiya dawî de bi kêrî me tê ku tîbûna me ya însanî ya bêçare derdixîne holê.

Bîrên kevin wê we dîsa û dîsa bê av bihêlin. Di dawiya dawî de tenê Xweda dikare tîbûna me bişkîne. Ev bîrên antîk mahkûmî têkçûnê bûn ji ber ku çavkaniyên wan ji nêz ve bi şert û mercên herêmî ve girêdayî

bûn. Di her demê de dijminek dikarîbû bi dizî têkeve hundur, dikarîbû jahrê bavê bîrê an jî dikarîbû wê bi ax û keviran tije bike. An jî xelayeke dûv dirêj ku dom dike, dikare bîrê bi temamî bigire. Weke bîreke kevin Zagon jî bi darazên mirovî dikare bi hêsanî bi zahrî bixe an jî li axa qaîde û rîtuelên mirovî dikarîbû bê veşartin. Samerî tenê bi pênc pirtûkên pêşî yên Tewratê re girêdayîbûn û çiyayên xwe dihebandin. Tenê li bin siya Zagonê dijiyan lêbelê Yahûdiyan îspat kirin ku jiyana em bêriya wê dikin ji me re avanekirin. Ev bîrên antîk yên bav û kalên bawerî û zagonê, pêdiviya bêdawî ya avên zindî ya Giyanê Pîroz bi armanca ji me re bikirpînin, dan me. Zagon, ji bo hebandinê cihek û mekanek jê re lazim bû. Zagon, Xweda di cihê ku em dikarin bigihêjinê û jê bi *wir* de bi cih dike. Ji bedêla ku hebandina Xweda bibe çavkaniya me ya jiyanê, weke merasîmeke olî dimîne. Ji îkametkirina di binê zagonê de bêtir, serdana wê heye. Zagon, ew cihê ku Xweda ji mesafeyekê diyar tê xuyakirin lê mirov nikare dest bidêyê. Zagon, dînamîkeke pêvajoya Çiyayê Sînayê ye ku em dikarin lê binêrin lê em nikarin Wî hembêz bikin.

Ji bedêla ku perestgeha me di *nava me* de be gava li *derdora me* be, wê demê em di bin rîska ku li derve bimînin de ne. Lihevrasthatina jina Samerî ya bi Îsa re, gelek parametreyên zagonî şkerandin. Jinê, Zagon binpê kiribû û bi zilamekî re bêzewac dijiya. Di dêra herî lîberal ya roja me de jî, wê bifikiriyana ku “di nava gunehê de” dijîn. Lêbelê Îsa ev şert û mercên wê derbas kirin û rasterast bang dilê wê yê şkestî kir.

Zagon her dem ji tişta dikare bide we zêdetir bêtir ji we dixwaze. Avên zindî nakevin cêrekî an jî heta nayên wezinandin. Heman tişt ji ava mirî re ne derbasdar e. Eger hûn ê ji bîra Yaqûb rahijin avê, pêdiviya we bi cîrekî heye. Ava ku hûn ê bibin mala xwe bi qasî ku hûn dikarin rahijinê sînordar e. Ava mirî ne sivik e, giran e. Eger rojê 2 lître ava ku li me hatiye tenbîkirin em bi kar bînin, serê kesekî li dor kîloyekê giranbûn wê bibe para wan. Eger ji bo çêkirina xwarinê, kirina paqijiyê, şûştinê û xerckirina malbateke 4 kesan hûn avê dikişînin, barê ku hûn ê rahijinê bi rehetî dikare 10 kîloyan derbas bike. Ev pîvan, giranbûna cêrê hûn ê rahijinê û mesafeya ku divê hûn bimeşin naxe nava hesab.

Û ev rêwitî divê we gelek û gelek caran bikiraya. Îsa, behsa tîbûneke mayînde û ya ku naxape dike. Ev jinika ji Rojhilata Navîn ya ku li welatekî ziwa û bejî çêbûye û mezinbûye, di seran serê jiyana xwe de tîbûn tecrube kiriye. Lêbelê bîreke pir kûr an jî aveke hênik ya ku pêdiviya wê ya hez, erêkirin û beşdarîbûnê têr bike, tuneye. Canê wê ji bêçaretiyê bê av maye. Her carê ji aliyê tişta ku hêvî dikir wê bêrîkirina wê bikewîne û wê canê wê taze bike ve, hatibû xapandin. Bêrîkirinên wê mafdar bûn lê weke gelekan ji me, li cihên xelet li tiştekî rast digeriya û hey digeriya.

> Ne xelet e ku mirov bixwaze ji me bê hezkirin.
> Xwestina ku hûn jiyana xwe bi kesekî nêzî we re ava bikin, ne xelet e.
> Xwestina jiyaneke birûmet ne xelet e.
> Xwestina jiyaneke bi armanc ne xelet e.
> Xwestina hevalan ne xelet e.
> Xwestina hebandinê ne xelet e.

Îsa, ne bêrîkirina wê pişt guh dike û ne jî henekê xwe bi ya we dike. Gava ku soza wê tîbûna wê bişkîne dayê, wê rêzdar dike. Ne jiyaneke ku dernakeve serî, yeka heta hetayê pêşkêşî wê dike. Bi arezûyeke ku ji kûrahî û bêçaretiya canê wê derdikeve, nêz dibe û rîca dike:

> Jinikê jê re got: «Ezxadim, vê avê bide min ku êdî ez tî nebim û neyêm ji vir avê nekişînim.» (Yûhenna 4:15)

Di rîcaya wê ya êşdar de, ez dengê hêviyê dibihîzim. Ez bêrîkirinên wê ji yên xwe nas dikim. Îsa, ez rîca dikim nehêle ez bêm vî cîhê ku her dem têkçûnên min tîne bîra min. Eynî weke wê min nikarîbû bi ya zagonên ciwaniyana xwe bikim. Dizanîbû ku vê qezenc nake û dizanîbû heq nake, ev tenê weke xelatekê dikarîbû jê re bihata. Weke bengiyekê êdî tiştekî ku xerc bike nemabû. Tîbûna wê ew êsîr girtibû.

Îsa, berî ku vê avê bide jinikê, divê zanîbûya bê ma gelo amdeye xwe pak bike an na. Me bi rastî amadebû ku tiştên çû li dû xwe bihêle?

Behsa bîreke bêcan, ya bi qusûr ku ev demeke dirêj e avê jê dikişîne, dike; ango behsa zilaman dike.

> Îsa lê vegerand û jê re got: «Here gazî mêrê xwe bike û were vir.» (Yûhenna 4:16)

Bi vê yekê re bila neyê bîra we ku Îsa bang kesekî rayedar dike ku pê re biaxive an jî gunehên wê derdixîne holê. Li şûna vê, ji bo êşên wê miz bide li mêrê wê pirsî. Xwuşka me ya wêrek, ji ber rewşa xwe ya rastî, her çiqasî baş zabîbû ku wê ava jiyanê ya Rebbê xwe nestîne jî, dîsa jî rastî hilbijart û got:

> Jinikê bersîva wî da û got: «Mêrê min tune.» (Yûhenna 4:17)

Dibe ku ev li xwe mikurhatin li ser wê giraniyek ava kiribe. Pênc zewacên têkçûyî. Di xwemikurhatina wê de ne kesek sûcdar dikir û ne jî lêgerîna mahneyan hebû, tenê ji xem û rastiya qirêj pêk dihat. Mêrê min tuneye…

> Jinikê bersîva wî da û got: «Mêrê min tune.» Îsa jê re got: «Te rast got ku mêrê te tune, çimkî pênc mêrên te hebûn û yê ku niha tu pê re yî, ne mêrê te ye. Te ev rast got.» (Yûhenna 4:17-18)

Îsa bi kesên rastiyê re dibêjin û bi xwemikurhatinên wêrek re dikare bixebite. Jinikê rewşa xwe ya heyî ji Îsa re got û Îsa kîtekîtên paşeroja wê temam kirin. Pênc zilaman ew weke hevjîn ji xwe re anîn û piştre jî avêtibûn qiraxekê. Carina ez meraq dikim bê ji bo çi li vê jinika gunehkar wisa zîq bûye. Ez neviya jinike me ku çar caran bi sê zilaman re zewiciye. Ew ne qurbanek e, ev hilbijartin û nebaşiya wê ye. Lê rewşa jina Samerî dibe ku ne wisa bûya. Em teqez dizanin ku di rewşeke xelet de ye. Di bin Zagonê de dijiya û li gorî Zagonê zilamek piştî ku bi jinikekê re zewicî, dibe bifikire ku xete kiriye û bi belgeyeke devjihevberdanê ya xeyalşkestî re dikare jê xelas bibe. Gava di bin Zagonê de dijiya, bi xwesteka xwe derfetên ku mêrên xwe

biguherandana tunebû. Ji bo dîsa bizewice pêdiviya wê bi vê belgeya devjihevberdanê hebû. Hûn lê difikirin… Zewaceke bi pênc qurûşan? Êdî ev jinik ewqasî ziyan lê hatibû ku ne navê xwe lê mecbûr mabû ku livînê xwe bi zilamakî re parve bike. Hemû jiyana wê bi xwestekên redkirî yên ku bi cih nehatibûn, boriyabû. Giyanê wê şkestibû lêbelê dîsa jî bi hêvî bû. Yûhenna 4:19 wisa berdewam dike:

> Jinikê jê re got: «Ezxadim, ez dibînim ku tu pêxemberek î. (Yûhenna 4:19)

Heta bi berî demeke kin jî min guranbûna vê mikurhatinê fêhm nedikir. Jinik bi vê gotinê çi tiştên ku heta niha pê dizanîbû, derbas dikirin ji ber ku Sameriyan bawer dikirin ku tenê Mûsa pêxember e. Li gorî Metta 10:41ê, bi saya vê mikurhatinê jinikê xelateke ku hêjayî pêxemberan heq kiriye: "Yê ku pêxemberekî ji ber ku pêxember e qebûl bike, ewê xelata ku ji bo pêxember e bistîne."

Xelateke ku li gorî pêxemberan e çi ye? Ez bawer dikim ku bi gelek awayan ev xelat dikare bê ziman lê wahiyeke derbarê rastiya dijî de û tiştekî ji vê têgihiştinê bi qedirtir, tuneye. Pêxember wekî din jî weke kesên zana tên nasîn. Îsa çi cihê ku çûyê, li wir çavên têgihiştina mirovan vekiriye. Gava jinikê pejirand ku Îsa pêxemberek e, li pêşeroja xwe fikirî û pirsî bê wê li kuderê Îsa bihebîne. Li gorî fikra min, di rêyên kevin yên jiyana xwe ya kevin de, di rewşeke bêzar û bêhal de bû. Tu derfetên wê tunebûn ku zanibe êdî hebandin ne li cihekî, wê di kesekî de wê pêk were.

> Îsa jê re got: «Sitiyê, ji min bawer bike, wext tê, ku hûnê ne li vî çiyayî û ne jî li Orşelîmê biperizin Bav. (Yûhenna 4:21)

Jinik Îsa weke pêxemberekî bi rûmet dike û beramberî vê jî Îsa bi zimanekî dilovan pê re dipeyive. Ez meraq dikim bê jinikê herî dawî kengî têkilî û dilovaniyeke wisa dîtiye. Îsa dilê wê yê şkestî û giyanê wê yê birîndar bi gotinên pêşerojê yên bi hêviyê tije, nû dikir.

Aniha jî ez dibihîzim ku Îsa her keçika xwe vedixwîne: “Ji min bawer bike ey jina binirx, taybet û ya ku jê hez dikim, dema te jî hatiye…” Dema bawerkirina we aniha ye. Hinekî bisekinin. Ji canê we re çi dike pistepist?

Xwedayê me ne li çiya, bajar an jî ne li dêrekê ku nêzî we ye. Tu kes nikare we ji huzûra Wî dûr bixe. Mala Wî ava ku tu xete nikare we ji tişta di nava we de dijî qut bike. Îsa, di bîra nava we de li bendê yê ku hûn Wî bihebînin. Nivîsên Pîroz bi bîr tînin ku Xwedayê me bi qasî pistepistekê nêzî me ye:

> Lê belê çi dibêje? Dibêje: «Peyv» – yanî peyva baweriyê ya ku em didin bihîstin – «nêzîkî te ye, li ser zimanê te û di dilê te de ye». (Romayî 10:8)

Îsa ev terma xwe ya ku hêjayî şoreşê ye, bi jinikeke herî ketî re parve kir. Kesekî ku Xwedayekî ji sînorên mekanî serbixwe qet bihîstiye gelo? Li kuderê dibe bila bibe, Xwedayekî qayil ku pê re hevbibîne? Ka carekê bifikirin ku ev nûçe ji bo wî çiqasî bêhempa ye. Jineke ku gelê wê bera wê daye û yeka ku ji Yahûdiyan re biyanî ye lê Xweda di cihê pîroz yê dilê wê de, cihek ji xwe re veqetand. Ji ber ku jinikê bi awayekî samîmî nasnameya xwe jê re got, Kurê Xweda jî bi heman awayî pê re eşkere dipeyive. Hilbijartinên kirin zor lê kirin ku jinikê derxînin derveyî sînorên jiyana wê. Îsa wê vedixwîne hundur û daxuyaniya xwe berdewam dike:

> Hûn diperizin wî yê ku hûn nas nakin, lê em diperizin wî yê ku em nas dikin, çimkî xilasî ji Cihûyan tê. Lê belê wext tê û niha ye: Yên ku bi rastî diperizin, ewê bi ruh û bi rastiyê biperizin Bav. Çimkî yên ku Bav li wan digere ew in ku bi vî awayî diperizin wî. Xwedê ruh e û yên ku diperizin wî, divê bi ruh û bi rastiyê biperizin wî.» (Yûhenna 4:22-24)

Îsa, kevneşopiyên wê bi rastiyê parçe parçe dike. Eger ev tiştên ku Reb dibêje rast bin, wê demê tam jî yeka ku Bav ji bo hebandinê

lêdigeriya bû, hem di giyan de û hem jî di rastiyê de hebandineke ku bêriya wê kiribû.

Îroniya li vir ji ber çavên me difilite ji ber her tiştên ku Îsa diyar dike weke rastiyên tên fêhmkirin, em dizanin û dipejirînin lê wê serdemê ev term radîkal bûn. Bêguman tu carî Bav Xweda nebihîstibû.

Bi Xwedayekî ku bêriya Wî dikir re dikarîbû têkilî daniya. Wê kêliyê ez bawer dikim ku di nava xwe de pevçûnek hîs dikir, weke oleke tengazer li hemberî vê pergala nas dike aniha li ber wê deriyekî hêviyê yê mezin vebibû. Li xwe ne ewle ye bê wê ji çi bawer bike, dilê wê bi hêvî, tevlihevî û meraqê direele lê tiştekî ku dizane parve dike:

> Jinikê jê re got: «Ez dizanim ku Mesîh» – yê ku jê re ‹Yê Bijartî› dibêjin – «wê bê û gava ku ew bê, ewê her tiştî nîşanî me bide.» (Yûhenna 4:25)

Ez meraq dikim bê gelo Îsa xwe li ber baweriya zarokane ya jinikê digire an na. Nûçeya baş ya rastiyê hîn bêtir ji wê veneşart. Gava ev gotin ji jinikê re kirine pistepist, ez xeyal dikim ku çavên wan ketine hev:

> Îsa jê re got: «Ez ê ku bi te re dipeyivim, ez ew im.»
> (Yûhenna 4:26)

Her tiştê ku hêvî dikir wê Mesîh bike, Îsa bêkêmasî kir… Her tişt ji wê re ragihand. Carina beyî ku mirov her tiştî bibêje jî, Xwedayê me dest her tiştî dide. Sakîn be dilê min. Mesîhê me yê ku mesih bûye, pirsên me yên derbarê hebandinê de bi piranî rastiya derbarê me de dibêje û bersivê dide. Di derbekê de kevneşopiyên me yên bêaqil îfşa dike û bi şûrê rastiyê re fikrên mirovan qut dike û diavêje. Kî cêrê avê danayne erdê û piştî ku vê bibihîze baz nade û naçe? Ha vaye Îsayê me. Şerm yên di nava xwe de li ber şermê naxe. Wan dixe nava ewlehiya xwe û gotinên kubar yên ku Ferîsiyan (û carina xwendekarên Wî jî) red kirine ku bibihîzin, bi wan re parve dike.

Kêlî bi dawî bûye. Xwendekar vedigerin û dibînin ku Îsa bi jinikeke ku li gorî wan ne baş û kêm tê dîtin re dipeyive. Lê hatina xwedekaran

êdî ji bo jinikê ne girîng e. Gava ku hûn ji aliyê Xweda ve carekê hatin pejirand… îcar mirov we red bikin wê bi kêrî çi bê? Yek ji xwendekarên Wî jî ku Samerî venexwendine ku Îsa bibînin, tiştekî balkêş e. Lê ev ne pirsgirêk bû ji ber ku Îsa nûçegîhanê xwe şandibû jî. Di nava vê demê hemûyî de, Îsa tenê li wê fikirî bû.

> Îcar jinikê cerê xwe hişt, çû bajêr û ji xelkê re got: «Werin, wî mirovî bibînin, ku hemû tiştên ku min berê kiribûn ji min re gotin. Gelo Mesîh ev e?» Xelk ji bajêr derketin û ber bi Îsa ve dihatin. (Yûhenna 4:28-30)

Gava em ji nêz ve lê binêrin, em ê kifş bikin ku gotinên wê bi awayekî zanebûn hatine hilbijartin. Îsa weke pêxemberekî nade naskirin an jî behs nake ku Yahûdî ye ji ber ku dizane ku dibe bajarî ji ber vê Wî red bikin. Ji bo rêya bajariyan veke serpêhatiya xwe bi wan re parve dike. Ez ji vexwendina hevala me ya li şûna ku bang wan bike ku bên bibihîzin, tê û bang wan dike ku Wî bibînin, pir hez dikim. Dîtin dibe ku bê wateya bawerkirinê û gava çavên me vedibin, em dixwazin ku hemû kesên din jî bibînin.

Îsa tiştekî evqasî pîroz, binirx û berî her tiştî tê; ji jineke ku ji bo yên din qirêj, ji rêzê û lewitî re diyar kiriye, pir li xweşa min diçe. Îsa sirên Xweda ji keseke ku pir kêm tê dîtin re diyar dike û bi vî awayî ji bo me hemûyan derî heta piştê vedike. Ji ber vê min di gelek pirtûkên xwe de behsa çîroka jinika Samerî kir. Ez li sohbeta Îsa û jinikê her dem bi nêrîneke din lê dinêrim û tu carî bi dilekî xemsar lê nanêrim.

Ev nêzîkayiya ku biyaniyeke di nava şermê de ye vediguherîne endameke malbatê ya pir jidil, bi salan e pir ji vê lihevrasthatinê hez dikim. Serdemekê ji ber ku navê vê jinikê tunebû, vê rastiyê pir bandor li min kiribû; bi vî awayî min karîbû navê xwe li çîroka wê bikira. Lê piştre min wê weke Photina ango bi navê “ronîbûye” nas kir. Wê rojê li Sameriyê dest bi mizgîniyê kiribû lê weke em dizanin xizmeta wê sînorên wê herêmê derbas kiribûn û pir belav bibû.

Çîroka wê; her yekî ji me yê ku weke bîrên kûrî ku jiyaneke nizm dijîn, divê me teşwîq bike. Jinikeke serhişk ku derbarê hebandinê de bi pêxemberekî re sohbet dike, ma wê çi daxuyaniya vê hebe gelo? Tenê bîra wê ne kûr bû... û ziwa bû jî. Pênc mêr kiribûn, du kurikên wê hebûn lê bêrîkirina di nava wê de venemirîbû. Ev jinika ku xwedî kapasîteyeke bêhempa, heta ku mejiyê hestiyên wê naliyan bûn li ber xwe dabû.

Ji nişka ve rewş guherî. Xelat bi dest xist. Îsa ew vexwendibû û bi wê cegerdariyê ava jiyanê xwest. Vî Mesîhê bêhempa ew bi temamî nas dikir û bê şert û merc jê hez dikir. Bi vî awayî li ser vexwendina Wî, keçika Xweda ya bêreqîb ji ava jiyanê bi qurtequrt vexwar û bi biryareke naheje re di nava talûkeyê de meşiya û veguherî mizgînxêr û elçiya Photinayê.

Waaa jina ku paşeroja wê heye, tu yê bide ser rêya wê?

## Pirsên Nîqaşê

1. Ji bo ku Xweda hîn bêtir hêzê di jiyana we de nîşan bide gelo hûn birçî bûne?
2. Çîroka Photina çawa bandor li we kir?
3. Li xweşa we çû ji ber ku ew jina di bîrê de bû? Ev rewş ji bo we sozeke çawa di xwe de dihewîne?
4. Hûn di kîjan aliyên jiyana xwe de difikirin ku hûn bîreke kûr in ku nizm dijîn?

10

# Jiyaneke Bêreqîb

Hûn ji bo diyarkirina armanceke nû an avakirina xeyaleke nû qet ne yextiyar in.

C. S. LEWIS

Ez dixwazim çîrokeke din a serdema kevnar a wêrekî û xwedayinê bi we re parve bikim. Demekê keçikeke ciwan û bedew a bi navê Thecla hebû. Ew rojekê li mala cîranan guhê xwe dide Pawlos ku wî wazên Mizgîniyê dida. Dema ku Pawlos ji bo jiyaneke dilpak û binamûs bang li keç û xortên ciwan dikir ku ew xwe bavêjin Mesîhî, Thecla xwe bi paceyê zeliqandibû û li wan guhdar dikir. Ew bi destgirtî bû lê piştî ku guhê xwe da gotinên Pawlos wê êdî nexwest bizewice û biryar da ku rojên xwe yên mayî ji bo mezinahiya Xweda bijî. Pawlos hay ji vê yekê tune bû ku ewqas tesîr li Theclayê kiriye lê kêfa dêya wê û destgirtiyê wê ji vê biryarê re nehat û ji ber vê yekê wan girseyek bi hêrs li dijî Pawlos tûj kirin. Ji ber serhildana gel Pawlos derxistin pêşberî waliyekî Qonyayê û ew di cih de xistin zindanê.

Theclaya ku gelekî ji ber vê yekê diêşe ji bo dîtina Pawlos micewherên xwe weke bertîl dide û diçe girtîgehê Pawlos dibîne û

Mizgîniya Îsa rasterast jê dibihîse. Piştî ku malbata wê pê dihese ku keça wan a wenda li hucreya Pawlos e her duyan jî derdixin pêşberî walî. Bi qamçiyan li Pawlos dixin û wî dişînin derveyî bajêr. Dayika Theclayê wê red dike û keça ciwan bi mirinê re rû bi rû dimîne. Ji bo ku ji keçên din re bibe îbret û ew li serhildaneke wisa pûç nefikirin, ew ê Theclayê bi stûnekê girêbidana û bişewitandana.

Dema ku Thecla ji bo kuştinê dibirin Pawlos û Xirîstiyaniyên din li goristanên derveyî bajêr hatin ba hev û ji dil ji bo wê dua kirin. Thecla bi stûnê ve girêdan lê agir pê neket. Piştre ji nişka ve bahozeke nejirêzê derket û baraneke pir xurt agirê ber lingên wê vemirand û Thecla ji mirinê rizgar bû. Karbidest ji vê yekê tirsiyan, fikirîn ku ev ji Xwedayên Grekan nîşanek e. Thecla serbest berdan û ew avêtin derveyî bajêr. Theclaya ku bêxwedî dimîne diçe ba Xirîstiyaniyên din ên qedexe li ser wan heye û li gel Pawlos û yên din biryarê didin ku ew ji bo Antakyayê bi rê kevin.

Piştî ku ketin nav bajêr, Alexanderê bi bandor û bi hêz bedewbûna Theclayê dît û xwest ku wê ji Pawlos bikire. Gava Pawlos red kir wî xwest ku bi zorê jê bistîne. Thecla bi tundî li hemberî vê yekê derket û di kêliya pevçûnê de pelên taca serê Alexsander jê weşiyan, li ber çavên gel ew cehimand û ferman da ku destê xwe nede xizmetkareke Xweda.

Alexanderê ku ji hêrsa har dibe wê dikişkişîne ber waliyê Antakyayê. Thecla li xwe mikur tê di nîqaşê de dema hewl daye ku bireve kincên Alexendar qetandiye. Careke din Thecla bi kuştinê re rû bi rû dimîne. Wê kuştina wê piştî rojekê pêk bihata û vê carê ew ê ji hêla heywanên dirinde ve bihata parçekirin.

Jinên Antakyayî ji ber vê gelekî hêrs bûn. Wan didît ku ev cezayê dane Theclayê neheqî ye. Jineke esîl a Romayî derdikeve pêş û ji bo bekareta Theclayê bê parastin, rîca dike ku Thecla ne li girtîgehê lê li mala wê bimîne. Wê şevê ev her du jin bûn hevalên hev ên nêz.

Roja din dema ku Thecla hat zincîrkirin û ew birin arenayê jina esîl li dû wê giriyekî dilşewat dike. Di nava xuminiya qelebalixiyê de Thecla tazî kirin û ew xistin arenayekê ku tije şêr û hirç in. Heywana ku pêşî nêzî wê dibe şepalek e. Bazda ber bi wê ve lê êrîşî wê nekir û bi sekneke ku wê biparêze li ber lingên wê mexel hat.

Hirçekê êrîş kir lê hîn ku xwe negihandibû Theclayê şepalê hirç kuşt. Piştre şêrekî êrîş kir û şepalê ji bo ku Theclayê biparêze ji nû ve pê re şer kir. Şer bi mirina her duyan bi dawî bû û berateyên her duyan li ber lingên Theclayê hatin raxistin. Perwedekarên heywanan, heywanên din bi qamçiyan ber bi nêçirên wan ve birin. Lê her heywana hat mexel ket û êrîş red kirin. Xumîniya qelebalixiyê sekinî û tirsa Xweda arena xiste bêdengiyeke kûr. Theclayê bi dengekî bilind û bi wêrekî dua kirin.

Walî rabû ser xwe û lîstika dirinde sekinand. Xwest ku hîn bibe ka ev jin kî ye û hêza xwe ji kuderê distîne. Theclayê wisa bersiva wî da: "Ez xizmetkara Xwedayê zindî me... Ez ji bo Kurê Xweda yê ku Xweda jê raziye baweriyê dikim. Tenê ew rastiya rêya rizgarî û jiyana bêdawî ye. Yê ku jê bawer neke ew ê di mirinê de bimîne..."

Walî ferman da ku kincên wê bidinê û piştre serbest bê berdan. Wê rojê ne bi hezaran be jî lê bi sedan kesan ji Mesîh bawer kirin û li gorî qeydên dêrê yên yekem jinên Antakyayî wê rojê bi yekdengî Xweda mezin kirin û bajar bi dengê wan hejiya.

Theclayê jiyanek dirêj û tijî jiya û heta ku di nod saliya xwe de xatir ji jiyanê xwest her û her Mizgînî ragihand.

## Jiyaneke Bêtirs

Tişta ku ev jin ango Thecla ewqasî bi hêz dikir çi bû? Tazî bû lê şerm nekir, ji ber ku bi saya wehiya Îsa xwe ji nû ve nas kir. Her çend ku bawermendek nû bû lê bû qasideke hêzdar. Dema ku bi duayan dengê xwe bilind kir, wêrekî li hemberî mirinê pêşkêş kir. Ev keça Xweda ya wêrek ku dê bi awayekî nixumandî mafê wazdayînê li gelek kursiyan bi dest nexista, li kolezyûmeke ku bi heywanên dirinde ve hatibû dorpêçkirin û bi awayekî tazî bi sedan kes xistin ser rêya Reb. Dema ku ez çîrokên wisa dixwînim, difikirim ku Hewa dibişire û bi vê re jî kêfxweş dibim. (Ez bawer im ku Sara jî dibişire!) Ji ber şerê ku Hewa li hewşeke ewle ya bi eleqeyeke nêz lê dît winda kir, ji hêla keçên Xweda yên nûhatî li arenayên ku bi dijminahiyan hatine dagirtin, ji nû ve û dîsa hatin qezenckirin.

Girse, ji bo temaşekirina înfazekê kom bibû lê li şûna vê ew bûn şahidên têkçûna Têkbirina Guhehan. Bila jiyanên me vê mîrateyê berdewam bikin. Em roj bi roj radighînin ku rastî û rizgariya em tê de ne, di rêya Mesîhî de ye, em ê şiyana xwe ya bi Wî ve hatiye dagirtin zêde bikin û lezê li hatina Wî ya duyem dikin.

Em dizanin ku di roja me ya îro de bi qasî ku di tu serdemên mirovahiyê de nehatiye dîtin Pirtûka Pîroz heye. Lêbelê em bi evqasî agahiyê hatin kuderê? Em xwedî gelek agahiyên têr û tije ne lê ji hêla vegerînê ve kêmaniyek me ya balkêş heye. Mixabin ku di gelek qadan û çalakiyan de fikr û şiyanên entelektuel cihê pêşengtiya Gotina Xweda û Giyanê Pîroz girtine.

Ez hîn zêdetir dixwazim. Tişta ku di giyanê xwe de hîs dikim, şiyarî û paleyiyeke giyanî ya bêreqîb e.

Pêdiviya vê dinyaya jirêderketî bi dîtina hêza Xweda heye. Belkî jî dema wê yekê hatiye ku em duayên dêra yekem vejînin.

> Û niha ya Xudan, li gefxwarinên wan binêre! Û vê yekê bide xizmetkarên xwe ku peyva te tam bi ziravî bêjin. Destê xwe dirêj bike, da ku bi navê xizmetkarê te yê pîroz Îsa, nexweş qenc bibin û nîşan û karên mezin çêbin.» (Karên Şandiyan 4:29-30)

Û van duayan hiştin ku çi biqewime?

> Piştî ku wan dua kir, dera ku lê civiyabûn hejiya, ew hemû bi Ruhê Pîroz tije bûn û peyva Xwedê bi ziravî digotin. (Karên Şandiyan 4:31)

Dema wê yekê hatiye ku Gotina Xweda bi wêrekiyeke bêtirs were ragihandin. Ji gelek hêlan ve zehmetiyên ku Thecla pê re rû bi rû mane ji yên me ne gelekî cudatir in. Dema biryar da ku li rêyeke ku ne li bendê bû bimeşe û jiyaneke pîroz bidomîne bi kîn û hêrsê re rû bi rû ma. Endamên malbatê hewl dan ku wê bidin sekinandin, dewletê baweriya wê li derveyî qaîdeyan dît û mêran hewl dan ku bi kotekî serdestiyê lê bikin û tişta ku weke serhildanê dibînin têk bibin. Lêbelê di seranserê vê pêvajoyê de birastî ya azad tenê ew bû. Tu tesîra mirin

an jî jiyanê li ser nasnameya wê ya ku baş pê dizane, tune bû... Ew, xizmetkareke Mezinê Mezinan ya Xweda bû.

## Jiyaneke Bêreqîb

Em di roj û demeke wisa de dijîn ku hemû tiştên li derdora me bi bahozeke xurt vî alî û wî alî ve diçin û tên. Eger ku hûn bizanin hûn ji ku hatine û aidî kê ne wê demê hûn ê li ser lingan bimînin. We jiyaneke bêreqîb hilbijart... Ev jiyan tenê ji aliyê Giyanê Pîroz ve dikare were avakirin:

> Madem ku em bi Ruh dijîn, hingê em bi Ruh rêve jî herin. Em quretiyê nekin, ji hev re meydanê nexwînin û çavnebariya hev nekin. (Galatî 5:25-26)

Û va em hatin cihê ku me dest pê kiribû.

Dê nîşaneya yekta ya nasnameya we ya resen we ji bo jiyaneke li pey şopa Giyanî berhêl bike. Hûn ne ji bo danberhevdinê hatine afirandin, hûn ji bo Kurê Xweda hatine afirandin. Hîn berî ku hûn hilma xwe ya pêşî bikişînin, Bavê we yê Asîmanî, jiyana we heta bi hûrguliyên wê li pirtûka xwe nivîsand. Jiyana we bi herfên zindî nivîsî. Ji bilî we tu kes nikare çîroka we bijî. Dem hatiye ku rûpelên we derbasî jiyanê bibin. Eger hûn metnên çîrokê yên ji bo kesên din hatine nivîsîn, bijîn wê tiştên ku Giyanê Pîroz ji bo we nivîsîne belasebeb biçin. Ji bo me her kesî qederek û rêyeke diyar heye ku em pê de biçin. Û eger hûn ê jiyaneke bêreqîb bijîn rênîşandana Giyanê Pîroz şert e. Jiyana li pêy şopa Giyan, ne tenê têgehek razber an hêviyeke romantîk e. Nîşaneyeke disîplîna giyanî û tevgera baweriya hebandina şexsî ye. Ev ne baldariya belawela ye, xwedayîn e. Wê Xweda hem di jiyana we ya taybet hem jî di ya civakî de li gel hemû bawerî û îteatên hûn dikin, armanca jiyana we eşkeretir bike û dengê xwe xurttir bigihîne we.

**Hûn ne ji bo danberhevdinê hatine afirandin, hûn ji bo Kurê Xweda hatine afirandin.**

Jiyana we û hemû şiyanên tê de navgînek e ku Xweda daye we. Cihê şermê ye ku xezîne û diyariyên di dilê we de, di bin siya fikr û bendemayînên kesên biyanî de bimînin. Hûn ne tenê ji bo ku bibin temaşevanek, li vê dinyayê ne. Gelek tiştên girîng û balkêş hene ku hûn ê bikin û dema têgihiştina vê hatiye.

Pêşeroja we niha ye.

Di demê de em li ser vê xalê ne. Em tu kes nizanin ku wê sibe çi biqewime lê hûn dizanin ku jiyan ev kêlî ye. Û hêza hilbijartinên we dikare hemû kêliyên we bi qîmet bike.

Tovê soza çîrokeke balkêş avêtine dilê we. Dibe ku pirtûka jiyana we girtî bimîne an hûn dikarin rûpelên wê biqulîpînin. Em li peyama ku Pawlos ji bo Galatiyan daye guhdar bikin:

> Bila her kes karê xwe biceribîne. Hingê mirov ne bi kirinên hinekên din, lê tenê bi kirinên xwe dikare pesnê xwe bide. Çimkî her kes wê barê xwe hilgire. (Galatî 6:4-5)

Eger hûn bi xwenasîna xwe mijûl nebin an jî bi nasîna hemû kesên din zêde mijûl bibin, wê xwenasîna we gelekî zehmet be. Eger hûn ê di rêwîtiya jiyanê de bêyî ku ji ser hişê xwe ve biçin bimeşin divê hûn *zanibin bê hûn kî* ne.

> Loma bala xwe bidinê ka hûn çawa rêve diçin, ne wek ên neşehreza, lê belê wek ên şehreza herin. Îcar ji fersenda vê demê îstifade bikin, çimkî roj xerab in. (Efesî 5:15-16)

Eger hûn di mijara dema xwe de ne baldar bin, wê rojên we di nav tevliheviya daxwaz û belavbûna balê de winda bibin. Dema ku hûn vê pirtûkê ji destê xwe deynin, rahijin pênûs û kaxezekê. Di ser bikaranînên dema xwe ya bihikmet û bêhikmet re biçin, bê çi ne. Ji bo ku hûn bikaribin ji nû ve xeyalan ava bikin pêdiviya min bi vekirina rojên we heye.

Bi baldarî armancên xwe bi xeyalên xwe ve girê bidin. Wê demê, keça Xweda ya bêreqîb tu çi xeyalan dikî? Hûn dikarin bibêjin ku jiyana

we gelekî bêzar an jî jirêzê ye. Ez raporeke rewşê ji te naxwazim. Azweriya te çi ye? Eger te azweriya xwe winda kiribe heta ku tu ji nû ve wê bi dest bixî vegere huzûra Xweda. Hiş û dilê xwe pak bike. Derkeve meşekê, li muzîkên hebandinê guhdar bike û ji nû ve bi bîra canê xwe re pêwendiyê deyne.

Ji bo diyarkirina armancê an avakirina xeyalan hûn tu carî ne gelekî pîr, ne gelekî hejar, ne gelekî dewlemend, ne zêde xwedî perwerde û ne zêde bêperwerde ne. Ya din jî hûn tu carî ne zêde ciwan in.

Dema ku ez li dîmenên jinên Xirîstiyan ên roja me dinêrim, gelek jinên ku ev govenda jiyan û xizmetê bi awayekî baş dikin dibînim, ez zêde matmayî dimînim. Di van deman de li eniyên pêşî gelek jinên ciwan yên bedew, wêrek û xwedayî hene û dilê min tije hêvî ye. Li hemberî ev rewşa nû ez ketim dudiliyê û min meraq kir gelo ez êdî hindiktir rapelikim û zêdetir nizm bibim. Çendek berê dema ku ez li vê mijarê difikirîm min bihîst ku Giyanê Pîroz min sererast dike. *Bilindbûna wan nayê wê wateyê ku tu yê vekişe. Divê tu pêşveçûna xwe bidomîne. Min qet armanc nekiriye ku ew te ber bi aliyekî ve dahf bidin; bihêle bila ew te ber bi jor ve dahf bidin.*

Dibe ku çûna min a bi aliyê "jor" ve ji yên heta niha cudatir be, lê ez qet nabihîzim ku Xweda dibêje li jêr binihêre an jî serê xwe daxe. Dibêje serê xwe rake. Dema ku keçên Wî bi yekîtî li hev dicivin, mezinahiya Wî xuya dibe.

Ji ber vê yekê, xwuşka min a ezîz, ez ê azweriya xwe bi te re parve bikim. Azweriya min tu yî. Ji ber vê her dem ji bo hewldana Mesîhê hatiye mesihkirin di te de bi cih bibe ez duayan dikim. Ez bêriya vê yekê dikim ku tu xwedî gelek agahiyan bî û bi awayekî resen tiştа emanetî te kiriye di Wî de bibînî. Ez bi bêrîkirin li bendê me ku di vê rêya pîroz a nasîna Reb de alîkariya te bikim. Dema ku min ev pirtûk nivîsî min ferq kir ku ez bi mijareke gelekî pîroz ve mijûl im, ji ber ku em di demek wisa de dijîn ku ji bo em tişta bi dilê xwe bi dest bixin, em bi reqîbên xwe re şer dikin. Pawlos di serdemeke cuda de jiya, lêbelê dêra ku wî jê hez dikir bi zehmetiyên nêzî vê re rûbirû dima:

> Xwezî we di bêaqiliyê de piçekê ez ragirtama! Lê belê ji xwe hûn min radigirin. Ez bi hesûdiya Xwedê ji bo we hesûd im, çimkî min hûn ji mêrekî tenê re, ji Mesîh re nîşan kirin, da ku ez we wek keçikeke pak pêşkêşî wî bikim. Lê ka çawa mar bi qurnaziya xwe Hawa xapand, ez ditirsim ku fikrên we jî bên xirandin û ji sadebûn û dilpakiya ku ji bo Mesîh e veqetin. Eger yek bê û Îsayekî din ê ku me nedaye bihîstin bide bihîstin, an eger hûn ruhekî din ê ku we nestandiye, an Mizgîniyeke din a ku we qebûl nekiriye bistînin, hûn qenc vê radigirin. (Korîntî II, 11:1-4)

Min ne weke dayiyekê weke dapîrekê bibihîzin; hûn ji bo danberhevdanê nehatine afirdandin. Afirîner bêhempabûna we di DNAya we de meyandiye. Tenê hûn dikarin îfadekirina bêhempa ya hezkirin û mezinahiya wî bidin û wê berhem û diyariyên vê kirina we di rêwîtiya we ya ebediyê de we bişopîne.

## Tacên Ebedî

Min bi ravekirina du pirsan dest bi pirtûkê kir, hûn kî ne û Xweda kî ye? Û niha ez wisa dixwazim bi tiştên ji bo me hatine dayîn bigirim. Hêza tişta ku me dike hevparê bingeha xwedayî, li ber sozên ku xwediyê nirx û mezinahiya evînê, em xwe bi rayedariyê dixemilînin.

Kêfa min ji micewheran re tê lê ne ji micewherên jirêzê re. Ez ji micewherên ku xwedî çîrok in hez dikim. Hungulîska min çîroka zewaca me temsîl dike. Hungulîskên min ên di çêbûna kurên min de weke diyarî hatine dayîn, hene. Kolyeyeke min a di şiklê şûr, bazinekî min ê di şiklê tîr û micewhereke min a din jî heye ku wateya şerê weke keçan temsîl dike. Xişlên min ên ku hevalên min diyarî min kirine an xişlên min ên guherîn an serdemên jiyana min ên girîng bi bîr tînin, hene. Ez li wate û dema li pişt diyariyê veşartiye dinêrim û diyar dikim ku ev micewhereke xeml e an aksesûar e.

Ez pir ji çîroka Hannah Hurnard a bi navê *Hinds' Feet on High Places* hez dikim. Her çiqasî ku cara pêşî min di nîveka salên xwe yê bîstan de xwendibû jî lê ji wê demê ve di dilê min de cîh girtiye. Dema ku zarokên

min biçûk bûn min ji bo wan jî ev çîrok dixwend û kengî pêdiviya min pê çêbibe ez ji bo xwe jî dixwînim. Di vê çîroka alegorîk de jineke ku bi tirsê tije ye ber bi cihên ku hezkirina kamil tirsê wenda dike û derdixe cihên bilind, bi rê dikeve. Di vê rêwitiyê de gelek ceribandin, kemîn û vîraj hene. Lehenga me ya jin gelekî ditirse û li her cihê ku konê xwe lê vegirtiye pêşkêşgehekê diçîne û ji erdê kevirekî ji bo bîranînê radihêjêyê û di tûrekî de bi xwe re digerîne. Li cihekî wêrekiya xwe pir winda dike û soz pir li dûr xuya dike ku hindik dibîne ev kevirên ku weke bîranînên bêqîmet ên şikestina hêviyan dibîne, bavêje. Lêbelê ji nû ve difikire û biryar dide ku wan bigire û bi vî awayî baş kiriye ji ber ku piştre her yek ji van keviran dibe micewherek li ser taca di serê wê de.

Pispor ji vê yekê bawer dikin ku di Nivîsên Pîroz de behsa pênc tacan tê kirin. Ya pêşî Taca Rastiyê ye û dema ku em gunehên xwe û şerma xwe bi rastiya Mesîh re biguherînin û me bi rizgariyê ve bi tac bikin em ê vê tacê bistînin. Ya duyem taca Dilxweşiyê ye û ev tac ji bo kesên ku di hemû şert û mercan de Xweda dihebînin û ji kesên ku Wî bilind dikin re hatiye veqetandin. Ya din jî Taca Mezinahiyê ye, ev tac ji bo wan kesan e ku bi hesret li benda Wî ne ku ji nû ve bi mezinahiyekê derkeve holê. Ez dixwazim di çend rûpelên dawîn de bi taybetî li ser her du tacên din bisekinim.

## *Taca Wê Nerize*

Taca wê nerize di ayetên 9:24-27 yên Korîntî Iê de derbas dibe:

> *Ma hûn nizanin ku di meydana bezê de, ji hemûyên ku dikevin hevbezînê tenê yek xelatê distîne. Hûn jî wisa bibezin, da ku hûn xelatê bistînin. Her kesê ku dikeve berhevdanê, di her tiştî de nefsa xwe digire. Ew ji bo çelengeke pûç vê dikin, lê em ji bo yeke nepûç dikin. Ji bo vê yekê ez bêarmanc nabezim, ez badîhewa kulma xwe navêjim hewayê. Ez cefayê didim bedena xwe û wê bindest dikim, da ku piştî min hinekên din hîn kirin, ez bi xwe neyêm redkirin.*

Ev tac bi pêşbaziyê tê qezenckirin û em çawa perwerde bibin em ê wisa baz bidin. Perwerdekirin ne tiştekî bi kêf e, lê redbûyîn an

wendakirina pêşbaziyê qet ne bi kêf e. Di gelek waran de Giyanê Pîroz perwerdekarê me ye:

> Ruhê Xwedê yê Pîroz ê ku hûn ji bo roja rizgariyê bi wî hatine morkirin, xemgîn nekin. (Efesî 4:30)

Her tişt ji bo me serbest e lê her tişt mirov nabe ber bi jiyaneke xwedayî û pêşbaziyek baş ku lê tê bazdan. Xweda dizane bê wê çi hewce ye. Ew dizane ku em ê kengî lezê bikin kengî hêdî bibin. Ew dizane bê divê em bi kê re perwerde bibin û ji kê dûr bisekinin. Em li gorî talîmatên Wî biçin em ê gelek sûdê jê werbigirin. Em ne ji bo tiştekî dirize di pêşbaziyê de ne, em ji bo bêdawîbûnê di pêşbaziyê de ne.

> «Li ser rûyê erdê ji bo xwe xezîneyan necivînin, ku li wir zeng û bizûzk wan xera dikin, dixwin û diz dikevinê û didizin. Lê ji bo xwe xezîneyan li ezmên bicivînin, ku li wir ne zeng û bizûzk dikarin wê xera bikin, bixwin û ne jî diz dikarin bikevinê û bidizin. Çimkî xezîneya we li ku derê be, dilê we jî wê li wê derê be. (Metta 6:19-21)

Eger dilê we li asîmanan be hûn ê rêya ku diçe wir peyda bikin. Jixwe wek ku me kişf kir ev xezîne wê bar bike dilê we û parastvana wê jî hezkirin e. Em li dinyayekê bi bêje, fikr, pirtûk, raman, pêwendiyên civakî, bedewbûn, afirînerî û zanyarî ve tije ye, dijîn. Gelek ji van bêhempa xuya dikin. Lê ji bo ku hûn di pêşbaziyê de nikaribin baz bidin enerjiyek cîhanî ya xeter heye ku giraniyê li ser we dike. Di vê mijarê de em tên hişyarkirin.

> Ji dinyayê û tiştên ku di dinyayê de ne, hez nekin. Eger yek ji dinyayê hez bike, hezkirina Bav bi wî re tune. Çimkî her tiştê ku di dinyayê de ye, xwesteka nefsê, xwesteka çavan û quretiya maldariyê, ne ji Bav, lê ji dinyayê ne. Îcar dinya û xwesteka wê derbas dibe, lê yê ku daxwaza Xwedê dike her û her dijî. (Yûhenna I, 2:15-17)

Ev tişt bi nêzîkayiya rêya dinyayê re me girê didin û bêbandor dikin.

Azweriyên dinyayê dibin sê beş:

1. Azweriyên xwebûnê an jî arezûkirina rêya xwe.
2. Azweriyên çav an jî arezûkirina hemû tiştên hûn dibînin.
3. Rûmeta ku jiyana madî dide an jî arezûkirina xuyakirina girîng.

Eger ne her sê bi hev re bin jî lê di demên jiyanê yên cuda cuda de bêguman em bi yekê ji van re têkoşiyane. Gelek rêyên ku ev di jiyana we de bi awayên cuda hatbin nîşandan hene û ev arezûyên mirov tahrîk dikin, dibe ku her yek ji wan di serdemên guherînê de cuda xuya bikin. Dema ku em nû zewicîbûn û zarokên me tune bûn ez gelekî ji xwe re bûm. Min wisa bawer dikir ku pêdeçûna di rêya xwe de û arezûkirina her tiştên ku ez dibînim, mafê min e. Baş e bi qasî ku ez vê helwesta xwe bijîm pereyên me tune bûn lê dîsa jî ev nedihat wê wateyê ku her tiştê min didît min ne dixwest. Piştre di nava pênc salên dawîn de sê zarokên min çêbûn û êdî tişta ku herî zêde min dixwest xew bû! Eger em bên ser daxwaza xuyakirina girîng, her ku ez yextiyar dibûm girîngbûna ji bo malbata min, hevalên min û keça min besî min û zêdî serê min bû jî.

Ev arezûyên me ji rê derdixin, di bin giraniya bêdawiyê de bi dinyayeke ku hêsîrî perçiqandinê ye ve girêdayiye. Ji tora civakî heta muzîkê, reklam û cîhana kêfxweşiyê her tim hewl didin ku van arezûyan xwedî dikin. Di tu serdemên dîroka mirovahiyê de em ewqasî nêzî mirovên ku pêwendiya me bi wan re tune ye, nebûne. Eger mirov bi kesên wan dibînin re (heval û malbat) ji bo pêwendiyê deyne ewqasî zehmetiyan bikişîne, naxwe ji bo ku pêwendiyê bi Xwedayê ku nabînin re zehmetiyan bikişîne, ev ne qet ne tiştekî ku me şaş bihêle.

> …yê ku daxwaza Xwedê dike her û her dijî. (Yûhenna I, 2:17)

Ji bo ku em ji vê cîhanê qut bibin em îradeya xwe datînin kêlekekê û ya Xweda dipejirînin. Em çareya girêdayîbûna van daxwazên xetere di Wî de dibînin.

> Bi hemû dilê xwe, bi hemû canê xwe, bi hemû hêza xwe û bi hemû hişê xwe ji Xudan, Xwedayê xwe hez bike› û ‹Wek ku tu ji xwe hez dikî, ji cîranê xwe hez bike. (Lûqa 10:27)

Eger dilê we bi hezkirina Xweda bikele wê balkêşbûna vê dinyayê di dilê we de kêm bibe. Dema ku ez kûr difikirim ku ez ji xwe û ji Xweda hez dikim, min ferq kir ku ez li hemberî xwe nermtir bûme. Dema ku ez ji xwe re nerm bim ez ji bo kesên din jî şîrîntir dibim. Dema ku ez li Xweda kûr dibim û şîrîn dibim, wê demê ew ê îhtîmala ku ez li pey tiştên beradayî baz bidim jî kêm dibe, ji ber ku wê pêwendiyên min valahiyê dagirin.

> Hey zînakarno! Ma hûn nizanin ku dostaniya bi dinyayê re, dijminahiya bi Xwedê re ye? Loma kî ku bixwaze bibe dostê dinyayê, xwe dike dijminê Xwedê. (Aqûb 4:4)

Em birastî jî cidî li vê ayetê dinêrin, yan jî em wisa bawer dikin ji ber ku em di bin xweşiyê de ne êdî ev tişt ji bo me ne derbasdar e, ez rastiyê meraq dikim. Zehmet e mirov xeyal bike ku kesek bi zanebûn li hemberî Afirînerê xwe derdikeve. Pawlos bi gelekî bêwefa yê ku dixwest hem di bin zagonan de be û hem jî di bin xweşiyê de bijî, mijûl bû û Yaqûb weke jina Lût her çiqasî xwediyê peymaneke ebedî bin jî bang li kesên bi dinyayê ve hatine girêdan dike.

Bala xwe bidinê ku ev berveçûn bi daxwaz an arezûya dostaniya bi dinyayê re dest pê dike. Di vir de Yaqûb tam çi dixwaze? Di vê dinyayê de mirov xwedî dost be, heta xwedî dostên dinyewî be û dostaniya bi cîhanê re ne heman tişt in. Divê em dostên dinyayê bin lê divê em bi dinyayê re ne dost bin. Ya pêşî dostanî û pêwendiya me ya bi kesên li dinyayê dijîn, ya duyem jî dostanî û pêwendiya me ya bi sîstema dinyayê re îfade dike. Hûn tu carî nikarin li ser hêzeke ku hûn di bin bandora wê de dihejin, bibin xwedî gotin. Ne ji bo ku em nêzî dinyayê bibin lê ji bo ku em karên dilovaniyê li dinyayê bikin bang li me hatiye kirin. Wateya vê:

Ji bedêla ku em ê li dinyayê tazî bin, em ê taziyên dinyayê bikin xwedî kinc.

Ji bedêla ku em ê ji bo dinyayê birçî bimînin, em ê birçiyên dinyayê têr bikin.

Ji bedêla ku em bi dinyayê re têkevin nava heman livînan, li ber serê livînên dinyayeke ku êşê dikişîne, bang li me hatiye kirin ku em şîfayê bidinê.

Di têkiliya me ya bi kesan re, em weke qasidên qralekî din ku fermanên Qralê me, em bi rûmet kirine, tevdigerin. Ev tevgera me tê wateya ku wê demek wisa bê ku wê ji vê tekiliyê re hodrî meydan bê xwestin

Ji bo bidestxistina vê tacê divê em dev ji rekabeta xwe û tirsê berdin û ji bo ku em ji Wî, ji xwe û ji kesên din hez bikin divê em banga Xweda himbêz bikin.

## *Taca Jiyanê*

Û taca dawîn... Taca Jiyanê.

Ya rastî ku mirov bala xwe bidiyê, mirov dikare ji vê tacê re bibêje taca pakrewanan jî. Di Nameya Îbraniyan de, piraniya "lehengên baweriyê" yên ku lîsteya wan hatiye dayîn, Îstefanos, Petrûs û gelek temaşevanên Mesîh ku em ê li vî aliyê ebedîbûnê tu carî navên wan nizanibin, ev tac bi dest xistine. Kesên ku *her tiştên* xwe dane hene. Ev tac bi bedeleke bêreqîb tê kirîn.

> Ji wan tengahiyên ku tu li ber kişandinê yî netirse. Va ye, Îblîs wê hinan ji we bavêje zîndanê, da ku hûn bên ceribandin û hûnê deh rojan cefayê bikişînin. Heta mirinê dilsoz bimîne, ezê taca jiyanê bidim te. Ewê ku guhên wî hene, bila bibihîze ku Ruh ji civînan re çi dibêje. Ewê ku bi ser dikeve, ji mirina diduyan qet ziyanê nabîne.›» (Peyxam 2:10-11)

Em di roj û demeke wisa de dijîn ku her dem derbas bibe wê zêdetir dil ji ber tirsê ji baweriyê dûr bikevin. Tundî, nexweşî, xela û şer tirsa mirinê çêdikin. Bêbextî, sûcdarkirinên pûç û zilm tirsê bi mirovan re çêdikin. Diyar e, ji bo Şeytan me ber bi bêtevgerbûnê ve bikişîne an ber bi bertekên xerab ve vekişîne dixwaze ku me aciz bike. Şeytan jî eynî weke Neron dixwaze ji hêlekê ve me bi zilm û tirsê felc bike, ji hêla din

**Ji bo ku em vê tacê bi dest bixin pêdiviya me bi kûrahiyê heye.**

ve jî dixwaze ku bi dewlemendî û şehwetan ve hişê me ji serê me bibe. Dijminên me ji her tiştî zêdetir dixwazin ku em li serê bîrên daxwazan bisekinin, xwe bixwin û hema pereyên hûr bavêjin bîrê. Lê ji bo ku em vê tacê bi dest bixin pêdiviya me bi kûrahiyê heye.

Çendak berê, dema ku min çav li nûçeyan gerand ez li sê çîrokên tirsnak rast hatim. Du heb ji van çîrokan keçikeke min a giyanî weke lînk şand ji min re. Ew û malbata xwe li pêşengtiya organîsazyoneke ku li Îsraîlê bi qaçaxtiya jinan re şer dikin, dadikevin. Di lînka yekem de min nûçeya xwekuştinên trajîk ên 150 jin û keçên ku ji aliyê DAIŞê ve hatine revandin û weke koleyên seksê hêsîr hatine girtin, xwend. Ez wisa difikirîm ku wê ev nûçeya biêş xerabtir nebe lê di dawiyê de nivîsî bû ku ev caniyên ku ew hêsîr girtine termên van jinan didin kûçikan. Min bawer nekir ku tiştekî wisa bibe û min cardin heman nûçe xwend. Ma dibe ku xerabî ewqasî bi awayekî safî hebe? Niha jî dema ku ez van gotinan dinivisînim dîmenên wan kûçikên ku laşên keçikan bi wehşetî perçe dikin tên hişê min. Gava hiş ji ber dehşeta çavên min direve, gotinên Peyxamê 12:17 min dibînin:

> Îcar ejder ji jinikê hêrs bû û çû, da ku bi wan re şer bike, yên ku ji dûndana wê mane, yên ku emrên Xwedê bînin cih û şahidiya Îsa bi wan re ye.

Wehşetek wisa ji bo mirovan zilmek zêde ye. Ev hêrsa vî ejderhayî ye.

Ev hêrs li hemberî “Jinê” û “kesên ku fermanên Xweda anîne cîh û şahidiya Îsa didomînin” pêk tê. Di nava van deh salên dawîn de ez dibînim ku ev hêmaya tarî nebaşiyê zêdetir dike û digihêje astên ku nikarin bên xeyalkirin.

Di lînka din de jî behsa mêrên ku Quran ji ber kirine wê weke xelat koleyên seksê bidin wan, dikir. Her wiha referanseke wisa hatibû dayîn ku digot, kesên ku tecawizî kafiran bikin wê ev ji bo wan rêyeke baweriyê be. Mixabin ez ditirsim ku heta ev pirtûk bê çapkirin wê ev

çîrok di bin siya gelek çîrokên jê xerabtir de bimîne.

Ya sisêyan jî bi rêya eposteya personelekî rasterast ji min re hat. Li welatên ku ji ber zilm û hejariyê mirovan nikarîbûn xwe zêde bigihînin çavkaniyên Xirîstiyanan, şîrikekî me yê ku materyalên belaş belav dike heye. Yek ji hevalekî me yê wêrek ku li Rojhilata Navîn dijiya, li Sûrî di êrîşeke bombeyî ya ku Xirîstiyan hedef girtibûn de canê xwe ji dest dabû. Şîrikê me yê ku şertên vî mêrikê tê de hatiye kuştin, rave kiribû û wisa nivîsandiye: “Bang li hin kesan tê kirin ku gelek tiştên xwe bidin û bang li hin kesan tê kirin ku *hemû tiştên* xwe bidin.”

Ez matmayî mam. Dema ku ez bi erebeyê diçûm ciwaneke xwe, min hewl dida ku di hişê xwe de ji bo jina bî ya hevalekî me nameyekê be ser hev de bînim. Min wisa hîs kir ku eger ez tiştekî bibêjim dibe ku ji bo jiyana wê û şertên jiyanê wê bibe heqaret. Gotina ku ez bibêjim, *ez xemgîn im,* kêm dima; min bigota, *spas dikim jî,* xelet xuya dikir. Min ê ji nava maleke ewle ku qet pakrewanî nasnekiriyî binivîsanda. Li ber destên min muzîkên hebandinê û pirtûkên ku ez ê nikaribim hemûyan bixwînim û wergerên Pirtûka Pîroz hene. Kîlera min tije xwarin û dolaba min tije kinc in, vê şevê gava ez ê çavdêriya neviyên xwe bikim, ez dizanim ku wê xwuşk û birayên me bêyî ku haya wan ji van êşan çêbibe bilîzin û bikenin.

Min şerm kir. Ji nişka ve min wisa hîs kir ku hemû jiyana min îzole bûyî, weke ku tenê qalikekî vala ye, hemû tiştên min qasî pifdankên kefê ku neviyên min pif dikinê sivik in. Min xwest ez li yekê bigerim. Jineke zanyar a ku ji min pîrtir û zanatir... eger bersivan nede pirsên di dilê min de jî wê ji hestên min fêhm bike.

Di hişê min de gelek pirsên “çima” hebûn. Jinên li aliyê din yê okyanûsê ji bedêla ku kêliyeke din bijîn ewqasî bêçare ne ku dixwazin canê wan bêstendin, îcar ê min çima evqas tiştên min hene? Edalet li kuderê bû? Êş û elema min hîs dikir, min dixwest lê bikolim. Piştre min ferq kir ku ez danberhevdinê dikim. Ez mafdar bûm ku min ev tezat ferq dikir lê danberhevdin ne hewce bû. Bersiveke vê tunebû. Tenê marekî ku ketiye halê ejderha hebû. Jin û zilamên di bin bandora

ejderhayan de, tiştên kambax tînin serê hev. Min ferq kir ku li pêşiya min hilbijartinek heye. Min dikarîbû pirsên bi hêrs bipirsiyana an jî min dikarîbû destûr bidaya ku pirsnîşanên jiyana min bi baneşanê bên guhertin. Min hêsirên xwe paqij kirin û min biryar da ku jiyana wan ya min bikirpîne.

Ev çîrokên zilmê ne nû ne, di her serdemê de derbasdar in. Weke jineke ku hatiye pêncî û pênc saliya xwe, li vî aliyê bêdawîbûnê divê ez bigihêjim têgihiştineke ku ez ê tu carî bi pirsên ku ez ê nikaribim bersiva wan bidim, pevneçînim. Bandora temen tenê têrê nake tiştên ku ne li gorî aqil bin, bîne têxe rewşeke li gorî aqil. Em li pîsteke pêşbirkê ne û bûyerên roja me bêdawîbûnê hîn bêtir balkêştir dikin. Ha ji ber vê hîn ku derfetên me hene divê em xizmeta hîn baştir bikin. Ev çîrok incex di bêdawîbûnê de dikare bê rewşa li gorî aqil lê aniha li vir em dikarin duayan bikin û gava dilên me ji reqabet, hesûdî û danberhevdanê azad bibin, wê demê em ê zanibin ku em hatine bihîstin.

> Wek ku Xwedê hûn gazî yek hêviyê kirine, beden yek e, Ruh yek e Xudan yek e, bawerî yek e, imad yek e. Xwedê yek e, bavê hemûyan e; ew di ser hemûyan re ye, bi hemûyan re ye û di nav hemûyan de ye. Û li gor pîvana diyariya Mesîh ji her yekî ji me re kerem hat dayîn. (Efesî 4:4-7)

## Jiyana Xwe Bijîn!

Gelek tişt ji bo me hatin dayîn. Dîtina me ya bêhempa xelat e. Tiştên ku em dibînin û tecrube dikin xelatek in. Hilbijartinek me heye. Em dikarin bihêlin ku ev yek me gelekî bêzar bike û em dikarin tu tiştî nekin. Em dikarin vê weke tiştekî ji rêzê bibînin û dikarin destûrê bidin ku bala me hişyar neke. An jî em dikarin di nava bêhempabûnekê de bijîn. Em li hêza vê kêliya em tê de difikirin û piştre pêş ve diçin.

Di nava deh salên dawî de qîz û jinên şepal ên ku şûr û xaçan radihijinê, li şûna ku weke keçikan şer bikin û canê xwe xwedî bikin,

min li ser maçên ku keçikan bi girî vedikin nivîsî. Û niha jî bi hêviya ku hemû daxwazên di dilê we de sekinînê ji bo ku pêk bên ez dinivîsînim. Ji ber ku,

Tu keça Xweda, ji bo jiyaneke bêreqîb bang li te hat kirin.
Tu ji aliyê bavekî bêreqîb tê hezkirin.
Tu di demeke bêreqîb de dijî.
Tu ji gelekî bêreqîb tê.
Tu ji bo Xwedayekî bêreqîb xizmetê dikî.
Tu ji aliyê qurbanekî bêreqîb hatiye kirîn.
Te navekî bêreqîb emanet stendiye.
Tu bi giyanekî bêreqîb hate xurtkirin.
Tu bi zimanekî bêreqîb hatiye îfadekirin.
Tu parçeyekî ji bedeneke bêreqîb e.
Tu hate ser erkeke bêreqîb.
Tu bi çekeke bêreqîb hat xemilandin.
Tu beşdarî şerekî bêreqîb bû.
Ji bo duayên bêreqîb bang li te hate kirin.
Li pêşiya me derfetên bêreqîb hene, ji ber ku
Em ji bo berhemên bêreqîb hatine amadekirin û
Em ji bo bêdawîbûneke bêreqîb hatine diyarkirin…
Wê demê em aniha jiyaneke bêreqîb ya di hêz, dilpakî û têgihiştinê de bijîn…
Hin ji me pir tiştên xwe, yên mayî jî her tiştên xwe bila bidin.

Di huzûra Xweda de bi hêviyeke rewnaq, bi xizmeteke sadiq û di her tiştên tu dikî de bi hezkirinê lê bisekin. Ji ber ku hevala min, xwuşka min tu xwediyê qedereke bêreqîb î. Aniha bi wêrektiya ji hezkirinê dizê here, netirse û bi qedera xwe re têkeve rûyê hev.

## Pirsên Nîqaşê

1. Çîroka Theclayê ji we re çi got?
2. Cudabûna di navbera dostaniya bi dinyayê re û dostê dinyayê de, diyar bikin.
3. Di jiyana we de cihên ku divê hûn xalbendiyên wê biguherînin çi ne?
4. Gaveke we ya din a ku hûn ê ji bo jiyaneke bêreqîb bavêjin wê çi be?

“Dinyayekê xeyal bikin ku her yek ji me pir tê hezkirin û em fêhm dikin ku qedir û qiymetê didin me. Lisa Bevere di pirtûka xwe ya ‘Bêreqîb’ de, ji bo em fêhm bikin û bizanibin ku ji aliyê Xweda ve bi awayekî bêhempa hatine afiradin û tên hezkirin, me teşwîq dike. Ji ber em wisa ne roleke girîng daye me hemûyan ku em ê di plana Xweda de ava bikin. Ev pirtûk ji bo hûn bidin dû mîsyona ku Xweda ji bo we veqetandiye, vexwendinek e.”

—**Holly Wagner**, pastor û nivîskar

“Em di nava çandekê de dijîn ku her dem em li cihên xelet li nasnameya xwe digerin û di nava zindiyan de dijîn ku bêarmanc digerin. Ev pirtûk, weke pisûlayeke heqîqî ye ku jin û mêran re çavkaniya rast ya nasnameya me ya giyanî nîşan dide. Em aîdî Xweda ne, Wî em hilbijartin û em bi awayekî nedîtî tên hezkirin. Lisa, di kifşkirina van rastiyên ku naguherin de, karekî pir bi hosteyî derdixîne holê. Ev pirtûk teqez divê bê xwendin!”

—**Brady Boyd**, pastorê dêra Jiyana Nû ya Colorado Springs’ê û nivîskarê *Addicted to Busy*’ê

“Lisa di pirtûka xwe bi navê Bêreqîb de; rastiya bê Xweda ji bo em bibin kî afirandiye û her yekî ji me weke şexsî û bêhempa çawa hez dike, parve dike. Piştî ku kesekî ev pirtûk xwend û şûnde, ez nikarim xeyal bikim ku kesek ji hezkirina Xweda guman bike!”

—**Chris Hodges**, Pastorê pispor yê Dêra Highlands û nivîskarê *Fresh Air and Four Cups*’ê

“Eger di jiyana we de derbarê nasnameya we de pirsgirêkên we çêbibin, ev pirtûk wê weke şoreşekê be ji bo we. Ji bedêla ku em girêka xwe li pişt werîs bixin û di Mesîh de nasnameya xwe ya bêhempa bi dest bixin, me teşwîq dike ku em cihê xwe di nava plana mezin ya Xweda de, bigirin.”

—**Sheila Walsh**, nivîskara *God Loves Broken People* û peyivdara sereke ya ji bo Jinên Baweriyê

“Ez bi rastî bawer dikim ku wê Bêreqîb çavan veke û wê tesîreke mezin li vî nifşî bike. Lisa Bevere, hezkirina Xweda bi awayekî zindî û bi balkêşiyeke wisa xweşik dibêje ku teqêz wê bala her xwendekarî bikişîne. Her ku xwendekar dakevin kûrahiyên vê pirtûka bêhempa, wê hezkirina Xweda ya ji bo wan û girîngiya ku em nasnameya xwe di Wî de dibînin, hîn bêtir wê fêr bibin.”

—**Matthew Barnett**, hevavakarê The Dream Center’ê

“Bêreqîb, bîranîneke xweşik e ku hezkirina Xweda ya ku ji hemû mirovan hez dike, derdixîne pêş. Lisa, bi wehiya taze nêzî mijarê dibe û fikrên xwe bi awayekî narîn û xwerû tîne ziman. Bi rastî jî pirtûkeke xweşik e ku her xwendevan dikare jê îlhamê bistîne.”

—**Caroline Barnett**, hev pastorê The Dream Center’ê

“Li vê dinyaya ku reqabet û danberhevdin ji xwe re kiriye êş û kul; ev pirtûk ji bo her dê, keçik, rêber û hevalî re berhemek e ku divê miheqeq bê xwendin. Ji bedêla ku em yên di destên xwe de bi kesên din re bidin ber hev, dem ew dem e ku em bi destên hev bigirin hatiye. Ji bedêla ku em li hevdû negirin, dem ew dem e ku em hevdû pîroz bikin hatiye. Em bêreqîb in, naxwe ji bo her kes xwe li ber çavan raxîne em cih vekin.”

—**Charlotte Gambill**, serpastorê dêra JIYANÊ, Bradford, İngiltere

“Eger hûn hewl didin ku bi hestên bêqîmet û bêarmancê re serî derxînin û ji bo hûn rexnegirê di nava xwe de bisekînin Bêreqîb tam jî ew tişta hûn lê digerin. Xweda, ji bo hûn di her şert û mercan de ji xwe razî bin û bêyî ku hûn danberhevdinê bikin û bijîn, hûn hilbijartin.”

—**Pastor Steven and Holly Furtick**, Dêra Bilind

“Lisa, alîkariya we dike û dihêle hûn bawerî û azadiya ku hûn zanibin ku hûn berhema bêhempa ya Xweda ne, tecrube bikin. Ji bo hûn ji danberhevdin û reqabetê azad bin û ji bo hûn bigihêjin qedera xwe ya ku Xweda daye we, çi tiştên ku ji we re lazim bin tîne bîra we.”

—**Victoria Osteen**, hev pastorê dêra Lakewood’ê, Houston, Texas

“Pirtûka Lisa Bevere ya bi navê Bêreqîb wê rê li ber we veke ku hûn derbarê nasnameya xwe ya di Mesîh de bigihêjin astên nû. Pirtûka Lisa bi dîtinin di cih de û bi zanyariya Xwedayî tije ye. Ji bo hûn li banga Reb ya bêhempa ya di jiyana we de temaşe bikin, wê gefan li we bixwîne, wê îlhamê bide we û wê we têr û tije bike. Eger hûn bêriya bê Xweda derbarê qedera we de çi gotiye, dikin; ev pirtûk ji bo we ye! Ez ji dil û can dibêjim teqez bixwînin.”

—**Kris Vallotton**, Dêra Bethel’ê rêberê alîkar yê pispor, Redding, California

“Lisa Bevere bi salan e hevaleke me ya ji dil û can e û ez bawer dikim ku wê bi fikrên xwe yên ku di Bêreqîb’ê de parve kirine, wê gelekan ji me azad bike. Gava we ev pirtûk xwend, ji bo hûn arezûya xwe ya danberhevdin û reqabetê têk bibin, ji Xweda alîkariyê bixwazin û destûrê bidinê ku we bike ew kesê ku hûn dixwazin bibin ew kes bê hûn ê çawa hembêz û pîroz bikin.”

—**James Robison**, serok û avakarê Ragihandina Jiyanê yê Navneteweyî

“Ji Lisa hez dikim. Ji bo sedema me heta tu bêjî bes gotinekê radigihîne. Ev pirtûk divê teqez bê xwendin û divê mirov bi peyama wê bawer be. Pir girîng e ku mirov zanibe bê kî ye û zanibe ku pêdiviya me bi kesên din heye! Gava we ev pirtûk xwend, hûn ê hîs bikin ku Bav nasnameya we ya rast û naheje diyar dike û bi vî awayî hûn ê bi hêz bibin.”

—**Jenn Johnson**, rêberê muzîka hebandinê ya Bethel’ê û nivîskarê îlahiyan

“Bêreqîb ji bo her jina di her temanî de xizmeteke bêhempa ya şiyarkirinê ye. Pêdiviya me pir bi peyama Lisa ya radigihîne ku em ji aliyê Xweda ve bi awayekî bêhempa tên hezkirin û li me tê bangkirin, heye. Min ji enerjî û azweriya wê ya ku di her rûpelê de dipijiqe derve, hez kir.”

—**Alli Worthington**, nivîskarê *Breaking Busy: How to Find Peace and Purpose in a World of Crazy*

"Gotinên Lisa yên bi wêrekî û Giyan tije ne; wê alîkariya jinan bike ku wan ji danberhevdin, quretî û hesûdiyê azad bike. Tişta ku soza wê dide, dijî: Eger hûn aîdî Îsa bin, hûn bêreqîb in."

—**Sarah Bessey**, nivîskarê *Jesus Feminist and Out of Sorts: Making Peace with an Evolving Faith*

"Pirtûka Lisa ya dawî tam xezîneyek e. Eyn weke Xweda destên xwe deyne ser hinarkên rûyê me, bala me bikişîne ser xwe û piştre bi hêdîka bibêje 'Ji te hez dikim.'"

—**Lisa Harper**, nivîskar û mamosteya Pirtûka Pîroz

"Fêhmkirina bê hûn aîdê kê ne, cihgirtina bêhempa ya di nava malbata Xweda de û karekterê Mesîh; ji bo dil û giyanekî bitenduristî her dem mezin bibin pir girîng in. Gava ku ev rêgezên ebedî bûn behs; rastiyên Lisa Bevere yên Pirtûka Pîroz û di mijara şîrovekirina wehiya wê ya şexsî de, qabîliyeteke wê ya bi serê xwe heye. Hûn ne tenê xwe kifş bikin bê hûn kî ne, di heman demê de hûn ê Xelaskerê bêreqîb, bi serê xwe û biqûdret jî ji nû ve kifş bikin bê kî ye."

—**Brian ve Bobbie Houston**, pastorên pispor û avakarên Dêra Hillsong'ê

"Li dinyayeke ku jin bi danberhevdin û reqabetê tên nasîn Lisa Bevere tişta ku herî baş pê dizane dike. Bi gotinên biadan, bihêz û şîfaker re me nêzî dilê xwe dike: 'Keçika min, tu besî xwe ye ji ber ku tu bi awayekî bêhempa tê hezkirin.' Bêreqîb me bi awayekî ewle di dilê Bav de bi cih dike û ji bo em di hembêza Wî de rehên xwe berdin, me ji pêdiviya me ya reqabetê azad dike. Hemû jinên ku bêriya têkiliyên kûr, nasname û armancê dikin, divê ev jin teqez bixwînin."

—**Christa Black Gifford**, nivîskara bixelat ya îlahiyan, peyivdar û nivîskara *God Loves Ugly* û *Heart Made Whole*

"Pirtûka nû ya Lisa Bevere Bêreqîb, pênaseyeke xweşik ya hezkirina bêhempa ya Xweda ye ku li hemberî me hemûyan hîs dike. Pirtûk tîne

bîra me ku reqîbê me tune ji ber ku Xweda em bi nirxên bêhempa û bi nasnameya em di Wî de xwediyê wê ne afirandiye. Divê her kes teqez bixwîne!”

—**Jentezen Franklin**, pastorê pispor yê Free Şapel’ê û nivîskarê *New York Times*’ê yê ku pirtûkên wî pir tên firotin

“Hevala min ya delal Lisa Bevere dîsa tiştekî pir xweşik kiriye. Bêreqîb, weke jineke Xwedayî bê hûn kî ne û aîdê kê ne wê kifş bike. Û pirtûkeke wisa ye ku îlhamê dide mirov û di xwe de hêmayên pêxembertiyê yên bi hêz dihewîne. Her jina hûn nas dikin pirtûkekê bidinê. Ez wisa bikim.”

—**Christine Caine**, avakarê xizmetên A21 û Propel Women’ê

“Ne tenê bi awayekî hekhev ji me tê hezkirin, di heman demê de bi awayekî bêhempa em tên hezkirin. Lisa, di Bêreqîb’ê de rastiyên ku alîkariya we bike ku hûn ji nû ve hêz û armanca xwe bidin ser hev, berçav dike.”

—**Mark Batterson**, nivîskarê *The Circle Maker*’ê yê *New York Times*’ê yê ku pirtûkên wî pir tên firotin û serpastorê dêra National Community

# ŞEPAL RADIBE SER XWE

*Şiyar Bibe û Dinyaya Xwe Biguherîne*




Nivîskar û axêver Lisa Bevere di “Şepal Radibe Ser Xwe” de, jiyan û îmaja şepalê ji bo jinan weke modeleke kovî û nazik pêşkêş dike. Lisaya ku taybetmendiyên ecêb ên vê afirînera bêhempa derdixîne holê, jinan vedixwîne ku azwerî, wêrekî û armancê kifş bikin.

Hîn bibin bê ev xalên li jêr tên çi wateyê:


- bibin nûnereke berbiçav a hêzê
- bi tundî ciwanan biparêze
- dengê xwe bi deyn bide yên bêdeng
- di ronahiyê de bijîn û di tariyê de nêçîrê bikin
- qêrîneke hevpar ya ku her tiştî diguherîne hûn ê hîn bibin.

Şepal Radibe Ser Xwe, bi têgihiştinên balkêş ên ji xwezayê û kûrahiyên dewlemend yên bi referansên Încîlê tije ye. Şepal Radibe Ser Xwe, bangek e ji jinan re ku bi hêz û hejmareke mezin rabin ser xwe cîhana xwe biguherînin.

Di vê malperê de heye: MessengerX

# MessengerX


*Ji bo her kesî û li deverî rêwitiya ku xwendekarekî ava bike*




- **Ji 125 zimanan zêdetir bêpere ye.**
- Weke sepanê û weke online mirov dikare pêde bike.
- Çavkaniyên ji bo hûn xwe bi pêş bixin.
- Paşeroja xwe û rêwitiya xwendekariya xwe bişopînin.



Ji bo hûn di hemû cîhazan de temaşe bikin, bixwînin an jî guhdar bikin; e-pirtûk, pirtûkên bideng, kurte fîlm, vîdeo, Pirtûkên Pîroz û hin tiştên ji van zêdetir ku di pirtûkxaneya çavkaniya xwendekaran ya Messenger'ê de cih digire, ji bo hûn xwe bigihînin wan serdana wê bikin.




## MessengerX.com

Daxîne ji ser App Store

Werbigire ji ser Google Play

Li temamîya dinîyayê li «App Store»-ê û «Google Play»-da

"Bêreqîb, di şerê li hemberî nasnameya me ya Mesîh de sekneke pir taybet berçav dike."
— JOYCE MEYER,
Mamosteyê Pirtûka Pîroz û nivîskarê ku pirtûkên wî pir tên firotin.

Sedemeke sînorkirina ku em xwe bi reqabetê bi kesên din re weke reqîb dibînin û xwe bi wan re didin ber hev, heye. Bi hêviya ku em ê li hemberî xwe û kesên din derkevin; em xwediyê dijminekî ne ku êrîşî hiş, îrade û hestên me dike. Em dikevin nava çerxeke ku me ji têkiliyên nêz îzole dike, derbarê nasnameya me de tevliheviyê derdixîne û armanca me bisînor dike.

Lisa Bevere; nivîskara ku pirtûkên wê pir tên firotin, bi pirtûka xwe ya ku navê wê Bêreqîb e, wehiya ku em derbarê hezkirina Xweda de distînin bi me re parve dike bê em van sînoran çawa parçe dikin. Bê hûn ê çawa hîn bibin ku kesên din weke reqîb nebînin û nasnameya rast ya ku we bi Afirînerê xwe re bêriyê kiriye û têkiliyên kûr yên ku soza nêzîkatiyê di xwe de dihewîne jî hûn ê hîn bibin. Lisa bi nêrînên pêxembertiyê yên aîdê roja me re, hînbûneke saxlem ya Pirtûka Pîroz dide û bi zimanekî azwer û qerfî gefan li we dixwîne...

- Reqabetê berevajî bikin û tişta herî baş ya di nava xwe de derxînin.
- Dev ji axaftinên ku divê hûn bibin parçeyê wan berdin.
- Bertekê bidin nîqaşa ku jin kêm in, zû dixapin û cahil in.
- Reqabeta di nava zayendan de pûç bikin û bi zilamên ku di jiyana we de cih digirin re xizmetê bikin.

Ji bo jiyaneke we ya bêreqîb hebe, dema ku hûn gavan bavêjin bi pêş ve hatiye.

Nêzîkatiya **Lisa Bevere** ya otantîk, azwer û kêfxweş; rastiyên kûr yên Pirtûka Pîroz bi sepanên piratîk re digihîne hev. Pirtûkên wê yên bi navê *Fight Like a Girl, Lioness Arising* û *Girls with Swords* jî di nav de, li temamê dinyayê gîhane bi milyonan mirovan. Lisa û zilamê wê John, di nava nivîskarên herî pir difiroşin de cih digirin û avakarên Messenger International'ê ne.



Ji bo hûn belaş meteryalan daxînin û vîdeoyan temaşe bikin, serdana navnîşana **MessengerX.com** bikin.

Ev pirtûk xelata nivîskar e û nayê firotin.

Hûn dîha zêde dixwezin?
Şikil pêlkin: